

Nûbihar






KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ







- ▶ Ji zilmê re bêdengmayin jî zilm e **Süleyman Çevik**
- ▶ Serhed: Welatê ku roj lê hiltê **Rohat Alakom**
- ▶ Kilama Robozkê **Berken Bereh**
- ▶ Şêxên Neqşîbendî û Bedirxan Beg **T. Î. Doskî**
- ▶ Cizîra Binxetê û Şêxên Ola Îslamê **Konê Reş**
- ▶ Eşîrên Herêma Botan-V: Eşîra Kiçan **M. M. Timurtaş**
- ▶ Mesture Kurdistanî **Rûken Çaliştiran**
- ▶ Helbesta Osman Sebrî **Tekîn Çîfçî**
- ▶ Bîranîna şehîd Mele Îzzeddîn **Mehmet Ay**
- ▶ Em ji zanayekî xwe bûn **Osman Tunç**
- ▶ Li pey Seydayê Varli **Ali Karadeniz**
- ▶ Mirasa seydayê şehîd Mela Îzzeddîn **N. Emînoğlu**
- ▶ Li ser dengbêjiyê **Felat Dilgeş**
- ▶ Helîm Yûsiv: Nivîsîn projeyeke jiyane ya berdewam e **Hevpeyvîn: Omer Dilsoz**
- ▶ Li ser romanivîsiya Mahmut Baksî **Îslam Geliş**
- ▶ Talankirina dîwana Feqiyê Teyran **Seîd Dêreşî**
- ▶ Lemaya Diyine **Bediuzzeman Saîd Nûrsî**
- ▶ Ferîştehan ew di xew re kirin **Hatîce Mollakendî**
- ▶ Helbesteke birîndar û şikestî **Bro Omerî**



Ji Nûbiharê! berhemên nû!



Ji kelepora Kurdî



Li ser navê Pak Ajans Yayıncılık
Ltd. Şti. (adına)
Xwedî û berpirsiyarê Nivîsaran
(Sahibi ve Yazı İşleri Müdürü)
Süleyman Çevik

Büyük Reşit Paşa Cad. Yumni İş
Merkezi No: 22/29 Vezneciler/
Beyazıt - İstanbul
Tel&Fax: (0212) 519 00 09
www.nubihar.com
nubihar@gmail.com

Navnîşana Nameyan
P.K. 80 Fatih - İstanbul

Nûnertiya Almanya
Burhan Kaya
kizilkaya_burhan@yahoo.de
Tel: 0234 - 7922968

Kovara Nûbihar ji 3 mehan carekê;
Payîz, Zivistan, Bihar û Havînê
tê weşandin.

Berg û rûpelsazî
Dawud Rêbiwar

Çapxane
Alioğlu Mat. Bas. Yay. ve Kağ. San.
Tic. Ltd. Şti Orta Mh. Fatih Rüştü
Sk. No: 1-3/A Bayrampaşa/İST.
Tel: 212 612 95 59

Yayın Türü: Yerel Süreli

Berdêla abonetiya salane
Türkiye: 25 TL
Welatên din: 25 EURO, 30 \$

Jimareyên Hesaban
Hundirê Tirkîyê:
Postgiro (Posta Çeki)
Süleyman Çevik: 658265
Süleyman Çevik, İş Bankası Laleli
Şubesi: 1084-0363459
Derveyî Tirkîyê: Süleyman Çevik,
İş Bankası Yavuz Selim Şubesi:
1079-30100-3118770

Mesûliyetê ramanên
nivîsaran aîde nivîskarên e.
Berhemên hatine sandin bi şûn de
navên veşerandin.


Ji zilmê re bêdengmayin jî zilm e	
Süleyman Çevik	3
Serhed: Welatê ku roj lê hiltê	
Rohat Alakom	5
Wan dicemide	
Mehmet Bozkoyun	16
Şêxên Neqşîbendî û Bedirxan Beg	
Tehsîn Îbrahîm Doskî	17
Kilama Robozkê	
Berken Bereh	20
deriyê dilê min	
mehmet ali aluç	22
Cizîra Binxetê û Şêxên Ola Îslamê	
Konê Reş	23
Eşîrên Herêma Botan-V: Eşîra Kiçan	
M. Munir Timurtaş	29
Sedeqe Ehmedê Nadir	
Hasan Hüseyin Çevik	32
Dotmîra wêjeya Kurdî Mestûre Kurdistanî	
Rûken Çalıştiran	33
Xezala miyandaran	
Ömer Faruk Çetinkaplan	36
berdin bila tarî be	
Muhammed Karaboğa	36
Helbesta Osman Sebrî	
Tekîn Çifçi	37
Pesna Yaran	
Zilkîf Xweşhêvî	42
Em ji zanayekî xwe bûn	
Osman Tunç	43
Bîranîna şehîd Mele Îzzeddîn	
Mehmet Ay	44
Li pey Seydayê Varlı	
Ali Karadeniz	45
Mirasa seydayê şehîd Mela Îzzeddîn	
Nezhat Emînoğlu	47

Şa dibin bi hestiyar		Ferîştehan ew di xew re kirin	
Huseyn Şemrexî	48	Hatîce Mollakendî	74
Dîroka derew		Demeke Tarî	
Kudbettin Çelik	48	Kelhokî	76
Li ser dengbêjiyê		Prof. Dr. Sibel Arkonaç: Em hemî	
Felat Dilgeş	49	parêzvanên îdeolojiya cumhûriyetê ne!	
"heyîv"!		Hevpeyvîn: Komxebata Psikolojiyê	77
sidîq gorîcan	52	Reva Gulnazê	
Helîm Yûsiv: Nivîsîn projeyeke		Hesen Polat	81
jiyanê ya berdewam e		Lo zemano!	
Hevpeyvîn: Omer Dilsoz	53	J. Ahmet Yıldız	83
Li ser romanivîsiya Mahmut Baksî		Mizgînî	
Îslam Geliş	56	Zîwer Îlhan	84
Talankirina dîwana Feqiyê Teyran		Kalikê min dibêje	
Seîd Dêreşî	63	Murad Pola	86
Çend gotin ji Mesnewiyê		Li gor Îslamê jin û bazirganî	
Mewlana Celaleddînê Romî	68	Rojbîn Ozkan	88
Lemaya Diyene		Helbesteke birîndar û şikestî	
Bediuzzeman Seîd Nûrsî	69	Bro Omerî	91
Hozanê heznê		Qelem ey!	
Azad Rêbiwar	72	M. Zahir Ertekin	93
Hewar		Neçe...	
Dilêr Zana	73	Bamed Serdar	95

**ÎNNA LÎLLAHÎ
WE ÎNNA ÎLEYHÎ
RACÎÛN**

Mirovê hêja,
berkevtî, zana,
aşiqê xebatên
îlmî, fedakar û
yek ji stêrkên
esmanê Seydayê
Mela Abdullah
Varli, cûye
rehmetê. Xwedê
wî rehmeta xwe
şad bike û serê
malbata wî û gelê
me sax be.

Nûbihar



Ji zilmê re bêdengmayin jî zilm e

SÜLEYMAN ÇEVİK

ceviksuleyman@hotmail.com

Di 28ê Çileyê Pêşin sala 2011an de, balafirên şer yên Tirkiyê, bi xeddarane li gundê Roboskiya Qilabanê 34 heb ciwanên bêgune û masûm kuştin.

Ev bûyera bi wehşet û xeddar, ji îro ve aşîkar e ku wê di dîroka Kurdan de wekî rojê reş cihê xwe bigre.

Di pey rojên ku herkesî behsa vê bûyerê dikir de îjar li Diyarbekirê ji bin erdê hestiyên însanan derketin û em rastî trajediyek din hatin.

Hîna em nizanin ev hestî yên kê ne, lê bi vê bûyerê jî carekê din mijara merivên wendayî kete rojevê û ew birîna me ya ku kewiyayî bû careke din der bû.

Di heqîqetê de elemanên saziyên dewletê yên ku van karan dikin weş û cenawur nebin ewqas bi rehetî nikarin 34 heb ciwanên masûm bi vî hawî bikujin, merivan bi zorê birevînin, li wan îşkence bikin û cesedên wan di cihên ji çavan dûr û xewle de veşêrin.

Qetlîama 34 heb ciwanên masûm û di van salên dawîn de

nizanim çiqas wendayiyên bê nav û bê nîşan!

Ev karên ku hinek kesan li ser navê dewletê dikirin gelo dikeve eqlê we ku rayedar ji van tiştan bêxeber bûn? Ew agahiyên ku di welat de bi herkesî aşîkar bû gelo mumkin e ku bi ewqas îstîxbarat û îmkanên xwe rayedar û îdareciyên dewletê nizanibin? Îro em dizanin ku çi siwîl, çi resmî hemû rayedarên wê demê haya ji van hedîseyan hebû...

Şahid û failên van bûyerên aşîkar herçiqas bi salan e hin tiştên kirine îtîraf bikin û bibêjin jî kesekî ji van mesûlan heta niha hesab nepirsiye. Piştî 12 Îlonê ji rayedarên hebsa Diyarbekirê û çiqas bêhiqûqiyên wê demê hene tu kes li ser wan nesekiniye.

Ev hestiyên hebsa kevn ya Diyarbekir jî tesadûfen derketine. Ji bo restorasyona cihên tarîxî dema erd kolane rastî hestiyên însanên kuştî hatine, şaş mane, nizanin çi bibêjin... Dibêjin, dibe ku ev hestiyên însanên dema Şêx Seîd, yan yên Ermeniyana bin û tew dibe ku mezal bin jî.

Ev bûyera bi wehşet û xeddar, ji îro ve aşîkar e ku wê di dîroka Kurdan de wekî rojê reş cihê xwe bigre

Hestiyên kê dibin bila bibin, xuyaye ku nêzikî sed salî ye kuştin û înfazên ne adil li van deran dibin, kesên wendayî hene ku nehatine dîtin û mirovên wan jî li wan digerin...

Mixabin em xerîbên wehşetan nînin, lê dema meriv evan dîmenên vê xeddariyê dibîne ji meriv re sebr û tehemûl namîne.

Çi ev merivên wendayî, çi kuştina zarokên Roboskiyê.

Em baş dizanin ku di dunyaya Kurdên vî alî û wî alî de "hidûd" tu tiştî îfade nake. Kurdên vê hêlê û wê hêlê merivên hev in, xal û xwarzî ne, mam û pismamên hev in û gelek jê yek eşîr in...

Ji ber vê, çûn û hatina Kurdên nêzikî hidûd tişteke normal e.

Bi salan e ku bi xebera dewletê û rayedarên wê, Kurd ji hidûd derbasî jêr dibin û bazirganiyê dikin; mal dibin û tînin û pê îdareya xwe dikin.

Ev felaket tev serpêhatiyên me ne, serpêhatiyên me jî dîroka me ne... Xuyaye ku li alîkî kuştina 34 kesên Roboskiyê, li aliyê din revandin, lêxistin, sirgun, girtin, îşkence û kuştina merivan û ji bin erdê derketina cesedên wan li vî welatî tişteke normal e...

Çima evan tiştan dibêjim.

Ev wahşeta ku em rastî wê hatine ne mumkin e ku dilê meriv neşewitîne, agir nexîne kezeba meriv.

Bifikirin ku di hengama ev wehşet dibin de li hemberî vê xeddariyê qet kesek xwe nalivîne jî. Û hûn dibînin ku mirina Kurdên reben ji hînek însanên bi wîcdan pê ve kesekî aleqedar jî nake. Kesên behsa heq û hiqûqê dikin,

mislimanên ku behsa biratiyê û ummetê dikin ji van meseleyên Kurdan re kerr û lal in...

Li alîkî li ber çavê dunyayê aşîkar 34 kesên bêguneh kuştine, li aliyê din li her derê welat însan revandine û bêyî ku mahkeme bikin kuştine û ji çavan dûr veşartine.

Encax zihniyeta ku wehşîbûn û xeddarbûna wê tescîl bûye dikare li ser kesên nejixwe ewqas şiddetên xeyrî însanî bike.

Ji bo fêmkirina zihniyetan carina hereketek dibe sebeb ku em hinekan baştir nas bikin. Bi van herdu zilmên xeddar jî bi me baştir aşîkar bû ku dîndar, çep, rast welhasil ekseriyeta xelkê vî welatî dilê wan ji êşa me re sar e.

Li vî welatî mirina Tirkên û Kurdan jî ne weke hev e. Rayedar bi mirina Kurdan biqasî mirinên xelkên din naêşin. Di ser de jî ev mirin bi neheqî û bi destê wan bûye...

Çapemeniya Tirkîyê bi mudaxeleya rayedaran piştî ku 12 seet derbas bû behsa bûyerê kir.

Di wan rojên ku zarokên me bi bombeyên wan parçe parçe bûne de, kes ji kêfa xwe jî nema... Ewana li bajarên rojava, li kolan û meydana bi eşq û kêf sersala 2012an pîroz kirin.

Ji dewletê tu kes tevlî cenazeyê nebû, kesî ji wan re telefon venekir, kes nebû şîrikê şîna wan... Ne kesek hatiye girtin, ne jî ji hêla rayedaran ve lêborîn hatiye xwestin...

Gundiyan bi xwe cenazeyên xwe li heştirên xwe bar kirin anîn defin kirin.

Di demeke weha de gereke

şîneke umûmî bihata îlankirin.

Bi qetî dixwazim bibêjim, her mirovê ku xwe li hemberî bûyera Roboskiyê û li hemberî malbatên wendayîyan kerr û lal dike ji wîcdan û însafê mehrûm e û bila li însaniyeta xwe bigere.

Eger ev qurban Kurd nebana gelo rayedar û raya giştî wê çawa hereket bikin?

Ev wehşetên han ne li Ew-rûpayê, li rojavayê Tirkîyê jî bibin dîsa qiyamet radibe li Tirkîyê...

Her dezgeh û rayedar dê biherikîyana ciyê bûyerê, rayedaran derhal di vê bûyerê de îhmala kê heye hesab ji wan kesana bipirsiyana...

Serokwezîrê ku ji bo tevkujiya Dêrsimê ya salên 1937-38an li ser navê dewletê lêborîn dixwest, ji qetlîmeke di dema xwe de lêborînek nexwest; bi ser de ji eskeriyê re spasiya xwe anî ziman...

Hûn çawa ji Kurdan sedeqetê dixwazin?


Hûn çawa dixwazin dilê Kurdan qezenç bikin?

Ma ji zilmê bêdengmayin jî ne zilm e?..

Mele Abdullah Varlı

Dema me ev jimara Nûbiharê amade dikir ku bişînin çapê Mele Abdullah Varlı wefat kir. Seyda însanek gelek ji dil û samîmî bû. Ji destpêka Nûbiharê ve min ew nas dikir.

Xwedê Teala bi rehmeta xwe ruhê wî şad bike û serê malbata wî, dostên wî û serê gelê me sax be. ●



SERHED

Welatê ku roj lê hiltê

ROHAT ALAKOM

“Welatê Serhedê daîm berf e qet ranabe...” (Ji straneke Kurdi)

Destpêk

Dîroka Serhedê hertim bala min kişan-diye. Ev demeke bi navê *Welatê Serhedê* (Dîrok, folklor û edebiyat) xebatekê amade dikim. Ev nivîsa bi navê *Welatê Serhedê* wek destpêka vê xebata min dikare bê hesabîn. Heta niha li ser Welatê Serhedê gelek tişt hatine gotin, lêbelê li ser vî welatê niv-folklorîk û niv-mîtolojîk tu lêkolînek yan jî tu teksteke bi serê xwe pir mixabin nehatiye nivîsîn. Ez hêvî dikim ku ev nivîsa min bala xwendevanan careke din dîsa bikêşîne ser vî welatê zêde nenas, dîrok û çanda wê.

SERHED:


Li ser xetê yan jî serê xetê

Peyva serhed ji du gotinan pêk hatiye: *ser+hed*. Gelek caran tê gotin ku serpeyveke Îranî û *-hed* jî peyveke Erebî ye. Serhed tê wateya herêma li dor sînoran yan jî li ser sînoran. Hin caran bi wateya

li ser sînor yan jî serê sînor hatiye bi kar anîn. Angorî lêkoler Mithad Sertoğlu peyva Serhed tê wateya serê sînor.¹ Serhed wek nav û paşnav jî tê bi kar anîn, wek mînak *Derwêş Serhedî* û *Medet Serhat*. Kesên ji Serhedê re *serhedî* tê gotin. Peyva Serhed ji der zimanê Kurdî, di zimanê Tirkî de jî tê bi kar anîn, wek mînak gelek caran ji bajarê Qersê re *Serhat Kars* (Qersa Serhedî) tê gotin. Lêbelê îfadeya Welatê Serhedê çawa emê li jêr jî bibînin navê herêmekê ye. Hin caran di Kurdî de em rastî forma *Serhedan* jî tên. Lêbelê ev forma zêdetir wek forma pirhejmariya (plural) peyva Serhedê tê bi kar anîn.

Mirov dikare bi kurtî bêje ku ew herêma ku li wir sînorên Împaratoriya Osmanî, Îran û Rûsyayê nêzîkî hev dibûn, Welatê Serhedê pêk dianî. Di rojên îroyîn de sînorên Tirkîyê,

1 Midhad Sertoğlu, *Resimli Osmanlı Tarihi Ansiklopedisi*, 1958, r.293.



Nexşeyeke ku Welatê Serhedê nîşan dide.
(Ji arşîva A. Argun Çakir)

Îran û Ermenîstanê li vê herêmê dighêjin hev. Bajarên Qers, Agirî û Wan kakilê Welatê Serhedê pêk tînin. Her wisa jî bajarên ku li rojavayê van bajaran cîh girtine wek Erzirim, Bitlîs û Muş jî perçeyekî Serhedê tînin hesabînin. Ev beşê Serhedê jî, Serheda paşmayî yan jî Serheda hundirîn dikare bê navandin. Gola Wanê ku gelek caran bi navê “Behra Wanê” tê nasîn, li Welatê Serhedê dimîne. Ev gola li herêmê Gola here mezin tê hesabînin.

Serhed herwisa jî beşeke *Qafkasyayê* (Caucasus) pêk tîne. Welatê Serhedê mirov dikare bêje ku di dîrokê de mînyatûrekê pirçandîya Qafkasyayê pêk aniye. Pirçandî, pîrzimanî û pirdîndarî her tim bûne sê stûnên rengîniya Welatê Serhedê. Vê yekê dewlemendiya çanda herêmê bi dirêjahiya sedsalan xemilandiye û neqîşandiye. Di biryara Kongra Coxrafyayê ku li Tirkîyê di sala 1941an de pêk hatiye, erdê Tirkîyê di nav xwe de bûye heft herêman. Welatê Serhedê li yek ji wan heft herêmên Tirkîyê, li Herêma Rohilata Anadolîyê dimîne. Welatê Serhedê gelek caran bi navê Kurdistana Bakûr yan jî bi navê Ermenîstana Rojava hatiye/tê nasîn. Yek ji wan herêma Ermenîstana Mezin *Ayrarat* bû ku ji çardeh kantonan pêk dihat. Ev herêma kakilê Welatê Serhedê dikare bê

hesabînin. Welatê Serhedê ji herêma *Ayraratê* gelek firehtir e. Li Welatê Serhedê çawa tê zanîn bi piranî zaravayê Kurmancî tê peyivîn. Di vê devokê de gelek caran mirov rastî peyvên Rûsî, Ermenî û Farisî tê. Li Welatê Serhedê bi dehan çand, ziman, dîn û bawerî li hev qelibîne, hev dewlemend kirine. Mirov nikare bêje ku ne tenê Serheda Welatê Osmanî hebû, herwisa jî Îran û Rusya jî xwedî Serhedekê bûn. Her yekê jî tanga (alî) xwe de ji xwe re çand, dîrok û edebiyateke Serhedê afirandine.

Divê em li vir diyar bikin ku Welatê Serhedê xweyê sînorên fermî (resmî) nîne, welatekî li ser sînoran e, welatekî gelerî û folklorîk e. Wek mînak ji aliyê dewletên merkezi de herêmên dûr ên wiha periferîk gelek caran Serhed dihatê hesabînin. Cixîz, têt, kevir, mayîn, kuleyên leşkeran ku gelek caran sînoran nîşan didin ne tenê sînorên herêmê, zêdetir sînorên van dewletan nîşan didin. Sînorên Welatê Serhedê sînorên xwezayî ne, peyman yan jî hududnameyek tune ye ku îro sînorên Welatê Serhedê nîşan dide.

Li ser nexşeyên nûjen em nikarin sînorên Welatê Serhedê bibînin. Lêbelê çend lêkolanan di van salên dawîn de angorî xwe sînorên ne-fermî yên Welatê Serhedê kişandine û pêşkêşî xwendevanan kirine. Wek mînak lêkolera Pîr Dîma² û Argun Çakir³ di xebatên xwe yên li ser Serhedê de ji van nexşeyan çend heb me li jêr weşandine. Van kesan xebatên xwe bi Welatê Serhedê ve sînor kirine, giraniya xwe dane vê herêma ne zêde lêkolandî.

QERS:

Paytexta Serhedê

Di nav bajarên herêmê Serhedê de Qers her tim navenda Welatê Serhedê hatiye hesabînin. Bajarekî garnîzonê bû. Pir hêzên leşkerî li herêmê berhev bûbûn. Bajar çend caran ketiye destê Faris û rûsan. Di dawîya de dîsa bûye bajarekî Osmanî yan jî Tirkî. Nivîskarê xweyê Xelata Nobelê (2006) Orhan Pamuk li ser bajarekî din ê Serhedê, bajare

- 2 Pîr Dîma, *Êzdiyên Serhedê*, Weşanxaneya Do, werger ji Rûsî: Ezîzê Cewo, 2009.
- 3 A. Argun Çakir, *Lêkolînek li ser stîla gotina stranana a dengbêjê Serhedê Reso*, Proja Xelaskirina Lîsansa Bilind, 2010. Unîversîta Îstênbolê ya Teknikê. Enstîtûya Zanistiyên Civakî.

Qersê romaneke bi navê *Berf* (2002) nivîsî. Di romanê serpêhatiya Qersa îroyîn heye. Lêbelê Orhan Pamûk heyraniya xwe li Qerseke din jî tîne: Qerseke Serhedî, Qerseke pîrçandî, Qerseke wek berfê wisa spî û paqij. Tîpên Kurd jî di romanê de hene.⁴


KURD:

Sînorparêzên Serhedê

Jiyana Serhedê di sedsalên kevn de xweyê hin rûçik û taybetîmendiyên bûye. Ji ber ku ev herêma di pratîkê de di destê Kurdan de bû, gelek caran gotina Kurdan derbas dibû. Kurd wek sînorparêz ji aliyê dewletên lê diman, dihatin tayîn kirin, karên fermî dikirin. Lêbelê gelek komên Kurdan wek Kurdên koçber, bazirgan û siyar bandûra xwe li van deverên Serhedê nîşan didan, li van deveran beled bûn. Bi taybetî ew sînorê Osmanî û Îranê ku piştî sala 1639an de hatibû pejirandin hema bêje Kurdan ev war-sînoran gav bi gav nas dikirin. Cîhên bihurge (boran) gelek baş zanibûn, beledê van nixteyan bûn. Îro jî wisa ye.

Di derbarê sînorparêziya Kurdan de serpêhatiyeke navdar hatiye belav kirin û wiha tê gotin.

Padîşahê Osmanî, Qanûnî Siltan Silêman, Kurd weke parêzgerên sînorên Rohilatê dîtine. Kurd di navbera dewleta Osmanî û dewletên mayin de weke dîwarekî jîndar hatiye dîtin ku ji "goşt û xwînê" pêk hatiye. Mele Mehmûdê Bazîdî girîngiya vê siyaseta baş fem kiriye û di vê nivîsa xwe de cî daye van gotinên Qanûnî Siltan Silêman. Ez bawer dikim ev gotinên Siltan Silêman, enîvîsa Kurdên Serhedê bi vekirî û baş îfade dîke û bersîva diya xwe wiha dide: "Dayê, min ew dîwar ji goşt û xwînê ava kir. Min hukmê wan herêman da destê êlên Kurdan, min ew ji Gurcistanê heta Bexdê, Besrê û Şarezûrê, di rêzekê de mîna asêgehek, danîn. Dijmin nikare ji wan derbas bibe û têkeve dewleta Îslamê".⁵ Bi kurtî hebûna sînoran û rewşa serhedbûnê di van salan de li ser rewşa Kurdan ya civakî, aborî û çandî bandoreke mezin nîşan daye. Babeta sînor, sînorparêzî û Kurdan babeteke balkêş e. Vê yekê bala kesên mayin jî kişandiye,



Beşek ji nexşeyê ku koçberiya Kurdên Êzdî berbi Welatê Serhedê nîşan dide. (Ji arşîva Pîr Dîma)

bi taybetî jî babeta Kurdan û parastina sînoran. Ji aliyê dewletên herêmî de li Serhedê hertim valahiyeke siyasî hebû, Serhed gelek caran wek welatekî bêxweyî bû. Lêbelê warê bandûra Kurdan li herêmê zêde bû.

Li derdorên sînorên Osmanî û Îran hertim şer hebûne. Di sala 1847an de li Erzîrmê nûnerên herdu dewletan, ji aliyê Osmanî û Farisan de civîneke navnetewî pêk tê. Divê gelek gerên lêkolînê bihatana kirin. Komîsyonek saz dibe û heyetê ev gera di navbera salên 1848-1852an pêk anîye. Encamên gerê bi navê *Gernameya Sînor* (Seyahatname-i Hudud) wek pirtûk hatiye weşandin. Ev pirtûk ji aliyê Mehmed Hurşîd Paşa de hatiye nivîsîn.⁶


Torinên Welatê Serhedê weke *mîrên sînoran* û *prensên sînoran* dihatin hesabîn. Leşkerên Kurd carina li Serhedê ji bo parastin û hin caran jî ji bo firehkirine sînorên Osmanî, Îranî û Rûsî xwe di nav gelek şeran de dîtine. Wan wek *leşkerên sînoran* şer kirine. Ji wan re bi latînî *milites limitanei* û bi Tirkîya Osmanî *serhad kulu* hatiye gotin. Di dîroka Osmanî de ew kesên ku sînor diparastin, êriş dibirin nav sînorê dijmin bi navê *Serhad Kulu* dihatin navandin û di nav xwe de dibûn çar beşan.

Kurdan bi saya vê pozîsyona xwe di van salan de dikaribûn tenê sînorên mîrekên xwe biparas-

4 Rohat Alakom, *BerfêKurdên Orhan Pamuk*, Tiroj, nr 23/2006.

5 E. I. Vasilieva, Pirtûka Winda ya Dîroka Kurdistanê, *Almanaxa Kurdî*, Weşanên Roja Nû, 1997, r.78.

6 Mehmed Hurşîd Paşa, *Seyahatname-i Hudud*, Simurg Yayınları, 1997.



Welatê Serhedê angorî lêkolerên Tirk ji du beşan pêk tê:

1) Beşa Erzirim-Qersê, 2) Beşa Murada Jorîn û Wanê

tana. Dema parastin û firehkirina sînoran bi navê Kurdistanê bihata kirin, wê demê hemû hesab diguhirîn. Ne Osmaniyan, ne jî Îraniyan dixwestin xwestekên here piçûk ên Kurdan bên guhên wan. Ev rewş û polîtîkaya dualî ji bo Torinên vê deverê jî derbas dibû. Çawa ku di serpêhatiyekê de em dibînin Torinên vê deverê weke sînorparêz di sedsala 19an de hin caran li bal Osmaniyan û gelek caran jî li ba Rûsan cî girtine. Eger wan wisa nekirana, ji wan re şert û mercên jiyane nedima, warê jiyana wan teng dibû. Çawa tê zanîn di van salan de sînoran gelek caran dest diguhartin. Mirovên van deveran nizanibûn sibê wê çi bê serê wan. Kurdên Serhedê weke sînorparêz gelek caran jî bûne hedefê êrîş û şerên mezin. Bîzansî, Osmanî, Faris û Rûs her yekê jî aliyê xwe de xwestiyê him bibe “dostê” van Kurdên sînorparêz û him jî dem hatiye bûne dijminê wan. Vê yekê bi sedsalan ajotiye.

Erdên pîroz

Ji bo dergûş (hêlekana) wargehê mirovahiyê keşîf bikin gelek lêkoleran berên xwe dane Welatê Serhedê. Çawa tê zanîn Mirovên li rûbarê dinê bi bêrî û bi hesrekeke kûr hertim li hêviya bihuştê

û baxçê bihuştê mane. Di zimanên Ewrûpî de li şuna bihûştê (cennet) gotina paradîsê tê bi kar anîn. Ev peyva gotineke Îranî ye û tê wateya bax, baxçe û park. Ev peyva di dewra Pêxember Zerdûşt de ji peyva *pairidaeza* (Baxê Dorgirtî) hatiye. Di farisya îroyin de *pardis* tê bi kar anîn. Çawa tê zanîn baxekî wiha xweşik jî di çavkaniyên Îslamî de bi navê *Baxê Îrem* hatiye bi nav kirin. Pêxember Şeddat baxekî wisa çêkiriye ku şibandiyê bihuştê. Ji Baxê Bihuştê re (Baxê Cennetê) ku mirovên pêşîn Adem û Hewa lê jiyane, di zimanê îngilîz de *Garden of Eden* û di zimanê Erebi de *Jannat 'Adn* hatiye gotin. Peyva Eden peyveke Îbranî ku tê wateya bedewî. Eden navê erdekî bûye ku lê bihuştê hebûye. Gelek lêkoler hatine li ser wê baweriyê ku ev erdê pîroz cîhekî ku nêzîkî cîhê destpêka wan çar robarên navdar in: Pishon, Gichon, Tigris (Hiddekel) û Eufrat ku bi ava xwe Baxê Bihuştê av dane. Hin lêkoler van robaran wek robarên Kur, Aras, Dicle û Firat dibînin. Nîşana Welatê Serhedê bêguman Çiyayê Agiriyê ye ku li herêmê çiyayê herî bilind tê nasîn (5.137 metro). Ne tenê bi bilindiya xwe, herwisa jî di Tewratê de wek çiyakî pîroz tê hesabîn. Çawa tê zanîn Keştiya Nûh Pêxember, di dema Tofanên li serê vî çiyayî daniye. Kurd jî vî çiyayî re Girîdax yan jî Gilîdax dibêjin. Berê ji beşeke Ermenîstanê re çawa me li jor jî diyar kir *Ayrarat* hatiye gotin, paşê gelek caran navê çiyayê Agiri jî danîne Ararat ku ji peyva *Ayrarat* tê. Di eslê xwe de navê *Ayrarat* (Ararat) navê wê herêmê ye ku vî çiyayê herî bilind lê daniye. Ermenî bi xwe jî ji vî çiyayî re nabêjin Ararat, dibêjin *Masîs*, Faris *Çiyayê Nuh*. Di sedsalên kevn de gelek netewe, gel û komên etnîkî li Serhedê hêwirîne. Her wisa jî di dîrokê de bûye meydana şer, bi salan gelek şer li herêmê qewimîne.⁷

Hemû ev serpêhatiyên nîşan didin ku Welatê Serhedê ji hezar salan vir de bûye nîşana aşîti, kêfxweşî û dilşahiye. Ne tenê ji ber van zaniyarî û agahiyên mîtolojîk û teolojîk, ji ber sedemên din jî mirov Serhedê bi giştî dikare bi navê *Baxê Bihuştê* yan jî *Baxê Îrem* bi nav bike.

7 P. İ. Aveyanov, *Osmanlı İnan Rus Savaşlarında Kürtler* (19. Yüzyıl), çev. İbrahim Kale, Avesta, 2010. Nejat Abdullah, *İmparatorluk Sınır ve Aşiret*, Avesta Yayınları, werger: Mustafa Aslan, 2009.

BUHIŞTEKE DEREWÎN

Jiyana pastoral li Serhedê

Gelek caran Welatê Serhedê bi çiyayên xwe, bi zozan, bi av û kanî wek bihuşteke hatiye xemilandin û nasandin. Sê faktorên bingehîn ku ban û bingehê Welatê Serhedê pêk tînin, ev in: Cudatiya xwezaiya wê, dewlemendiya folklorê û rengîniya pirçandiya herêmê. Welatê Serhedê angorî beşên din ên Kurdîstanê havînan gelek hênik dibe. Di kelakela germa havînê de mirov dikare belekiyên berfê li ser çiyayên bibîne. Ev yeka rehetî û aramiyeke mezin dide mirovan, bîna wan fireh dike. Di straneke Kurdî de ev yeka xweş hatiye zimên: *"Welatê Serhedê daîm berfe qet ranabe..."* Serhed bi zozanên xwe, bi kaniyên xwe yên sar û cemidî ve navdar e. Havînan ev bilindcîh buhişteke derewîn pêk tînin. Serhet bûye mijara stranan: *"Welatê Serhedê çiqas xweş e/Welatê Serhedê çem û kanî!"*. Serhed gelek caran bûye hevwatera gotina zozanê. Havînan zozanên Serhedê dibû wargeyên kêf û bînvedanê. Ji alîkî de konên reş û çadirên spî, ji alîkî de kincên jinên Kurd ên gulgulî her der dixemilandin. Dêreyên (fîstan) jinên Kurd ên rengrengî di van salan de keskaya zozanan dinexîşandin. Rengên pûşiyên van jinan ên gevez (sor), tûtîkî (turincî), aravî (pembe) û qîçîk (zer) jî tevî vê govend û şenahiya rengan dibûn. Mirov dikare bêje ku zozan di nav rengan de difetisîn yan jî vedigevizîn.

Ew jiyana li zozanan yek ji wan stûnên jiyana Welatê Serhedê pêk anîye. Vê jiyana sade û aramiya mezin ku li zozanan hebûye hertim mirov li berbi xwe kişandiye. Mirovên serhedî havînan bi keriyên pezên xwe di zik û hembêza tebetê de jiyayin. Ew keriyên malbatan ku ji çend semer pez pêk dihatin, di wan mehên havînê bi kîsê felekê ji xwe re li van zozanan diçeriyay û paşê dema germên havînê êdî dişkestin, payîzê vedigeryane deştê, aranê.

Dijayetiya di navbera mirovên aran û zozanan gelek kûr e. Kesên hînî jiyana zozanan bûne nikarin wisa bi rehetî li aranan bijîn. Mirov vê yekê di nivîseke Evetik Îsahakyan bi navê *Emoyê Kurmanc* de baş dibîne. Emo ligel çend Ermenî û Tirkên di girtîgehê de ye. Biharê, dema gundî êdî malên xwe bar dikin diçin zozanan bîna Emo gelek teng dibe. Vê bîntengiya xwe di girtîgehê de ji hevalê xwe



Şivaneke Kurd li berpalên Çiyayê Agiriyê (Sarwe, 1921)

re wiha eşkere dike: *"Ya te başqe ye, tu merivê şeher î, timê hûn malan de nin, merivê çiyayê nînin"*.⁸ Emoyê Kurmanc rojekê hê berdana wî re çend meh mane, tîne xwe di pencereya girtîgehê de darda dike, dike. Angorî vê serpêhatiyê dengê *Emoyê Kurmanc* gelek xweş bûye: *"Sîng û berî domama min spî ne / Mîna berfê, berfa serê Axmaxanê / Por û guliye wê hev diçin û tîn / Mîna bayê hênîkî Axmaxanê"*. Berbîna Emo tenê çiya bûne, xewnerojên çiyayê bûne, çiyayên ku dilê wî di girtîgehê de hertim bi dipiritandin.

Wisa hatiye pejirandin ku Serhedî bê çiyayên xwe, bê zozanên xwe nikarin bêjîn. Li şûna zozanan Serhedî gelek caran gotina çiya bi kar tînin, wek mînak dema havînan derdikevin zozanan, Kurdên herêmê dibêjin *"Emê derkevin çiyê"*. Ew strana navdar ku bi salan li ser zar-zimanê şeniyê Serhedê geriyaye: *"Weylê dîne çiya bilind in te nabînim!"* yek ji wan stranên here hezkirî dikare bê

8 Avetik Îsahakyan, *Emoyê Kurmanc*, 1955, r.60.

hesibîn û romantîzma Welatê Serhedê îfade dike. Stran ji zarê Şeroyê Biro de hatiye gotin ku bi xwe ji Serhedê çûye Ermenîstanê.⁹ Di vê strana jêrîn de malbateke ku ji Serhedê, ji zozanên Serhedê sirgûnê deşt û germistana Diyarbekirê bûye, gazin û loma li vî meskenê teze dike û xerîbiyê dikşîne:

*Welatê Serhedê li sînorê vê Îranê,
Îsal ji pêra koçerî çawa şunda ketin ji zozanê,
Xaliqo, tu serê sebeba dewletê re qebûl nekî,
Çawa destê me ji cî û warê me qetandin,
Berê hêsîrê me dane welatê Diyarbekir,
Na welle, deşta Bişêriyê, germ e, germistan e?
...*¹⁰

Ew cihên sirgûnê di stranên Kurdî wek cihên wêran, kavil, xopan, dêran û kambax tên tarif kirin, wek cihên xerabe hatine nasandin. Ji aliyê din Diyarbekir ji bo kesên ku zaroktî û xortaniya wan li wir derbas bûne, her çiqaş zêde germ be jî, bêguman bajarekî gelek şîrîn e. Dema mirov xwe di mala xwe de dihesibîne, li bal nas, heval û hogirên xwe ye, wê demê xerîbiyê nakşîne.

Ev manzaraya pastoral ku me hinekî li jorê da nasandin bûye kakilê jiyana muzîkê ya Welatê Serhedê jî. Şivanên Kurd hertim bilûra wan bi xwe re dibirin çol û çolistanê. Bilûrvan û dengbêjên mezin ji nav van şivanan de derketine. Welatê Serhedê havînan dibû cî-meskenê şivanan. Padîşahên Serhedê yên here navdar şivan bûn. Çawa tê zanîn peyva *pastor* di eslê xwe de tê wateya şivan.¹¹ Şivanî ji ber van rastiyan navekî din ê dengbêjiya Kurdî jî dikare bê hesibîn. Nivîskarê Ermenî Avetik Îsahakyan di pirtûkeke xwe de qala du şivanên Kurd dike (yekî bilûrvan, yekî dengbêj) ku ji destpêka biharê heta payîzê kerî-suriyên wan (ermenîyan) li zozanan xweyî dikirin:

*"Mexso rind li bilûrê dixist, Hico jî dengbêj bû.
Wana kilamê cimaeta xwe yên dilşewatî digotin.
Min bi dil û eşq guhdariya kilam û bilûra wan dikir.
Min ji wana dibîhist serpêhatî û efrindinên
Kurmancî yên epekî-folklorê Kurdan wekî min ji
çûktiya xwe heta îro jê hezkiriye".*¹²

9 Ji stranên Radyoya Rewanê.

10 Ordixanê Celil, *Stranê Zargotina Kurdaye Tariqê, Weşanxaneyê Orientalia*, 2003, r.234.

11 Bengt Lewan, *Arkadien – Om herdar och herdinnor i svensk dikt*, Bokförlaget Dya Doxa, 2001.

12 Avetik Îsahakyan, *Emoyê Kurmanc*, r.60.

Demê em di edebiyat û folklorê Kurdî de temaya şivaniyê lêbikolin emê bi rehetî bibînin ku Kurd çima ji dayîka xwe şair û dengbêj hatine dinê. Nivîskarê Ermenî yê navdar Xaçatûr Abovyan hê di sedsala 19an de ji ber dewlemendiya folklorê Kurdî ecêbmayî dimîne, di cîhekî dibêje ku her Kurdek çî mêr çî jin ji diya xwe şair hatiyê dinê.¹³ Abovyan Kurdan wek siyar, şovalyeyên Rohilatê dide nasîn.¹⁴ Mirov dikare bi rehetî bêje ku Kurdên Serhedê bi giştî bi tehrêkî herî baştirîn ji aliyê nivîskarê Ermenî Xaçatûr Abovyan de hatine nasandin.

Di folklor, edebiyat û dîrokê de romantîzekirina Serhedê gelek berbiçav e. Wek mînak di stranên Kurdî de Serhedê ku ji Serhedan jî rengîntir û xweşiktir hatiye neqîşkirin û boyaxkirin, heye. Demên buhirî, demên windabûyî di van berhem û serpêhatiyên edebî, folklorîk de wek demên zêrîn tên hesibîn. Rengên van demên ku ji xewnerojan pêk tînin, hertim aravî ne (gulreng, pembe). Ji mirovên wan xweşiktir tu mirov li rûbarê dinê tune ne. Jiyana van deman gulgulî ye. Her tişt dişibîne gulê. Bedenên mirovan gulendam û rûyên wan gulçehre ne. Jinên wan wek tavbanoyan û hîvbanoyan wisa bedew û xweşik in: *"Ji royê re dibêjin dernekeve emê derkevin"*. Xortên wan bejn bilind, lihevhatî, çeleng û kîkanê mêran in.

SERHED:

Coxrafya Selahedîn Eyûbî, Ehmedê Xanî û Feqiyê Teyran

Li coxrafya Serhedê mirovên wek Selahedîn Eyûbî, Ehmedê Xanî û Feqiyê Teyran derketine, dîroka vê herêmê xemilandine. Çawa tê zanîn kal û bav, pêşiyên Selahedîn li bajarekî bi navê Dvinê hatine dinê ku ewqas ne dûrî herêma Qersê ye. Kurdan bi salan ev bajarê bi navê Dvîn xistine bin destê xwe. Dergehekî Dvinê, bi navê *Dergehê Aniyê* hatiye bi nav kirin. Ev yeka hevnasî û hevkarîya di navbera van herdu herêman de baş îspat dike. Serhedîbûna bavikên Selahedîn bêguman serbilindî, rûmet û xemleke mezin dixê nav dîroka

13 Xaçatûr Abovyan, *Kurd - Êzdî*, 1986, Êrêvan, wergera ji Ermenî: Wezîrê Eşo, r.65.

14 Xaçatûr Abovyan, r.70.

Kurdên Serhedê.¹⁵ Nivîskarekî Kurd di beşeke helbesteke xwe de mijarên Selahedîn û Serhedê bi hostatî bi hev re xweş girêdide:

Selahedîn
neviyê Eyyûb
lawê Necmeddîn
biraziyê Şêrko me
ji mîrekiya Şedadiyan
Kurdekî çiyayî
eslen Serhedî me...¹⁶


Ehmedê Xanî li jêr rewşa Kurdên Serhedê aniye ber çavan. Kurd bi canê xwe li Serhedê çawa rêz bûne, sed û bend pêk anîne û çawa bûne hedefê tîrên Rom û Ecem gelek bi vekirî diyar kiriye:

*Ev Rom û Ecem bi wan hesar in
Kurmanc hemî li çar kenar in*

*Herdu terefan qebîlê Kurmanc
Bo tîrê qeda kirine amanc*

*Goya ku li serhedan kilîd in
Her taîfe seddek in sedîd in...*¹⁷

Piştî ku yek ji wan paşayên Bazîdê, Mîr Mihemed vefat dike, Ehmedê Xanî li ser koçkirina wî helbestekî bi forma straneke şînê dinivîse û navê wê datîne: *Ka padîşahê Serhedan?* Ehmedê Xanî di vê berhema xwe de bêserî, bêtacî û bêxweyî mayîna Welatê Serhedê wek xeterekê dibîne, xemgîniya xwe tîne zimên û kesereke kûr dikêşîne.¹⁸ Ehmedê Xanî di cîhekî Mem û Zîn'de qala herêma Serhedê dike ku bajarê Qersê li wir bûye. Ehmedê Xanî nişan dide ku dewletên mezin çawa eşîr û êlên wan deran ji xwe re kirine kela û sûrên jîndar: *"Goya ku li ser sînoran, Kurd hemû mifte ne / Êlên wan hemî goya ku bendên zexm in, kele ne..."*¹⁹ Di vê destana xwe ya navdar de Ehmedê Xanî herwisa jî navên wan herdu robarên navdar, Erez û Kura dide ku li herêma Serhedê re



Hunermend Şamilê Beko

derbas dibin, diherikin û paşê dibin yek, tevî Behra Hezarê dibin: *"Ew lehiya cegera wî wisa gurr hat / Goya ku bi ser çemê Erez (Aras) ve, Çemê Kur hat"*.²⁰

Welatê dengbêjan

Ne tenê ji aliyê coxrafîk û xwezayê de herwisa jî çanda Welatê Serhedê bala me dikişîne. Serhed gelek caran Welatê Dengbêjan hatiye navandin.²¹ Dengbêj Evdalê Zeynikê, Şakiro ve Reso wek mînak bi salan bilbilên wî welatî hatine nasîn.²² Hin kes Evdalê Zeynikê wek hîmdarê dengbêjiya Serhedê didin nasîn.²³ Di xebateke xwe de min dengbêjên Kurd bi navê "Xweyên Serhedê yên eslî" bi nav kiribûn û dabûn nasîn.²⁴ Evdalê Zeynikê di stranekê de dengê xwe wiha bilind dike:

*Ez şahê dengbêjan, Evdalê Zeynikê me
Li Serhedê qesasê serê şair û dengbêjê xelkê me*

15 Rohat Alakom, *Hêsrên Selahedîn di Çavkaniyên Swêdî de* (Ne - Kurd 22/11 010).

16 Serdar Roşan, *Bazên Welat*, Doz Yayınları, 2005, r.13.

17 Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, Avesta, 2011, wergêr: Kadri Yıldırım, r.155.

18 Rohat Alakom, *300 Saliya Koçkirina Ehmedê Xanî*, Kovara Zend, Bihar/2007.

19 Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, Korall Yayınları, Türkçesi: Mehmed Emin Bozarıslan, 1975, r.57.

20 İzzeddin Mustafa Resûl, *Ehmedê Xanî ve Mem û Zîn*, Avesta Yayınları, wergervan. Kadri Yıldırım, 2007, rûp.43.

21 Ahmed Aras, *Klame Kurdî û Dengbêjiya Serhedê*, Kovara Bir, hejmar 7/2006. Şerefcan Cizîrî, *Dengbêjiya Serhedê*, Azadiya Welat, 1/12 2010.

22 Eskerê Boyik, *Bilbilê Welatê Serhedê: Evdalê Zeynikê*, 2006.

23 Ehmed Cengiz Çamlıbel, *Evdalê Zeynikê - Himdarê Mekteba Stranên Serhedê*, Weşanên Deng, 2005.

24 Rohat Alakom, *Kars Kürtleri*, Avesta, 2009, rûp.150-152.

*Ez ku bigirîm, dengê min î ji vir here erdê Eceme²⁵
Ez ji rêya dûr hatime. Gulê ez îro mêvanê te me.²⁶*

Yek ji wan dengbêjên herêmê, Derwêş Serhedî wek mînak Qersê; “*Qers, kûra kilama ye*” dinavîne.²⁷ Mehmed Gultekîn, yek ji wan nivîskar û lêkolerên Kurdên Bazîdê ku niha li Almaniyayê dijî ev çend sal in bi berhevkirin û şîrovekirina stranên Serhedê mijûl dibe. Mehmed Gultekîn dixwaze van stranan wek pirtûk biweşîne.

Berî sedsalî li aliyê Qersê bi navê dengbêj Nazuk hunermendekî navdar hebûye. Birayê wî Şamilê Beko koçberî Ermenîstanê dike.²⁸ Nivîskarê Kurd Erebe Şemo di derbarê hunera Şamilê Beko de wiha dibêje: “*Dema Şamilê Beko fîqê dixê, mar meriyan naxin, lê dûpişk direqîsin*”. Yek ji wan jî Şeroyê Biro bû.²⁹ Mirov bi kurtî dikarê bêje ku Welatê Serhedê “*Welatê Dengbêjan*” bû. Mîsyonerên Swêdî ku di destpêka di dawiya sedsala 19an û di destpêka sedsala 20an di nav Kurdên Serhedê de mane, bala xwendevanan kişandine ser dewlemendiya folklorê Kurdî.³⁰ Yek ji wan N.F. Höijer ku Kurdî jî fêr bûye, wiha dibêje: “*Her çiya, gol, çem, gelî, bajar, gund yan jî her kevirê mezin li welatê wan çîrokeke xwe heyê*”.³¹ Mîsyonerekî din E. J. Larson jî Kurdan wek komeke poetîk bi nav dike û dibêje ku ew evîndarê mezin ên stran û muzîkê ne. Larsson di eynî nivîsê de diyar dike ku wî herçiqas Kurdî nizanibûye jî di rêwitiya xwe de carina bi baldariyeke mezin stranên dengbêjekî gerok guhdar dikir.³² Welatê Serhed ne tenê ji aliyê kesên biyanî (ne-serhedî), ji aliyê Serhedîyan bi xwe de jî hatiye pesinandin. Wek mînak lêkoler Xalid Xayatî dema di xebateke xwe

de qala “*Kurdên Serhedê li Herêma Marsîlyayê*” dike, di cîhekî de dibêje ku ev Serhedîyan koçber ku koçî Fransayê kirine, li vir bi serbilindî behsa çanda xwe, stranên xwe dikin.³³ Nîzamettîn Arîç, Dewrêş Serhedî, Dengbêj Şemdîn, Delîl Dîlanar û gelekên din vê kevneşopiya dengbêjiyê îro jî berdewam dikin.

“Çûn Talan”

Di sedsala 17an de wek mînak dema sînoren Osmanî tam nehatibûn kişandin, gelek caran wan kesên bi navê *akincî* (êrişkar) bi siyarî derbasî aliyê dijmin dibûn, ew deran talan dikirin û paşê bi talanên xwe şunda vedigeriyan. Îfadeya “*Çûn talan*” ji van salan maye. Talan anîn di van salan de wek kar û pêşeyekî (meslek) û taybetmendiyeke jiyane dihate hesibîn:

*Mîro Ūris derket ji Rewanê
Mîro Ūris derket ji Rewanê
Dengê top, tivinga Sarî Moskow serserê bavê
Gulnazê
Dixurice fena tavê teyrokê der baharê
Şed û şûdê bavê Gulnazê gele dera hene,
Mêra dikuje, talan tîne ji nava Îranê
Hey li mîro, hey lo wezîro.³⁴*

Di sedsalên kevn de gelek rêyên bazirganiyê, kirîn û firotanê di Serhedê re derbas dibûn. Ew kerwanên ku ji Trabzonê bi rê diketin pêşiyê li ser Erzirimê, paşê li ser bajarên din re berê xwe didane Tebrîzê. Rêgaya Erzirim û Tebrîzê di van salan de gelek hatibû nasîn. Ji ber ku li herêma Serhedê gelek sînor digîhiştin hev, li vê herêmê merc û hoyên talankirin û qaçaxtiyê gelek bûn. Li ser sînore derbaskirina mal û mirovan bi sedsalan e li Serhedê bûye karekî rojane. Qaçaxtiyê gelek pêşta çûye û heta niha jî her berdewam e. Kurd gotinên *qaçaxtiyê* û *qaçaxçiyê* ku ji Tirkî tîne wek gotinên di cîh de nabînin. Kurd van dan û standinên li ser sînoran wek perçeyekî bazirganiya herêmê ya kevn dibînin. Angorî Kurdan, ew tiştêkê bêqanûnî nakin. Bi rastî di zimanê Kurdî peyveke ku cîhê *qaçaxtiyê* bigre vê gavê tune. Dema dewleta Kurdan rojekê ji rojan saz bû, bêguman Kurd divê peyvekê bibînin ku tê wateya qaçaxtiyê. Di van salên dawîn de di

25 Ereban bi giştî gelek caran ji misilmanên ne Ereber û her wisa ji kesên Fars û azerî re ku li Serhedê diman, digotin ecem. Mirov dikare bêje ku peyva Ecem ji peyveke coxrafîk zêdetir wek gotineke folklorîk û edebî dikare bê hesibin.

26 Ahmet Aras, *Evdala Zeynikê*, Weşanên Deng, 1996, r.43.

27 Ji meyla Derwêş Serhedî 12/9 2008.

28 Heciyê Cindî, *Ji Cêrga Dengbêj û Sazbendêd Me: Aşiq Nazûk*, Riya Teze 29/10 1977.

29 Wezîrê Eşo, *Dengbêj Kal Bûbû*, Êrêvan, 1983, rûp.34-42.

30 Rohat Alakom, *Mîsyonerên swêdî li Serhedê (1898–1921)*, Nefel (2/3 2008).

31 N.F. Höijer, *Kurderna- En tafla från paradisetes bygder*, Ansgarius, 1888-1889, r.46.

32 E. J. Larsson, *Kurderna och deras land*, di nav destnivîseke bi navê *I Orienten* (Svenska Missionsförbundets arkiv, Stockholm).

33 Khalid Khayati, *Mağdur Diyasporadan Sınır-ötesi Vatandaşlığa mı? Avesta*, 2009, r.213.

34 Ordixanê Celîl, *Stranê Kurdaye Tariqiyê*, r.446.

derbarê jiyana li ser sînoran lêkolînên balkêş amade dibin.³⁵ Prof. H. Neşe Özgen bi çend lêkolînên xwe bala lêkoleran kişande Kurdên li dor sînoran.³⁶ Zehra Ayman di teza xwe ya masterê de Serheda Qersê dide nasîn.³⁷ Nivîskara Kurd Eslîxan Yıldırım, li ser sînorên Kurdistanê xebateke ji du cildan pêkhatî amade kiriye.³⁸

SERHED:

Erdê casûsî û kontra-casûsiyê

Çawa tê zanîn piştî Komara Yekitiya Sovyetan di sala 1917an de saz dibe, tirs û xofeke mezin dikeve dilê welatên li ser sînor. Di navbera salên 1917-1991an de *Şerê Sar* bandoreke mezin li herêma Serhedê dihêle. Sînorên Sovyetê yê bi Tirkîyê û Îranê re bi temamî tê girtin.³⁹ Him casûsên Sovyet, him jî casûsên Tirkîyê ligel casûsên Emerîkayê di van salan de li Serhedê cîrît davêtin. Di romaneke Almanî de li Serhedê kar û çalakîyên casûsî û ajaniyê çawa berdewam dikin, gelek bi vekirî xuya dibe.⁴⁰

Rengê Serhedê dîsa çilmisî

Ermenî (File) di sala 1915an de li Serhedê û seranserê Tirkîyê bûn hedefê lêdan, kuştin û qirreke mezin. Koka wan hate qelandin. Yek ji wan li jiyane nema. Peyvên ku zêdetir ji bo van ax û erdên bi xwîn hatin bi kar anîn, peyvên kambax, mîrat, kavi, dêran, xopan û wêran bûn. Bi rastî di van salan de Serhed wêran bû. Rengê herêmê çilmisî. Yek Ermenî nema! Yek ji vê tofanê nefilîtî. Yê ku xelas bûn jî dîn guhartin. Zarokên wan zarokên "dêfile" û "bavfile" hatin nasandin, bûn



Hunermanda Kurd Susika Simo (Sala 1958)

hedefê çêran. Koka xwe, nasnameyên xwe veşartin, ji mirovaya xwe bi dûr ketin. Di sala 1915an de wê demê bajarê Qersê di nav sînorê Çarîtiya Rûsyayê de bû. Ermeniyên Qersê jî di navbera salên 1918-1920an de hatin qirkirin yan jî bi zorê xwe avîtin Ermenîstanê û Gurcistanê. Zarokên ku di van salan de sêwî man, bêdê û bêbav man bi hezaran bûn. Ev nîfşa wek "nîfşa sêwîxaneyan" hatin navandin. Ji bo ku hemû di sêwîxaneyan de mezin bûn. Haya wan zêde ji vê coxrafya Serhedê, vê coxrafîya bi xwîn tune bû. Li Serhedê di salên kevn de bi sed hezaran Ermenî /file li van bajarên Serhedê yê li jorê navgotî, diman. Kurdan li ser van cînarên xwe stran jî gotine: "Welatê Serhedê cî-meskenê filan/Bav-fileyê te kuştim ji derdê dilan..." Çawa li jor jî me diyar kir li Welatê Serhedê qeza û belayeke dîrokî hate serê Ermeniyên. Lêbelê Kurdan di van oxirmê giran de ji van birayên xwe re û cînarên xwe yê Ermenî re gelek caran hembez vekirine.⁴¹ Peyva dostanetî mirov bi rehetî dikare bêje ku di dîrokê de gelek caran bûye navekî Serhedê yê din!

35 Osman Gümüşçü, *Siyasi Coğrafya Açısından Sınırlar ve Tarihi Süreç İçinde Türkiye'de Sınır Kavramı*, Bilig, nr 52/2010.

36 Prof. H. Neşe Özgen çend salan sereketiya vê projeyê kiriye: *Sınır Kasabaları Sosyolojisi Projesi: 2001-2004* (Teksteke digital e, ji 113 rûpelan pêk tê). <http://www.neseozgen.net/tr/yayinlar/26.pdf>

37 Zehra Ayman, *Bellek Mekanı Olarak Sınır ve Ötekilik; Kars Şehri*. İstanbul Bilgi Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü. Kültürel İncelemeler Yüksek Lisans Programı, 2005.

38 Eslîxan Yıldırım, *Di sedsala 20'an de Kurdistan û Sînor -1*, Weşanên Enstituya Kurdî ya Amedê, 2009.

39 *Where Turk and Russian Meet*, The National Geographic Magazine, June-1952.

40 George Halban, *Malik, vargen*, Stockholm, 1976 (Almaniya wê: Malik der Wolf, 1975).

41 Rohat Alakom, *Muhtila Begê Mokî: Kurdê ku herî zêde Ermenî xelas kirine*, Birnebûn, nr 45/2010.

Keça Tolstoy li Serhedê birînan dipêçe

Di sedsalên kevn de bi sedan kesên biyanî çûne Serhedê, ev herêma ziyaret kirine û lêkolînên cihê pêk anîne. Hin ji wan li pey rêça Keştiya Nûh ketine, derketine ser çiyayê Girîdaxê. Keça nivîskarê dinênas Tolstoy ya bi navê Alexandra di destpêka Şerê Cîhanê yê Yekem, di sala 1915an de wek hemşîreyekê (alîkara doxtor) ligel komeke tendûristiyê diçe Welatê Serhedê, li deverên wek Îdir, Agirî û Wanê dimîne. Dema ev dîmenên Serhedê cara yekem dibîne ew tavilê dibe evîndar, maşoqa Serhedê. Alexandra wek keseke mirovhez birînen gelek Kurdan, Ermenîyan, Tirkên û kesên ji neteweyên din dipêçe, alîkariya wan dike û wan qenc dike. Ew diçe kîderê, li wir rastî Kurdan tê û di bîranînên xwe de qala wan dike. Ev bîranînên wê, bi navê *Doç* (bi Kurdî *Dot*) di sala 2000an de tîne weşandin.⁴²

Serhedê Kurdên Êzdî

Li Serhedê komeke Kurdan ku nav dabû, Ezdiyên Serhedê bûn. Li aliyê Wanê, Agiriyê û Qersê diman. Gelek caran war diguherandin û rastî zordestî û êrişên mezin dihatin: "*Me miriyên xwe de di cîhekî çal nekirin!*"⁴³ Van Kurdên Êzdî di dawîya salên Şerê Cîhanê yê Yekem de koçberî Ermenîstan û Gurcistanê kirin. Di vê qirçirin û rêwitiyê de dero-dero, dûr-derayî bûn, şerpeze bûn, mala wan tun-tewes bû. Careke din çavên wan li Welatê Serhedê neket, gelek ji wan bi vê hesretê mirin. Yek ji wan Kurdên Êzdî, helbestvan Fêrikê Usiv di helbesteke xwe de ji van tengezarên re hembêz vekiriyê, li riya wan dipê:

...
Qulingno, hey wax, hûn çûn
Êwir nebûn vî meskenî
Dilkê min we re hêlîn
*We nehat lê danenî.*⁴⁴

Ez bawer nakim ku ji vê çarîkê xweştir tu helbestek hebe ku wiha bi germahî, qefesa dilê xwe ji mirovên tengezar re, wek Kurdên Êzdî re, veke. Di van salên dawîn de çend berhemên balkêş di

derbarê Kurdên Êzdî de derketin. Wek mînak di lêkolînên Ahmedê Gogê⁴⁵ û Pîr Dîma⁴⁶ de agahî û zanyariyên gelek kêrhatî hene. Pîr Dîma ligel çend lêkoleran xebateke din a gelek balkêş amade kir ku ji nimûneyên çanda Kurdên Serhedê pêk tê. Ev nimûneyên mîrateya çandî heta niha jî di Muzeya Tîflîsê de tîne parastin.⁴⁷

Radyoya Rewanê ku bi salan weşanên Kurdî pêşkêş dikir, dengê wê li Serhedê gelek zelal dihat guhdar kirin. Kurdên Serhedê bi saya Kurdên Êzdî bûbûn xweyê radyoyekê. Dengên spîkerên wek Eznîva Reşîd, Keremê Seyad û Gulîzera Casim hê jî di guhên Serhediyên de ne: *Erîvan Xeber dide!* Kurdên Serhedê zêde guh nedidan wan nûçeyên yekformî yê polîtîk, rijî û şiroveyên giran û bêtam. Van Kurdên bêsebir hewasa xwe, kêfa xwe zêdetir bi beşa duwem, bi gotina klam û stranên Kurdî dianî. Ji van stranên gelek li ser daxwaza guhdaran dihatin hilbijartin û weşandin.

Kurdên Êzdî di sala 1918an de ji cîhê xwe leqiyên. Di van salên rev û bezê de cîh û meskenê xwe ji ber tîrsa komkujiyê hîştin, xwe avêtin ber bextê Rûsyayê. Li Ermenîstan û li Gurcistanê cîwar bûn. Li van cîhan ji xwe re hêlînên nû çêkirin. Ev kesên li xerîbiyê, dûrweletiyê diman hertim bi keser, nalîn û bi xem bûn:

Ezê xelqê tape Qersê, mihacir im

...

Gidî lo lo min go ez xerîb im, ne li vir im
Êtîm gede min go ez xerîb im, ne li vir im
Welle ezê parî birincê nav beroşê, ser agir im
Erê, bextê te re qenca ez xwestim, xiraba ez birim
Eger tuyê salix û sulixê min dipirsî
Welle ezê xelqê tapê Qersê, mihacir im.

Welatên dereke û biyanî çiqas xweş dibin bila bibin jî, çawa di stranên Kurdî yê xerîbiyê de jî xuya dibe, welatê mirovan li ber dilê hemwelatîyên xwe hertim şirîntir e. Mirov li welatê xerîb hertim bêhiş, bêmade û melûl e. Mirovên ku diçine xerîbiyê, wek qulingên ku ji refên xwe diqetin, wek wan bi serê xwe tenê bêgav û bêçare dimînin.

42 Rohat Alakom, *Alexandraya -Keça nivîskarê Rûs Lev Tolstoy ligel Kurdên Serhedê* (Nefel 18/1 2010).

43 Zehra Ayman, *Bellek Mekanı Olarak Sınır ve Ötekilik; Kars Şehri*. İstanbul Bilgi Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü. Kültürel İncelemeler Yüksek Lisans Programı, 2005.

44 Fêrikê Usiv, *Berevoka Berhema*, cild III, 2009, r.154.

45 Ahmedê Gogê, *Dengê Kal-Bavê Me*, Êrêvan. 1997.

46 Pîr Dîma, *Êzdiyên Serhedê*, Weşanxaneyê Do, werger ji Rûsî: Ezîzê Cewo, 2009.

47 Dîmîtrî Pîrbarî (Pîr Dîma) & Lamara Paşaeva & Îldar Nadîradzê: *Nimûneyên Kultura Medenî ya Kurdî ji Muzeya Neteweyî ya Gurcistanê* (Gurcistan Devlet Müzesi'ndeki Kürt Maddî Kültür Örnekleri), 2007, r.112.

Dengbêjê Kurd, Evdalê Zeynikê ku pisporê qulingan û xeribiyê bûye û bi wan re peyiviye, wiha dibêje:

Hayê li min

...

Heyla dilo, tu bi şevê-royê diqîrî, çima qe nawestî

*Mînanî qulingê Serhedê ji refên xwe qetyayî
Serê baskê te bi çamûr, koka baskê te şkestî
Ezê îro dikim herim zozanê mala bavê muh-
ba xwe,*

*Gelî gundîno ez nezan im, ez xerîb im
Nizanim zozanê mala delaliya mi maye li
kîjan alî, kîjan destî...⁴⁸*

Mirov jî wisa ye, dema ji koma xwe, refên xwe û berdilkên xwe diqete hertim ker û gêj e:

*"...Quling hertim cot-cot in û ew hertim bi hevra diqîngînin. Qîrîna qulingekî bi serê xwe tenê elamete xêrê nîne, yeqîn tiştek hatiye serê wî".⁴⁹ Motîva qulingan û refên qulingan di strana *Lo, lo lawko* de ba-beta çêkirina hêlînan li xeribiyê tîne bîra mirovan.*

YAŞAR KEMAL, GUNAR EKELOF:

Du heyranên Serheda ku ji Serhedê cihêtir e!

Ehmedê Xanî ji bo Serhediyên hertim wek Siltanê Siltanên Serhedê tê nasîn. Ev danasîna bi ihtîşam û bi hişmet "Siltanê Siltanan", di eslê xwe de danasîneke nivîskarê navdar Yaşar Kemal e ku xwe jî kesekî Serhedî tê hesabîn.⁵⁰ Çawa tê zanîn kal û bavên wî berî salan ji Serhedê ji gundekî Wanê bar kirine, hatine başûrê Tirkîyê, Deşta Çukurovayê ku wek imbara pembû tê hesabîn. Dijayetiya Çukurovayê-Wanê di berhemên Yaşar Kemal de de gelek berbiçav e. Yaşar Kemal qala Wana îroyîn, Wana ku xizanî, belengazî, zordestî, teda û lêdan lê hene û Wana ku vê dawiyê hejiya, bi kezaran mirovan canê xwe dan, nake. Yaşar Kemal qala Waneke din dike, Waneke ku ji kaniyên wê şuna avê hingiv tê xwarê, tu kesek rêya kesî nabire û cîhekî ku hertim xweşî û qencî lê heye. Ji bo ku xirabiya Çukurovayê nîşan bide, Yaşar Kemal mekanek efirandiyê û navê wê Wan daniye. Wana ku di berhemên Yaşar Kemal de pêş de tê cîhekî çêkiriye, cîhekî xeyalî ye (fiktîv). Waneke ku emsalê wê li rûbarê dinê tune ye.⁵¹ Yaşar Kemal

di berhemên xwe yê din de jî li Serhedê ye, wek *Destana Çiyayê Agiriyê* (1970).

Sînorên Bîzansê yê rohilatê heta Serhedê dirêj dibûn.⁵² Kurdên sînorparêz yê ku li van deveran diman hertim bala lêkoleran kişandiyê. Serpêhatiya mîrekî Kurd ê Serhedî ji ku li berpalên Gola Wanê dima, dibe naveroka destaneke poetîk.⁵³ Ev berhema ji aliyê helbestvanekî Swêdî de hatiye nivîsîn. Ekelof di vê dîwana xwe ya bi navê *Dîwana li ser Mîrê Emgionê* (1965) de qala mîrekî Kurd dike.⁵⁴

Yaşar Kemal û Gunnar Ekelof di vî warî de di bin du heyranên Wanê, Waneke ku ji Wana îro cihêtir!

Serhed serî hildide (1930)

Dî navbera salên 1927-1930yê de Kurdên Serhedê li derdorê Çiyayê Agiriyê li dijî lêdan û zordestiyên Tirkîyê serî hildan. Kurdan qasî pênc salan herêm kontrol kirin. Hin lêkoleran ev dest-xistin û serfiraziyên Kurdan bi navê *Komara Agiriyê* bi nav kirin. Serekê ve sehildanê Îhsan Nûrî Paşa bû. Kesên wek Boroyê Heskê Têlî, Ferzendeyê Hesenî û Xalisê Evdilmecîd pêşengiya vê serhildana Serhedê kirin.⁵⁵

Encam

Kurdên Serhedê gelek caran angorî dewletên herêmê wek komên muhalîf, dijber hatine hesabîn, gelek caran hatine dersînor kirin. Yan jî di sedsalên kevin de ji deverên hundirê welêt ji ber sedemên siyasî berbi Serhedê hatine sirgûn kirin. Ev Kurdên koçber ku nû li Serhedê danîne, angorî hewcedariyên xwe vê carê ji der sînorên fermî ji xwe re "Warekî Jiyanê" efirandine û dest pê kirine ev wara fireh kirine. Bi hêzên li aliyê din ê sînor re ketine têkiliyên curbicur.

Yayınları, 1992.

52 Vassilios Digenis Akritis (*Basileios Digenes Akrites*), wergêr: Va-sios Sabatakakis & Staffan Stolpe, Sekel Bokförlag, 2007.

53 Gunnar Ekelöf, *Diwan över Fursten av Emgion*, 1965. Wergêrê wê ya Tirkî jî heye: Gunnar Ekelof, *Emgion Prens İçin Divan*, YKY, 2003.

54 Rohat Alakom, *Enînivîsa Mîrekî Wanê*, Malpera Nefel (7/3 2007). *Enînivîsa Mîrekî Kurd: Mîrê Emgionê, Ronahiya Dîrokê*, Aran, 2008.

55 Rohat Alakom, *Xoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması, Avesta Yayınları*, 2011. *Bir Türk Subayının Ağrı İsyanı Anıları*, Avesta, 2011. Mustafa Balbal, *Ararat'taki Esir Generalden Kan Çiçekleri*, Doz Yayınları, 2002.

48 Ahmet Aras, *Evdalê Zeynikê*, r.41.

49 Ahmet Aras, *Evdalê Zeynikê*, r.120.

50 Yaşar Kemal, *Kanın Sesi*, Toros Yayınları, 1991, r. 302.

51 Rohat Alakom, *Yaşar Kemal'in Yapıtlarında Kürt Gerçeği*, Fırat

Wan dicemide

Mehmet Bozkoyun

Ji bo geleki bê xwedî...

Li Wanê her tişt dicemide
Zarokên Xaçortê yên rengesmer dicemidin
Hêvî dicemide
Agir dicemide
Dem dicemide
Qêrîna konbajaran dikeve xewnên min yên bêxew
Hewara Ünîs (Yûnis) dibihizim di bin giraniyeke bêpîvan
Lê mirovahî kerr û lal
Serhed dicemide ji mirovahiyê
Ma ev bû biratiya gelan
Kîrînên Xwedê "ela rest wel-eyn"
Lê gotinên hovmîrovan dijwar e
Xeyalên min ên pêserojê dicemidin di bin konektî zîp û zîha
Ax ev çî nalîneke dilşewat e
Mîrovahî tîk çû di bin ramanên siyasi de
Kurd li Kurdan xwedî derneket
Lê çî hacet ji gelên din re
Li ber serma û seqema zivistanê
Dayîkek û neh zarok dicemidin bê bav
Wan dergûşa şaristaniyê
Xemla te Zernebad naherike
Çorawanîs, xîrabe û xeft dêr bûn wargeha şîrê
Ji bona te şîr girêdan
Xor Xora te li benda Seidan e
Ka bêje Wan, ev çî serma û seqema tu bê hêz kirîyî
Zarokan por spî kir
Dayikan zarok avêtin
Behra te miçîqî
Peravên te bê mirov man
Li warê te kund dixwînin
Li bin konektî bînav
Axin û nalîna dayîkekê dicemide
Li ser pîra Mamedîkê berf dicemide
Ma ev serma ne bes e
Wan, bajarê qedîm ka bêje ev çî hal e
Ev çî ewrên reş û tari ne bi ser te de hatine
Ma ev bû soza te dabû min
Ma ev bû hêviya min û te ya li girava Extemarê
Çiyayê Agirî ji bo te reş girêdaye
Xwîskên te Dicle û Ferat heştiran dibarinin ji bo te
Lê tu hin dicemidî

04 Rêbendan 2012 Wan

Serhetbûnê, wek faktorekî dînamîk di warê tîkiliyên dualî yan jî pîralî de roleke mezin lîstîye. Ji ber vê yekê bala hêzên dewletên hawirdor hertim li ser van Kurdên ku li ser sînoran tevdişeriyên, bû. Sînorên gelek asê li herêmê hebûn. Lêbelê Kurdên herêmê di sa rêyên kese û şiverê ji xwe re didîtin, li ser van sînorên ku buhur nedidan, bi hêsanî derbas dibûn. Kurdên Serhedê timê ev herêma bi dirêjahiya sedsalan pêkol (kontrol) kirine. Mîrov nikare hema sînoran wek cixîzekê yan jî xeteke sor bihesibîne. Kurdên vî alî sînor û wî alî sînor hertim bi hev re ketine tîkiliyan, di navbera herdu aliyan de pevguhartinên cihêreng peyda bûne. Ev tîkiliyên dersînor gelek caran li van herêman çandê melez, belek û pîr-reng jî pêk aniye.⁵⁶

Li herêma Serhedê sînorên (xet, hed) dewletên Osmanî, Îran û Rûsyayê digihîştin hev. Ji ber vê yekê ji Kurdên vê herêmê re dibêjin *Kurdên Serhedê*. Welatê Serhedê bajarên Qers, Agirî, Van û herwisa jî bajarên Erzîrim, Bitlîs û Muşê hildide nav xwe. Li Welatê Serhedê çawa tê zanîn bi hemû şan û navê xwe, Çiyayê Agirî (Girîdax, Ararat) bilind dibû. Ev çiyayê navdar, sembol û nîşana vê herêmê bû ku ji aliyê mirovên xerîb û biyanî de weke *Welatê Serhedê* dihate bi nav kirin. Bi kurtî mirov dikare bêje ku vê herêmê bi sedsalan ji Kurdan re hembêz vekirîye, bûye dergûşa mirovahiyê ya qedîm. Piştî ku di sedsala 17an di navbera Osmanî û Farisan de sînor hatin kişandin, Welatê Serhedê edf bû meydana şer.⁵⁷ Di sedsala 19an de vê carê Rusya jî tevî van şeran bû.⁵⁸ Kurd hertim di nav êgir de bûn. Eger em bi zîmanê folklorîk û mîtolojîk bipeyîvin mirov dikare bêje ku Xwedayê mezin yê sînoran *Terminus* hatiye hawara Kurdan, ew ji hemû xirabîyan parastine, xelas kirine û anîne van rojên îroyîn. ●

56 Osman Gümüşçü, *Siyasi Coğrafya Açısından Sınırlar ve Tarihi Süreç İçinde Türkiye'de Sınır Kavramı*, Bilig, nr 52/2010.

57 Nejat Abdullah, *İmparatorluk Sınır ve Aşiret*, Avesta Yayınları, werger: Mustafa Aslan, 2009.

58 P. İ. Averyanov, *Osmanlı İnan Rus Savaşlarında Kürtler (19. Yüzyıl)*, çev. İbrahim Kale, Avesta, 2010.

Şêxên Neqşîbendî û Bedirxan Beg

TEHSÎN ÎBRAHÎM DOSKÎ

Transkrîpsiyon: Ayhan Geverî

Hevalê me M. Nezîr Basneyî di jîmareya *Nûbiharê* ya 115ê de gotarek li bin navê “Serhildana Bedirxan Beg û Şêxên Neqşîbendî” belavkiribû. Têde belgenameyeka Osmanî ya bi zimanê ‘Erebî hatiye nivîsîn ji layê waliyê eyaleta Diyarbekirê Muhemmed Xêreddîn digel wergera wê ya Kurdî li ber çavê xwendevanan danabû. Di vê belgeyê de walî mezinên xwe yên li Stenbolê agahdar diket ku wî nameyek ji çend şêxên terîqeta Neqşîbendî re şandiye û têde daxwaz ji wan kiriye ku ew Bedirxan Begê şîret biket da “ew neyartiya dewletê neket û xwe bi dest ve berdet...” Eger ne “ew ji aliyê dînî û terîqetê ve dê gunehkar bit û ji aliyê dinyayê ve dê peşêman bit.”

Piştî hevalê me deqa belgenameyê belavkirî gotinekê dibêjit: “Êdî ka çiqasî ev şêxên han li gorî pêdiviya vê nameyê tevgeriyabin nayê zanîn..” û wekî aşkera ew vê gotinê dibêjit, ji ber ku wî li dor vê meselê çu belgeyên dî nedîtine. Belê çend belgeyên dî ji arşîva Osmanî di dest me de hene her li dor vê meselê. Ji ber wê me xwest em jî ji aliyê xwe ve


rohnkirinekê bidine ser vî babetî, da ku xwendevanên *Nûbiharê* baştir bi vê meselê agehdar bibin.

Yekem car me divêt em aşkera bikeyn ku du ji wan şêxên ku walî name jê re şandî em dinasîn û duyên dî li ber me kifş nebûyne ji ber ku navên wan di wan jêderan de nehatîne. Lê yên ku li ber destê me hene, yanî ew herdu şêxên aşkera eve ne:

1. **Şêx Salihê Sêpekî:** Ji ‘eşîreta Sêpekan e ewa li devera Bedlîsê akincî. Her çende ew mirovê mezinê vê ‘eşîretê bû, belê dibêjin wî dest ji dinyayê vekêşaye û xwe gehandiye Şêx Xalidê Cizîrî (ku yek ji xelîfeyên Mewlana Xalidê Şarezûrî bû) û li ser destê wî bû. Yanî bûye yek ji dûkeftiyên terîqeta Neqşîbendî. Piştî wefata Şêx Xalidê Cizîrî, li şûna wî bûye şêx û şêxatiya terîqetê li devera Cizîrê bo Şêx Salihê Sêpekî maye û vî Şêx Salihî bihayekî mezin li cem mîr û mezinên wê serdemê hebûye. Heta dibêjin Sultanê Osmanî Ebdilmecîdî bi xwe jî bihayekê zêde didayê. Gelek murîd û xelîfeyên wî hebûn ên mîna Şêx Muhemmedê ‘Eynî

Çend belgeyên dî ji arşîva Osmanî di dest me de hene her li dor vê meselê. Ji ber wê me xwest em jî ji aliyê xwe ve rohnkirinekê bidine ser vî babetê

ji mensûbên terîqeta Neqşibendî ya bilind in û ji dûkeftiyên Mewlana Xalidî ne, her wesa ji ber ku xelifeyên Mewlana yên îşaret bo hatiye dan Şêx Salih Efendî û Hamid Efendî û İbrahim Efendî û ‘Ezraîl Efendî li aliye me ne û dema min bihîstî ku ew guhdariya gotina wan şêxan diket, min nameyek bi zimanê ‘Erebî bo wan nivîsî û min gotê terîqeta Neqşibendî ya bilind her wesa terîqetên dî, dibînin ku guhdariya dewleta bilind û ebedî, rêya rizgarbûnê ye li dinyayê û axretê û neguhdariya wê, peşemânî û ziyan pêve dihêt. Û ehlê terîqetê bi hiçrengî qebûl naken û ez bi xwe jî ji dûkeftiyên terîqeta bilind im û da çu ziyan negehîte birayên me û heta ew nebîne ji wan kesên bêqîmet di nav mirovan da heta roja qiyametê, ji ber neguhdariya wan bo îmamê muslimanan, min daxwaz ji wan kir ew şîretê li wî mirî biken yê îşaret bo hatiye dan. Û min hindêk ayet û hedîs bo wan nivîsîn û min aşkera kir ku hiç nexweşiyek di nefis û mal û namûsê da nagehîte wî û ew eger xwe bi dest dewleta bilind ve berdet, rutbeya mîrê miran ya bilind bo wî dê hête dan û heta ez wan piştrast bikem û meyla wan bi dest xwe ve bînim min gote wan ez jî ji mensûbên terîqeta bilind im û min îcazetnameya xwe ya terîqetê da digel nameya xwe û bo wan şêxan hinart. Û min zanî ku piştî wan ev name xwandî wan kesek şande nik wî mirî da bêjîtê ku “guhرداریا dewletê bi aşkerayî û veşartî li ser me wacib e û divêt ku tu guhdariyê bikey û xwe bideye dest dewletê, lê eger ne, hijmara birayên me ji dûkeftiyên terîqeta Neqşibendî li deverê bîst hezar kes in û em dê wan hemûyan



digel xwe beyn û bi nik dewletê ve biçîn, vêca ‘eqlê xwe bine serê xwe û em bi tişteki mîfayî nagehinîne te.” Û me zaniye ku mîrê îşaret bo hatiye dan êdî hest bi rihetiyê naket û wî li ber e biçit xwe li kelê asê biket. Eve û min wêneyek ji wê nameya min ewa bi zimanê ‘Erebî bo îneqamê sedareta bilind şandiye û piştî hûn wê dibînin dê bo hewe aşkera bit ku koma mîrê îşaret bo hatiye dan dê belave bit û ew êdî neşêt beranber hêza aşkera ya sultanê me rawestit. Û mesela wî nêzik dê bi dûmahî bêt...”

Belê, ji vê gotina walî dihête zanîn ku wan şêxan guhdariya

walî kiribû û daxwaza wî bicih î nabû. Lêbelê divêt ji bîr nekeyn li vêrê ku ev gotine, gotina walî ye bo mezinên wî li Stenbolê û dibit ew gelek yê rast jî nebit. Belkî armanca wî ew bit ew xwe li ber mezinên xwe şîrîn biket û bêjîte wan: ez karên mezin dikem!

Û hêjayî gotinê ye ku di hindêk jêderan de hatiye ku mîr Bedirxanî heta dûmahiyê jî, Şêx Salih pêş xwe ve wek nûner dihinarte nik mezinên Osmanîyan. ●

Kilama Robozkê

Berken Bereh

were wey lê lê wey lê lê wey lê lê wey lê lê êêêê
 ax ax aaax aaaaaaaaax!
 felekê li me xayîne wey lê êêêê
 de hûnê rabin lezkin bilezînin
 hawara me ragihînin Hewlêr, Mehabad û Amedê
 de bila heçî Kurd in
 werin vê xopana çiyayê Tilîlehê
 xweşmêr û tîfal û xortê me Robozkiyan birevînin
 wele wek cara ji caran bêbextê Romiyan
 fermana me Kurda rakiriye
 sîng û berê mi evdala xwedê
 û sîh û heşt karwanciya
 dayê ber tanq û top û firokeyan
 wey lê lê felekê xayîne lê lê

erê, bûkê digot ezê qirigê,
 wile vê berêvara reş î wehş
 me yê berê xweşmêrên xwe daye rêka dûr e
 ax wile me nedizani çûn heye hatin tune
 xweyê mirî kor e

çiyayê Tilîlehê bi dar û ber e
 li jorê hawar û gazî
 li jêrê geliyê kerr e
 ezê çawa xwe bigihînim delalên xwe
 ku wiha li ser serê min evdala xwedê
 mirin digere
 ax ez nemînim ez nemînim

lo Şivano te yê gotî
 ezê biçim têra lingekî protez mal bînim
 da birayê min bikare temaşa min bike bê çawa
 gogê digerinim
 ax de wile ez nemînim ez nemînim ez nemînim
 dayê

lo wile serwetî gotî
 emê nivê şevê hatîne kopê
 me yê elektrîkên xwe vexist û girt
 da leşker bizanin ku em in
 lê wan em dane ber topan
 berê me dane kortê
 wele dema em li hev kombûne
 firokeyan li me bombe barandine
 wezê qulibîme nav berfa li jêrê
 wele min nizani em dane ber devê xencerê
 ax ez nemînim ez nemînim ez nemînim dayê

wile bi dengê bombeyan emê bezîne
 me di rê de sê cemseyên leşkera dîne
 lê li me nesekinîne
 me yê telefonê alayê kiri
 fermandarê alayê gotiye ew yên we nîne
 ax ez nemînim ez nemînim ez nemînim dayê

lê dema me xwe gihande kopê
 me dit wa kezêb û rêviyên mêrxasên me
 ax biravo wê tevli yên hêstiran bûne
 hinek ji wan ne ling e, ne çav e, ne berîbeden e
 ax ez nemînim ez nemînim ez nemînim dayê

wile me yê wê şevreşê
 parî û hûrên delalên xwe
 ji bin tehtan, ji nav berfê... deranîne
 wek bendekan li hêstiran siwar kiriye
 ax wile kesek nîne şîna me bigerîne
 ax ez nemînim ez nemînim ez nemînim dayê

II.

Nalînên Robozkê

beriya esman hilweşe
stêrk bixuricin
min bi destê birayê xwe girt
xwe avêt hambêza çiyayê Tilîlehê

xweda neyîne serê kafiran

III.

min ne dê û ne bav e
stûn û ezîzê min tu bûyi
va tu ji çûyi
ezê çi xweliyê li serê xwe bikim

IV.

te dixwest bibî endezyar
ji me re qesr û qonaxan lê biki
destek te ma li wî alî
çavek te di bin tehtekê de

V.

du birayên min hebûn
her yek ji wan welatek
niha di heman qebrê de
wek tovê binefşekê

VI.

min dixwest gulbihara min
vê biharê daweta me çêbibe
ax! nehiştin bêbextên Romê
wan çend perûyên di çeltî de
bide yeka dîn
xêra miriyên xwe

VII.

bîbore kezîzera min
ketime bextê te
ew şara ji sûka Duhokê ji
ma di bin wan topan de

VIII.

xema min nayê bi kuştina min
dîsa barê xwişk û birayê min
-ku dixwînin li xerîbiyê-
ma li ser milê te bavo

IX.

em belengaz bûn
em bengiyê aramî û aştiyê
me bawerî anî bi Romiyên
me nedizani tu caran bextê wan nayê rayê

X.

çavê min
ew deqa şîn
û guhê hêstira boz
ne kesekê xêra dît
ne gurya war
hê li nav wê dirryê

XI.

qet xema nexwe dayê
wê wek pîvokekê bibişkive
ji hûrpariyên min ê berhevkirî
ji wî şîrê te yê helal
ku te di bagerên şevê de dayî
xwişk û birayê min
azadî

XII.

Pênûsa Robozkê

her ku dilê wan bibije xwîn-şerabê
-çima em Kurd tèn bîra wan-
ji bo pîrozkirina sersalê
ha çend cixarên bi çermê min hatin pêçan ji
di bere bikêşe cergê xwe yê genî

bi serê Kurdistanê xwe kim
wê di gewriya we de neçe xwar
ew xwîn-şeraba wan zarokên we desteser kirî
li bêjû
li Robozkê
li Qilabanê

hûn bi dilpakiya xwe mirin ezîzên mino
axx! ezê çawa bijim li bin vî barê giran!

deriyê dilê min

mehmet alî aluç

şev şeva hiznê,
dem dema hiznê,
demsal demsala hiznê ye.
hêviyên min diweşin
li ser hêviyên te yên berz
teví pelê dar û berên ku
te çandin di dilê min de...

ev şeva bi hizn û eleambar
kenê çavên te
olan dide di kerrika guhên min de
ez li vir, tu li wir
bila çavên te
her tim mîna niha
bi deng dikenin.
lêbelê
îşev şeva hiznê ye...

îşev şeva nalinê ye
nalinên min û sirîştê,
diresîn li ser kevir û kuçikên ezîz
û belav dibin
li dorhêla min.
navhev dikevin
hildikişin, bilind dibin
di bin ava jiyane
dibarin û dirijin
li ser kenê çavên te de...

îşev şeva şiqinê ye
dişqim û diqirim bêhemdê xwe
ditirsim, diricifim
û fêm dikim ku
ê ku ditirse
TU yi
ne ez im!..

îşev şeva zayinê ye
fîkrên qedexe
fîkrên ku te hunandin
di hundirê hundirê min de,
dizên ji mêjiyê min.
û fîkrên ku te xemilandin bi evinê

dîl digrin bejn û bala min
carina te, carina fîkrên qedexe
û carina ji...
... difikirim
lê fedî dikim...

îşev,
ne şeva hiznê,
ne ji şeva nalinê ye.
îşev,
ne şeva şiqinê
ne ji şeva zayinê ye.
îşev,
şeva bédengiyê ye.
ev şeva kerr û çiksayî
dipiste di guhên min de
nişkave
bédengiya şevê diqelişe
û parçe parçe dibe
bi dengê kenê çavên te...
lê mixabin
ji xeynî min û şevê
tu kes
kenê çavên te nabihîze...

demsal bihurin
bihar û havîn qediyar
serisnagê payizê ye
disa tu ji min dûr ketî.
deriyê dilê xwe
min girt ji her kesî re...

çendîn sal in te vedîşerim
di paşila xwe de.
çendîn sal in te dipêçim
bi dilê xwe ve.
niha tu ji min dûr be ji
deriyê dilê min,
vekiriye ji te re
kerem ke
were...

04.10.2011/hayrabolu

Cizîra Binxetê û Şêxên Ola Îslamê

KONÊ REŞ

Dema ku Şêx Maşûqê Xiznewî hat revandin û kuştin, Qamişlo bi bûyera kuştina wî a trajedî re li hev ket û hat hejandin. Hingî kurê min yê biçûk Celadet (Mîro), ji min pirsî: Yabo! Şêx Maşûq kî bû?! Min lê vegerand, ji mala Şêx Ehmedê Xiznewî bû. Got: Mala Şêx Ehmedê Xiznewî kî ne?! Di vir de ez mam sekinî û min ji xwe pirsî, çima ez naxepêrim û nivîsekê li dor şêxên Cizîrê û mala Şêx Ehmedê Xiznewî berhev nakim?

Berê jî, min di bîranînên xwe yên zaroktiyê de li gundê Doda, hin nivîs li dor vê yekê nivîsandibûn û misilmantiya Dodayan anîbû ziman. Vêca ji wê nivîsandinê ezê dest pê bikim. Di wê biçûkaniya min a gundê Doda de, li gor misilmantiya Dodayan, bandora sê şêxên olîtiya misilmaniye li wan hebû, anku her beşek ji Dodayan murîdên şêxekî bûn. Hin ji wan murîdên **Şêx Behyedîn** bûn. Behyedîn birayê Şêx Xalidê Zîlan bû, yê ku piştî komkujiya geliyê Zîlan, Kemalîstan ew sirgûnî Anatoliya rojava kirin, hingê ji neçarî, hin zarokên wî û ev birayê wî

Şêx Behyedîn derbasî Binxetê bûn. Destpêkê, Şêx Behyedîn hat Amûdê, Hazdê û dawî li Doda mizgeft û tekiyek ava kir û dergehê tobe û tewacê vekir. Murîdên wî bi pirranî Mehcir û Miqriyên Doda bûn, di gel xelkê gundên Gundik, Tilkêfê û Olçiya bûn. Xelîfeyê wî li Doda Xelîlê Hecî bû, li Gundik Ferhanê Çelebî bû û li Olçiya jî Îzzeddîn bû. Beşek jî murîdên **Seydayê Hecî Mûsa** bûn, yê ku Tekî, hicrik û paytexta wî li gundê (Sîha Mivred) bû, dor 35 km başûrî Doda dikeve. Dikarim bibêjim ku malbata min bi tevayî murîdên Seydayê Hecî Mûsa bûn, di gel xelkên gundê Sada. Dodayên mayî bi pirranî murîdên mala **Şêx Ehmedê Xiznewî** bûn, yên ku paytext û Tekiya wan li gundê (Til Marûf) bû, dor 60 km li rojava û başûrî Doda dikeve. Jixwe hin di gund de hebûn hay û bayê wan ji misilmantiyê qet nebû.

Her êvara îne hin ji murîdên van şêxan ji bo tobe û tewacê xwe kar dikirin û diçûn cem şêxên xwe. Herçî murîdên Seydayê Hecî Mûsa bûn, Hecî Derwêş serkêşiya wan dikir- Hecî

Behyedîn birayê Şêx Xalidê Zîlan bû, yê ku piştî komkujiya geliyê Zîlan, Kemalîstan ew sirgûnî Anatoliya rojava kirin, hingê ji neçarî, hin zarokên wî û ev birayê wî Şêx Behyedîn derbasî Binxetê bûn

Di wan salan de jî gelek caran Babaderwêş dihatin gund, qewil digotin, li erbana dixistin, di ber re jî Xelîle li hev dixistin û davêtin ber hev. Me zarokan jî dida pey wan, bi dûv wan de li gund digeriyan

Derwêş pismamê bavê min bû- bi peyatî an bi ker û qantiran ji Doda diçûn ta bi Sîha Mivred. Şevêkê diman û adinî rojê dizîvirîn. Herçî murîdên mala Şêx Ehmedê Xiznewî bûn, melayê gund serkêşiya wan dikir, ew jî bi pêyatî an bi ker û qantiran û an bi Ereban diçûn Tilmarûf, hin caran diçûn Qamişlo tevî karwanê sofîyên mala şêx dibûn û bi wan re diçûn. Jixwe ta ku Şêx Behyeddîn li Doda bû, murîdên wî dihatin Doda, lê piştî ku çû Amûdê, camî û tekiya xwe lê avakir, murîdên wî her îni ji Doda û gundên derdorê ji bo tobe û tewacê diçûn Amûdê. Dema ku murîd ji mala şêx dizîvirîn, nanê Tiberkê ji me re tanîn. Dê û bavê me, ew nan didan me û ji me re digotin bixwin (Tiberka mala Şêx e). Tevî hişkbûna wî nanî, ew nan li ber dilê me zarokan nerm û xweş bû.

Gelek caran li ser benderên gund an di odeyan de murîdên her sê şêxan diketin qirika hev û din de, hev aciz dikirin. Her yekî rastî û duristiya şêxê xwe digot, her yekî pesnê şêxê xwe dida. Me fam nedikir çima şerê hev dikin û her yek pesnê şêxê xwe dide. Tevî ku şêxê tevan misilman in û tev wek hev yek nimêjê dikin û wek hev yek rojiyê digirin û Xweda li cem tevan yek e û pêxember, Mihemed e.

Xweş li bîra min e, dema ku Mele Xelîl ji gundê Nêf melayê Doda bû, hingî dor 13-14 feqeyên

wî hebûn. Wî ji wan re digot Suxte, ew Suxte an Feqe li mizgeftê radizan. Mele Xelîl ew fêrî nehû, serf, tefsîr, mintiq, hedîs, tefsîr û beyan dikirin. Wan feqeyan di biharan de li ser benderên gund dixwendin, şopa çûn û hatina wan di nav gîha de wek şivîlekê xuya dikir. Hin ji wan Feqeyan ji herêma Aliyan, hin ji Aşîtan û hin ji Serxetê û Serheda bûn. Xwarina wan li ser gundiyan bû, navê xwarina wan Tayîn bû û gelek caran, nexasim êvara îne wan feqeyan balûte digerandin û qesîde digotin, balûteyên wan wek reqsa hûrizî bûn.

Di wan salan de jî gelek caran Babaderwêş dihatin gund, qewil digotin, li erbana dixistin, di ber re jî Xelîle li hev dixistin û davêtin ber hev. Me zarokan jî dida pey wan, bi dûv wan de li gund digeriyan, me li wan temaşe dikir û me jî wek wan digot û em bi hev dikeniyen. Ew Babaderwêş bi keran dihatin, geh cot bûn, geh sê kes û çar kes bûn. Babaderwêş bi rîh û şaşik bûn, şaşikên serê wan zer bû û her yek ji wan tûrek bi bejna wî ve daliqandî bû. Gelek caran di navtara gund de li erbanan û xelîlan dixistin, gundiyan jî, her malekê li gor dewlimendiya xwe tebsîk savar, nîsk an ard ji wan re dibirin û berdidan tûrê wan. Gelek caran jî hin Seyid li ser keran dihatin gund, bi rih bûn, şaşika serê wan kesk bû, xiştekir dirêj û serî tûj di destê wan de bû, em ji

xişta wan ditirsyan. Ew Seyid mal bi mal digeriyan, gundiyan jî xêr bi wan dikirin, her pere nebûn, ard û savar didan wan. Mezinan ji hev re digotin; Xocayê Xizir xwe dike reng û kesmê yekî ji van Seyidan û mal bi mal digere, li hal û rewşa millet temaşe dike, lê nayê naskirin. Bi tenê ku mirov tiliyên destê wî bigivêşe, eger bê hestî û tev nermik bin, ew Xocê Xizir e, Xocê Xizir tiliyên destê wî tev nermik in, hestî di wan de nîne û yê ku wî nas bike, çî jê bixwaze, daxwazên wî pêk tîne.

Carekê gundiyeke me ji Doda diçe gundê Xerbkortê, di navbera herdu gundan de newalek kûr bi navê newala Ademo heye. Wî gundiyeke ji zilamên gund re digot; ta ku ez giham binê newala Ademo ez ji hawhaw ve ketim û min kes ne bi rê de û li dor xwe nedît. Ji westandinê min xwe da keviya rê, rûniştim û min qutiya xwe vekir ku çixareyekê ji xwe re bipêçim, ji nişka ve min seh kir ku yek ji min re dibêje Else-lamueleykum. Li paş xwe zîvirîm min dît, ku yekî Seyid e, bi şaşik û ciba xwe ya kesk li paş min, ji kerê xwe dadikeve. Hema di cî de min qutiya xwe girt, rabûm ser xwe û lêvegerand: Wey eley-kumelselam we rehmetsullahî we berekatihî. Û ez bi ber ve çûm, min destê xwe dirêjî destî wî kir û di dilê xwe de got Xwedê wekîl e ev Xocê Xizir e. Va min ew li vê çolê zefî kir, ez feqîr û reben im, ezê daxwazên xwe jê bikim. Lê berî ku ez daxwazan jê bikim, min di dilê xwe de got, ka ezê destê wî biguvêşim, eger tiliyên wî bê hestî û nermik bin, ew Xocê Xizir e, ez wî bernadim. Û wiha min destê xwe ber bi destê

wî ve dirêj kir, wî jî destê xwe ber bi yê min ve anî, lê hema wî serê tiliyên xwe gîhandin tiliyên min û bixar destê xwe kişand, rê neda ku ez tiliyên destê wî biguvêşim. Bi wê kişandina destê wî re, min jê re got: Ev tu ne Xocê Xizir bî? Wî li min vegerand û got: Ê ê ê na... Min nas kir ku ew ne Xocê Xizir e, min jî di derhal de lê ve-gerand: Willeh tu ne Xocê Xizir î. Ji werê wê gumanan ji min re çêke ku ew Xocê Xizir e. Erê di wî heyamî de min nas kir ku Babaderwêş û Seyid jî bi misil-mantiyeke xurt ve girêdayî ne.

* * *

Piştî hilweşandina Împaratoriya Osmanî û guhertina wê bi Cumhuriya Kemalî di sala 1923an de û bi taybetî piştî serhildana Şêx Seîdê Palo di sala 1925an de û bidarvekirina wî û her 47 şêx û axayên Kurdan yên pê re, Kemalistan bi hovîti berê xwe dan şêx û axayên Kurdan yên mayî; ji berê ve, girtin, kuştin û sirgûnî Anatoliya rojava kirin û pê re jî tev Tekî, hicrik û dibistanên olî yên wan şêxan girtin. Vêca, ew şêx û ronakbîrên ku ji ber destê Kemalîstan filitîn û jiyana wan di metirsiyê de bû, ji neçarî Kurdistana bakur li paş xwe hiştin û berê xwe dan nav Kurdên Binxetê û bi taybetî bajarê Amûdê yê ku ji kevntirîn bajarê Cizîrê ye û bajarê Qamişlo yê ku nû hatibû avakirin. Ev herdu bajar û Beriya Mêrdînê ji sed salan ve bi bajarê Mêrdînê ve girêdayî bûn. Wê hingê Binxetê di bin desthildariya Fransîzan de bû. Vêca gelekani ji şêx, mele, zanyar, rewşenbîr û axayên Kurdan xwe li bajar û gundên Beriya Mêrdînê girtin û bîr û baweriyên xwe wek

Piştî serhildana Şêx Seîdê Palo, di sala 1925an de û bidarvekirina wî û her 47 şêx û axayên Kurdan yên pê re, Kemalistan bi hovîti berê xwe dan şêx û axayên Kurdan yên mayî

ku dixwestin berdewam kirin; Mizgeft, Tekî û hicrik ava kirin. Ji kesên ku hatin bajarê Amûdê û tevî Şêx Ehmedê mala Bavê Kal, bira, zarok û pismamên wî bûn, Şêx Ehmedê Kesk (Şêx Ehmedê Qadirî), yê ku di sala 1860î de li Kurdistana bakur, wîlayeta Mêrdînê, gundê Darê çêbûye. Bi fermana şêx, mela û axayên Kurdan re hatiye bajarê Amûdê, mizgeft lê ava kiriye û dawî di sala 1954an de li Amûdê çûye ber dilovaniya Xwedê û ew di goristana Amûdê de hatiye veşartin. Seydayê mezin Ubêdellahê Seyda; ku yek ji damezrênerê dibistanên olî yên pêşî ye di Amûdê de, gelekani li ber destê wî xwendiyê ku yek ji wan seydayê Cegerxwîn bi xwe ye. Ew bi koka xwe ji Kurdistana bakur, xelkê Hêzanê ye, di pey re, kurê wî Seydayê Fethillah cihê bavê xwe girtiye. Şêx Başîrê Hamidî û kurê wî Qutbeddînê Hamidî; ew jî ji Mêrdînê daketine Amûdê û tê de şêxitiya xwe kirine, Şêx Mihemed Sedeqe. Û ji rewşenbîran yên ku hatine Amûdê; Qedri Can, Cegerxwîn, Reşîdê Kurd, Elyas Efendî. Her wiha gelek ji Şêx, mele û rewşenbîrên herêma Botan û deverên din jî di rêka Eyndîwerê û Nisêbînê re derbasî Sûriyê û Qamişlo bûne wek; Şêx Ewdulrehmanê Garisî, Mele Ehmedê Zivingî, Mele Ebdulselam Nacî, Mele Ehmedê Palo, Mele Ehmedê Namî, Mele Tahîr, Mele Nûriyê Hesarî, Mele

Ebdulqidûsê Cemîlê Seyda, Mele Mihemedê Mele Reşîd.

Şêx Mehmûdê Kalê: Ji mala Bûbê ye, mala Bûbê ji malbatên herî kevnar in di wîlayeta Mêrdînê de. Piştî ku sînor hatiye danîn, ew jî bûn du beş, beşek li Serxetê û yek li Binxetê. Yên Binxetê serokê wan şêx Mehmûdê Kalê bû, pay-texta wî li gundê Gaguriyê ye. û çend gundên wan yên din jî hene, Gaguriyê dor 25 km başûrî Derbasiyê dikeve. Şêx Mehmûdê Kalê di sala 1868an de hatiye dinê û di sala 1961ê de li gundê Gaguriyê çûye ber dilovaniya Xwedê û lê hatiye veşartin. Niha kurê wî Hemîdê Kalê seroketiya malbata Kalê dike. Dibêjin Seyid in. Di nav gel de cihê rêzgirtinê ne.

Şêx Mehmûdê Qere Qoyê: Bi koka xwe ji gundê Qere Qoyê, qeza Wardo, wîlayeta Mûşê ye. Ew di sala 1870î de li gundê Qere Qoyê hatiye dinê, xwendina xwe a olîtiyê wek tevayî oldarên de-vera Mûşê di hicrik û dibistanên olî de xwendibû. Piştî serhildana Şêx Seîd Efendî, ferman lê bûye û hatiye gundên derdorî bajarê Mêrdînê û di sala 1931ê de Binxet bûye, hatiye gundê Tilêlûnê. Berî ku Derbasiyê ava bibe. Niha gundê Tilêlûnê, di rex Derbasiyê de ye. Li wir mizgeft û hicrka Feqeyan ava kiriye û li gor rêçika Neqîşbendî misilmantî belav kiriye. Di sala 1952an de li Şamê koça dawî kiriye û di goristana Şêx Xalidê Nexşbendî, di beşekî

**Şêx Mihemed Îssa, li Binxetê dema ku çav bi
welatparêzên Kurdan wek Mîr Celadet Bedirxan,
Hesenê Kurd, Osman Sebrî dikeve Kurdevariya
wî gurrtir dibe.**

taybet de ku bo wî û malbata wî hatiye terxankirin, hatiye veşartin.

Şêx Mihemed Îssa: Kurê Şêx Mehmûdê Qere Koyê ye, di sala 1924an de li gundê Qere Koyê çêbûye, piştî serhildana Şêx Seidê Kal bi diya xwe re hatiye girtin. Di biçûkaniya xwe de li ber destê bavê xwe xwendiyê û bi giyanê Kurdperweriyê hatiye xwedîkirin û bi bavê xwe re hatiye gundên beriya Mêrdînê û Binxetî Sûriyê bûye. Li Binxetê dema ku çav bi welatparêzên Kurdan wek Mîr Celadet Bedirxan, Hesenê Kurd, Osman Sebrî dikeve Kurdevariya wî gurrtir dibe. Berî ku Partî Demokratî Kurdî li Sûriyê damezirînin, wî, li gundê Gir Kundê mizgeft û hicrikek bo feqan ava kiribû û wek bavê xwe rêka Neqîşbendiyê dimeşand. Gir Kundê dor 15 km başûrê Derbasiyê dikeve, dor 20 feqe an suxteyên wî hebûn, ew fêrî serif, tefsîr, mintiq, hedîs û beyan dikirin û wiha nîşkekî mezin ji melayên Kurdperwer ji ber destê wî hatine der.

Di gel ku Şêx Mihemed Îssa zanyarekî olî bû wiha jî têkoşer û siyasetmedarekî Kurd yê bi rûmet bû, di sala 1957an de, yek bû ji damezrênerên P.D.K.S (Alparî) di Sûriyê de. Di ber vê partyê de gelek êş û ziyana dîtine. Şêx Mihemed Îssa di roja 31.05.2001ê de li bajarê Heseqê çûye ber dilovaniya Xwedê, li gor wesiyeta wî, zarokên wî, termê wî rakirin

Şamê û ew di rex bavê wî Şêx Mehmûdê Qere Qoyê de veşartin.

Yada Hazdê (Şêxa Yadê): Dibêjin; jina Şêx Mihemed bû ji şêxên Serheda, piştî kuştina mêrê wê Şêx Mihemed, ew binxet bibû û li gundê Hazda mala Cimea, şêxitiya xwe dikir. Hazdê, nêzikî Amûdê ye. Sê kurên wê hebûn ji wan re digotin; Şêx Omer, Şêx Xetîb û Şêx Dawud.

Seydayê Hecî Mûsa: Ji şêxên rêçika Neqîşbendî yên naskirî ye, bi koka xwe ji malbata Seyidên Bêcirmanî ye, destpêkê wek xelîfê Şêx Ehmedê Xiznewî meletî li gundên beriya Mêrdînê kiriye, paşê ji ber hin probleman di navbera wî û mala Şêx Ehmed de, wî bi tena xwe rêçika Neqîşbendî ji gundê Sîha Mivred belav kiriye û murîd û sofiyên wî bi pirrbûn çêbûne. Ew di sala 1883an de li Kurdistana bakur hatiye dinê û di 13 sibata 1963an de li gundê xwe Sîha Mivred koça dawî kiriye û lê hatiye veşartin. Seydayê Hecî Mûsa ji şêxên Kurdperwer bûn.

Şêx Îbrahîm Heqî: Ji şêxên rêçika Neqîşbendî yên naskirî ye. Ew kurê şêx Hisênê Basret e. Bav û bapîrên wî şêxên mîrekên Botan bûn. Paytexta wan li Kurdistana bakur, herêma Botan gundê Basret bû. Şêx Îbrahîm Heqî, di sala 1893an de li Basret hatiye dinê, piştî serhildana Şêx Seid, ew jî wek gelek şêxên Kurdan ji Kurdistana bakur mehcir bûye û

çûye Îraqê, gundê Til Ebû Zahir, li ser peravê çemê Dicle û kurê wî şêx Îdnan li wir çêbûye. Paşê di sala 1937an de hatiye Binxetê, gundê Hilwa, li wir mizgeft û tekiya xwe ava kiriye. Şêx Îbrahîm Heqî di sala 1963an de li Hilwa çûye ber dilovaniya Xwedê li wê derê hatiye veşartin. Di pey re kurên wî şopa wî berdewam kirine, ji wan **Şêx Îdnan Heqî**, yê ku di sala 1931ê de li Îraqê, gundê Til Ebû Zahir çêbûye, xwendina xwe di zankoya Ezher de li Misrê bi dawî aniyê û hêj li ser şopa bav û bapîrên xwe dimeşe.

Seydayê Mele Îbrahîmê Sofî Ewdo yê Tinatî: Bi navê Şêx Îbrahîmê Tilşîrê jî tê naskirin. Wî jî li Tilşîra Aşîta hicrik ava kiribû, li dor 34 feqeyên wî, ji gelek cihên Kurdistanê hebûn. Ew li ser rêka Neqîşbendî dilivîya, pêwendiyên wî bêtir bi mala Şêx Îbrahîm Heqî re xweş bûn. Seydayê Mele Îbrahîm, di sala 1885an de li Kurdistana bakur hatibû dinyayê, di sala 1956an de li Qamişlo çûye ber dilovaniya Xwedê û li goristana Qidûr Beg hatiye veşartin.

Şêx Reşîdê Dêrşewî: Şêx Reşîdê Mihemed Nûriyê Dêrşewî di sala 1897an de li herêma Botan, gundê Şaxê, ku seyrangeha mîrên Botan bû hatiye dinê. Di gelek dibistanên olî yên herêma Botan û bajarê Mûsilê de xwendiyê. Piştî serhildana Şêx Seid û fermana şêxan, ji neçarî herêma Botan li paş xwe hiştiye û di Eyndîwerê re derbasî Sûriyê, qeza Dêrikê, gundê Rimêlana Şêx bûye û bûye ji akinciyên wê. Û ji gundê Rimêlana Şêx, şêxitiya xwe di herêma deşta Hesinan, Koçerên Mîran û Aliyan kiriye; problemên xelkê çareser kirine, mizgeft ava kirine û xêr û

xweşiya xelkê xwestiye. Di sala 1976an de çûye ber dilovaniya Xwedê û ew gundê wî Rimêlana Şêx, di goristana ku taybet bo wî hatiye çêkirin di bareşî gund de hatiye veşartin. Niha kurê wî Şêx Mihemed Nûrî şopa wî dimeşîne.

Dibêjin ku di sala 1961ê de berpirsaryarên parêzgeha Heseke civînek piştgiriyê bo rêjîma Abdulkerîm Qasim dijî şoreşa Barzaniyê nemir li gundê Rimêlana Paşê pêk anîne, di wê civîne de ji Şêx Reşîdê Dêrşewî xwestine ku gotinekê di vê bûyerê de bibêje. Şêx wiha gotiye: Ezê wek Xwedê û pêxember gotiye bibêjim; Eger du beş ji misilmanan şer bikin, wan li hev bînin, eger yê xurt û zalim, lihevhatinê nexwaze û zulma xwe nesekinîne, li rex yê mezlûm bisekinin. Mele Mustefa ne hinkûfê hikûmeta Îraqê ye, ew yê mezlûm e. Û gelek caran jî di nav mele, sofî û murîdên xwe de wiha digot: "Heçî li qewmiya xwe nepirse, bila ji îmana xwe bitirse."

Şêx Ehmedê Xiznewî: Ew damezrênerê malbata Xiznewî ya bi nav û deng e û pêşengê rêçika Neqîşbendiye di nav Kurdên Sûriyê de. Bi koka xwe ji eşîra Elîka (Elîreşka) û Kurdên Binxetê ye. Di sala 1890ê de li gundê Xizna yê Binxetê hatiye dinê û xwe bi gundê xwe Xizna daye naskirin. Xwendina xwe li gelek deveran û li Nûrşîn, cem şêxê mezin (**Hizret**) xwendiyê, paşê vegeyriyê gundê xwe Xizna. Li Xizna, camî, tekî û hicrikên feqan avakirine û berpirsaryariya rêçika Neqîşbendî hilgirtiye ser milên xwe û belav kiriye.

Di salên piştî serhildana Şêx Seîd de, gundê Xizna, bibû navend ji şêx, mela, feqîr

Şêx Ehmedê Xiznewî: Ew damezrênerê malbata Xiznewî ya bi nav û deng e û pêşengê rêçika Neqîşbendiye di nav Kurdên Sûriyê de. Bi koka xwe ji eşîra Elîka (Elîreşka) û Kurdên Binxetê ye

û hejarên ku ji ber zul û zora Kemalîstan direviyan, hingê piraniya wan xwe li gundê Xizna û şêx Ehmedê Xiznewî digirtin. Her wiha di eynî wan salan de pêwendiyên Şêx Ehmed bi axa û welatparêzên Kurdan yên ku ji gundê Dugirê kar û xebat ji bo Xoybûnê û şoreşa Araratê re dikirin, xweş bû û serwextî birîn û kovanên welatîyê xwe yên Serxetê bû. Hin dibêjin ku bibû yek ji endamên Komela Xoybûnê jî. Vêca dema ku Fransîzan di havîna 1930ê de, li ser daxwaza hikûmeta Tirkîyê welatparêzên Kurdan yên ku endamên Komela Xoybûnê bûn, sirgûnî Şamê kirin, hingî Şêx Ehmed û çend melayên wî jî, di roja 23.08.1930ê de sirgûnî bajarê Dêrazorê kirin. Piştî pêlekê ji sirgûniyê Şêx Ehmed a Dêrazorê, hikûmeta Fransî destûra vegeza wî dan, bi şertê li gundê Xizna nemîne, dûrî sînorê Tirkîyê keve- Ev dûrbûna ji ber sînor, li ser daxwaza hikûmeta Tirkîyê bû. Hikûmeta Tirkîyê ji Şêx Ehmed û murîdên wî bitirs bû- Vêca divêbû şêx Ehmed cihekî din bo xwe bibijêre, ew cihê nû girê Til Beerûr bû, yê ku dor 30 km başûrî sînorê Tirkîyê dikeve. Şêx Ehmed navê Gund ji Til Beerûr bi Til Marûf guhert û careke din ji wir rêçika Neqîşbendiyê belav kir. Lê her bi navê şêxê Xizna ma naskirî. Ta ku di Adara 1950ê de koça dawî kir û li Til Marûf hat veşartin. Dibêjin carekê Cegerxwîn û Dr. Ehmed

Nafiz Zaza kovara Hawarê ji Şêx Ehmed re birine û doza alîkariyê lê kirine, Şêx Ehmed 700 lîreyên wê hingê daye wan. Bê guman ez Şêx Ehmedê Xiznewî ji welatparêzan dibînim.

Ji xelîfeyên

Şêx Ehmedê Xiznewî

Sêzdeh xelîfeyên Şêx Ehmedê Xiznewî hebûn ew jî ev bûn: Şêx Masûm (kurê Şêx Ehmed), Şêx Mihemed Maşûq (kurê Şêx Masûm, biraziyê Şêx Hizret ji gundê Norşîn/Tirkîyê), Şêx Mihemed Sedîq (ji gundê Papevankê nêzikî Elcewazê ye/Tirkîyê), Seydayê Hecî Mûsa (ji gundê Nicim, Tilfaris û Siha Mivred), Şêx Ebdulhekîm (ji Adiyamanê, bû xelîfe li Menzîlê, Urfa/Tirkîyê), Seydayê Mele Ehmed (miftiyê Heseke û xwediyê gundê Miftî), Seydayê Mele Ebdulletîf (ji Amûdê), Seydayê Mele Ebdulrezaqê Hilêlî (li gundê Xalid), Seydayê Mele Salihi (li gundê Miêrîkê), Seydayê Hecî Hisên (ji gundê Kertiwênê/Tirkîyê), Seydayê Mele Cinêdê Botî (xelîfê şêx bû li Heleb û Beyrûtê), Seydayê Mele Îbrahîm (li gundê Girê Siwêr), Mele Mihemedê Mele Reşîd.

Piştî mirina Şêx Ehmed, kurê wî **Şêx Masûm** cihê wî digre ta ku ew jî di sala 1958an de diçe ber dilovaniya Xwedê û li Til Marûf, di kêleka bavê xwe de tê veşartin.

Di pey Şêx Masûm re birayê wî **Şêx Elaeddîn** dibe Şêxê Til Marûf û barê rêçika Nexşebendî dikeve ser milên wî de û wiha ta ku ew jî di sala 1969an de li Şamê koça dawî dike û li Til Marûf tê veşartin.

Di pey Şêx Elaeddîn re birayê wî **Şêx Îzzeddîn** bi barê rêçika Nexşebendî radiibe. **Şêx Îzzeddîn** di sala 1925an de li gundê Xizna hatiye dinê, di roja 31ê Tîrmeha 1992an de koça dawî kiriye, ew jî li Til Marûf di kêleka bav û birayên xwe de hatiye veşartin.

Di sala 1966an de çendî hikûmeta Sûriyê zor li **Şêx Îzzeddîn** kiriye ku beyannameyekê belav bike û tede bibêje; **şoreşa Barzanî** di rêka kufrê de ye û dûrê dînê Îslamê ye, lê Şêx Îzzeddîn razî nebûye û wek wan nekiriye.

Piştî mirina Şêx Îzzeddîn, Til Marûf li hev dikeve, mala şêx dibin du bend û sê bend. Bendek Şêx Mihemed kurê Şêx Îzzeddîn, bendek Şêx Ebdulxenî birayê wî û bendek yên mayî. Mal û cah dibin problem di nav wan de. Di wê hingê de rêjîmê jî destê xwe di nav wan de dirêj dike. Gundiyên Til Marûf jî bi pirbûn dibin Komunîst û Beesî û şerê mala şêx dikin. Hikûmetê jî piştî hinan digire li dijî hinan. Şêx Îzzeddîn jî di wesyeta xwe de kurê xwe **Şêx Mihemed** wek xelîfe li pey xwe bi nav dike, **Şêx Ebdulxenî** razî nebû, xwe ji biraziyê xwe heqîr dibîne. Dawî ji Til Marûf bar dike diçe gundê **Xizna**, bal mala Xeyda û ji wir şopa bavê xwe Şêx Ehmed dimeşîne, lê di cemaweriya xwe de lawaz e. Bêguman destê emiyetê di jihevketina mala Şêx Ehmedê Xiznewî de mezin bû.

Şêx Mihemed di sala 1949an li Til Marûf hatiye dinê, di roja 22ê çiriya pêşîn 2005an de li Siûdiya Erebî, di rûdaneke trafîkê de koça dawî kiriye. Di wê rûdawê de diya wî, jina wî, keç û kurê wî jî pê re çûne ber dilovaniya Xwedê. Bi koçkirina Şêx Mihemed re, kurê wî Şêx Mihemed Mûtaa cihê wî girtiye û wiha ji sala 2005an û virde Şêx Mihemed Mûtaa kurê Şêx Mihemed kurê Şêx Îzzeddîn şopa Şêx Ehmed ji gundekî di rex Til Bêder de bi navê **Til Erfan** dimeşîne.

Û wiha ew plana Mihemed Teleb Hilal pêk hat û niha Til Marûf di ser guhan re hatiye avêtin, bi tenê ew çend gorên mala şêx li Til Marûf mane. Mirov dikare bibêje ku ew festîvalên cemawerî, hevdiñên mele, sofî û murîdên ku ji Serxet û Binxetê hev û din li Til Marûf didîtin êdî nemane.

Hêjaye gotinê, di sala 1962an de dema Mihemed Teleb Hilal serokê emniyeta parêzgeha Cizîrê bû, wî di wê salê de pirtûkek bi navê "Xwedinek di parêzgeha Cizîrê de di warê yasayî, civakî û siyasî de", derxist. Ev şovenist û nijadperestê Ereb di vê pirtûka xwe de 12 bend bo bişaftin, Erebkirin û nemana Kurdan, hejmartine, benda şeşan taybet bi hilanîn û nemana Şêxên Kurdan e ji Cizîrê, dema dibêje:

6 – Navê şêxîtiyê ji ser şêxên Kurdan rakin û hin şêxên Ereb, ji herêmên Ereban bînin nav herêmên Kurdan da şêxîtiya xwe di nav Kurdan de bi kar bînin.

Erê, ji wê hingê ve wana, şêxên Kurdan bi tevayî û mala Şêx Ehmedê Xiznewî bi taybetî wek kelem di nav çavên xwe de

didîtin. Beşekî mezin ji hebûna Kurdan di Sûriyê de, di hebûna şêxên wan de didîtin û bi hewildan bûn ku Kurdan di Cizîrê de nehêlin. Mala Şêx Ehmed jî xweş nîşan bûn ji hebûna Kurdan re, nexasim ku bi rêka wan Kurdên Serxet û Binxetê hev û din li Til Marûf didîtin û wiha pêwendiyên wan bi hev re berdewam dibûn. Erê ji wê hingê ve, bi hewildan bûn ku Kurdan û mala şêx nema bikin, ta ku vê paşiyê di rêka dubendî û sêbendiya ku ket nav mala şêx de û piştgiriya wan ji bendekê re li ser hesabê benda din, mala şêx ji hev belawela û tarûmar kirin û wek ku Hilal dixwest, ew di Til Bêder û Til Erfan re derxistin..

Şêxê şehîd Mihemed Maşûqê Xiznewî: Şêx Maşûq di salên xwe yên dawî de têkoşerekî Kurd bû, wek oldarekî misilman bervedêrî di ber gelê xwe yê Kurd di Sûriyê de dikir, bi hewildan bû ku zulm û zora rêjîmê ya ku li ser gelê wî dihat meşandin nemîne. Ew kurê Şêx Îzzeddîn e, di roja 25.01.1957an de li Til Marûf hatibû dinyayê, di roja 10 gulana 2005an de li Şamê hat revandin û nebedî bû. Di roja 1 Hezîrana 2005an termê wî, li Dêrazorê dane malbata wî. Ew di goristana Qidur Beg de li Qamişlo hatiye veşartin.

Hêjayî gotinê ye; sebareti Kurdên me yên bi ola xwe Êzidî ne, ku di wî heyamî de, gelek Şêx, Qewal û Feqîrên wan li Cizîrê hebûn, mirov dikare navê **Şêx Nasirê Mîrza**, bavê şêx Meqbûl li gundê Otilce di pêşiya gişan de bîne ziman û navê **Feqîr Hisê** li gundê Til Xatûnkê di pey re. ●

Qamişlo, 22.09.2011

Eşîrên Herêma Botan-V: Eşîra Kiçan

M. MUNİR TİMURTAŞ

timurtasmunir@hotmail.com

Eşîra Kiçan çiqilê sêyemîn a ji Eşîra Şilêd e. Eşîra Kiçan di bingeha xwe de ji du bavikan pêk tê:

1-Kiçanê Emeran.

2-Kiçanê Hesenan.

Kiçanê Emeran jî 4 bav in:

1-Malbatî: Bi Mala Şeref û bi Mala Sêvdîn têne naskirin. Yê axatiya Kiçan kirî Birahîmê Qaso bû. Yê niha rihsipiyê Malbatîyan, H. Evdirrehmanê Eshet û çendik dî ne.

2-Şemsan: Rihsipiyê wan Fendî û H. Kamil in ewên ku eslê xwe Garêsî ne.

3-Sofîkan: Rihsipiyê wan Emerê Elî Emeran e.

4-Şatiran: Mezin û rihsipiyê wan Xelîlê Xwestî û Emerê Mehmet Salih in.

Kiçanê Hesinan, ji 12 bavikan pêk tê:

1-Saqîaniyan: Mezinê wan Mala Gurî yê Şemên e.

2-Alîgiran: Mezinê wan Beşdar e. Eslê xwe Besthincî ne.

3-Hesinan.

4-Talîkan: Eslê xwe Hewrexî ne. Mezinê wan Emerê Mihê ye.

5-Gewran: Mezinê wan H. Resul e. Eslê xwe Hewêrî ne.

6-Kudikan: Mezinê wan Rus-tem e.

7-Mala Botî: Mezinê wan H. Evdirrehmanê H. Botî ye. Eslê xwe ji Gundik yê Şirnex Heştyanî ne û mezinê Kiçan ê Hesinan Mala Hacî Botî ne.

8-Mala Şaho: Mezinê wan H. Hesên e.

9-Mala Bênev: Mezinê wan Idrîs e.

10-Mala Nanoşîran: Mezinê wan Mistê ye.

11-Mala Şutû: Mezinê wan Îsa û Seîd in.

12-Mala Pilo: Mezinê wan Tahirê Kup e.

Bi kurtasî, Kiçanê Emeran berê axayê Kiçaniyan e. Ji Kiçanê Emeran jî Mala Sêvdîn û Mala Şeref in. Axayê Kiçanê Hesinan, Mala Hacî Botî ne.

Kiçan eşîrek boş e û koçer in.¹ Teqrîbî, ji 2000 malan pêk tê.

1 Koçer, weke têtê zanîn ew civaka ne d - manî ne. Yanî xaniyê wan nîn in. Havînê diçin zozanan û zivistanê têne deştê. Jiyana wan di konan de ye. Lê mixabin ji ber şert û mercên demê, Eşîra Kiçan jî weke wan eşîrên di mecbûrî rûniştinê bûye û rûniştî ye. Çunkî zozanê wan û hem gemyana wan qedexê bûye. Mixabin çanda koçeriyê giheştîye asta tunebûnê.

Eşîra Kiçan çiqilê
sêyemîn a ji Eşîra Şilêd
e. Eşîra Kiçan di bingeha
xwe de ji du bavikan
pêk tê

Gundê Eşîra Kîçan 17 gund in:

1-Robar: Wêran bûye.

2-Şkeftê Sêvan: Wêran bûye.

3-Seravan: Wêran bûye.

4-Mîrmijdîn: Wêran bûye.

5-Kirêj: Ava ye.

6-Sazan: Wêran bûye.

7-Rûbara Jêrî: Wêran bûye.

8-Salîkan: Wêran bûye.

9-Çemê Teînê: Wêran bûye.

10-Kavilqirê: Wêran bûye.

11-Herbaqa: Ava ye.

12-Cerahiyê: Ev gund ji xwe re kirîne lêbelê niha wêran bûye.

13-Mizgevtûkê: Ev gund ji xwe re kirîne û ava ye.

14-Bazivtê: Ev gund ji xwe re bi hisedarî kirîne û ava ye.

15-Xirabê Kîçan: Wêran bûye.

16-Kaniya Reş: Ev gund ji xwe re bi hisedarî kirîne. Wêran bûye.

17-Xirbezor: Hisedar in. Wêran bûye.

Zozanê Eşîra Kîçan (Kelha Hêtê) di dema Koçî Beg de bûye malê Eşîra Kîçan û heta îro jî zozana wan e. Eşîra Kîçan eşîreke Kurd e û misilman e. Ji bilî Kurdî tu zimanê dî nizanin. Lêbelê di dawî de dema ku dibistan di welêt de hatin avakirin û zarokan dibistan xwendin hînê Tirkî bûn û hînê nivîsandinê bûn û niha jî pîr û kalê wan ji bilî Kurdî tu zimanê dî nizanin.

Exlaqê Eşîra Kîçan: Exlaqê wan ne serhişk in, pisporê bazirganiyê ne. Danûstandina wan bi însanan re rihet e. Ehlê bazirganiyê ne. Debara wan li ser kirîn û firotina pez, dewar, mazot, bazirganiya bi Iraqê re

Exlaqê wan ne serhişk in, pisporê bazirganiyê ne. Danûstandina wan bi însanan re rihet e. Ehlê bazirganiyê ne. Debara wan li ser kirîn û firotina pez, dewar, mazot, bazirganiya bi Iraqê re û ajotina tirêmbêlan e

û ajotina tirêmbêlan e. Wergirtina zilaman, çi cila werdigirin şal û şapik û keffî şelem e. Yê jinan: fîstan û kefiyê spî didin serê xwe, piştikek ne zehf sitûr didin pišta xwe, belê hinek jinên pîr piştikek pehn didin pišta xwe ji bo ihtiyaca xwe wek peran têxin nav piştikê de û tiştin dî jî, exlaqê jinên Kîçan, hez ji paqijiyê dikin bi paqijiya xwe ve navdar in. Jixwe Sîrika wan, yanî sîrika Kîçan gelekî meşhûr e û çêkirina wan a tiştê bi dest çêdikin; weke gore û destikê nimêjê û lepik û çîqê didin dora texta gelekî sipehî û taze ne.

Di nava Eşîra Kîçan de jinwestin û jinrevandin ne weke Eşîra Teya ne û berfirehtir dikarin li mesela binêrin û bi eqelê selîm meseleyan dikarin çareser bikin. Dema xusara yekî ji Eşîra Kîçan çêbe, wek tirêmbêl qulibandin û şewat ji hevdu re gelekî dibin alîkar û her pisebavekî girêdayê bi rihsipiyê xwe ve ye. Ew rihsipî jî girêdayê bi axayê xwe ve ye. Taziyan, serdanan û xêlan bi hev re diçin û bi hev re tên. Xwendayê wan yê dibistana gelek çêbûne, li Tirkîyê, Romanya, Bulgarîstan, Azerbaycan û gelek deverên din jî hene û di hemû çiqilê ilmî de jî hene. Belê xwendayê wan yê

dînî weke melayê medreseyan gelekî hindik in. Ema dîsa jî hez ji însanê oldar dikin.

Wargeha Eşîra Kîçan a xwecihî, yanî sekna wan ji bilî gundan li Cizîra Botan û li Hezexê ne (Îdîl). Sebebê wêranbûna van gundan, siyasî ne, ne aborî ne û netîca şer û cenga 30 (sih) salî ye.

Eceba Eşîra Kîçan navê xwe yê Kîçanî ji çi distîne?

Li gundê Seravê yê ku bi Cizîra Bota ve girêdayî ye, xêlek/dawetek çêdibe. Vêca mîrek ji mîrê Şaxê jî hatiye beşdarê wî xêlî bûye. Di wî xêlî de, mîr jineka gelek delal û sipehî dibîne û mîr dipirsê ev jina he ya kî ye? Hinek dibêjin: Mîrê min ew bûka Mîrzozoyê Seravî ye. Mîr ban dike Mîrzo, Mîrzo hazir dibe û dibêje: Kerem bike mîrê min. Mîr dibêje: Mîrzo! Divê tu îşev bûka xwe ji min re bînî. Mîrzo dibêje: Bi ser serê xwe. Mîrzo vedigerê malê, bang dike herdu kurên xwe û bi xef şewrê xwe dikin û ji hev re dibêjin, emê mîr bikujin. Mîrzo diçe cem mîr û dibêje: Mîrê min! Mala me li derveyî gund e. Êvarî yanî şev keremke were malê. Keyfa mîr gelekî tê. Dibe şev, mîr qesta mala Mîrzo dike. Dema mîr diçe malê, Mîrzo û kurê xwe li mîr tene hev û mîr dikujin.

Vêca cihê Mîrzo û zarokên wî di wî welatî de namîne û di-revin û diçin Mêrdînê, xwe bi Wedwedê? Mêrdîn digirin û li Mêrdînê dimînin. Piştî demekê ku li Mêrdînê dimînin, Mîrzo dinêre ku zilm û neheqîya Wedwedê Mêrdînê ji ya mîrê Şaxê mezintir

2 Wedwede, liqebeke ji bo hakimê ku di dereca xwe de kêmîrî paşa, bes hemû tiştê xwe de weke paşa ye, lê derecekê bin paşê re ye.

e. Wedwede zilmê li Mîrzo û li her kesî dike. Gelê Mêrdînê dibêjin, gelo ma tu kesek nîne vî zilamê bikuje? Rewşa halo dewam dike heta rojekê Mîrzo Seravî difikire û bang dike herdu kurên xwe û biryara kuştina Wedwedê Mêrdînê didin û wî dikujin. Dema Wedwede dikujin tu cihê Mîrzo û zarokên wî li Mêrdînê jî namîne û direvin û diçin Stenbolê. Gelê Mêrdînê dipirsin: Ma kî Wedwede kuşt? Hinek dibêjin: Kê mîrê Şaxê kuştibe wî Wedwede jî kuştîye û gotin Mîrzo Seravî kuştîye. Yekî li wê derê got: “We mîr dîtî ev e çawa Wedwede kuştin! Ji hingê ve navê Mêrdîn bûye Mêrdîn yanî we mîr dîtî”. Yanî Mêrdînê navê xwe ji vê gotinê standîye. Piştî çûna Mîrzo Seravî ya Stenbolê, li wir dimîne û heta niha jî xerêza Mîrzo Seravî li Stenbolê ye. Li gorî kal û pîrê Eşîra Kîçan hê jî xerêza Mîrzo têne sera li welatê xwe didin.

Vêca dema Mîrzo mîrê Şaxê kuştî û çûyî Mêrdînê hingê du jinên Mîrzo hebûn, yek bi hevserê xwe re çû Mêrdînê ya dî çû malbava xwe (Gêrka Mihemê Emo) navê xwe yê nû (Sîlopiya) bes ev hevsera Mîrzo ya çûyî malbava xwe (Girikê) hevsera Mîrzo ya biçûk bûye. Dema çûyî jî hingê kurekî jinikê hebûye bes nedigotin kurik e, digotin keçik e, qet ne tu kes wî nekuje. Çunkî dema bizanibin kurik e mumkin e bikuştîbana. Weha dewam dîkin û dimînin heta ew kurik mezin dibe û mîsela kuştina mîr jî kevin dibe û hevsera Mîrzo ya Kulî (Girikê ye) kurê xwe bi xwe re dibe û diçe Seravê ava dike. Yê derdora wan dibêjin ev kî ne, hatin Seravê avakirin? Dibêjin: Kurê jinika biçûk ya Mîrzo Seravî ye, hatiye gundê xwe ava kiriye.

Qedera Eşîra Kîçan ji qedera her eşîrê Kurd ne cuda ye; geh şerê xwexwetî û geh şerê eşîretên dîtir yê xerîb çêbûne û belavê gelek deran jî bûne weke Sûrî û Iraqê û gelek deverê din

Vêca Eşîra Kîçan navê xwe ji vê derê standîye, yanî gotine kurê jinika kîçik. Piştî, halo zêde bûne û bûne eşîreke berfireh û boş.

Serhatiyeka Eşîra Kîçan

Circîs yekî fileh e li gundê Têrbegayê ye, di tixûbê Surî de ye û nêzî sînorê Tirkîyê ye. Circîs zilamek fileh e û li gorî demê gelekî dewlemend e. Zilamek ji Eşîra Kîçan yê bi navê Reşo feqîr e û rênçberê Circîs e û Reşo gelekî hez ji Circîs dike. Ev Circîs dibe misilman. Piştî demekê dîsanê vedigere filehtiyê. Weke çawa gorî şert û mercê demê tê zanîn yê fileh ji tîrsa, misilman bûye û dema bûye firehî dîsanê vegeyriyaye bûye fileh. Şêxek ji şêxê Cizîra Botan bi vê bûyerê dihese û emr û fermana kuştina Circîs dide. Ew şêx bangî eşîra Kîçan dike û yê ku axa û serokê pisebavan e û dibêje: Herin Circîsê fileh bikujin û hûn roja qiyametê piştîye piştî min in. Ev pêşîvanê Eşîrê dibêjin: Qurban e me çek nînin û navbera Tirkî û Sûrî de xet heye û belkî zehmetî hebe. Şêx dibêje: Ji bo çekan û sînor mereq nekin û herin qereqola gundê Imîrînê ya bi Cizîrê ve girêdayî ye û silavê min ji wan re bêjin û hewe çiqas çek bivê dê bidin hewe û xetê jî dê ji we re vekin.

Axayê eşîra Kîçan û pêşîvanê pisebavê wan bi hevdu diçin qereqola Imîrînê û qeder bivin çeka hildidin û şev diçin û nêzî gundê Circîs ku Tîrbega ye dibin. Dema digihîyin xaniyê ewil ku xaniyê Reşoyê Kîçî ye, Reşo ji xew radîkin û dibêjin: Reşo tu deng neke em hatine Circîs bikujin. Reşo dibêje: Hetan hûn min nekujin hûn Circîs nakujin, Circîs zilamek dewlemend e, sed feqîr û jar nanê wî dixwin û ez bi xwe jî nanê wî dixwim û ez xiyaretê lê nakim. Yê Kîçî devê tivêngê têxe tenîştê Reşo qene Reşo bikuje. Reşo bi xwe jî Kîçî ye û malbatî ye, yek pismamê Reşo yê malbatî berê çeka xwe didê hevalê xwe û dibêje, hûn Reşo bikujin ezê jî hewe hemîyan bikujim. Dema ku nêrîn kuştina Reşo çênabe radîbin hemû bi hev re tifaq dîkin û Reşo girêdidin û wî bi zarokê wî ve tînin Tirkîyê û dîsanê vedigerin û diçin ser gundê Tîrbegayê ve digirin û dibe şer. Circîs bang dike Îsivê min nekujin. (Îsiv kurê Circîs e) mal û serweta min bila hemû ji we re be. Belê ew qebûl nakin. Circîs û kurê wî dikujin û talanê wî jî tînin û têne Tirkîyê.

Li gorî wan, ev karekî pîroz bûye û wan bi vî karî cihê xwe yê cînetê jî kirine cihê eshehiyê de û bi dilekî rihet têne malê. Xwedame ji şerê cihayetê biparêze.

Qedera Eşîra Kîçan ji qedera her eşîrê Kurd ne cuda ye; geh şerê xwexwetî û geh şerê eşîretên dîtir yê xerîb çêbûne û belavê gelek deran jî bûne weke Sûrî û Iraqê û gelek deverê din.³●

3 Di vê nivîsê de me agahiyên xwe tev ji devê rihispi û kalên Eşîra Kîçan standine.

Sedeqe Ehmedê Nadir

Hasan Hüseyin Çevik

Ez bilbil im wextê seher
Tu Xwedanê hewz û kewser
Ey Resûlê enîqemer
Qurban ey Ehmedê Nadir

Ev nûra safî bêhidûd
Li cennetê tu yî Mehmûd
Li meskene xwe yî mewcûd
Meded ya Ehmedê Nadir

Tu Resûlê serbitac î
Tu Ehmed nûra sîrac î
Ew sultanê çû miracî
Sedeqe Ehmedê Nadir

Li Qudsê cewelan dikir
Li erşa nûr beyan dikir
Qabe qewseyn seyran dikir
Sedeqe Ehmedê Nadir

Kişya meskenê Cebraîl
Hebîb l'erşa daye meyl
Resûl erşa maye zelîl
Sedeqe Ehmedê Nadir

Xerîb im ez nezam rehan
Rahê diçe şehînsahan
Rahê meqsûd alî cîhan
Te go ey Ehmedê Nadir

Cebraîl go eya sultan
Heq jibo te da erd û ezman
Bo te çekir cin û însan
Çer nizanî Ehmedê Nadir

L'wira meşxûl ew muzaffer
Daket ref ref bo wî rehber
Kirin tewaf nûra enwer
Sedeq ya Ehmedê Nadir

Ew refrefê sîrrê nihan
Şahê Erebb, Tirk û Îran
Hebîb mewla dibû mêvan
Bû mêvan Ehmedê Nadir

Xweda w fexrê kaînatê
Lîsan vekir ji luxetê
Şahê hezar mucîzatê
Sohbet kir Qadir û Nadir


Çeşmê min xwîn dirijîya
Kan ew gula nav enbiya
Kan Resûlê Haşîmiya
Resûl ew Ehmedê Nadir

Ew aşîqê qelbê 'elîl
Zîkrê lîsan îsmê celîl
Wî qelb nekir zelîl sefil
Ji eşqa Qadir û Nadir

Ew aşîqê qelbê hezîn
Nalan dikir wek Muhyeddîn
Ew canê xwe'd qurban bişîn
Bo xatê Ehmedê Nadir

Li babê te dikim efxan
Diçe sewtam erşê Yezdan
Şuphê bilbil dikim nalan
Ji eşqa Ehmedê Nadir

Huseyn dibêj zulcelal î
Padişahê bêmîsal î
Tu heqqanê bêzewal î
Sedeq ey Sultanê Qadir.



Dotmîra wêjeya Kurdî Mestûre Kurdistanî

RÛKEN ÇALIŞTIRAN

*“Min ew jinem ke le pakî le serûy hemiwan im
Le hemû xêlê jinan da niye kes hawşan im
Le jêr serwênêkem da serêke hêjay tac
Belam le zebrî zeman wa qetîsî dewran im” [1]*

Ev helbest dor 200 sal berê ji aliyê jinek kurd ve hatiye nivîsîn. Gava ku em li helbestê dinihêrin, jinek xwebawer û serbilind derdikeve holê. Haya wê ji qabiliyetên xwe hene û vê rastiye eşkere dike. Ev jina bêhempa tenê ne helbestvan bû. Di heman demê de nivîskar û dîroknivîs jî bû. Heta di Rojhilata Navîn de dîroknava jin a ewilî tê zanîn. Ji ber vî bêguman, wek wê jî gotiye, ew rûsipîtiya dewranê, rûmeta gelê Kurd e. Ev jina behremend Mah Şeref Xanima Kurdistanî ye. Nasnavê wê ye helbestvaniyê Mestûre Kurdistanî ye. Di nav rûpelên wêjeya Kurdî ya klasîk de digel desthilatdariya mêran navê xwe bi pûntoyên girs nivîsiye.

Gava ez bi dû vê jina jêhatî û serketî ketim ez gelekî xemgîn bûm. Mixabin ji xeynî çend lêkolanan di derbarê Mestûre Xanimê de lêkolan hema hema nehatiye kirin. Li gor agahiyên min bi dest xistin, ez dixwazim bi kurtasî behsa jiyan û berhemên Mestûre Xanimê bikim.

Mah Şeref Xanima Kurdistanî di sala 1804ê de li bajarê Sineyê [2] ji dayik bûye. Bavê wê Ebûl Hesên Beg ji malbata Qadirî

bû. Malbata Qadirî li mîrgeha Erdelanê malbatek xuyanî û ronakbîr bû, bi huner, zanîst û dîrokê eleqedar dibûn. Dêya wê ji malbata wezîrên Kurdistanê Sineyê bû. Ango Mestûre Xanim ji malbatek desthilatdar bû. Ev hêman di paşerojê de astengê li ser rêya perwerdehiya wê berteref dike. Mestûre Xanim piştî ku digihêje temenê salên perwerdehiyê bi piştigiriya bavê xwe dest bi xwendinê dike. Lewra di wê dewranê de xwendin ji bo jinan ne tiştekî hêsan bû û ne pêwîst jî bû. Hilawiya Kurdan jî zêde guh nedida xwendina jinan. Lê bavê Mestûre Xanim Ebûl Hesên Beg ji malbatek ronakbîr bû û gorî serdema xwe mirovekî pêşketî bû. Wî gelekî guh daye perwerdekirina keça xwe. Mestûre Xanim çûye koçka parêzgarê Sineyê û bi keçên parêzgar re hatiye perwerdekirin. Li vir hîn



Peykerê
Mestûre
Xanimê

zimanê Erebi û Farisî bûye. Ligel vê, ji salên zaroktiyê pê ve çûye pirtûkxaneya parêzgar û li vir ji Xusro Banî Erdelan ders girtiye. Xusro Banî Erdelan serokê pirtûkxaneya parêzgar bû û zanyarekî wêje û dîrokê bû. Li cem mamosteyê xwe wêjeya Farisî, Erebi û fiqha Îslamî xwendiyê. Mestûre Xanim di vê heyamê de dest bi ceribandina nivîsa helbestan dike.

Bi parêzgarê Erdelanê Xusrew Xan re zewiciye û ketiye nav vê malbata mezin. Ji xêynî mîrtiya wî, Xusrew Xan hunermend û wêjenas jî bûye. Hunerheziya wî ji Mestûre Xanimê re bûye piştgirî. Wan bi hev re jiyaneke geş û xweş domandiyê. Mestûre Xanim di vê heyamê de jî xebatên xwe yên li ser dîrok û helbestan berdewam dike.

Di sala 1834ê de hezkiriyê Mestûre Xanim Xusrew Xan di sih saliya xwe de miriye. Rewşa jiyana Mestûre Xanim bi vê bûyerê ser û binî bûye. Rojên geş qediyane cihê xwe dane rojên reş û tarî. Mestûre Xanim pir bedbext bûye û ketiye valatiyek mezin, berê xwe daye nivîsandinê. Bi saya nivîsa helbestan bêhna wê fireh bûye û dilê wê yê neçar aşt bûye. Helbestên xwe piranî di vê demê de nivîsandine. Ez dixwazim beşek ji helbestek Mestûre Xanimê ku li ser mêrê xwe Xusrew Xan û dilêşîya mirina wî nivîsiye derpêş bikim. Di helbestê wiha dibêje:

Xusrew wehar en, Xusrew wehar en
Kor bam ce dîde fêslê wehar en
Mevsîm cilûs gulzar en
...
Ûmîd we hezret danay bî çûn bû
Pezî nakamît dinya nigûn bû
(Mestûre)! kor bay xeyalet xamen
Xesrewt destan we bend û damen [3] [4]

Bêguman hûn jî dibînin ku mirina Xusrew Xan bandorek wêranker li ser Mestûre Xanimê kiriye û bûye mijara helbesta wê.

Mestûre piraniya helbestên xwe bi Kurdiya zaraveyê Goranî nivîsandine. Bi zimanê Farisî û zaraveyê Soranî jî helbestên wê hene. Li gor Mîrza Elî Ekber dîwana Mestûre ji bîst hezar helbestan pêk hatiye. Lê ji van helbestan qasî du hezarî dest ketiye. Di sala 1887ê de helbestên Mestûre Xanimê yên Farisî bi navê "Dîwan-ı Mahşeref Hanım Kurdistanî" ji aliyê Yahya Marîfet ve tene çapkirin.

Mestûre piraniya helbestên xwe bi Kurdiya zaraveyê Goranî nivîsandine. Bi zimanê Farisî û zaraveyê Soranî jî helbestên wê hene. Li gor Mîrza Elî Ekber dîwana Mestûre ji bîst hezar helbestan pêk hatiye.

Mîrza Elî Ekber li ser Dîwana Mestûre Xanimê wiha dibêje: "Ew di zanist, huner, xweşnivîsî, vehûnandin û helbestkariyê de bêhempa ye. Wê, nêzikî bîst hezar helbest vehûnandine ku yek ji ya din xweştir û keşîntir e."

Feqî Huseyn Sağniç der barê helbestên Mestûre Xanimê de wiha dibêje: "Helbestên Mestûre Xanimê bêhempa ne. Ger mirov helbestên wê bide ber helbestên helbestkarên serkeftî û berz ên Kurd ên wekî Mîrza Şerîfî, Xana û Elmas Xanê û wan miqayîse bike bêguman heke helbestên Mestûreyê ji yên wan berztir, şîrîntir, xweştir û keşîntir nebe ji wan kêmtir jî nîn e."

Mestûre Xanimê peyitandiyê ku helbestvan û zanyarên di nav klasîkên Kurdî de tên zanîn, ne tenê mêr in, di heman demê de yê jin jî di navbera wan de hene û derfet di destê wan de hebe ew ê jî wekî helbestvan û zanyarên din ên mêr serfiraz bibin.

Mestûre Xanimê di heman demê de dest bi nivîsandina dîroka binemala Erdelanê jî kiriye. Dîroka mîrgeha Erdelan li dor hezar salî dom kiriye. Ji ber vê nivîsandina wê ne tişteki hêsan bû û xebatek hûrgilî dixwest. Mestûre Xanim ji mêj ve gelek pirtûkên li ser dîrokê xwendibûn. Gelek agahî û serpehatî ji bavê xwe, ji mamostê xwe û ji Xusrew Xan bihîstibûn. Beriya ku dest bi nivîsa dîroka binemala Erdelanê bike demeke dirêj lêkolînên girîng kirine û gelek agahî berhev kirine. Piştî vê xebata dijwar berhemek hêja derdikeve holê. Ev berhem, agahiyên ji damezirandinê heta hilweşandina mîrgeha Erdelanê yê dîrokî vedihewîne û bi zimanê Farisî hatiye nivîsîn.

Ev berhema wê ya dîrokî, piştî damezirandina Komara Kurdistan a Mehabadê, di sala 1920î de li Sineyê ji aliyê zanyarê Kurd Nasir Azadpûr ve bi navê "Dîroka Ardêlan" tê çapkirin. Nasir Azadpûr, di pêşgotina pirtûkê de wiha dinivîse: "Peydabûna jineke wisan xwendî di civaka misilmanî de, tişteke ku nayê bawer kirin."

Mestûre Xanim ji malbatek ronakbîr û hunerhêz dihat, lê ev nayê vê wateyê ku Mestûre Xanim hew saya van derfetan pêş ketiye û bûye Mestûre Kurdistanî, lewre gelek jinên torin ên mîna wê xwe li vî karî ranekişandiyê.

Ev berhem di dîroka Erdelanê çavkaniyek serekî ye û di dîroka cîhanê de cihekî gelek girîng diyarî Mestûre Xanimê dike. Di Rojhilata Navîn de dibe dîroknasa jin a ewilî. Mestûre Xanim bi vê taybetmendiye bala zanyarên biyanî jî dikişîne. Dîroknasa Rûs Yêvgêniya Vasîlêva ku pêncî sal e li ser dîroka Kurdan nemaze li ser dîroka Kurdên rojhilatê lêkolîn dike, pirtûka wê ya “Dîroka Ardêlan” werdigerîne zimanê Rûsî û di sala 1990î de li ser Mestûre Xanim bi navê “Max Şeref-Xanim Kurdistanî” pirtûkekê dinivîse û li Moskovê çap dike. Vasîlêva di pêşgotina pirtûkê de diyar dike ku di dîroknivîsa wê de bi qasî jîrahiya wê statûya wê ya civakî jî rolek girîng lîstiyê û Mestûre bi tenê ne di serdema xwe de di nav portreyên dîroka Kurdistanê yê jin de jî kesek rengîn û terwende ye.

Ji xêynî herdu berhemên wê ku me li jor behsa wan kir, berhemeke wê ya din jî heye. Li gor agahiyan, ev berhem li ser rêz û rêçikên îslamê ye. Bi zimanê Farisî hatiyê nivîsîn. Nivîskar Azad Zal ji bo vê berhemê wiha dibêje: “Kîjan jin e ku wê hêzê di xwe de bibîne, li ser olê kûr bibe û di ola îslamê de şerhê bike, ji ber vê cihê xwe di nava alim û rîzanên îslamê de bi jinanî bigire...”

Ji mirina Xusrew Xan sê sal piştê di 1847ê de desthilatdariya mîrgehê dikeve destê Xusrew Xan Gurcî. Bi vê bûyerê rewşa Erdelanê diguhere, êdî li Sineyê cih ji Mestûre Xanim ê re namîne. Mestûre teva hin kesên ji endamên malbata Banî Erdelan koçber bûye û çûye mîrgeha Baban bajarê Silemaniyê û heta dawiya temenê xwe li vir jiyaye. Ev hunermenda nemir di çil û sê saliya xwe de di 1847an de çûye ser heqîya xwe.

Mestûre Xanim ji malbatek ronakbîr û hunerhêz dihat û bûye bûka parêzgarê Erdelanê, lê ev nayê vê wateyê ku Mestûre Xanim hew saya van derfetan pêş ketiye û bûye Mestûre Kurdistanî, lewre gelek jinên torin ên mîna wê xwe li vî karî ranekişandiyê. Afîrînerî, jîrayî û hêrsa fêrbûnê jî di serfirazbûna wê de bandoreke girîng kiriye. Mestûre bi dîroknasên navdar ên li ser mîrgeha Erdelanê berhem afirandiyê yê wekî Muhammet Şerif Qazî, Xusref Îbnî Muhammed, Mîrza Alî Ekber re tê nasîn. Helbestvanê mîna Nalî di bin bandora wê de maye. Navê wê di çavkaniyên biyanî de tevî şeş dîroknasên Kurd ên ku li ser eşîrên Kurdan lêkolîn kirine yê mîna Şerefxanê Bedlîsî tê bibîranîn.

Evê jina piralî û nixdar sê berhemên hêja li dewsa xwe hiştine. Di nav rûpelên wêjeya Kurdî de navê xwe bi pûntoyên girs ên zêrîn nivîsandiyê û bûye dotmîra wêjeya Kurdî.

Wek Tosinê Reşîd jî dibêje, serê wê hêjayî tacê bû. ●

05/10/2011

TÊBÎNÎ:

[1] Mah Şeref xanima Kurdistanî

[2] Carina Sinedij an jî Senendec bajarekî li rojhilatê Kurdistanê ye.

[3] Ev helbest ji pirtûka Dîroka Wêjeya Kurdî ya Feqî Huseyn

Sağniç hatiyê wergirtin.

[4] Wate: “Ey Xusrew! Ya Xweda bila çavên min kor bin ku tu ne li vir î, va werz û demsalê biharê ye û çaxê vebûna gul û geşbûna gulzarane.

...

Hêviya min ji Xwedavê mezin

ew e ku dînya têk biçê ji ber vê nakamî û bêhêvîtiyê. Ey (Mestûre)! bila tu kor bibi, xeyala te xave û Xusrewê te niha di gorê de hatiyê bend û asteng kirin.”

Ev wateya helbestê ji pirtûka *Dîroka Wêjeya Kurdî* ya Feqî Huseyn Sağniç hatiyê wergirtin.

ÇAVKANI:

Adak, Abdurrahman, *Erdelanî Kadîm Bir Saray Şairi: Mestûre Mahşeref Hanım*, Uluslararası Kürt Kadîni Kongresi Bildirileri, Hakkari Üniversitesi Yay. Hakkari 2011.

Rahmi Yağmur /Mamed Musta-

fayev, Kürt Tarih Yazarlığı ve Erdelan Okulu www. gelawej.net, 31 Agustos 2011

Sağniç, Feqî Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Stenbol, 1992

Tosinê Reşîd, Mestûre, Amed, 2010.

Zekî Beg, M. Emin, *Kürt ve Kurdistan Ünlüleri*, Sweden, 1998

Zekî Beg, Mehemed Emîn, *Kürtiyek ji Mêjûwa Kurd û Kurdistan Ji Destpêkirina Mêjûwê Tanî ve Rojê*, Werger: Dr. M. S. Cuma.

Xezala miyandaran

Ömer Faruk Çetinkaplan

Ceylan ÖNKOL re

Dewi da xwu di
Daristanî miyandi
Kavirekan vero
Ceylan
.....

Ceylan
Çimxezala mayka xwu
'Efara pêr dê xwu
Ceylan
Şênaiya wak û biraran
Ceylan
Şiwaneka kavirekan
Ceylan
Bê ham û bê tam
.....

Kavirekan vero
Vilikan miyandi
Erd û azmîn şahîd
Ceylan
Bê ham û bê tam
.....

Destê şewray
Erd û azmîn aya
Zalimî kor
Ceylan
Bê ham û bê tam
.....

Destşikyayey
Awa siya çim kewtey
Bê nengû mendey
Ceylan
Bê ham û bê tam
.....

Şimarê merg dekwo kerre
Bê wihêr 'erdo mendey
Destşikyayey
Tofan şimarê
Well şimarê
Xeyr nêvinê xwura
Pergelê şima vila bo
Zewtê mayan şimarê
Axîna Ceylan şimarê
Cehennem şimarê
Xezebê Ellay şimarê

Weyl şimarê

19 Kasım 2010

berdin bila tarî be

Muhammed Karaboğa

li ser qetliama Qilêbanê

komar bixwazin tarî ronî dibin
li ronahiya komarê ocax dibihurin

tarî ronahî bû
bibika çavên qantiran mezin û mezin bûn
hejmara çavên wan zêde bûn
çavên mirovan ji hevûdu xatir dixwest
çav û laş ji hev derbaz bûn
bêje bi heznî

li vir Pablo Picasso bi bîr bînin-Guernica
komar bixwazin tarî ronî dibin
li ronahiya komarê ocax dibihurin

navê wan "qaçaxçî" bû
bi xizani ji sînora derbaz dibûn
xizani ji sînora derbaz dikirin
navê wan "qaçaxçî" bû
hezar car jî "qaçaxçî" tî bi kar bianîna
jiyana wan tu car nediguherî
cara dawî cuda
evê jî wan nedît

çend sal ewil gule, lê iro bombe
çend sal ewil sî û sê, iro yek jî serde
kirîvo neweşandin, dibêjin nenivîsin
komar bixwazin tarî ronî dibin
di ronahiya komarê de weşan kor dibin
kirîvo bixwazin nexwazin li vir Ahmed Arif
bîr tê

komar bixwazin tarî ronî dibin
li ronahiya komarê ocax dibihurin
ne hewce ye
berdin bila tarî be

Helbesta Osman Sebrî (1905-1993)

TEKÎN ÇÎFÇÎ

Osman Sebrî tenê kesek e. Bi xebat û tevgera xwe, bi berhemên ku li pey xwe hişt wek lehengekî tê pejirandin. Gel, mirovên ne leheng nake leheng. Heger teraziya dîrokê gel e, teraziya gel jî ji zêr e. Gel bi wê teraziya zêrîn, lehengên xwe bi xwe dibijêre û wan di bîr û baweriya xwe de tomar dike û bi demê re xebat û bizava wan lehengan jê re dibe dîrok.¹

Bi baweriya min jî Osman Sebrî yek ji lehengên sereke yê gelê Kurd e. Carna bi çeka xwe, lê pirî caran bi peyv û pênuşa xwe şoreşgerekî qirase ye. Li ser rêya ku Şêx Seîd vekiribû meşiya ye, heya dawiya umrê xwe. Di bîranînên xwe de serpêhatiyên xwe yek bi yek weke hebên tizbiyekê li ber me rêz dike. Herdu apên wî di doza şoreşa Şêx Seîd de hatibûn daliqandin. Bi xwe jî, ji ber temenê xwe yê piçûk ji sêdarê xelas bibû, lê

ji girtin û zindan û mişextiyê bêpar nemabû.²

Apo Osman, her dem bûye bela serê serdestan. Ji 1926ê heya 1971ê, 18 caran hatiye girtin. Bi salan li zindanên cihê raza ye. Her wiha Apo bi mişextiyên xwe navdar e. Li Sûrî, Libnan, Iraq, Tirkîyê mişext maye. Ya herî balkêş jî mişextiya wî ya li Medegeskera navdar ya li Efrîqayê ye. Nêzîkî salekê li wir dimîne.³ Lê em ji jiyana wî têdighên ku ew tu caran ji doza xwe ya di rêya azadiyê de, bi gavekê be jî, paşve neçûye. Bi biryar e: "Heger ez mirim û min Kurdistan nedît, li ser laşê min gurzên gulan daneynin" dibêje.⁴

Osman Sebrî digel hemû êş û azaran heya ku li darê dinê bûye, pênuşa xwe ji nav pêçiyên xwe dernexistiye. Di helbestên xwe de tevî teşe û şewaza klasîk




1 Reş, Konê, "Panoramayek di Deryaya Lehengekî ji Lehengên Gelê Kurd de Wek Nimûne Têkoşer û Toreva: Osman Sebrî", Vesta, payîz 2003/hejmar 1.r. 89

2 H.b.r. 90

3 Kurdo, Prof. Qanatê, *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, Weşanên Öz-Ge, Ankara 1992, r. 166.

4 Bereh, Berken "Têkoşer û Xemxûreki Gelê Kurd: Osman Sebrî", Vesta payîz, 2003/hejmar 1.r. 93



deriyê helbesta nûjen vekir. Em dikarin bibêjin ku ji aliyê şewaza û teşeya nûjeniyê Osman Sebrî, digel Qedrîcan pêşengên vê cûreyê helbestê ne. Piranî bi heft û heştbangî nivîsandin. Carina bi dubeytî jî helbestên xwe ristine. Her çiqas teşe klasîk be jî naverok nûjen e. Eşqa wî ya ji bo welêt di her berhema wî de xwe dide der. Bi taybetî di helbestên wî de:

*Jiyîn xweş e bi xurtî
Li Kurdistan bi Kurdan
Bav û biran çi bikim
Hemû min tê bi derdan*

Osman Sebrî gelek hişyar, zana, dûrbîn û hunermand bû. Tim û tim dixwest ku Kurd nakokiyên nava xwe ji holê rakin. Ji çareserîya vê pirsgerêkê jî, wekî gelek rewşenbîrên Kurd yê din, xwendin didît:

*Derba li me tu zanî
Rim nîne giş nezanî
Xopan kirin Kurdanî
Ev tiral û nezanan*

Osman Sebrî piştî 1929ê ku bi alîkariya dozgerê Kurd, ji nav lepê dewletê difilite, berê xwe dide binê xetê (Sûrî). Li wir ji aliyekî ve di nava xebatên Xoybûnê de roleke girîng hildide ser milên xwe, ji aliyê din ve jî bi alîkariya Celadet Elî Bedirxan hîmî elîfbêya latînî dibe. Xwendin û nivîsandina Kurdî pêş dixê. Ji nivîskarên klasîk yê wekî Xanî, Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî haydar dibe. Berhemên wan dixwîne. Li gor wî her xebata ku bê kirin divê aranceke wê ya sereke

hebe. Di pêşgotina pirtûka xwe ya bi navê Apo de weha dibêje: "Helbest û çîrok tenê bi rê û rêbazên hişyarbûn û berxwedanê dikare pêşengiya gelê xwe bike û wan ji bo têkoşînê rake ser piyan." Hema bêje hemû helbestên wî di xizmeta vê armancê de ne. Ji bo îspata vê gotinê, tenê çend mînakên em li vir bidin:

*Xortê çak rabe zû me divê dilşadî,
Serxwebûn, aşî, serbestî, azadî
Van tiştan her divê pir xebat, west û xweîn (xwîn)
Berî me sed hezar, sed hezar tê da çûn⁵*

*Dipirsî îro ji min halê welat,
Dê bêjim jê diçin sed agir û pêt,
Çi çiya, deşt û newal, rêl û zîmag,
Çi bajar, gund û kelat avahî pag,
Bi girîn, kezeb ji min anîne xar.⁶*

Ew helwesta Osman Sebrî ya Kurdîhez, di hejmarên Hawarê, Ronahî û Roja Nû de aşkere xuya dibe. Jixwe Osman Sebrî yek nivîskarên sereke yê van kovaran e. Çîrokên Osman Sebrî yê bi navê Şeytanqûnî ku ji çîrokên gelê Kurd hatine çapkirin.⁷ Hin caran rexneyên xwe yê di derheqê nivîsên ku Hawarê de çap dibin (Hin nivîsan qels, ji wêje û armanca Kurdewarîyê dûr dibîne) jî dîsa bi zîmanekî edebî bi xwendevanan re parve dike⁸.

Li gor Osman Sebrî, têkoşîna mezin divê ji bo zîman bê dayîn. Ew têkoşîn divê hem bi rêya nivîsê, hem jî bi rêya çekdarî divê bê dayîn. Ji bo vê jî, bi helbestan, gelek caran ji hesinekî jengarî şûrekî bêhempa çêdike. Bi ser de dixwaze ku ew hesin jî qet li ber xwe nekeve. Ji ber ku bi dilê xweş û bi rûniştinê tu tişt ava nabe. Bi gotinên xwe hesinê jengarî jî qanîh dike. Dibêje ji bo ku neyar were rayê, ne rehm û tebatî, şer û pevçûn divê.

Dema ku tê salên 1950yî di hin mijaran de bi rêzimana ku Celadet amade kiribû qayîl nabe, Rêzimana Kurdî amade dike.

Li gor Cegerxwîn, Osman Sebrî ji bo hevaltîyê, ji bo dostaniyê serê xwe dida. Lê Xwedê neke,

5 Bali, Abuzer, *Dîwana Osman Sebrî, Weşanên Pêrî, Stenbol, 2004* (ji marşa aşîyê)

6 H.br (ji helbesta bi navê Halê Welat)

7 Sebrî, Osman, *Li Goristana Amedê, Weşanên Lis, Amed, 2010*

8 B.n. "Gazînd û Gîlî", *Hawar*, hejmar 14/1932

ku carekê bixeyidiya jî her tişt dikir. Rojekê dosyeyekê di destê Osman Sebrî de dibîne, jê dipirse bê ka ew çî ye? Osman Sebrî jî dibêje ku di derheqê hevalên wî de hin agahî ne û wî ew dane wezîrê karê hundir yê Sûrî jî. Cegerxwîn ji dest wî digire û dişewitîne. “Şerm e” dibêje.⁹ Wer xuya ye ku Osman Sebrî bi piranî ji ber ramanên xwe ji aliyekî bi serdestan re, ji aliyê din ve jî bi rewşenbîr û siyasetmedarên wê demê re şer kiriye. Digel wisa ye jî, di helbest û berhemen xwe de her qala yekîtiya Kurdan kiriye. Ev rê tenê xwendin û jîholêrakirina nezaniyê nîn e. Helbet di vê rê de kuştin û mirin jî heye. Di helbesta bi navê “Wefda Kurdî” de weha diqêre:

.....

*Rawe kirin rêya serbestî, azadî,
Ku bê kuştin û mirin
Kes nagehê warê rûmet û şadî.¹⁰*

Sebrî pêda diçe vê ramana xwe digihîne Xanî, dibêje ku, beriya vê bi çar sed salî Xanî rêya felatê ji gernasên niha çêtir dizanî. Xanî jî gotiye ku bêyî ceng û têkoşîn û sergermî welat nayê standin.

Li gor Osman Sebrî, hêviya gelê Kurd xort in, lê divê xort bi merdî serî hildin, Welat ji bo xelasiyê li benda wan e. Êdî raketin nabe. Niha xelasi tenê bi şer dibe. Ev şîretek e:

.....

*Ji min bibhîse şîreta biran
Te nîn in derman, bê tîfing û şûr¹¹*

Osman Sebrî ji tevgerên dinyayê jî haydar e. Enternasyonalîst e. Ji bo dinyayeke azad û wekhev, bang li keç û xortên dinyayê dike ku li hember NATOyê tevbigerin. Digel ku kesekî bawermend e jî, ji bo dinyayeke bi dad û wekhev dixwaze ku xwe bigihîne xortên şoreşger û komunîst. Lê hikûmata Sûrî û Fransizên ku wê demê Sûrî dagir kirine rê nadin Apê Osman:

*Nahêlin ku bêm Werşew,
Wa ye destê min
Ji dûr ve bigrin biguvêşin bi şadî
Sonda me digel hev,
Ji bo cîhan xebat, her aştî azadî¹²*

**Li gor Osman Sebrî, hêviya gelê Kurd
xort in, lê divê xort bi merdî serî hildin,
Welat ji bo xelasiyê li benda wan e.
Êdî raketin nabe. Niha xelasi tenê
bi şer dibe.**

Em dizanin ku Osman Sebrî ji parçebûna welat pir diêşiya. Neyarê xwe dinasîn. Lê ji bo xelaskirina welat qada şer ji hev venediqetandin. Lîngekî wî li Tirkîyê, yê din li Sûrî (binxetê) bû. Geh li Başûr li ba Mele Mistefa bûye, geh li Libnanê. Xem û xeyala wî her azadî bûye. Wek ku me li jor jî diyar kiribû, heya xelaskirina welatê vêsîn heram e, li gor wî. Ji êş û azara ku Kurdên li bakur dikişînin sê kesan gunehbar dike Osman Sebrî. Ku wan her sêyan di nava salekê de gelek Kurd dane kuştin. “Kemal û Îsmet û Bayar, sê hezar mêrxas birine dar” dibêje. Paşê serhildan û têkçûn û tevkujiyên Kurdan yek bi yek dinivîse Osman Sebrî.¹³

Dîsa vedigere ser yekitiya Kurdan û gazî pêşengên Kurdan dike. Divê her kes di rêyekê de neçe û li dijî hevalê xwe şer û fesadî û gelaciyan neke. Dem dema yekitiyê ye:

*Rewşa gelê Kurd divê em îro wek bira bin,
Heya bikarin di şeva Kurd da çira bin.
Ji têkoşerê çil salî re “xain” nayê gotin
Dema bê gotin zor fihêt e, rastî bê sotin.¹⁴*

Aliyekî Osman Sebrî yê balkêş jî, rêbaza vegotinê û guherbariya di helbesta wî de ye. Wekî ku me li jor gelek mînak dan, ji aliyê wate û armanca nivîsandina helbestê ve gelek dişibin hev. Lê ji aliyê şêwe ve gelekî rengîn e. Wek mînak di dîwana wî de 12 fablên ku bi teşeya helbestkî nivîsandî hene. Li gor xwezaya fablan (helbestên li ser lawiran ango yên ku bi devê lawiran hatine gotin) her helbestek çîrokek e, xwediyê şîretekê ye. Hinek ji wana em dizanin ku gelek kevn in. Di hinekan de hin guherandin hene. Hinek jî meriv dibê qey bi destê Osman Sebrî hatine çêkirin.

Bi van helbestên ku di bin navê “Dengê Lawiran” de hatine nivîsandin, mirov dikare bibêje ku Apo Osman zarokên Kurdan jî ji bîr nekirine. Ji vî aliyê xwe ve Osman Sebrî ne tenê helbest-

9 Cegerxwîn, *Hayat Hikayem*, Evresel Basım Yayın, İstanbul 2003, r. 210-211

10 Balî, 2003, r.90

11 Ev helbest di sala 1956an de di pirtûka “Bahoz” de çap bûye.

12 Balî, 2003, r. 94

13 H.b.r. 100

14 H.b.r. 39

vanek e, her weha mamosteyek e jî. Em ji nivîsa Konê Reş ya hêja hîn dibin ku Apo Osman Sebrî di hemû jiyana xwe de, bi taybetî ji 1950î heya mirina xwe, mala xwe qelibandiye dibistanekê û zarok û xortên Kurdan li wê derê fêrî xwendin û nivîsandina Kurdî (bi tîpên latînî) kirine.¹⁵

Dîwana wî ji aliyê bêjeyan ve dîwaneke gelekî dewlemend e. Ji her herêmê bêje hene. Hinek ji wana îro kêm tîne bikaranîn. Em dibînin ku di rastnivîsê de alîgirê sivikbûna ziman e. Peyv çawa ji devê mirov dertê divê weha bê nivîsîn. Wek mînak, nabêje "bigirin", dibêje "bigrin". Nabêje "bibihîsin", dibêje "bibhîsin". Serdestiya tu devokan nîn e. Ew yek ji bo yekitiya Kurmanciyeke hevpar nebe nabe ye.

Gelek nivîskarên Kurd bi taybetî jî yên li Sûrî rêya xwe bi mala Osman Sebrî xistine. Dîlawerê Zengî, A. Balî, Konê Reş tenê çend heb ji wan in. Her xwendekarê ku Osman Sebrî xwendiyê teqez aqilek jê girtiye.

O. Sebrî pirrî caran metelokên gelêrî ji zargotinê werdigire, di nava hişê xwe de dimeyîne paşê wana di nava helbestên xwe de bi kar tîne. Nahêle ku xwendekar bi wateya wan metelok û bivêj û gotinên pêşyan bileyizin. Her tişt di cih de ye. Ew baş dizane ku her gotineke pêşyan, her metelokekê serpêhatiyê wê di nava kelepura Kurdî de heye. Helbestvan dema ku van amûran bi kar tîne, çîrok û serpêhatiya wê peyvê ji xwendekaran re dihêle.

Osman Sebrî carna xwe ranagire him biwêjê, him jî çîroka biwêjê li xwe bar dike û tîne dixê nava helbestê. Heke li helbesta bi navê **Kûçikê Bekiran** binihêrin, emê vê rastiyê bibînin:

Îro hate bîra min yek meselokên han

Li nik me dihate gotin, wekî kûçikê Bekiran

Paşê ji helbestê em têdigihên ku, li nav gundê Bekiran kûçikekî nandoz hebûye, her li têrkirina zikê xwe digeriya. Kûçik hay bûye ku li şahî û dawetan goşt û xwarin gelek e. Vêca her ku dengê def û zirneyan dibihîst, diket wê şopê û diçû. Heya gundî pê dihesin ku vaye kûçikê şivanan jî didine pey wî. Xortên gund ji bo ku ji vî kûçikê nandoz xelas bibin, planekê çêdikin û bi vî hawî ji wî kûçikê nandoz xelas dibin. Paşê ew mesele

di nava gel de bû metelok ku ji bo kesên keysebaz û bêkêr tê gotin. Paşê Osman Sebrî vê meselê tîne bi pirsgirêkek xwe ya şexsî ve girêdide:

Hene celebek mirov, olek wan nîne.

Ew rûmetê nizanin, ziktêr in, çavbirçî ne.

Di me rabin camêr, wekî xortên ber Ferêt,

Doliwekê çar bikin, bo nandozên pîs û şêt

Heyder Omer dibêje: "Ew yeka wî dixê dava (tor) axaftineke yekser, ku akama wê li ser hunerî û ciwaniya helbestê zor neyînî ye, ji ber ku ji he-yama helbestê bi dûr dikeve, û nêzikî çîrokbêjiya folklorî dibe."¹⁶

Di vir de em dikarin bibêjin ku ya Osman Sebrî nikaribûye wan metelok û çîrokan bi awayekî hunerî bi kar bîne û wateyeke nû lê bar bike lew-ma çîrok tev nivîsandiyê, an jî wî bi zanetî her tişt gotiyê, da ku Kurd ji zargotina xwe û paşxaneya metelokan haydar bibin. Dibe ku ew risteya Osman Sebrî vê nêrîna me ronî bike: "*Şîr û çîrok heke bi awayê rênasî bîn nivîsîn, dikarin rûmeta têkoşîn û gelparêziyê di peyayên xurt û hêja de vejînin.*"¹⁷

Ku ne ji wan gumanan yek be, mirov bi rehetî dikare bibêje ku mirov çîrokê tev bavêje jî tiştêk ji helbestê kêma nabe.

Di vir de şêweyeke Osman Sebrî ya **bîrî** heye, ne **afirînî** ye.

Yanî Osman Sebrî ji bîra xwe ya ku bi xwendin, guhdarkirin, ceribandin û serpêhatiyên dewlemend dagirtiye, berhev dike, li bin guhê hev dixê û hinekî jê derdixê dide ber xwendevanan.

Di şêweya afirînêr de, her tişt ji derûniya helbestvan tê. Helbestvan bi hin hestan, hin bûyeran haydar dibe, bi wan re mijûl dibe, paşê wana radi-ke asta hunerekê û helbestekê ava dike.

Şêweya **bîrî**, her tim di xetereya dubarekirinê de ye. Axaftvan (helbestvan) tiştên ku berê hinekê din gotibûne tîne zimên û wêneya xwe ji ber yên berê digire. Gelek caran dubarekirin, xwendevanan ji helbestê sar dike. Xwe di nava helbestê de nabîne. Helbesta ku xwendekar tiştêkî ji derûniya xwe tê de nebîne, wêneyekî sar û bê wateye.

Bi rastî peyvên Osman Sebrî di nava sînorên teng de dimînin. Hema bêje her peyv di wateya

16 Omer Heyder, *Osman Sebrî, Helbestvan û Nivîsevan*, Weş. SemaKurd, Silêmanî, 2006.

17 Balî A. *Dîwana Osman Sebrî*, Weşanên Pêrî, 2003, r. 19

xwe ya yekemîn de dimîne. Ji sînorên ferhengî dernakevin. Wek “kezeb, can, azadî, mirin, şûr, welat, doz, gel....” li gor ramana Osman Sebrî tenê zimanekî sivik û aşkere dikare alîkariya hişyarbûna gel bike. Lewma jî divê her tişt bi zimanekî ku her kes (zarok jî di nav de) dikare bigihê bê nivîsandin. Tenê ev dikare bibe alîkarê azadiya gel. Lewma jî Osman carna dadikeve binê hişmendiya gel, tiştê gel dizane careke din ji wan re dibêje. Armanca gotina xwe jî bi dawiya helbestê ve girêdide.

Pirî caran helbestên Osman Sebrî, li ser jiyana gundiyan e. Lewma bi zimanê gundiyan diaxive, xem û xeyala wî hişyarkirina gundiyan e. Pirî caran bîr dike ku helbest ne tenê ji bo şoreşê, carna ji bo xweşikiyê jî têne nivîsandin. Tew carna tenê ji biderkirina kulekê, ji bo rijandina êşa nava mirov jî têne nivîsandin.

Xeta ku Osman Sebrî vekiribû, ji bo helbestvanên Binxetê heya salên heştêyî yekane rê bû. Helbestên xwe tekser bi xemên neteweyî û civakî dinivîsandin. Her yek ji wana bibû şîretker û fêrkerek.¹⁸ Li gor wan nivîskaran, divê berê netewe xelas bibe. Paşê wê helbet dor bê ser meseleyên civakî. Lewma jî gelek helbestên Osman Sebrî mînakên baş in. Di helbesta bi navê **Lawê Gel** de weha dibêje:

*lawê gelê min, bes tu maye qels û nivistî
Di warê xebat, ji bo welat gelekî sist î*

.....

Di warê rûmet kînga derkevî pêşî¹⁹


Di helbesta Osman Sebrî de gelek caran şopa helbestvanên klasîk yên wekî Xanî, Cizîrî tîn dîtin. Peyvên nas li ber çavên me dikevin. Ev mînaka jêrîn yek wan mînakan e:

Lêv yaqut, didan mirar²⁰

O. Sebrî di helbestên xwe de kînayeyê bi kar tîne. Çend mînak jê weha ne: Nekir zarezar, serî di ber, rûmet kete ber lîngan, rojên tarî...

Mebesta vîn gotinên jor ne wateyên zimanwanî ne, ewana ji bo armancên din hatine gotin. Ango helbestvan, bêjeyekê ji bo bêjeyeke din bi kar tîne.

Awaza helbesta Osman Sebrî di parastina **kêşê**



*Bergê
kitêbeke Os-
man Sebrî ku
ji Weşanên
Lîsê hatiye
weşandin*

(wezin) û **rêzbendê**(qafiye) de diyar e, û piraniya helbestên wî li gorî rista movikên dengdêr saz bûne. Gelek caran Cegerxwîn dixin bîra mirov. Her rêzikekê heft movikên (hece -kîte) wê hene. Ev helbesta jêrîn mînakek e:

Min-dîl-tu-car/ne -na-lî

4/3

Min-zar-tu-car/ne-ka-lî

4/3

Bi-dil-hiş-kî/ bi-la-lî

4/3

Sîn-ga- xwe-da / ber-ri-man

4/3

Ev cûreyê kêşê ji zargotina Kurdan hatiye wer-girtin, jê re tê gotin kêşa 7 (4+3) berge, ku ew jî kêşa dîlana Kurdan e. Pêşî çar berge, di dûv de kurtevehesek û paşê sê berge hene.²¹

Helbet hemû helbest ne li ser vê terzê hatine nivîsîn. Yên serbest jî hene. Li gor armanc û nave-roka helbestê şêwe jî diguhere. Osman Sebrî ji serî heya binê gelek ceribandî kirine.

Weke encam

Di vê xebatê de armanca me ev bû ku em di çarçoveya helbestên Osman Sebrî (1905/1993) geryanekê li nav jiyana, armanc, xebat û ramanên

18 Omer, 2006

19 Balî Abuzer, *Dîwana Osman Sebrî*, r.145

20 H.b.r.74

21 Omer, 2006

Pesna Yaran

Zilkîf Xweshêvî

Ji bo Hayrullah Acar

Min bihist tu, helbestên sewdaseriyê werdigerîni, seriyan pê digerîni, meke
Xunçeyên evîne dipişkivîni, perdeyên mehremiyetê didirrinî, meke
Dilê aşiqan zeviya wesweseyan e, tu fitneyê li zeviyan direşîni, meke
Ey berdevkê Mewlanayê mezin, bi Kurdî be jî serxweşkirin heram e, meke

Osman Sebrî (bi gotina Rewşen Xanim a jina Celadet Elî Bedirxan, Apo) bikin. Her weha helbestên Osman Sebrî ji aliyê teşe û şeweyê ve binasin. Heya ji me hat me xwest ku em bi berfirehî li ser helbestan bisekinin. Lê ji bo ku zêde cih negire, me zêde cih neda helbestan. Lê bi jêrenotan em dikarin bi rehetî bigihêjin tevahiya helbestên navborî.

Bi gelemperî em di helbesta Osman Sebrî de herikbariyek xweş dibînin. Digel hemû rexneyan em dikarin bi dilekî hênîk bibêjin ku Osman Sebrî, li gel şert û mercên wê demê, tevî Qedrîcan û Cegerxwîn, di helbesta Kurdî ya nûjen de (ji bo zaravayê Kurmancî) deriyên nû

vekirine. Bi naveroka helbestên xwe, ji bo her xortekî Kurd, hestên welatperweriyê ji nû ve vejandine. Her helbesteke wî bi serê xwe beşek ji zargotîna Kurdî ye. Di nava helbestên Osman Sebrî de dewlemendiya zimanê Kurdî heye. Doza aşî, wekhevî, azadî û biratiyê heye. Hesreta rojê serbest heye. Gilî û gazine ji nezaniyê hene. Rê û rêbazên xelasiyê hene. Aqil hene, şîret hene, serpehatî hene. Rûmetdayîna jin û zarok û xortan heye. Hezkirina çiya û deşt û newalên welêt heye.

Helbet kêmasiyên vê xebatê jî dê hebin. Ji bo wan jî em li hêviya alîkariya rewşenbîrên me ne. ●

Mêrdîn, 14.09.2011

CAVKANÎ

Bali, Abuzer, *Diwana Osman Sebrî*, Weşanên Pêrî, Stenbol, 2004.

Berch, Berken, *"Têkoşer û Xewxurekî Gelê Kurd: Osman Sebrî"*, Vesta hej 1, payiz 2003.

Cegerxwîn, *Hayat Hikayem*, Evresel Basım Yayın, İstanbul, 2003.

Kurdo, Prof. Qanatê, *Tarixê Edebyeta Kurdî*, Weşanên Öz-Ge, Ankara 1992.

Omer, Heydet, *Osman Sebrî*,

Helbestvan û Nivîsevan, Weş SemaKurd, Silêmanî, 2006.

Reş, Konê, Osman Sebrî, www.efrin.net

Sebrî, Osman, *Li Goristana Amedê*, Weşanên Lîs, Amed, 2010.

Reş, Konê, *Panoramayek di Deryaya Lehengeki ji Lehengên Gelê Kurd de Wek Nimûne Têkoşer û Toreva: Osman Sebrî*, Vesta, hejmar 1, payiz 2003.

Ji refên
Nûbiharê

Sorgul


Ibrahim Sunkur



Nûbihar

TÛRIKÊ PÎRÊ KAL

PÎRÊ KAL



Nûbihar



Em ji zanayekî xwe bûn

OSMAN TUNÇ

Min Seydayê Abdullah Varli di sala 1976an de nas kir. Wê demê ez di Zanîngeha Stenbolê de telebe bûm. Seydayê Abdullah, wekî seydayên din, di medreseyên Kurdistanê de xwendibû.

Lêbelê ew wekî xwendevanên medreseyên klasîk xuya nedikir. Ji ilm û irfana xerbê û hereketên siyasî, çandî, îçtîmaî û felsefî jî haydar bû. Bi taybetî li ser dîrok, çand û zimanê Kurdistan, xwediyê malûmateke gelek fireh bû. Bûyerên tarîxî, bi awakî orjînal şîrove dikir. Dema bûyerên tarîxî şîrove dikir, tenê bi çavkaniyê nedima. Lewra gelek çavkanî didan ber çavê mirov û dixwest doza xwe wusa bide îsbatkirin. Bi sebebên muxtelîf, her careke hatina wî ya Stenbolê, muheqqeq me yê hevûdu bidîta. Di dawiyê axaftinê de, gotin digeriya dihate ser mesela Kurdistan. Heta pirsgirêka Kurdistan neaniya ziman gotinên xwe xelas nedikir. Doza wî ya yekemîn, pirsgirêka Kurd bû. Di her navendê de, mijareke ilmî diavêt holê. Ji munaqesheke ilmî re derî vedikir. Ji bo ku nedixwest dema xwe vala derbas bike. Lewma ji gotinên vala qet hez nedikir.

Der heqê dîrok û zimanê Kurdistan de, xwedî malûmateke ansîklopedîk bû. Dema ku di vê mijarê de rayên muxtelîf berçav dida û rîwayet dikir, hejmarên kitêban jî, dida. Bi vê sedemê dixwest quweta bîra xwe jî bide îsbatkirin.

Di qenaeta min de xebata Seydayê Varli ya herî mezin û giranbiha, pêngava wî ya meala Qur'ana Pîroz a di zimanê Kurmancî de bû. Seydayê hêja ji bo vê xebata xwe, gelek mucadele kir û zehmet kişand. Di sala 1980î de çend rûpelên ewil ên xebata xwe, da min. Da ku ez ji bo çapkirina wê, alîkariya ehlê hîmmetê û kesên welatparêz bidest bixim. Lêbelê mixabin ev îmkan çênebû. Paşê Seydayê hêja bi şiklekî, di çapkirina meala Kurdî de gîha serkeftinê û wezîfeya belavkirina mealê jî, weşanxaneya Nûbiharê hilgirt ser milê xwe. Bêşik ev teşebûsa hanê, bû çavkanî û îlhamê ji bo seyda û melayên Kurd. Dûre, di vî warî de çend xebatên nû jî, hatin holê.

Ew zimanê ku çî di meala Qurana Pîroz de, çî jî di meqaleyên

Di qenaeta min de xebata Seydayê Varli ya herî mezin û giranbiha, pêngava wî ya meala Qur'ana Pîroz a di zimanê Kurmancî de bû. Seydayê hêja ji bo vê xebata xwe, gelek mucadele kir û zehmet kişand

Bîranîna şehîd Mele Îzzeddîn

Mehmet Ay

Ey şehîd Mele Îzzeddîn şehîdê dîn û welat
Şev û rojan te xebat kir ku şehadet bû xelat
Şakirdê Seîdê Kurdî xadimê netew û dîn
Doza Îslam û azadî ji te re bibû evîn
Aferîn Seydayê hêja sed hezar car aferîn

Dijminê nezan û xayîn bibû wek gurê boz
Gelek xortên ciwan kuştin çî sed sal çî newroz
Te Îslama Muhemmedî kiribû armanç û doz
Can fedayê rêça heq û rêça Qur'ana pîroz
Aferîn Seydayê hêja sed hezar car aferîn

Rohniya çavê mezlûman serbilindê umetê
Nav û dengê te wê hebin ta roja qiyametê
Çiqas pesnê giran bêjim kê m e lê ew li te tê
Tu şehîdê dîn û welat xwediyê şan û rûmetê
Aferîn Seydayê hêja sed hezar car aferîn

Îslama rast winda bûye maye bêkes û xwedî
Sorgula dewra saedet Îslama Muhemmedî
Zaliman ji Xweda şerm nekir ne ji Pêxember fedi
Bi Seîd û Huseyîn şa bi li cinneta ebedî
Aferîn Seydayê hêja sed hezar car aferîn

Têkoşin her duago ye bo mezlûm û şehîdan
Wekî Hesên û Huseyîn wekî herdu Seîdan
Gelê mezlûm û bawermend ji bir nake egîdan
Emê bêne goristanê di rojên cejn û eydan
Aferîn Seydayê hêja sed hezar car aferîn


xwe de bikaraniye, ji aliyê hin kesan ve hatiye rexnekirin. Lewra Seydayê hêja, hin distûrên wî yên gramatîk ên orjînal ku li gor raya xwe û xasê bi wî tenê, hebûn. Ji wan prensîbên xwe qet tawîz nedida.

Seydayê Varli ji xwe re, wek qada xebatê, mijara lêkolînê, tayîn kiribû. Ew jî bi taybetî mijara dîrok û edebiyatê bû. Di vê mijarê de gelek tiştên hêja anîn ziman û nivîsand. Lêbelê ez texmîn nakim ku seydayê hêja di vê mijarê de gihîştîye meqsed û armanca xwe. Çimkî di bin destê wî de, gelek xebat hebûn. Di qada dîrok û ziman de, pirtûkên gelek giranbiha berhev kiribûn û civandibûn hev. Ez hêvîdar im ku ev pirtûkxaneya Seyda ya dewlemend, bi dîqqet bê muhafezekirin û ji bo îstîfadeya lêkolîneran, jê re statûyek çêbibe.

Seydayê birêz, gava her carekê ku me hevûdu bidîtana, xebatên xwe yên ku cedwela wan çêkiriye, dianî zimên û ji bo xelaskirina wan tiştan, ji Xwedayê xwe, jiyaneke ku ji wan xebatan re têr bike, dixwest. Heyfa wî ku berî qedandina wan xebatan çû rehma Xwedê. Hezar û hezar rehmet lê be. Bi rastî, ma kê kar û xebatên xwe yên li vê dunya derewîn qedandîye? Şaîrekî çî xweş gotiye:

*Mirin hat li derî da, dawîya dawîn.
Ne fêkiyek, ne kulîlkek di dest da;
Kewar dişewite li ber tava rojê;
Hemû hingiv ma di mêşê da.*

(Cahit Sitki Tarancı)



Li pey Seydayê Varli

ALİ KARADENİZ

Seydayê Mela Abdullah Varli ji nav me koç kir. Rojêke zivistanê, Sibateke sar, li Enqerê, mîna şair Cemal Sureya dibêje; “Her mirin mirinek zû ye”, zû ji nav me bar kir û çû.

Bi her mirinê re dil ji nû ve diqurufe, lê kê çare dîtiye ji mirinê re. Jixwe em ji mirinan pirrtir çî dibihîsin li vê dunyaya ku her tişt li ser tevabûnê hatiye danîn. Li van deran mirin carna bi destê ecel tên û carna ecel bi destê mirovan temam dibin. Lê car din jî her çûnek qurfeke dilan e, her çûnek ji yên mayî re wendakirinek e.

Seydayê Mela Abdullah Varli, jî zû de nexweş bû, rojên wî yên dawî li nexweşxaneyê derbas bûn û wefata wî jî li nexweşxaneyê bû. Bi qasî mirina wî, tiştê ez pê êşiyam; ez neçûm ser cenazeyê wî, çimkî çaxa haya min jê çêbû, cenaze biribûn Erdîşê, ji malbata wî min tu kes nas nedikir, min neçû ji tu kesî re negot serê we sax be. Ji bilî jimarên telefona wî, kesekî, an cihekî ez pê de herim nehat bîra min.

Niha ez di telefona xwe de li navê wî û li jimarên telefona wî dinêrim, ewên ku ez pîr caran pê li Seyda geriyame, min dengê wî

dibihîst, pîrsa halê wî dikir. Kîjan cara ez li gotinekê radiwestîm, li navekî dimam asê, minê telefon bidaya Seyda û ji wî bipirsiya. Wî yê ji agahiya xwe fireh hem bersiva pîrsa min, hem jî agahiyên wekî din bidaya. Niha ez çî pê bikim, çawa destê min dê lê bigere ji deftera saxan jimarên telefona wî derêxim!

Lê heyhat. Ku bayê mirinê bi ser merivan de hat, ji bilî birinê ji merivan nagere. Ew merivê ku mîna karê xwe mezin, bejinbilind, bi sohbet, bi şewq, bi dilekîbawer destê xwe dabû mirinê çûbû.

Seydayê qedirbilind çaxa meriv diçû xebatxaneya wî, tevî umrê xwe yê mezin radibû bi destê xwe çayê ji meriv re çêdikir û bi destê xwe îkram dikir, mêvanê wî çendî bi umir jê biçûktir bûya jî, nedihîşt, wî bi xwe îkrama xwe dikir. Mixabin ev zanayê hêja tu kes li ber destê wî tunebû.


Min cara pêşî ew li kû û kengî dîtibû, min kenî ew nas kiribû, min xwest biînim bîra xwe. Ber ya ez wî nas bikim min navê wî bihîstibû; wek kesê ku cara pêşî tefsîra Qur’anê bi Kurdî çêkiribû, karekî ku heta wê rojê nehatibû kirinê. Pîr paşê, sala 1993an,

Bi her mirinê re dil ji nû ve diqurufe, lê kê çare dîtiye ji mirinê re. Jixwe em ji mirinan pirrtir çî dibihîsin li vê dunyaya ku her tişt li ser tevabûnê hatiye danîn. Li van deran mirin carna bi destê ecel tên û carna ecel bi destê mirovan temam dibin

di sempozyuma ku *Nûbiharê* derheqê gotûbêjkirina pirsra Kurdî û çaredîtîne de li darxistibû, wek beşdarvanekî min ê ew bidîta. Seyda, teblîxeke pirr dirêj ji bo sempozyumê amade kiribû, lê beşdarvan pirr bûn, ji her yekî re, ez ne şaş bim, 10 deqîqe diket. Gava Seyda derket kursiyê û dest bi gotina xwe kir, li gor wî hê nû peyivîbû, lê serokê dîwanê anî bîra wî ku deqîqeyek ji para wî maye, Seydayê ku gotinên kurt û hindik dilê wê hênîk nedikir, tenê bi kenekî tinazane bêçaretî û neqayiliya xwe anîbû zimên. Wê rojê wê serzenîşa Seyda kesên hazir pirr kenandibû. Ji wê rojê vir de, çûn û hatina me bi Seyda re dest pê kiribû.

Seyda di karê xwe de bi kêf û eşqeke mezin dixebitî. Meraqa wî ya li ser zanîne û vekolîne hêjayî heyretê bû. Bi salan di kutûbxaneyan de xebatkirina wî, ev meraqa wî pirrtir kiriye, ji hêlekê ve jî firseta dîtin û berhevkirina kitêb û belgeyên gellekî hêja peyda kiriye. Seba peydakirina çavkaniyan, kîjan devera dûr bûya bêyî erê-nayê çûyîyê. Gava jiyana Ahmedê Xanî dinivîse, dibihîse li Almanyayê sûreteki Ahmedê Xanî li cem yekî heye. Seyda, li gor gotina wî, pereyan deyn dike û seba wî sûretî diçe Almanyayê. Jiyaneke ku di rêya ilmê de hatiye bihurtin...

Seyda, berhemên pirr hêja yadigarî me kirin. Ji navberhemên wî, meala wî cihekî taybet digire. Ew li dora bîst salan bi sebir ji vî karê bi rûmet xebat kiribû heta ku bi dawî anîbû. Bi Kurdî çêkirina mealeke qet ne karekî hêsan bû; çimkî rêyeke ku beriya Seyda hatibû vekirin tunebû. Ji ber ku Seyda tehsîla xwe li



medresan kiribû û li ber destê seydayên Kurd xwendibû, ew usûla medresên Kurdan ku ders bi Erebi di hate xwendin û tefsîr bi Kurdî di hate gotin, di çêkirina mealê de ji Seyda re rêbertiyeke baş kiribû. Lêbelê di vî mijarê de metnê nivîsandî peyda nedibû. Ji bilî çend tefsîrên temamnabûyî mîna ya Kamuran Bedirxan ku di kovara *Hawarê* de weşandibû, tefsîreke çêkirî tunebû. Lêbelê Seydayê, bi arîkariya Xwedê ev karê bi rûmet temam kir û di vê rêyê de bû pêşdar.

Seydayê Varli, rûmeteke mezin dida Ahmedê Xanî; jixwe amadekirina du cild kitêbên derbarê jiyana Xanî de nîşana vê hezkirina wî ye. Ji bilî vêya, kitêba wî ya hêja *Dîroka Dûgelên Kurdan* ji hêla çavkaniyan xezîneyeke dewlemend e. Ev berhem ji meraqdar û vekolînerên dîroka Kurdan re bibliyografiyeke baş dide.

Seyda dewamî dixebitî, di xebatxaneya ku ji merkeza bajêr dûr, di nava taxeke perê bajêr de, mîna noqevanekî, mîna nêçîrvanekî li pey ronîkirina dîroka gelê xwe digeriya. Dilekî bi şewat bi Seyda re bû, eşqeke mezin, hemiyeteke pirr. Lê


çi heyf, di nava bêçaretîyê de, bi nava tenêtiyê de dixebitî. Kes li ber destê wî tunebû. Ew berhemên dabû hevdu tev mane sêwî li pey wî. Gelo kesê hebe xebatên wî yê nîvçemayî temam bike? Wek jiyane, her kar û barê mirov dimînin nîvçe.

Bêguman Kurdan, vekolîner û alimekî xwe yî pirr mezin wenda kir û aliyekî me ma vala. Xwedê wî bi rehmeta xwe şad bike. ●


Ji refên Nûbiharê

JIYANA PÊXEMBERÊ ME
HZ. MÜHEMMED

MURAD CELALÎ



Nûbihar




1

Nûbihar

Mîrasa şehîd Mela Îzzeddîn

NEVZAT EMÎNOĞLU

Bi munasebeta salvegera şehadeta
Şehîd Seydayê Mela Îzzeddîn



Seydayê şehîd Mela Îzzeddîn, wek alim û telebeyekî Nûr û rêberê civakî, mîraseke bêmisli li dû xwe hîşt. Hem alimekî kûr bû û ji medreseyên Kurdan gihîştibû, hem jî telebeyekî Rîsaleyê Nûr bû û pîsporê fikr û dîrsa hikmeta Bedûzzeman bû. Sadiqê van herdu nasnameyên xwe bû û yek ji ya din re feda nedikir. Fikra dîni ya ku ji medreseyên Kurdan ên qedîm û ji hikmeta dersên Bedûzzeman ya nûjen sitendibû û fikra milletperweriya Kurdewarî nedikire qurbana hev. Herweha xwedî nêrînek însanî ya berfireh û rewşenbirane bû.

Ev şexsiyetê mezin û ezîz, ronahî û rewneqdariya xwe, ji wê şîreta Seidê Kurdî ku digot, "Sê cewherên me hene ku hifza xwe ji me dixwazin: însaniyeta me û dîne me û mîlîyeta me...", sitendiye. Ev perspektîfa wî ya pîralî, hemû gelê Kurd û hemû rojhîlata navîn û alema Îslamê û heta hemû dunyayê hambêz dike. Lewra ew nîrx û cewherên ku bîrdozî û tevgara wî li ser hêşîn bûye, hemû reng û dengên welat û hemû bîr û baweriyên rojhîlat û hemû nîrxên alemê û kaînatê, îhtîwa dike û digre nav xwe. Lewma Seyda bi rehetî, bi her derdorê re dikete nav têkiliyan.

Bi hemû fikr û baweriyên re, di çarçoveya hevrêzî û hurmetê de, dan û sitendin dikir. Lewra bi her hêl û derdorê re paydeyên wî yên muştêrek hebûn. Bi awakî bêkompleks û bixwebawer, li her platforman xwe dikaribû îfade bikira. Lewra xwe sîpartîbû hêza gotinê, hêza heqîqetê. Ji bo her kesekî gotineke wî ya ku jê re bibêje, hebû. Li her derê, rastiyeke

ku parve bike hebû. Lewma her dem digot ku armanc û encama evê xebat û xizmeta me, azadiya Kurdan e, biratiya alema Îslamê ye û sulh û aşîya alemê ya di navbera dîn û milletan de ye. Herweha digot lazim e ku em li gor van xayê û îdealên ezîz û bala, bixwînin û xwe bigihînin û sazî û xebatên kollektîf pêk bînin. Da ku ev xebat û xizmetana, dewamdar û mayende bimînin û girêdayî bi şexsekî yan jî çend şexsan û xasê der û demekî nemînin û bibin mal û nîrxê millet.

Bi rastî Seydayê şehîd û ezîz mîraseke mu'ezzem ku ji fikr û baweriyêke xweser û bala û alemgiştî, digel sazî û kesên gihîştî, li dû xwe hîştîye. Bi serda jî, hêz û hîmmeta şehadeteke pak û paqij jî lê zêde kir û wusa ji me xatir xwest. Ev mîrasa han ku dûrî qirêjîya şaibe û lekeyan e, xwedî hêz û hêjayîyeke bêhempa ye. Her ku sal derbas dibin, ev hêjayî zêde dibe û qîmeta wê mezin dibe.

Divê ku em di ronahiya mîrasa Seydayê xwe yê şehîd de û li rê û rêbaza wî dewamdar bin, herweha ji bo bext û taliha xwe ya bêçare, alîkar û xebatkar bin û ew mîzginîya ku Hezretî Ustad ji sed sal berê de daye, pêk bê û rewşek ezîz û azadane çêbibe. Da ku wuhareng, mîras û eserên wan seid û şehîd û ezîz ên berî me ku bi qencyên xwe sax in, bijîn û ruhê wan jî di qebra wan de şad bibe.

Ja dibin bi hestiyar

Huseyn Şemrexî

dibinim hinek pîrekan
 bikofî û kitanspî ...
 li mêrgeke bihiştî hemî ponijî ...
 xwe bi xwe dibêjim:
 ma çi bûye ji van!
 hem hatine geştê
 hem çeman diguvêşin
 ji kanîkên çavan.
 ku hinekî din meşiyam bi hêla wan,
 li pêşberî wan,
 çend gor dihate kolan.
 ku ew, çav li hestiyar diketin,
 ji kêfan difiriyan.
 min ji xwe re got:
 “gelo ev hov in, pîrhevok in yan gornebaş ...”
 lê paşê min dît ku wisa du’â dikirin:
 “Xwedayo, Xwedakê min!
 ev hestiyên han,
 tu bikî ku
 ên kurê
 min
 berxikê
 min
 cîgera
 min
 bin.”

Stenbol, 6, 2, 2012



Dîroka derew

Kudbettin Çelik

Ser xwîn û hêstiran
 Dîrokeke derewîn çêkirin
 Azadiyeka bi kaxizan

Di nav rûpelên bêbaweriyê de
 Rastî veşartin
 Bi hîle mirov xapandin
 Çerxa felekê li me gerandin
 Ji nav xwe em veqetandin
 Em kuştin
 Em qelandin
 Bi derewan em xapandin
 Ji welatê me em derandin

Dîrokeke ji derewan çêkirin
 Ser axa xeyalê me

Rastî winda kirin
 Di nav rûpelên pirtûkên
 Dîroka derew de
 Raboriya me veşartin
 Agirê hêviyên me vemirandin
 Dêrd û kul li me belandin
 Gundê me şewitandin
 Ji keseran em helandin

Dîrokeke derewan çêkirin
 Zimanê me qedexa kirin
 Cih û warê me talan kirin
 Êş û derdê dinyayê li me bar kirin
 Em dîn kirin
 Em har kirin
 Bê welat em terkî dinyayê kirin

Bi hevnegirtineke mezin
 Dîrokeka derewan çêkirin
 Gotin bawer bikin
 Û bêjin “şoqa rojê tarî ye.”

Li ser dengbêjiyê

FELAT DILGEŞ

Gelo “dengbêj” kî ye? Em dikarin ji kê re bêjin “dengbêj?” Helbet dengbêj jî wekî me endamekî civatê ye. Ew jî wek me ji tore û adetên civatê re hurmetdar e. Ew jî wek me li hember mal û malbata xwe, li hember welatê xwe xwedan berpirsiyariyekê ye. Ew jî wek me dikene, wek me digirî, wek me şînê digire. Ew jî bi xebereke xweş, bi mizgîniyekê şa dibe. Ew jî bi xebereke reş, xemgîn û dilşikestî dibe. Rewşa civakî, tesîra xwe li ser jiyana wî jî nîşan dide. Bi gotina kin û kurt, dengbêj jî yek ji me ye, di nav me de dijî, bi me re digere, bi me re hevaltiyê dike. Bi qasî ku hewiya me bi wî tê, hewiya wî jî bi me tê. Bîhna wî jî bi me dertê û fireh dibe. Dengbêj hevalê me ye, gundiye me ye, kirîvê me ye, cîranê me ye. Ango yek ji me û di nav me de ye.

Gelo ya ku dengbêjekî, ji endamekî rêzê yê civakê diqetîne çi ye? Çi, wî ji me cihêtir dike? Ew bi çi yê xwe ji me diqete? Ma bi rengê xwe, bi kincên xwe, bi pêlava xwe, bi rêveçûna xwe? Helbet taybetiyên wî yên cihê û xweser hene. Hin taybetiyên wî yên wisa hene ku ew taybetî bi me gelean re tune ne. Berî her tiştî ew bi awayekî cihê li civakê dinêre.

Nêrîna wî ya civakê, me û wî ji hev diqetîne. Her weha ew bi çavekî cihê li bûyeran jî dinêre. Ya ku bala wî dikişîne, ya ku ew dibîne, ya ku ew difesilîne, ji ya ku em dibînin cihêtir e. Carekê dengbêj, bi hestiyariyê hunermendî li civakê û li bûyeran dinêre. Êşa civakê, derdê civakê, şîn û şahiya civakê li ber çavên wî cihê ye. Ew hê kûrtir û dûrtir dibîne. Gava ku em tenê bi ser derdê xwe, bi ser birîna xwe re xwar in, ew bi birîna tevahiya civakê re têkildar e.

Gelo dengbêj kî ye? Berî her tiştî dengbêj şahidê dema xwe ye. Ew ji ya ku dibîne, ji ya ku dijî û ji ya ku dibîhize re şahidiyê dike. Ew şahidiya wî ya ku bi lorandinê, bi strandinê, bi dengbêjiyê bilind dibe, pirrê caran demê û sînoran nas nake, ji dehan, sedan salên berê ve dadiwerive û tê dema me. Piştî ku bi meqamek edebî hat strandin û gihîşt civakê, êdî strana wî dibe milkê gel û dimîne. Bi ser de dengbêj ne tenê şahidê dema xwe, ew sewt û awaza dema xwe ye jî. Dengbêj ji ber xwe nabêje. Ya ku di nav civatê de pêk hatiye û tesîra xwe li ser jiyana endamên civatê nîşan daye li ser zar û zimanê dengbêj e. Bi vî awayî dengbêj zar û zimanê civakê ye.

Gelo ya ku dengbêjekî,
ji endamekî rêzê yê
civatê diqetîne çi ye?
Çi, wî ji me cihêtir
dike? Ew bi çi yê xwe
ji me diqete? Ma bi
rengê xwe, bi kincên
xwe, bi pêlava xwe, bi
rêveçûna xwe? Helbet
taybetiyên wî yên cihê
û xweser hene

Dengbêj di strandina xwe de ji enstrûmanekî muzîkê îftifade nake. Her çiqas hin dengbêjên van demên dawî di strandinên xwe de ji enstrûmanekî îstifade bikin jî, dengbêjên berê, bi pirranî hunerê xwe tenê bi dengê xwe pêk dianîn



Dengbêj bi strana xwe şahidiya dîrokê jî dike. Gelek caran em dikarin agahiyên heja yên di derheqê bûyereke xweser û dîrokê de ji strana dengbêjekî hîn bibin. Mesela Homeros bînin bîra xwe. Homeros dengbêjek dema antîk a Yunan e. Bi qasî 800 salan Beriya Mîladê, angî nêzikî sê hezar sala berê bi destanên xwe yên bi navê Ilyad û Odesse, navê xwe bi herfên zêrîn li dîroka mirovatiyê nivîsandiyê. Herdu destanên ku li ser navê wî tên zanîn li ser şerên mêrxasiyê ne. Homeros, bi ser ku dengbêjek kor e, bi agahiyên ku bi destanên xwe radigihîne me, çavên me gellekan vedike. Di kultura Yûnanan de, çawa ku Herodot wek dîroknas, Hîpokrat wek hekîm, Sokrat, Eflatûn û Arîsto wek fîlozof tên zanîn, wisa jî Homeros dengbêj e; dengbêjê dengbêjan e. Wek dengbêjekî ku îro jî tevahiya dinyayê re bûye mal, herkes siyanet û hurmeta wî digire. Îcar bi qasî Homeros navdar nebe jî, dengbêjek Romayîyan jî heye. Navê wî jî Vîrgîl e. Dengbêj bi qasî ku dengbêj e, carna ewqas jî dîroknas e. Loma

dengbêj bi awayekî jî xizmeta nivîsandina dîrokê dike. Demên dîrokê yên tarî, hin demên ku ji bo me sernixamtî ne, bi strana dengbêjekî dikarin li ber me ronahî bibin. Dengbêj, bi çend rêzên strana xwe dikare gellek tiştên veşartî li ber me zelal û eşkere bike.


Bêguman karê ku dengbêjên me jî kirine û heta îro jî dikin bi tu awayî jî yên xelkê ne kêmtir in. Destana Memê Alan bînin bîra xwe. Ji serî heta binî, bi kafiye, bi aheng hatiye gotin. Her rêzek wê, her rûpelek wê xwedan tahm û lezetek edebî ya bêhempa ye. Mirov bi xwendina wê, bi bihîstina wê têr nabe. De îcar gava ku li ser zar û zimanê dengbêjekî hunermend be, mirov ji guhdarkirina wê têr nabe.

Dengbêj neynika civakê ye jî. Ew her tiştê civatê nexş dike û li ber me datîne. Civat dikare resmê xwe, angî sûretê xwe di stran û kilama dengbêj de bibîne. Çimkî ew resmê civatê dikşîne û datîne ber me. Loma jî dengbêj lome û gazin nayê kirin. Civak jî bi her awayî jî nexşê dengbêj re dilsoz

e. Resim û sûretê ku dengbêj kişandiye, ji alî civatê ve tafîlê tê qebûl kirin. Civak bi pey rastî û nerastiya resmê ku ji alî dengbêj ve hatiye kişandin nakeve. Dengbêj çî gotibe, çawa gotibe, wisa qebûl dike û lê xwedî dertê. Kes nabêje dengbêj kêma an zêde gotiye. Pîrrê caran herkes dibêje, "seeta wî xweş be, xweş gotiye." Îcar jî xwe piştî ku stran ji devê dengbêj derket, êdî ew mal û milkê civatê ye. Dengbêj dev jê berde û nebêje jî ewê were gotin. Çimkî stranek xweş, awazek şêrîn, tu car stûxwar, sêwî û bêxwedî namîne.

Dengbêj di strandina xwe de ji enstrûmanekî muzîkê îstifade nake. Her çiqas hin dengbêjên van demên dawî di strandinên xwe de ji enstrûmanekî îstifade bikin jî, dengbêjên berê, bi pirranî hunerê xwe tenê bi dengê xwe pêk dianîn. Eger enstrûmanek bixebitandina jî, ew jî bi gelemperî bilûr bû. Gelek caran, bêyî ku ji bilûrê jî îstifade bikin, tiliya destekî an herdu tiliyên xwe yên eşhedê dikirin gohê xwe û dest bi gotinê dikirin.

Di civata Kurd de, kesên ku kifş û xwedan hebûnekê bûn, angî yên ku bi mîrîtî, begîtî û axatî dihatin naskirin, helbet xwedandengbêj jî bûn. Çawa ku dengbêj bi mîr, bi axa an jî bi begê xwe dihatin zanîn û naskirin, wisa jî carna beg, mîr û axa bi dengbêjên xwe dihatin naskirin. Mîr, beg û axayên ku rûmet nedidan dengbêjan û civatên ku dengbêj tê de distirên li dar nedixistin, li ber çavê gel pîrr bi rûmet nedihatin dîtin. Çimkî civat bi hebûna dengbêjan şên û xweş dibû. Heta carna, gava ku malek ji bo xwezgîniyê, angî ji bo keçxwestinê biçûya ber derê



mala ku dixwaze pê re merivatiyê deyne, denbêjek jî bi xwe re dibir. Bi vî awayî hem dengbêj civat şên û xweş dikir, hem jî karê berbûyan hêsan dikir.

Bêguman tu dibistanek dengbêjiyê tunebû. Heta pirraniya dengbêjan jî xwendin û nivîsandinê jî bêpar bûn. Jixwe denbêjî piçekî jî ji ber xwe bê jî ye. Çimkî dengbêj ji ber xwe stran dibêje û ji ber xwe stranan çêdike. Tûrikê wî, bîr û hafiza wî ye. Belê dengbêjên xas, îlla dixwestin şagirtekî bi xwe re rakin û piştî ku ew mirin jî, şagirtên wan stranên wan bidin jiyandin. Loma di navbera dengbêj û şagirt de têkiliyeke xurt hebû. Hin caran dengbêjî ji bav derbasî kur jî dibû. Belê dixwazî kurê wî, an dixwazî yekî xerîb, dengbêjê xudan şagirt hê bêtir bi rûmet bû. Dengbêjê bê şagirt wek zilamê warkor dihat hesabandin. Îcar mixabin têkiliya dengbêjî û şagirtiyê jî di van salên dawî de hema bêje nema. Çimkî dengbêj gellek kêmbûn. Ji bo yê mayî jî, pirrê caran doza nan derdikeve ser doza dengbêjiyê.

Di dema ku Kurd li ser xwe bûn û xwedan dezgehên xwe yê siyasî bûn de, qedr û rûmeta denbêjiyê dihat girtin. Belê piştî ku şikest xwarin, dengbêjî jî bi paş ket. Demekê, li ber derê her mîrekî Kurd çend dengbêj


hebûn. Êvaran bi saya wan dîwana mîr şên dibû. Belê ji roja ku mîrekiyên Kurd winda bûn vir ve karê dengbêjiyê jî sist bû.

Denbêj kedkar û hosteyek ziman e jî. Kes bi qasî wî bi qedr û rûmeta gotinê nizane. Ne jî kes bi qasî wî bi sirra gotinê dizane. Gotinên ziman, di devê dengbêjekî de bi hunerekî kûr tî honandin. Dengbêj bi sirra peyvê dizane û dizane bê ka ewê kîjan gotinê li pey kîjanê rêz bike. Peyvên ziman bi hunermendî li pey hev rêzkirin û bi ahengek xweş xemilandin karê wî ye. Gotin ji ser zarê wî yê şêrîn dişemitin, dibin lehî û ji devê wî diherikin.

Wek ku me got dengbêj sewt û dengê civatê ye. Civatek bê dengbêj, wek civatek kerr û lal e. Dengbêj, peyvbêj û derdbêjê

civata xwe ye jî. Bi ser de dengbêj bîra civakî ye jî. Ew nade jibîrkirin. Bi gotina xwe dide jiyandin û dike bîra mirov. Bi saya dengbêj bîra civatê aza û zindî dimîne. Dengbêj neyarê jibîrkirinê ye. Ew bi kilam û strana xwe bîra civatê ya kor zindî dihêle.

Gotin û stran, şûrê dengbêj e. Li ber her cûre neheqiyê, ew bi gotina xwe, bi kilam û bi strana xwe disekine. Dengbêj wijdana gel, wijdana civatê ye jî. Miletêkî ku dengbêjên wî bi azadî nastêrin û dengê wan li seranserê welat olan nade, ew millet an mirî ye, an jî li ber mirinê ye. Ka ji kere-ma xwe vê carê jî ji bo xatirê min goh bidin Dewrêşê Evdî, cardin strana Ehmedê Mala Mûsa guhdar bikin. ●



“heyv!”

sidîq gorîcan

qêreqêra firoşkaran
xurexura tirimbêlan
avahiyên nû û kevn
cûre cûre insan
cûre cûre qewm ...
li metropoleke mezin û bi xirecir
keçika min tiliya xwe dirêjî asîmanan dike
û heyîva ku nû
û bi qasê tiliya wê ye destnîşan dike;
“baba” dibêje bi qêrineke şahîdar
“heyv!”
“baba heyv!”

oy cana min!
delala min!
ku tu dibêji “heyv!”
bi ruhê xwe ez li bilindahiyê dikevim
xwe li ser kîhêlan wek suwaran dibînim
di nav ewqas qêrûgêjiya hişçuyî û ruhpelixî de
ku tu dibêji “heyv”
çîroka camêrê çermsor hat bira min
ku dibêjin wextekî
gava ew û hevalekê wî
di nav kolanên Newyorkê de digerin rojekê
ji nişkave disekine û li dengêki guhveçin dibe:
“tu jî seh diki?
tu jî seh diki gelo?
dengê çirçirokekê tê” dipirse ji hevalê xwe

oy cana min!
delala min!
di vê serdema

ku em berederiyê mal û bajarê xwe bûne
di vê cîhana ku stêr û asîman
dar û ber
mêş û morî
gul û çîmen
dil û lorî wînda bûne


û ketine navberên sükên teng û hişk de

heyvdîtina te

hêvî û ferahiyê direşîne ruhê min
minetdar im ji bo heyîna te

oy cana min!
delala min!

tu taveheyva demên qîr û tariyê yî
tu taveheyva kêlikên tengezariyê yî..



Helîm Yûsiv: Nivîsîn projeyeke jiyanê ya berdewam e

HEVPEYVÎN: OMER DİLŞOZ

Me bi nivîskar Helîm Yûsiv re li ser nivîskariya Kurdî pişt a çend gotinan şikand, Yûsiv bal kişand ku ew bi çavê projeyeke jiyanê li karê nivîsê dinêre û got: “Armanca min avakirina wî şêweyê xweser e, wî dengê xweser e yê ku êş, şewat, derd, keser, şîn, kêf û hemû kelecana giyanê mirov dike peyv û hevok û di cihokên rûpelên spî re diherikîne û dibe wêje.”

✓ *Helîm Yûsiv, wekî nivîskarekî, tu nivîskariya xwe di kîjan kategoriyê de bi nav dikî?*

Ya rast, ez nizanîm bê nivîskariya min di hundir çî kategoriyê de bi nav dibe. Eger tiştekî wisa bê xwestin, dibe ku lêkolînerê an jî rexnegirekî wêjeyê karibe bike. Nivîsandin ji bo min projeyeke jiyanê ya berdewam e. Kevir bi kevir, peyv bi peyv, bingehê danîn hetanî ku reng, şêwe û awayê xwe yê taybet bigre. Armanca min avakirina wî şêweyê xweser e, wî dengê xwesere yê ku êş, şewat, derd, keser, şîn, kêf û hemû kelecana giyanê mirov dike peyv û hevok û di cihokên rûpelên spî re diherikîne û dibe wêje. Ji hêlekê de, aliyê takekesane û azmûna şewata hinavane û ji aliyê din de jî azmûna form û honandina tevneke hunerî û xweser e. Lê, di çî kategoriyê de zewac van herdu ezmûnan di nivîskariya

min de kiras girtiye, yan jî wê hîn bigre, ez bi xwe jî bersiva vê pirsê nizanîm.

✓ *Wekî tê zanîn, te bi çîrok-nivîskariyê deng veda lê di heman demê de te roman jî nivîsandin; Helîm Yûsiv, di çîrokê de li çî, di romanê de li çî digere, ferqa wan çî ye?*

Nivîsandin bi giştî ji bo min ger e. Li xwe digirim, li oksîjena jiyanê digirim, li wê kêlika ku jiyanê tê de geş dibe, rastî tê de tazî dibe û mirin newêre serê xwe ji bin qûmê derxîne... Armanca min bidestxistina wê kêlikê ye, ewa ku min ji temenê xwe wînda kiriye. Ev temenê ku kêli bi kêli, xulek bi xulek, ber bi qedandinê de diçe. Nivîsandina wêjeyê, hem têkçûn e û şerekî bêfêde ye li hember tunebûnê, hem jî berxwedaneke û hewildaneke mezin a paşdexistina têkçûna li hember demê ye. Nivîsandin pêşbaziyêke têkçûnê

ya li hember mirinê ye. Her mirov dixwaze bi wan kêlikên reviyayî yê demê bigre, têk diçe. Ji ber ku ji jiyanê bi wîrdetir jiyana mirov bi xwe bendemana mirinê ye. Heta ku mirov bi nivîsandinê çend kêlikan bi dest dixwe, di wê navê re, çend kêlikên din diçin. Bi vî awayî ev gera felsefîk ya li wan kêliyên windayî, gereke bêdawî ye û gerînokeke aloz e ku tenê tevliheviyê û xemgîniyê li pey xwe dihêle. Ji ber vê, nivîskarî karekî xemgîn e.

Ji bo min, çu cudayiyên mezin di navbera çîrok û romanê de nîn in. Tenê, roman dikare çîrokeke dirêjtir, kûrtir û berfirehtir be. Pirê caran naverok, raman, şêwe, awa û formê honandina xwe bi xwe re tîne. Li cem min, nivîsandin û jixweberî xwişkên hev in. Anku jixwebere tê. Dema ku tê, qelafet, reng, sîma, bejn û bala xwe jî bi xwe re tîne. Ya giring ew e ku mirov karibe bi hostayî, rê li ber herikan-

dina wê êş, jan, şewt û teqandina volkanên hundirê xwe, veke. Li ba min, ew meteryalên sincirî yê wan volkanên teqiyayî, geh dibin çîrok, geh jî dibin roman.

✓ *Ji “toza Girê Şermola” heta bi jiyana Ewropê ku di berhema dawîn de te ev mijar daye ber dasa xwe ya edebiyatê; mirov dikare qonaxên nivîskariya Helîm Yûsiv çawa pê nase bike?*

Bi rastî ez çu qonaxan nas nakim. Herwisa ez nizanim bersiva pirsên giştî, yê girêdayî nivîskariya xwe bidim. Ji ber ku têkiliya min bi vî warî re têkiliyeke hestiyar û hisî ye. Ji bo min her pirtûkeke min qonaxêke taybet ya jiyana min e. Hemû jiyana min, hemû êşa min, herwisa hemû kêfa min di hundirê wan pirtûkan de belavbûyî ye. Wisa pirtûk bi pirtûk, ji “Mêrê Avis” ku cara yekem li Şamê, di 1991ê de derket, heta “Ausländer beg” ku li Amedê, di 2011an de derket, heşt qonaxên cuda û cihê hene. Xala hevbeş ya di nav hemûyan de, ew e ku hemû qonax encama şewata rihekî ne, ya giyanekî ne ku tenê li ser jana agirê ku bi laşê wî ketiye, nivîsandiyê. Toz û dûmana ku ew bi xwe xeniqandiyê kiriye peyv û hevok. Giyanekî wisa ye ku heta dawî bi xwe re, bi pênuşa xwe re, bi rastiyê re, bi xemgînî û trajediya ku tê de dijî re, dilsoz e.

✓ *Tu çawa mijara xwe ya nivîsê diyar dikî?*

Carinan heta ku mijara nivîsê diyar dibe sal diçin. Carinan jî ji nişka ve mijarek bi qepera mirov digre û nema dev ji mirov berdide hetanî ku bibe çîrok yan jî roman. Carinan jî mirov dest bi nivîsandina mijarekê dike, di

kêlîka nivîsandinê de, mijareke nû xwe dide pêş û cih nema dide mijara destpêkê. Carinan bûyerek, yan jî wêneyek yan jî axaftina bi hevalekî re, yan jî xewnek dikare rê li ber mijara nivîsê veke. Ez bi xwe di jwariyeke mezin di dîtina mijaran de nabînim. Ji vî alî de, ji ber ku ez Kurd im, ez xwe weku nivîskarekî xwedîşans dibînim. Nivîskarê Kurd pêdiviyê bi gera li mijaran nabîne. Mala wî tije mijar û materyalên nivîsandinê ne. Tenê, tu Kurd bî, ew bi serê xwe kaniya hezarê mijaran e.

✓ *Helîm Yûsiv xwe têkilî jiyana karakterên xwe dike; heta kuderê tu hukm li wan dikî, an nexwe piştî tu wan durist û berceste dikî êdî ew te li pey xwe dibin?*

Karakterên min, wekî ku kesin ji min dûr û bi serê xwe ne, wisa jî beşekî giyanê min in. Her karakterek hinek ji xwîna min di rehên bedenê wî re diçe û tê. Bi ketina qaşilên birînên wan re dêşim, bi şabûna wan re şa dibim û bi şikestinên wan re xemgîn dibim. Karakterên min, weku xwe tevdiagerin, weku xwe dijîn, weku xwe diramin û weku xwe dikin. Tiştê ez dikim tenê ew e ku ez deriyê jiyana ji peyvên li ber wan vedikim û destdirêjiya jiyana wan nakim. Ji ber vê, hinek ji wan pir ji min nêzik in û dibe carinan ez bi xwe bim, carinan jî kesin dûrî min in û min aciz dikin. Di vê çarçovê de, giring e ku ez, rê li ber xeyala karakterên xwe vekim, ez xeyalên wan bi desthilatdariya xwe neşikînim. Ez wan li ser kêfa wan bihêlim û xwe jî ji rola xwe, weku nivîskar, bêpar nehêlim. Ev lîstika afirandinê, mirinê û jiyane

ye. Her kes rola wî heye. Dibe ku xeyal bê sînor be, lê rol, herdem, bi sînor e.

✓ *Gelek nivîskar piştî berhema wan hate ser destxana weşanê û li nav xwendayan belav bû, êdî bela xwe jêvedikin; tu qet li berhemên xwe yê çapbûyî vedigerî. Heke vegeerî dibêjî “xwezî” ev der weha nebûya?*

Jina ducanî hetanî ku zaroka wê çenebûbe, ji bo zarokeke saxlem, xweşik û bêqisûr bîne, dikare her tiştî bike. Her bandorê li wê zaroka ku di zikê wê de ye bike. Lê, piştî ku zarok hate dinyayê, êdî dibe xwedî reng û xislet û taybetiyên ku diya wî nema dikare wan biguhere. Wisa jî piraniya zarokên ku seqet tên dinyayê, ne dê û ne bav nikarin ji wan re bibin çareserî. Rewşa min jî bi berhemê re, mîna rewşa wê diyê ye. Berhema min, hetanî ku li ber destê min be, dikare bi her awayî bê guherandin, lê piştî ku çap dibe, ramana guherandinê ji serê min tê avêtin.

Heta niha, herdem di pirsgerêkên ziman û rastnivîsinê de, piştî çapkirina berhemê, xwestekên weha bi min re çêbûne. Gelek berhemên min hene ku tenê ji bo vê mesela zimên û sererastkirinê, ez dixwazim bi awayekî din bîne çapkirin.

✓ *Helîm Yûsiv, karakterên xwe li gorî dem û cih durist dike, an mekan û dem tenê ji bo xurtbûna karakteran tenê navgînek in?*

Karakter û dem û cih-mekan sê tiştên ku bi hev ve girêdayî ne û pirê caran bi hev re ji dayik dibin. Pevgirêdana van her sê elementan stûna avakirina

her berhema wêjeyî ye. Li cem min, yekem qonaxa afirandina berhemê hest û kelecana giyanê min e. Di qonaxa duyem, ya honandin û avakirina mîmariya berhemê de, rola mejî û aqil derdikeve pêş. Karakter û dem û cih, ev hersê element, di qonaxa yekem de, bi hev re û jixwebere, têne holê. Ji ber vê, ez pêdiviyê nabînim ku ez rûnê û ji bo afirandina berhemekê li ser şêwe û awayê têkiliya karakter û cih û demê bifikirim. Lê, divê ez li xwe mikur bêm ku hemû berhemên min, berî dem û cihî, bi avakirina karakterên taybet ve mijûl in.

✓ **Tu pêşveçûna edebiyat û wêjeya me çawa dibînî; Helîm Yûsiv ji vê rêçûnê bêzar e?**

Wêjeya Kurdî wêjeyeke bê-xwedîye, wêjeyeke lierdêmayîye. Dewleta Kurdan tune. Siyaseta Kurdan siyaseteke kelê, zuha û li hember zimanê serdestên xwe bi kompleks e. Cihê wêjeyeke ast-bilind di nav dezgeh û projeyên wan de tune. Dezgehên ku bi navê çand û wêjeyê avakirine, dezgehên propaganda û qalikên vala û bênaveroke in. Pîvanên karkirina di van dezgehên de jî, pîvanên îdeolojîk û girêdayî xeta rêxistinên siyasî ne. Anku di ras-

tiya xwe de dezgehên rêxistinî ne, lê kirasê çand û wêjeyê li wan hatiye kirin. Bi gotineke din, hêviya min tenê di pênuşên çend nivîskarên Kurd de heye, ku bi keda xwe ya takekesane, bi belengazî û serhişkiya xwe xwîneke nû didin wêjeya Kurdî û wê bi pêş de dibin.

✓ **Pirseke taybet: Heke Helîm Yûsiv nenivîsiba dê çi bikira, gelo xweziya te piranî bi çi tê?**

Aniha jî wekî ku ez nanîvisînim, ez dijîm. Jiyana min ne jiyana nivîskaran e. Ez rojê heşt seetan, di dezgeheke wergerê de, ji bo debara jiyana xwe bikim, kar dikim. Du zarokên min çêbûne. Ez wext nabînim ku ez serê xwe bixurînim. Ji bo nivîsandinê, ez carê demê ji xwe re didizim û dinîvisînim. Ez rojekê ji rojan ji nivîskariyê re vala nebûme û weku nivîskarekî nejiyame hetanî ku ez xweziya xwe bi tiştêkî din bînim. Ez dikarim vê bêjim ku ez xweziya xwe bi jiyana nivîskarên ne Kurd tînim.

✓ **Pirseke aktuel: Wek tê zanîn tu ji Kurdistana Sûriyê yî û îro li welatê te aloziyên mezin hene, tu wek nivîskarek dîtînen xwe yên bo vê pêşveçûnê bi çend**

hevokan dikarî bi me re parve bikî?

Ji 15ê Adara 2011an de, li seranserê Sûriyê, rojavayê Kurdistanê jî di nav de, şoreşa azadiyê li dar e. Gav bi gav, xulek bi xulek ez pêvajoya vê volkana ku ev pêncî sal in bêdeng e, dişopînim. Dilê min bi xortên Amûdê re ye, bi vî nîfşê nû yê Sûriyê re ye. Ez jî, mîna bi hezarên nivîskar û hunermendên Ereb û Kurd, ku li derbideriyê dijîn, li benda sekinandina herikandina xwîna azadîxwazên Sûriyê me, da ku rê li ber wê yekê vebe ku em karibin rojekê be jî bayê hênîk yê azadiyê li welatê xwe bixînin. Ev welatê ku hem tirsê û hem bêdengiyê ew ji pêvajoya dîrokê derxistibûn. Hêviya min mezin e ku wê sala nû serkeftina şoreşa Sûriyê ya azadiyê bi xwe re bîne. Min bêriya toza Amûdê kiriye, vê paqijîya Ewrûpayê rihê min zuha kiriye. Divê ev rêjîma hov hilweşe, ez vegerim û carekê be jî çavên xwe bi dîtina vî dîmenê nû kil bikim. Herwisa beşdarî pîroztîrîn kar di jiyandê de, bibim. Bi kesên wekî xwe re, şaxên dara azadiyê ya kesk ji toza zordariya kor û mirina temendirêj daweşînim. ●

HELÎM YÛSIV KÎ YE?

Di sala 1967an de li Amûdê, rojavayê Kurdistanê (Sûriyê) ji dayik bûye. Li zanîngeha Helebê Fakulteya Hiqûq qedandîye û ji sala 2000î de li Elmanyayê dijî. Bi dehan gotarên wêjeyî di kovar û rojnemeyên Erebî û Kurdî de weşandine. Heta niha berhemên wî bi Kurdî, Erebî, Tirkî û Elmanî hatine weşandin. Ji sala 2000î hetanî 2011an, di televîzyonên Kurdî de, bernamayeke wêjeyê bi navê "Gava sêyemîn" amade û pêşkêş kir.

Berhemên wî yê çapkirî ev in:

1-Mêrê avis-Çirok-1991, Şam.

2-Jinên qatên bilind-Çirok-1995, Beyrût.

3- Mîrî ranazîn-Çirok-1996, 2002, Istanbul

4- Sobarto-Roman-1999, Istanbul

5- Memê bê Zîn-Çirok-2003, Istanbul

6- Tîrsa bê diran-Roman-2006, Istanbul

7- Gava ku masî tî dibin-Roman-2008, Amed

8- Romana Kurdî -Lêkolîn- 2011, Amed

9- Ausländer beg-çirok- 2011, Amed

Ji Şanoyên ku ji nivîsên wî hatine girtin :

Komara dînan,

Bidarvekirina pozeki,

Sol û seri.

Li ser romanivîsiya Mahmut Baksî

ÎSLAM GELIŞ

Wêjeya Kurdî her û her bi gor civaka xwe û jiyana wê durv û teşe girtiye. Her guherîn û veguherîneke civakî, çandî, siyasî û kulturî kiriye ku wêje jî bi gor wê xwe veguhere. Bi geşedan û pêşketina civaka Kurd ya di warê bajarvanî û çandiniyê de di warê wêjeyê de jî cureyên nû (roman, pexşan, şano hwd) hate bicihkirin. Şikir ku îro di warê romanê de em gihiştîne asteke dilxweşker. Hinek kes hejmara romanên Kurdî ji ser 400î re bi lêv dikin (Ahmet Onal-xwediyê weşanên Pêrî).

Tevî vê rewşa dilxweşker mixabin di derbarê nixandî û çawaniya romana Kurdî de ji bilî nivîsên danasînî tişteke berbiçav tune. Ez dixwazim bi gor zanîn û feraseta xwe çend dilopên ku ji xwêdana hişê min derçûne tevî rexneya romana Kurdî bikim.

Bêguman ev karekî pir zor û zehmet e. Lê divê romanhezên Kurdî di derbarê romanên ku xwendine, yan jî yên ku dê bixwînin de, bibine xwedî hinek agahiyan. Ez dê di vê rêzenivîsa xwe de bi kurtî be jî di gel romana Kurdî, reng û nexş û taybetiyên wê di qada romana cîhanê de û

li gel romana netewên cîran jî destnîşan bikim.


Ji bo destpêkê min xwest Mahmut Baksî û berhemên wî ji xwe re bikime mijara nixandî. Lew Mahmut Baksî hem bi liv û livbaziya xwe -çi siyasî, çi wêjeyî- û hem jî bi nivîsa xwe di nav gelê xwe de kesekî herî tê nasîn e. Her wiha wek ku hûnê li jêr jî bixwînin Mahmut Baksî di romana Kurdî de xwedî reng û şêwazeke cuda ye.

Kurtenaverok

Mahmut Baksî bingeha romana xwe li ser pergala kapîtalîzmê û jiyana feodal avakirîye. Bi nêrînek realîst, hemû rengên civaka Kurd hûr hûr nixandiye û rastiyan jiyane wek dîmeneke zindî daniye ber çavên xwendevanan.

Di romana Mahmut Baksî de piranî dîmenên ji civakê yên wê demê hatin hûnandin

Romana *Gundikê Dono* bi hatina biharê, evîna Aso û Bedo dest pê dike. Lê li gorî min nivîskar bi zanebûn ew herdu dîmenên xweşaniye ber çavên xwendevanan,



ji ber ku piştî deh rûpelên din em dikevin nava xirecira gundiyan, zordariya axayan, feqirtî û belengaziyê.

Mijara romanê zêdetir di navbera salên 1950-1970ê de dibore. Di navbera wan salan de dewletê otorîteya xwe ya derve bi destê axayên zordar û zilimkar bi dest dixist. *Baksî jî, di wan salan de di nav civakê geriyaye û bi çavên xwe bûye şahidê gelek bûyeran. Ji ber wê yekê, em dikarin bêjin di romana Gundikê Dono de tiştên çêkirî, awarte û fantastîk cih nagirin û her wiha derdora mijara romanê lê dibore jî herêmeke rastî ye û navên gund, çem û çiya ji navên raste-rast yên herêmê ne. Wekî çiyayê Mereto, herêma Xerziyan, gundê Siphîyê, gundê Hezo, Gundikê Dono, Bişêriyê, Kurtalan, Kaniya Binevşê, hemû navên herêma li derdora Batmanê ne. Cihê mijara romanê lê diborin jî ev der in. Bûyerên romanê jî bûyerên di nav dîrokê de qewimîne û ne dûrî rastiyên jiyânê ne. Şerê mala Eliyê Ünîs, di dema wî şerî de nefîbûna Kurdan a Anatoliyê (Salo û Perîxan jî yek ji wan in) û şerê çiyayê Sasonê.*

Mahmut Baksî çarçoveya romana xwe gelek baş xêz kiriye, di navenda romana Gundikê Dono de axa daniye serî û bûyerên romanê hemû li derdora axa zivirandîye. Axa ji (Hecî Zorav) hemû aliyan de ketiye bin bandora pergala kapîtalîzmê. Bi hatina makîne û motoran, karê ku gundiyan dikirin ji dest wan derdikeve. Êdî axa ne hewceyî kar û keda gundiyan e. Roj bi roj gundî di bin lingê axa de tîn perçiqandin, di nav feqirtî û xizaniyê de dimînin. Axa gundiyan sal bi sal dike deyndarê xwe, bi wê



Mahmut Baksî digel Yilmaz Guney

sedemê re mal û milkên wan ji destê wan derdixe wan mecbûrî koçbûnê dike. Axa ne tenê mal û milkên gundiyan, her wiha keç û bûkên bedew jî wekî malê xwe dihesibîne û wan jî bê pirs û sual têxe paşla xwe. Axa ji mal û milk têr nabe, her wiha divê kevneşopiyên warê Xerzan jî li gorî berjewendiyên xwe biguhere. Li gorî şecereya malbata xwe diviya bibûya şêx, lê axatî ji karê xwe re baştir dîtiye. Aqilmendê wî Zibeyrê Ehmê jî êdî bi kêrî karê wî nayê divê ew ji cihê xwe bide hakim û ebûqatan...

Gayên reş, kerên bozbelek, hespên rehwan cih dabûn motoran, jîp û kamyonan. Diviya Zibeyr jî cihê xwe bida ebûqatan, hakim, katiban...(r. 26)

Her diçe zilm û zordariya axa li ser gundiyan zêde dibe. Piştî demekê gundî li hemberî axa dibin yek û axa bi destê xwe sedema kuştina xwe amade dike. Di sê deverên romanê de axa çîroka xwe têxe rêya xeter.

1-Filîto bi darê zorê, bi

alîkariya cendirmeyan ji gund derdixe.

2-Aqilmendê xwe Zibeyrê Êhmê li ber çavên gundiyan dide ber şemaqan û têxe destê cendirmeyan. Li warê Xerzan cara yekem e axayek wiha li aqilmendê xwe dike.

3-Dawiyê jî bi hezkiriya Bedo, bi Aso re dizewice û sedema kuştina xwe hêsantir dike.

Filîto, Zibeyrê Ehmê û Aso piştî wan bûyeran, dafik li ber Hecî Zorav çêkîrine. Hecî Zorav, bi xwe dikeve dafika wan. Filîto, hew dikare li ber kîna dilê xwe bide. Zibeyrê Ehmê dixapîne, li nava gund Hecî Zorav dike û bi ser de xwe jî dide kuştin.

Di romana Gundikê Dono de şopên realîzmê

Zanistî di sedsala 19ê de gelek pêşve çûye, ev pêşveçûna zanistê bûye sedema pêşveçûna teknolojiyê û teknolojiyê jî bi gelek aliyan de jiyana mirovan guhartiye. *Felsefa pozîtîvîzmê (jî), ku ji aliyê Auguste Comte ve, di*

sedsala 19ê de derketiye holê û wî bingeha felsefa pozîtîvîzmê "mirov bi çavên xwe çî bibînin, baweriya xwe jî li wê tînin" avakiriye. Pozîtîvîzm di serî de li ser zanistiyê hatiye peytkirin (çêkirina Erebyan, pêşveçûna bijîşkiyê)? Dûv re nivîskarên realîst pozîtîvîzm li ser çîrok û romanê ceribandine û bi wî awayî herka realîzmê bi destê nivîskarên wek Balzac, Stendal, Emile Zola li ser wêjeya cîhanê cih girtiye.

Mijara realîzmê rastiya jiyane ye, bûyerên awarte û fantastîk tê de cih nagirin. Tiştên di jiyana mirovan a rojane de "diqewimin, an jî dibe ku biqewimin" raste-rast wek dîmeneke zindî li ber çavên xwendevanan re diborin. Nivîskarên realîst hest û ramanên xwe tevî nivîsa xwe nakin ji ber ku hestên mirov gelek caran mirov dixapîne. Stendal vê mijarê wiha dinirxîne, "Nivîskar neynika xwe li ser rêyeke dûr û dirêj digerîne, di neynika xwe de çî dibîne divê di romana xwe de jî wê binivîse."

Di realîzmê de rêbaz û bikaranîna ziman xwedî cihê girîng e. Nivîskar divê bi hevokên herikbar, peyvên wateya wan zela-lal re, xwendekar di nav nivîsa xwe de winda bike. Nivîskarê Tirk Yahya Kemal li ser bikaranîna ziman wiha dibêje, "Tirkî di devê min de wek şîrê dêya min e" nivîskarên realîst jî wek Yahya Kemal ziman bi kar tînin, divê bê zor û zehmet peyvên wan bîn daqurtin.

Piştî van agahiyên li ser herka realîzmê ka berê xwe bidin romana *Gundikê Dono*, Mahmut Baksî çî avayî realîzm bi kar aniyê.

Mahmut Baksî bingeha romana xwe li ser pergala kapîtalîzmê û jiyana feodal avakiriye. Bi nêrînek realîst, hemû rengên civaka Kurd hûr hûr nirxandiye û rastiyan jiyane wek dîmeneke zindî daniye ber çavên xwendevanan

Rêbaz û ziman

Mahmut Baksî, hemû rengên herka realîzmê bi awayekî hunerî pêk aniyê. Di bikaranîna realîzmê de ne dûrî nivîskarên Ewropî ye. Her wiha ji aliyê teknîkê ve jî romana wî em dikarin têxin di nava romanên rojhilat ên sereke de. Dema mirov romana *Gundikê Dono* dixwîne, bi eşkere dibîne ku Mahmut Baksî çiqas serwerê zimanê Kurdî ye. Bi rêbazeke saxlem, hevokên kurt, peyvên xwerû û sade, mohra hunera xwe li romanê dide. Bi taybetî diyalogên di nava lehengên romanê dibore de hunera xwe bêhtir aşkera dike. Mirov dibêje ku li pêşberî nivîskar leheng diaxivin û ew dinivîse.

Eyşanê berê xwe da feqî Mihemed û got:

-De Feqî Mihemed wext derenge; divê tu terqîna Doxê bixwînî...

-Terqîna çî Eyşan? Feqî Mihemed got. Me terqîna kûçikan jî seh kir.

-Çima, Feqî Mihemed. Ma Doxê ji dêya Zibeyrê Ehmê kêmtir e?

Zibeyr fikirî ku Mihemed naxwîne, destê xwe xist kerrika guhên xwe bi dengê bilind got:

-Ya rebî tu ruhê Eyşanê û Doxê bi hev re bistîni, welîllahîl hemd..

Pişqînî bi gundiyan, bi Hecî Zorav ket. Kêfa Eyşanê jî hat. Ji ber ku piştî miriyan, ken baş bû li ba Xerziyan. (r. 34)

Wekî em dizanin Mahmut Baksî di rojnameyên Tirkî de dest bi nivîsê kiriye ji ber wê yekê di gelek deverên romanê de bandora zimanê Tirkî xuya dike. Bi zêdehi jî ew bandor li ser biwêjan û pêşgotinên Tirkî pêk hatiye.

Ker ji xoşavê çî fêma dike. (eşek hoşaftan ne anlar) Kurdiya wê, "ker û bihok; an jî ker çî hay ji bêhna bihokê ye."

Hecî Zorav kevîr diavêtin Zibeyr: (Hecî Zorav Zibeyre taş atı-yordu) Kurdiya wê, "Hecî Zorav tan diavêtin Zibêr."

Lehengên romanê

Roman an jî çîroka di bin bandora herka realîzmê de hatî nivîsandin, lehengên wê jî divê bi hemû livînên xwe, bi hemû tevgerên xwe ve bişibin mirovan. Divê leheng jî ji nav jiyane hati-be hîlbijartin û jiyana wî jî wek jiyana wan mirovên din be. Bi taybetî derdora leheng bando-reke mezin li ser çêdike, bi şert û mercên derdora xwe ve dibe xwedî karakter. (afirînek)

Lehengên romana *Gundikê Dono*, bi hemû livînên xwe, gotin, fikr û ramanên xwe ve mirov in. Baksî viyaye ku li ser kesayeta lehengan mijara romana xwe bîne ziman ji ber ku her lehengek xwedî peywîr û semboleke girîng e.

Li ser kesayeta şofêrê Hecî Zorav Salo, em dizanin zimanê Tirkî bi çî awayî hatiye gundên Xerzan.

Bi hatina van şofêran cara pêşî zimanê Tirkî ketibû nava gundên Xerzan. Salo jî yek ji van şofêran


bû. Ji zimanê makîneyan. Ê motoran baş fêhm dikir. Hosteyekî bi nav û deng bû. (r.18)

Nivîskar Perîxana jina Salo wek sembola guhartinê bi kar aniye, ji ber ku hatina Perîxanê li Gundikê Dono bûye sedema guhertineke mezin. Keç û bûkên gund gelek tişt cara yekem bi saya Perîxanê dîtine. Ne tenê xort, pîr û kalan jî xweziya xwe bi Perîxanê tîna.

Hatina Perîxanê, Gundikê Dono guherandibû. Êdî keç û bûkên Gundikê Dono jî dixwestin wekî Perîxanê li xwe kin. Serê etarên Sêrtiyay li ser rêya Gundikê Dono li hev diketin. Basmên gulgulî li bejnên delal û nazik dihatin. Şimikên rengîn, şimikên bi sîm serê pêçikên keçan dixemilandin. Doxînên benik xwe li ber doxînên lastik nedidan. Bêhna rêxê, bêhna portê û lewantê, di nav gund de ketibûn şer. Şerqina eynik, neynik û şehên naylon ji berîkên fistanên keçan bilind dibûn.

Bi kurtî, hatina Perîxan û Salo aqilê keçan ê bûkan û xortan tev li hev kiribû tiştên kevn û nû bi hev re zeliqîbûn (r. 19)

Li nav civaka Kurdan aqilmendî û xulamî xwedî dîrokeke kevnare ye. Em dikarin bêjin dera axa, beg û mîr hebin, xulam û aqilmendê wan jî hene. Her wiha di destana Mem û Zîn a bi nav û deng de, li ber derê mîr Zeydîn xulamê wî Beko heye. Beko di destana Mem û Zînê de xwedî roleke mezin e. Rewşa çîroka li ser rola Beko dileyîze hatiye guhartin. Di romana *Gundikê Dono* de nivîskar ew rastiya civakê bi nêrîneke realîst, bi awayekî hostayî pêk aniye. Bi taybetî aqilmendê Hecî Zorav



Zibeyrê Ehmê xwedî roleke girîng e, li warê Xerzan ji aqilmendan re digotin "hes" û pir qedr û qîmet bûn. Baksî di romana xwe de wiha behs kiriye:

Zibeyrê Ehmê aqilmendê Hecî Zorav bû. Di nav axayên Xerzan de aqilmendî adeteke kevin û dîrokî bû. Li warê Xerzan ji wan re digotin "Hes", lê nêrîn, gotin û rexneyên wan pir bi qiymet bûn. Hes di peyv û rexneyên xwe de serbest bûn. Li gorî dîroka Xerzan ew axayên ku li gorî hesên xwe nemeşiyane û guh nedane wan, tim û tim zîrar kirine. Hesan dikarîbûn li ber gundiyan, vekirî, eşkere rexne bianîna ser axayên xwe û bala wan bikişanda. Ji bo vê yekê Hecî Zorav eşkere newêribû bela xwe li Zibeyrê Ehmê bida (r. 25-26)

Romana Gundikê Dono bi evîna Aso û Bedo dest pê dîke, lê nivîskar evîna wan nexistiye navenda romana xwe. Bi hev re taybetiyên wan herdu lehengan evîndariya wan e. Lê min divê bi gorî taybetiyên wan, ez Aso û Filîto bi hev re, binirxînim. Ji ber ku rola herdu lehengan bi hev re ji evîndariya Bedo û Aso

girîngtir e. Herdu leheng bi sembola mêranîyê derdikevin pêşiya me. Aksiyona romanê bi wan re bilind dibe û nîfs dibe.

Filîto zavayê Hecî Zorav e. Hecî Zorav bi darê zorê Filîto ji gund derxistiye. Lêbelê Filîto ew heyf nehiştiye ji Hecî Zorav re. Hespên wî didize, li dorî gund digere, xewa şevê li Hecî Zorav heram dike.

Aso hezkiriya Bedo ye. Bedo jî, ji ber zilma Hecî Zorav reviyaye çûye bajêr. Aso li gund tenê maye. Li nav keçên gund de a herî bedew Aso ye. Ji ber vê yekê di ser sê jinên xwe re jî Hecî Zorav ew xwestiye û Asoyê jî dixwe paşila xwe. Mixabin ew tişt bi hêsanî pêk nehatiye. Hecî Zorav bi destê xwe hêdî hêdî kuştina xwe amade dike. Wekî me got, nivîskar ji evîndariyê zêdetir/pirtir rola mêranîyê daye Aso. Piştî Hecî Zorav bi Aso re dizewice, Aso bi destê xwe dîroka mirina wî dinivîse û wî dike 'gayê xesandî'. Ka em binêrin Aso çi aniye serê Hecî Zorav.

Eyşanê bi milê Hecî Zorav girt û kişand:

-Tu çi dikî Hecî Zorav, Eyşanê got. Ma te Aso ji bo çi anî? Ku tu berzika we dax kî, çi gû ma Hecî? Ez bawerim tu ne li hemdê xwe yî.

Hecî dahfek li Eyşanê da. Eyşan teniştîkî li erdê ket. Xanima boşatî bistika sor da destê Hecî Zorav. Xanim ji kêfa difiriya. Hecî Zorav kirasê Asoyê rakir destê xwe avêt derpiyê wê û jê şeçitand. Serê bistîkê nêzî navrana wê kir. Asoyê ji hewla canê xwe gunikê Hecî Zorav girt û bada. Qurînî ji Hecî Zorav çû. Qurequra wî Gundikê Dono hejand. Asoyê

bi herdu destên xwe bi gunikên wî girtibû û bernedida. Di bistekê de bi wî govdeya qirase, serqûnkî li erdê ket û bêhiş ma. Wekî gayê pîr fişefiş dikir. Serê wî di nav xwêdanê de mabû. Her sê hewiyan kir nekir, nikaribûn gunikên Hecî Zorav ji destê Asoyê derxistina. Gundî li ber derê koşka Hecî Zorav kom bûbûn.

Sebrîko û Ezdîn ketin holê. Ezdîn bi kotek gunikê Hecî Zorav ji destê Asoyê derxist. Nalîneke dijwar ketibû qirika Hecî Zorav û dikuxiya... (r. 64-65)

Em dikarin bêjin lehengê herî balkêş Hecî Zorav e ji ber ku nivîskar bûyerên romanê hemû li derdora wî zivirandine. Hecî Zorav bi sê teybetiyên xwe derdikeve pêşya me.


1) Ketiye bin pergala bayê kapîtalîzmê. Bi hatina mekîne û motorên Anadolîyê, zilma wî jî li ser gundiyan zêde bûye. Her diçe gundî ji ber zilma Hecî Zorav ji gund koç dikin û Gundikê Dono hindik dibe.

2) Ji jinan pir hez dike, sê jinên wî hene lê dest diavêje Perîxana jina Salo û herwiha hezkiriya Bedo Aso jî ji xwe re xwestiye, lê Aso ew kiriye "gayê xesandî" û êdî Hecî Zorav ketiye derdê xwe paqijkirinê.

3) Nivîskar bi awayekî mîzahî nêzikî Hecî Zorav bûye. Ew çiqas zilma xwe li ser gundiyan xort dike nivîskar wî li ber çavên gundiyan û xwendevanan bi awayekî pêkenî pûç dike.

Hişyarbûna Civakê

Mahmut Baksî di romana *Gundikê Dono* de ne tenê axayên zilimkar û zordest bi kar anîne her wiha viyaye bi rêya lehengê



romanê, peyamekê jî bide xwendevanan.

Hecî Zorav bi hemû fikr, tevger û ramanên xwe ve ketiye bin bandora pergalê. Li gorî wî dê rojek bê, dewlet dê wî xelat bike û her biçe payeyên bilind bidinê. Heta niha jî, jiyana xwe li ser wê rêçê meşandiyê. Li pêşberî gundiyan xwe alîgiriya dewletê kiriye û hakim û qeymeqamên dewletê jî, dema "Hecî Zorav dibînin jê re dibin erd."

Mahmut Baksî li hemberî Hecî Zorav, Mihemed Beg daniye. Mihemed Beg, li gorî bûyerên di nav dîrokê de qewimîne dîzane ku dema karê dewletê ji Hecî Zorav xilas bibe dê çî bînin serê wî.

Mehmed Begî kesereke hûr kişand û keniya. Destê xwe avêt rûyê xwe yê sipî, erçena xwe xurand. Serê xwe bilind kir û got:

- Hahî, hahî Rizgo axa... Ma we çî zû ji bîr kir lawo? Ma ên bavên me, pismam û hogirên me, ne cendirme bûn? Ji Osmanîyan heta niha, ên me dikujin, kî ne gelo? Malik ava. Roja keysa hikûmatê li me bê, dê me tevan bi

dar de ke. Çawan hûn jî dizanin, ji Şêx Seîd û vir de, bi dehan serhildan çêbûn. Lê tiştêk neçû serî. Çima? Ji bo ku yekîtiya aqûbeta me tune bû. Em kewê gozel in, kewê gozel. Mêrikê gundî tim û tim, daye pey me. Zar û zêçên xwe di rêya me de dane kuştin. Lê em bi xwe, bextreş in, nankor in. Em ji tarîxa xwe ders nagirin. Roja keysa me tê, em destê xwe dixin qirika mêrikê gundî û dixeniqînin. Ez bi serê Feteş begê kim, dostanî û dijminatîya hikûmeta Tirkîyeyê yek e; di navberê de ferq tune. Tu pê bî jî û tu li balê bî jî, rewş naguhere. Ma şerê mala Eliyê Ünîs nayê bîra we? Bi dehan axayên dora Sasonê bi hikûmetê re bûn yek û çûn ser birayên xwe. Piştê çî bû? Hikûmetê ew axa jî nefiyê Anadolîyê kirin, berê zar û zêçên wan dan xurbetê. (r.79)

Civaka Xwezayî

Civaka Kurd bi gelek taybetiyên xwe ve ji wan civakên din cûda ye. Yek ji taybetiya Kurdan ew tiştên li nav wan civakên din neyên axaftin û wek tabû tînin, jin û mêrên Kurdan, wan di nav xwe de bi eşkereyî diaxivin, pê henekan dikin. Lehengên romana *Gundikê Dono* jî îşê xwe yê şevê (hevghihîştina mêr û jinan) ji hev venaşêrin, di nava xwe de eşkere pê diaxivin. Mêr pesnê xwe didin ku bêhtir jêhatiye. Nivîskar ew taybetiya jiyana Kurdan baş dîtiye, herwiha ne tenê mêr, jin jî xwe ji îşê şevê re ji hev du jêhatî dikin, wekî jinên Hecî Zorav dora xwe ya şevê nadin hevdu.

Menco li Eşyanê zivirî û got:

-Ez û tu êdî pîr bûne Eşyan. Em êdî çêlekên stewr in. Tu bi

ya min bikî, emê dora xwe bidin van herdukên biçûk. Aşê me wek berê naşixule Eyşan. Zarokên me zewicîne, em xwediyê neviyan in. Jiyana ne tenê îşê şevê ye ez qewaş.

Gotinên Mencoşê, Eyşan dîn kir. Kef bi ser devê wê ket. Ji qutika xwe hinek kêf kişand. Pişka çilma wê li rûyê Menco ket. Eyşanê devê xwe tije kir û got:

Fesadokê qûnpanê!.. ma tu jî jin î. Ma bi te ve aş maye, ku bişixule Menco? Aşê te zû ve çûye, maye çeq çeqo rebenê.

Menco got:

-Bes e van peyvan bikin Eyşan. Ê te çeqçeçok jî nemaye; dînê. Madem aşê te baş dihêre, ev çi hewî ne Eyşan? (r. 63)

.....

-Qey li mal e Hecî. Ma ez herim gazî bikimê? Çawan li mal e û çawan nayê nimêjê? Bi serê bavê min şeva çûyî Zibeyr li ser sînga Fatmoka kor fetisiye. Go, 'Mirîşkê çav li qazê kir, qûna xwe çirand.' Ev jî Zibeyr e. Kuro Zibeyrê Ehmê, pepûko, tu li ku, îşê şevê li ku... Ma tu dikarî piyê xwe bidî piyê min, Zibeyrko. (r. 60)

.....

-Keçê ka Zibeyr? Hecî pirsî. Êdî bes e, te malik lê xerab kir. Pêşîra rebeno berde. Bi gora bavo, min digot qey Zibeyr li ser sînga te fetisiye.

Fatmokê bi awirên tûj li Hecî Zorav mêze kir û got:

Hecî Zorav, Zibeyr ne li ser sînga min e. Ew di dilê min de ye. Ku tu bikarî derxî kerem ke derxe. (r. 61)

Yek ji teybatiya civaka Kurdan dijûnkirin e, ez bawer dikim ku Mahmut Baksî hemû cûreyên

Mahmut Baksî 22 pirtûk nivîsandin û li welatên cihê hatin weşandin.

Gelek ji wan hatin wergerandin. Zimanên ku pirtûkên wî hatine wergerandin: Swêdî, Danîmarkî, Elmanî, Ingilîzî, Kurdî, Norwecî, Tirkî û Holandî

dijûnkirinê ên warê Xerzan tevî mîzaheke xurt rasterast ji nava jiyane wergirtiye:

-Hesenê kose, kûçikê eşîreta Xiyana. Haya min ji dafikên te û Zibeyrê Ehmê heye... Ezê keran berdim ser dê û jina te. Ha vêga divê tu mala xwe ji gund bar kî. Naxwe ezê Ferîdoka jina te di bin cendermeyan de avis kim... (r. 74)

Bandora Yaşar Kemal

Nivîskar hem ji aliyê teknîkê ve hem jî ji aliyê mijarê ve maye di bin tesîra Yaşar Kemal de. Piştî sala 1950yê romanên li ser jiyana gundiyan ketine rojevê, bi taybetî Yaşar Kemal hemû quncikên jiyana gundiyan di romanên xwe yên rêza Înce Memed I, II, III, IVê

Çend berhemên wî

-Botan (1969)

-Zarokên Îhsan (1978)

-Hêlîn (Helîn) (1984)

-Gundikê Dono (Dono'nun Köyü) (1988)

-Serhildana Mala Eliyê Ünîs (2001)

-Kürt Gözüyle Yılmaz Güney

de bi zimanekî helbestî nivîsiye. Jî xeynî Yaşar Kemal di heman demê de Mahmut Makal (Bizim Köy), Peride Celal (Üç Kadının Romanı), Kemal Bilbaşar (Cemo-Memo) jî roman li ser jiyana gundîtiyê nivîsîne. Nivîskarên jiyana gundiyan nivîsîne, ne dûrî wê jiyane ne.

Piştî li Anadolîyê Enstîtû hatin vekirin, nivîskar jî ketin nava jiyana gundiyan û piştî demekê ew jiyana ku bi çavên xwe dîtî û jiyayî, bi zimanekî hunerî nivîsîn. Jiyana Mahmut Baksî jî heta demekê li nav gund bihuriye û wî, ew jiyana bi çavên xwe dîtî bi awayekî realîst êxistiye nava ristika hunera xwe. Çawa ji romanên Înce Memed re dibêjin romana însanê mecbûr e. Romana Gundikê Dono jî ya wan însanên mecbûr e ji ber ku Hecî Zorav ji xeynî kuştina xwe tu rê nehiştine ji gundiyan re.

Di romana Yaşar Kemal de dema Înce Memed axayekî di kuje wiha dibêje: "Ew axa çû dê yekî din bikeve şûna wî, bi kuştinê dawîya wan nayê. Di romana Gundikê Dono de Filîto divê Hecî Zorav axa bikujê lê Zibeyrê Ehmê wiha dibêje.

"Hecî Zorav hebe çi ye, tunebe çiye? Kûçik e dê here dê yekî din bê şûna wî. Ma zarokên wî tev de, ne Hecî Zorav in? Çîrok ne ev e, ezbenî. Lê em çawan dikarin hîmê axatiyê bileqînin, a mûhîm ev e." (r.51)

Şêx û xapandin

Dema mirov dikeve nava kûrahiya dîrokê, bi tiştên hatin serê civaka Kurd re gelek ecêbmayî dimîne. Bi nezanîn û paşdemayîna wan, carnana wan

dibe dema cahiletîya sedsalên 16ê. Ji beriya ronesansê çawa papazan/keşîşan di kilîseyan/dêran de mifteyên cinnetê/bihûştê belav dikirin û ji cinnetê erd difirotin wan mirovên nezan, di warê Kurdan de jî ew tişt dîsa li ser rêya dîn bi destê şêxan pêk hatiye. Lêbelê piştî Ronesansê Ewropayî hişyar bûn û êdî bawerîya wan li wan papazên gunehê wan efû dikirin nehat. Kurd heta sedsala 21ê de jî bawerîya xwe li wan şêxên xwedî keramet (!) tînin û bi wan hê jî tîn xapandin. Ev tişt jî gotina Marx a “dîn afyona netewan e” tîne bîra mirovî.

Mahmut Baksî berfirehî li ser şêx û fehlên wan sekinî ye, viya-ye ku rastiyên şêxan û qurnaziya wan deyne ber çavên gundiyan çavnekerî.

“Li Mekê di dikanekê de Şêx Evdilhekîm elektrîkên ku bi ampîlan vêdikevin dibîne. Şêx pêşî ji wan ditirse û newêre destê xwe bide wan. Lê piştî çend rojan Şêx serê xwe dişixulîne û dizivire dikanê, sê heb ji wan elektrîkan dikire, têxe paşila xwe. Şewqa ampûlên biçûk di ber kevirê reş de di serê Şêx de dibiriqin. Lîstik temam e.

Piştî çend mehan, Şêx Evdilhekîm û micewr dikevin rê û tîn Xerzan. Nêzî gund. Dema eşa ye, tarî ketiye erdê. Micewr bi alîkariya feqîyan, gundiyan li mizgeftê dicivînin. Gundî di mereqa Şêx de ne. Lê Şêx tune. Micewr bi dilekî keser wefata Şêx Evdilhekîm ji wan re dibêjin. Qorînî bi gundiyan dikeve. Hinek

feqî dest bi qesîdan dikin û dikevin cizbê. Nava mizgeftê dibe tîmarxane û dimîne...

Dem zû derbas dibe. Wext nivê şevê ye. Herdu micewr gundiyan didin pey xwe û diçin ber mala Şêx. Pencera Şêx vekirî ye ji nedî ve nûra Xwedê di nav oda Şêx de dibare. Cibeyê Şêx, bi rengê xwe yê kesk di nav şewqa elektrîkan de diçilwile. Gundî lal dibin, ji tîrsa zimanê xwe gez dikin...

Ev tişt ev bûyer çend şevan dom dike. Gundiyan Warê Xerzan tev bi hev re berê xwe didin Telîba û vê hikmetê bi çavên xwe dibînin... di demeke xurt de bi mirîdên Şêx Evdilhekîm çêdibin.

Piştî vê kerametê, piştî vê nûra Xwedê, xelk bi çavên Mehdî li Şêx dinêrin. Decal nêzik e. Gur û mih dê çil sal bi hev re biçêrin. Dawiya dinyayê hatiye. Dinya beredayî û nexweş... wey li wî ku bikaribe xwe ji gunehan xilas bike, mifteya cinetê bigire...

Mifte li ba Şêx Evdilhekîm e. Gundiyan xwedî milk, tapûyên xwe didin Şêxê mezin di nav çend mehan de bi hezaran mî, bizin, çêlek, ga û gamêşên Şêx çêdibin. Û di nav çend salan de jî çar gundên qirase dikevin destê wî Gundikê Dono yek ji wan e. (r. 37)”

Mahmûd Baksî (1944-2000)

Di sala 1944ê de li Suphiyê gundê Hezo (qeza Êlihê), bakurê Kurdistan, ji dayik bûye, 19.12. 2000ê de jiyana xwe li Stockholm (Swêd) ji dest da.

Ew nivîskar û rojnamevanekî balkêş bû. Ji sala 1967 û paşde li ser pirs û jiyana Kurdan nivîs û pirtûkên xwe bê rawestan nivîsine. Destpêka rojnamegeriya wî di Batman Postasi de dest pê kir. Nivîs û berhemên wî her tim

ji aliyê dewleta Tirkîyê ve mîna xetereke mezin hatine dîtin û qedexa li ser wan peyda bûne.

Di sala 1968ê de bû serokê TÎPÊ (Partiya Karkeran a Tirkîyeyê) ya Batmanê. Di sala 1969ê de bi navê Mezra Botan romana wî ya yekem li Stenbolê derket. Paşê di sala 1970î de pirtûka xwe ya bi navê Sadî Akkiliç Davası derxist. Sadî Akkiliç kominîstekî Tirk bû û ji ber gotareke wî heft sal û niv cezayê hepsê lê birîbûn.

Mahmûd Baksî di wan salan de sendîkavan bû û wî karê xwe yê sendîkavaniyê li DISKê didomand. Karê xwe yê sendîkavaniyê ji sala 1968 heta 1970ê domand. Paşê bi hinceta ku ew Kurdîtiyê dike û ji ber herdu pirtûkên wî ên ku hatine çapkirin, 15 sal cezayê hepsê lê hate birîn. Loma di 1970yî de ji bêmecaliyê mecbûr ma ku derbasî Elmanyayê bibe. Di sala 1971ê de Cunta Leşkerî dest danî ser îktîdarê û ev bû yek ji sedema ku Baksî di sala 1971ê de li Swêdê bi cih bû.

Mahmûd Baksî li Swêdê jî vala nesekinî û heta dawiya jiyana xwe nivîsand. Wî heta niha 22 pirtûk nivîsandine û pirtûkên wî wergeriyane gelek zimanan. Lê Baksî bi xwe bi sê zimanan; bi Kurdî, Tirkî û Swêdî dinivîsand.

Mahmûd Baksî di 19ê meha 12an ya 2000î de li Stockholmê çû ser dilovaniya xwe û niha li Diyarbekirê veşartîye.

Mahmud Baksî 22 pirtûk nivîsandin û li welatên cihê hatin veşandin. Gelek ji wan hatin wergerandin. Zimanên ku pirtûkên wî hatine wergerandin: Swêdî, Danîmarkî, Elmanî, Ingilîzî, Kurdî, Norwecî, Tirkî û Holandî. ●

Talankirina dîwana Feqiyê Teyran

SEÎD DÊREŞÎ

“Du caran dîwana Feqiyê Teyra ya ku min twîjandî hate dizîn, herwisa min xwe bédeng kir. Lê piştî cara siyê dîsan kesekî dîwana Feqiyê Teyran bi navê xwe weşand, ez bêgav mam ku êdî divêt li ser van kesan binivîsim, da ku ew bibine îbret û taşinî bo her kesekê pêkoleka bi vî rengî diket”

Pêşgotin

Min çu dema neviyaye, di nivîsînê xwe de kesekî bişkênim, heta eger xeletî jî di rasta min de kiribin, gelek kesan rexna min kiriye û hindekan jî li vêrê û wêrê he nivîsînê min li ser navê xwe belav kirîne, lê min bersiva wan nedaye û tiştek di rasta wan de nenivîsiye. Du caran jî dîwana Feqiyê Teyra ya ku min twîjandî hate dizîn, herwisa min xwe bédeng kir. Lê piştî cara siyê dîsan kesekî dîwana Feqiyê Teyran bi navê xwe weşand, ez bêgav mam ku êdî divêt li ser van kesan binivîsim, da ku ew bibine îbret û taşinî bo her kesekê pêkoleka bi vî rengî diket.

Berî biçime di nav mijarê de, min divêt bêjim, ku diyaroka diziya kitêban an dizya edebî di dîrokê de kevn e, li nik Kurdan jî mêjûya vê diyarokê dizivîrîte berî çarsed salan, bi dirustî di serdemê Melayê Cizîrî de û an bêjîn digel wî bi xwe.


Di çaxê Melayê Cizîrî de, melayekî navdar li Finika Bohtan bi navê Melayê Finikê hebû. Di nava xelkê û di dîwanê mîran de helbestê Melayê Cizîrî li ser navê xwe dixwendin û digot: Ev helbeste min nivîsîne. Melayê Cizîrî jî pê dizanî û pê degirî, îna rabû helbesteka dijwar li ser wî nivîsî û daxwaz jê kir ku dev ji van pîrbêjî û ezmanreşyan berdet, eva xwarê jî ew helbest e:

Ey Mela namê te ye xemset'eşer

*Tu bi şê'ra ne te gotî, xwe dikî qend û şeker
Durrê nasofte dihonî, me nedî mislê te qet
Ne di simtê 'Ecemê da, ne di iqlîmê Teter
Ev çi şê'r û 'xezel û med'h û senayê xwe dikî
Di civatan we dibêjî, me bi te'n û bi xeber
Ev çi teqlîd û şîtat in çi bitat in tu dikî
Serî vê ra dihejîni, bi dused ah û keser
Tu dizanî Finika te ne mekanê 'xezelan e
Çi buha tene meta'ê te eya bêser û ber
Dest û payan ji berê zêde bikî dê te bikim
Mislê 'Hemmadê 'Ereb herwekî Sêx anî bi ser
Ehmed im sînesîper pêşberî tîra felekê
De'wedare te me îro tu ji de'hlê were der'*

Ev mînaka Melayê Cizîrî min îna, ji ber wêrê, da ku bo xwendevanan pitir rohn û aşkera bît, ku dizya berkarê hizra mirovî girantir û bi sengtir e ji diziya tiştekê dî, ji ber ku dizya hizra mirovan anku berkarê wan ê hizrê bi dehan an bi sedan salan di nav mejiyê xelkê de dimînît, herwekî mînaka Melayê Cizîrî ku eve pitir e ji çarsed salan û hindî Kurd mabin jî bîrhatina vê diziyê jî dê her bimînît.

1 Ehmed bin el-Mela Muhemed el-Bohtî el-Zivingî.
el'Eqdulcewheri fi Şerî'h Diwan el-Şeyx el-Cizerî, elcuzu' el-
sanî. Metbe'et el-Rafideyn, el-Qamişli, 1059 miş b.p. 888-891.



Piştî van bîst salêt dawiyê, dergeh bo Kurdan vebûn ku torevaniya xwe pêş bêxin û folklor û klasîk û kultûra xwe vejînin û vekolînan li ser biken, bi dehan kesan xwe havête vê meydanê û bi dilsojî kar û xebat li ser kir. Hindek kesêt lawaz û neker û lenger jî xwe kêşa vî warî, wan viya bi demekê kurt xwe bi rêka torevaniyê navdar biken. Vê meydanê jî siwarêt 'egîd û zîrek û pehlewaniyê divên, kesêt lenger û lawaz neşên tê de bibezin û ciîrdanê tê de biken. Nivîsîn ne karekî hewante û sivik e ku her kesek bikarît tê de serkevît. Nivîsîn xwegorîkirin e, divêt mirov pitirya jîna xwe tê de bimezêxît. Nivîsîn exlaq û balberî ye, divêtin kesê nivîsevan mînak û pîrê zemanê xwe bît. Nivîsîn şehrezayî û aqilmendî ye, divêt nivîsevan di hemî qulaç û goşeyê ezman û dîrok û toreyê milletê xwe de melevan bît. Lê ev mirovê van karan diken çu saloxêt bi vî rengî li nik wan nînin, lewra jî bi nezanîna xwe diçin destê xwe dirêj dikene berkarêt hizr û ramanêt mirovê dî û li ser navê xwe belav diken û

dibêjine xelkê, tamaşe biken, em çend xweşmêr û 'egîd in!

Parçekirina Kurdistanê tixwîbêt pûlayî êxistine navbera Kurdan, nivîsîna bi çend elîfbêtkan, dîsan şûrhêt bilind di navbera Kurdan û lihevdaydarbûn û têgehiştinê, hatin danan. Evca ev kesêt lenger û lawaz hizir diken madem ev tixûb û şûrhêt bilind hene, kes bi wan na'hesyêt û çî ya diken dê bo wan bimînît. Lê Kurdistana evro ne ya berî bîst salan e, dibît berî bîst salan û wê ve haya Kurdan kêmi ji êkudu hebû, evro dunya û Kurdistan jî keftîne qunaxeke dî, hêdî hêdî tixûb yêt diderizin, amîrêt têgehiştin û jêknêzîkbûnê dikevîne destê her kesî, ji ber vê çendê jî kesêt xwe di bin gilêşê dîrokê vedişêrin, xelk zû wan dibînît û kifş diket.

Pênasînek li ser dîwana Feqiyê Teyran

Berî ku ez û Xwedê jêrazî Pêzanê Alîxanî dest bi komkirin û vejandina dîwana Feqiyê Teyran (para êkê) bikeyn, helbestê wî li gelek cihan di belav bûn û gelek ji wana di destnivîsan de hatibûne nivîsîn û hindek jî dev

bo devî dihatine vegêran, me wesa biryar da, ku divêt hemî helbestê wî bi dokomênt û twîjandî di dîwanekê de bihêne weşandin û ji bo her helbestekê pêdivî bû çend destnivîsek hebîn, ji ber ku pitirya berkarê Feqî jiberêk çûye û guhorîn keftîne tê de û gelek caran jî helbest parçe bûye û bûye du helbest an jî parçeyek çûye di nav helbesteka dî da. Me jî gelek destnivîs li dorê xwe kom kirin, bo her helbestekê çend destnivîsek, ji nû sala 1989ê em rabûyn li ser wan destnivîsan deh helbestê wî twîjandin û çend berperêk li ser jîna wî û li dawiya dîwanê jî ravpeyvek nivîsî û li Bexdayê çap kir.

Piştî ew deh helbest me li Bexdayê çapkirin, êdî ez keftime helkolîn û vekolîna hemî jiyan û berhem û serpêhatiyên Feqiyê Teyran. Bi rastî ez dikarim bêjim, min Feqiyê Teyran vejand, tevaya berkarê wî min vecemand û vekolîneke berfireh li ser jîn û jiyara wî kir û sala 2005ê bi 'herfê' 'Erebî di bergekî de bi navê "Dîwana Feqiyê Teyran" li bajarê Duhokê çap kir. Êdî ev dîwana Feqiyê Teyran bûye berê binyatî bo her vekolîneke dî paşerojê li ser bihête kirin.

Kesêt dîwan

li ser navê xwe çapkirî

Berî ez bi dirêjî biçime di nav vê çîrê de, dê navê wan kesan û cihê çapkirinê bi kurtî li vêrê rêz bikem û paşî ketê ketê bi dirêjî li ser axivim. Dîwana Feqiyê Teyran sê caran ketiye ber şopa talankirinê:

Cara yekê: Ji layê Mela Reşîf Îrgat û Mela Îsmet Kiliçaslan û

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê di sala 1999ê.

Cara duyê: Ji layê Mela Xalid Sadînî di weşanxaneya Nûbiharê di sala de 2000ê.

Cara siyê: Dîsan ji layê Mela Xalid Sadînî di weşanxaneya Nûbiharê de, di sala 2009ê.

Ez hez dikem xwendevan bizanin ku herdu carê yekê û duyê min xwe bêdeng kir û rêzeka bi tinê jî li ser nenivîsî, lê piştî cara siyê Xalid Sadînî ev karê nerê kirî, êdî min jî biryar da ku kiriyara wan a xirab bo hemî kesan diyar bikem.

Li vêrê jî bi dirêjî li ser wan dîwanan axivîn yê ku ji dîwana Feqî hatîne dizîn:


1. Ey Avê Av û Şêxê Sen'anî

Sala 1999ê hejmara 35ê kovara "Jiyana Rewşen" her a wê salê, gehiştê destê min. Min nêra wan berperê pirtûkê nû derketî nîşa diden, dibînim pirtûkeke Feqiyê Teyran bi navê "Ey Avê Av- Şêxê Sen'anî" hatiye nîşadan. Kovarê ev rêzê xwarê li ser pirtûkê nivîsîne:

"Ey Avê Av- Şêxê Sen'anî. Helbestê Feqiyê Teyranê ku di nav gelê Kurd de bûye efsane. Beriya demê di pirtûkekê de hatibûn berhevkirin û bi ser navê "Ey avê av" ji aliyê weşanê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve hatibû çapkirin, vê carê li gel berhema wî ya navdar "Şêxê Sen'anî" wek pirtûkekê hatin çapkirin.

Mele Reşî Îrgat tîpguhêziya Şêxê Sen'anî kiriye û ji bo ku xwendevan di têgehiştinê de nekevin tengasiyê, di dawiya pirtûkê de ferhenggek jî hatiye çapkirin.

Ey avê av* Şêxê Sen'anî, Feqiyê Teyran, tîpguhêzî ji tîpên



'Erebî: Mela Reşî Îrgat û Mela Îsmet Kiliçaslan, 167 rûpel, weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê".²

Piştî min nîşandana pirtûkê di kovarê de xwendî, bi rastî ez gelek pê şah bûm, min hizir kir her çawa bît dê berkarê Feqiyê nû û pêzanînê nû di pirtûkê de hebin. Ez rabûm min tîlefona Enstîtuyê kir, berpîrê wê tîlefona rakir. Min destxweşî li wan kir ku wan dîwana Feqî derêxistiye. Herwekî diyar bû dîwan li ber destê wî bû, min gotê: Tu dikarî bo min bêjî ka kî helbestê wî tê de ne? Ewî navê her deh helbestê ku me di wextî de çapkirin û beyta Şêxê Sen'anî bo min gotin û got: me li ser navê, Ebdîrreqî Yûsîf çap kirîne û du melayan jî tîpguhêziya wan kiriye. Êdî xiş li nik min peyda bû ku ewan dîwana me li ser navê seyda ,Ebdîrreqîb Yûsîf çap kiriye. Min jî gotê: birayê min, eve kitêba me ye hewe wusa çap kirî! Piştî wî pêşgotina dîwanê dîtî û navê me jî li binê dîtî, êdî ji nû zanî ku ew xelet bûne. Wî got ez dê di-

gel tîpguhêzan axivim paşî sibehî tîlefona min bike. Ew bû roja paştir dîsa min tîlefona Serokê Enstîtuyê kir. Wî got: Belê rast e em şaş bûyne, dê çapê duyê navê te danîne ser. Min gotê: Baş e bes divê hûn wan libê mayî li mekteban vekêşin. Ewî got: Em venakêşin! Îna min gotê: Heke me Kurdan dewletek heba, hûn nedîşyan karekî hosa biken. Bersiva wî ew bû, got: Hema here çî ji destê te têt bike! Ma dê çî ji destê min hêt! Hema min xwe bêdeng kir.

Piştî heyamekê, çapa duyê ji pirtûkê derkeft, bi her regekî min libek ji pirtûkê bi dest xwe êxist. Vê carê jî navê me li ser bergê pirtûkê nînin. Enstîtuyê di çend berperan de pêşgotinek nivîsiye, paşî pêşgotineka me ya kurt ku di demê xwe de me bo dîwanê nivîsîbû, înyayê xwarê. Paşî perek jî daye navê kitêbê "Ey avê av". Û di bin navê kitêbê de navê herdu tîpguhêzan nivîsiye, li jêr navê wan jî nû navê me nivîsîne. Herwekî ev karê henê hemî tîpguhêzan kiriye.

Herwekî min avir dayê, Enstîtuyê pêşgotinek bo dîwanê nivîsiye, viyayê ku şaşiya xwe ya çapa êkê rast veket, di cihekê de bi vî rengî avir daye şaşiya xwe:

"Wekî hûn jî, dê di pêşgotina ku ji aliyê Seîd Dêreşî ve hatiye nivîsandin de bixwînin, beşa vê pirtûkê ya "Ey avê av" cara ewil ji aliyê Seîd Dêreşewî ve hatiye twîjandin û bi navê "Dîwana Feqiyê Teyran" li Bexdayê bi tîpê 'Erebî' hatiye çapkirin. Em li ser vê mijarê dixwazin vê xalekê jî zelal bikin. Di pêşgotina pirtûka "Ey avê av" çapa yekemîna Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de, di şûna ku dê Seîd Dêreşî

2 Kovara Jiyana Rewşen, Hejmara 35, sal 1999, Enstîtuya Kurdî, Stenbol, b.p.59.

were nivîsandin de ji sedem xeletfamkirinê 'Ebdirreqîb Yûsif hatiye nivîsandin."³

Li vêrê jî dîsan carekê, "Dêreşî" û carekê, "Dêrşewî" nivîsiye. Herçende eve ne şaşiye-ke mezin e, ji ber ku tîpê herdu navan nêzîkî hev in, lê şaşiya mezin ew e ku şûna 'Seîd Dêreşî', 'Ebdirreqîb Yûsif', 'bihête danan, ku deng û tîpê herdu nava vêrê û ,esmanan jêk dûr in.

Kitêb bi rengekî bêserober hatiye berhevkirin: Vekolîna me li ser jiyana Feqî li dûmahiya dîwanê danaye, ezmanê vekolînê hatiye guhorîn û gelek şaşiye-ke rîzmanê kevîtinê. Û her deh beyt û helbestê me twîjandî û wek kitêb çapkirî, wan tinê helbestê rût û bê dehmen kirîne latînî.

2. Feqiyê Teyran, jiyana, helbest û berhemên wî (çapa yekê)

Sala 2001ê dîwaneke dî ya Feqiyê Teyran a çapkirî bi tîpê latînî li jêr navê (Feqiyê Teyran, jiyana, helbest û berhemên wî) ji twîjandina, M. Xalid Sadîni derkeft. Bi rastî berî ez bi ser dîwanê de biçim, dîsan wekî ya berê keyfxweş bûm ku dîwaneke Feqî hatiye çapkirin, min hizir kir dê tiştên wî tê de hebî û ez jî dê mifayekê baş bo twîjandina dîwanê jê bînim, ji ber ku ew çend sal bû berdewam min li ser kar fikir. Lê piştî min dîwan xwandî, derkeft ku wî her dîwana

Feqiyê Teyran a me li Bexdayê çapkirî, kiriye tîpê latînî û beyta Şêxê Sen'anî jî li dawiya wê danaye û çend şîrkê kurt jî ku ne yê Feqî ne, di wextê xwe de li Sovyeta berê hindekan helbest divehandin û bi navê Feqî belav dikirin, wî tê de weşandîne.

Xalid Sadîni di pêşgotina çapa yekê rûpelê 8ê de dibêjt:

"...min lingê şeytan şikand û min pêngava yekem di rêza mêtûya wêjeya Kurdî de avêt. Ew jî 'Feqiyê Teyran' e. Eva ku di destê we de ye."⁴

Kekê Xalid wesa xwe daye niyasîn ku wî pêngava êkê di mêtûya wêjeya Kurdî de havêtiye û bo cara yekê ye wî dîwana Feqiyê Teyran vejandî. Wî wesa bo xwe hizir kiriye ku êdî kes bi vê dizîya wî agahdar nabî û eve dê her li ser navê wî bimînî. Lê bila ew û hemî kesê karê bi vî rengî diken bizanin, dîrok rehmê bi kesê de nabet, ewê karekî hosa yê şaş diket, divê hizra paşerojê jî biket, nexasme şaşiyeke bi vî rengî!. Lewra jî ez dibêjme hêja Mela Xalid Sadîni, te lingê şeytanî neşikandiye, belkî te lingê xwe şikandiye!

Me di pêşgotina dîwana Feqiyê Teyran de wesa nivîsîbû ku eve para yekê ye û para duyê wê li pey wê bihê û me li ser cildê kitêbê jî, "pirta yekê" nivîsîbû. Wesa xuyaye ku piştî Xalid Sadîni dîwan ji tîpê ,Erebî veguhastiye latînî û viya li ser navê xwe çap biket, wî hizra hindê jî kiriye ku divê ew para duyê ji dîwanê bi dest

xwe bêtî û dîsan li ser navê xwe biweşînî, herwekî di pêşgotina wî de hatî, dibêjt:

"Ev xebata di destê we de dê du cild be. Cildê yekem ev e, ê duyê di rê de ye..."⁵

Evca ez nizanim ka Mela Xalid çend salan li benda cildê duyê maye ku em derbêxîn û ew li ser navê xwe biweşînî.

Dîsan Xalid Sadîni dibêjt:

"... 'Feqiyê Teyran 1' ji du beşan pêk hatiye. Beşê yekem lêkolîna min a li ser jiyana Feqiyê Teyran e. Di dawiya vê beşê de jî çend çîrokên li ser Feqiyê Teyran tîn gotinê min nivîsîne. Beşê duwem 24 helbestên Feqiyê Teyran in. Gelek ji wan li ber hev hatine hevberkirin. Ji bo vê hevberkirinê xebata Seîd Dêreşî û Pêzanê Alîxan- dîwana Feqiyê Teyran – rêberiya min kiriye. Rastî dema pêşîn ev pirtûka navbûrî bi dest min keft, min xwest ku ez wê pirtûkê transkîrîbey tîpê latînî bikim û wesa bidim weşanxanekê ku çap bikin. Lê piştî min ew transkîrîbe kir, ez li dû çend çavkaniyên din geriyam û min peyda kirin. Min lêgerîna xwe li ser xîmên pirtûka navborî ava kirin, di dawiyê de min dît ku xebata min di nav wê pirtûkê de cih nabe. Divê ez wê û ya xwe tevîhev bikim. Min jî wisa kir."⁶

Belê te wesa kir, lê te karekî xirab kir!!

3. Feqiyê Teyran, jiyana, helbest û berhemên wî (çapa siyê)


Herwekî min berî niho jî avir dayê di sala 2005ê, min hemî

3 Feqiyê Teyran (ey avê av - şêxê sen'anî) twîjandin: Se'îd Dêreşî û Pêzanê Alîxan. Ji pîpê Erebî bo latînî: M. Reşîd Îrgat û Ismet Kiliçaslan. Weşanên Înstituya Kurdî ya Stenbolê. Çapxana: Berdan met-bacilik 1999, bp. 6.

4 Feqiyê Teyran / jiyana, helbest û berhemên wî / ji nivîsîn û lêkdana M. Xalid Sadîni. Çapa yekem. Ji weşanên Nûbihar çapxana: Matbaacilik; İstanbul 2000. bp. 8.

5 Her ew jêder. Bp. 8.

6 Her ew jêder. Bp. 8-9



berkarê Feqiyê Teyran lê da û twîjand û vekolîneke hejî wî, min bo kir û li dezgeha Spîrêz li Duhokê çap kir.

Piştî çapkirina wê, helbet dîwan li her cihê Kurd lê, belav bû, libek (nuxxeyek) jî xuyaye gehîştîye destê Hêja Xalid Sadîni lê vê carê diyar bû wî nedikarî wî barê giran helgirî û hemî dîwana Feqiyê Teyran bi dehmen û ,haşiyêt wê ve bikete tîpêt latîni û li ser navê xwe çab biket, ji ber ku da karkiniya wî zû li nik xelkê diyar bît! Lewra jî rabûye du beytê dirêj , 'Bersîsê , Abid û , 'Kela Dimdim' ji nav dîwanê rakirîne û dîsan havêtîne di nav dîwana wî bi navê xwe çapkirî da. Heta li piştî kuç û tenûran jî behsê vê dîwana Feqî ya nû nekiriye, herweku viyaye li xwendevanî veşêrît, ku dîwaneka dî ya Feqî çap bûye û hemî berkarê wî tê de ye. Tiştê wî îşaret pê day di beyta , 'Bersîsê , Abid', di dehmenan de (jêrnotan) bi xetekê hûr nivîsiye: "Me ev jêrnotana ji pirtûka Seîd Dêreşî girtin, ku wî jî ji destxeta dawîya pirtûka seyda Ebdirreçîb Yûsif wergirtine."⁷

Di beyta Dimdimî de jî her di dehmenkê de hosa nivîsiye: "Serastkirina ev beyta hanê me li gorî ya Seîd Dêreşî çêkiriye." Erê baş e kekê Xalid, te ji pirtûka Seîd Dêreşî an jî li gorî ya wî çêkiriye, lê ji kîjan pirtûkê!! Ji wê ya sala 1989ê li Bexdayê hatiye çapkirin? An jî ji wê ya sala 2005ê li Duhokê hatiye çapkirin!?"⁸

Di pêşgotina çapa sêyem de jî Mela Xalid dibêjît: "Wekî ku di pêşgotina ji bo çapa yekem a vê pirtûkê de hatiye diyarkirin, çapa yekem a vê pirtûkê di girtîgehê de, di nava şert û mercên gelek giran û bi sinor de hatîne amadekirin. Ji ber vê yekê jî du şî'rên girîng ên Feqî di wê çapê û çapa duyem de nebûn."⁹

Paşî pê ve diçît û dibêjît: "... şî'rên Feqî, 'Bersîsê Abid' û , 'Kela Dimdim' li vê çapa nû hatin zêdekirin û pirtûk bi giştî di ber çavan re hate derbaskirin..."¹⁰

berhemên wî/ M. Xalid Sadîni. Çapa Sêyema Berfireh. Ji weşanên Nûbihar çapxana: Kilim Matbaacilik; Stenbol 2009. bp.343.

8 Her ew jêder, b.p.389

9 Her ew jêder b.p. 10

10 Her ew jêder b.p. 10

Belê kekê Mela Xalid, em baş dizanîn û xwendevan jî baş dê zanin, ku van çend salê borî hemiya, te xwe li benda dîwana Feqiyê Teyran para duyê girtibû, jiber wê çendê jî herdu beyt , 'Bersîsê , Abid û Beyta Dimdim' di nav dîwana te de di kêmbûn, çimkî berî dîwana me derkevît, te ev herdu beyte bi çavan jî nedîtibûn. Evca dê ji kîve îni?! Lê pa ez bawer dikem tu gelek yê maye li benda dîwanê û westiyay heta ku min dîwan derêxistî, ji ber wêrê jî hema te bi lez û bez ew herdu beyt havêtîne di nav de.

Em dê vê gotina xwarê jî ya hêja Mela Xalid Sadîni bêjîn û paşî dê dergehê gêngêşê girîn û bila her hizrek û ramaneke dî bo xwendewana bimînît!

Mela Xalid dibêjît:

"...şî'rên Feqî , 'Bersîsê , Abid û , 'Kela Dimdim' li vê çapa nû hatin zêdekirin û pirtûk bi giştî di ber çavan re hate derbaskirin, hin bendên ku di çapên berê de hatibûn hiştin, hatin temamkirin."¹¹

Merema Mela Xalid bi vê gotinê, , hin bendên ku di çapên berê de hatibûn hiştin, hatin temamkirin" ew e: Dîwana me ya çapa 1989ê, hindê bend kêmbûn, di çapa sala 2005ê de, ew deh helbestê dî a berê de dîsan ser ji nû min twîjandîne û hindê bend di hin helbestan de di kêmbûn û di destnivîsê nû de hatîne û ew bend jî min li ser zêdekirîne. Evca ew jî rabûye, ew bendê kêmbûn ji dîwana me derêxistîne û dîsa wî jî êxistîne di nav cihê wan de.

7 Feqiyê Teyran / jiyân, helbest û

11 Her ew jêder b.p. 10

Dîsan Mela Xalid pê ve diçît û dibêjt:

“Xaleke dîn a girîng jî...ku ev pirtûk wê ji du cildan were, lê dema ku me ev çapa nû amade kir û helbestên Feqî yên di çapên din de nebûn lê zêdekir, êdî pêwîstî bi amadekirina cildê duyem jî nema. Lewra hemû berhemên Feqî yên ku hetanî îro hatine bidestxistin di vê çapa nû de cih digirin. Em di vê baweriyê de ne ku wekî yek cild amadekirina berhemên Feqî, wê ji bo xwendevanan jî baştir û hêsantir be.”¹²

12 Her ew jêder b.p. 10

Belê raste, me di çapa 1989ê da, gotibû, eve para yekê ye, Mela Xalid jî dema li ser navê xwe çapkirî, wî jî nivîsî bû para yekê.

Di çapa sala 2005ê de min dîwan hemî di cildekî de çap kir. Êdî Mela Xalid jî got: “Em di vê baweriyê de ne ku wekî yek cild amadekirina berhemên Feqî, wê ji bo xwendevanan jî baştir û hêsantir be”.

Dûmahiyê, hîvîdar im xwendevan li min negirin, ku min ev dergehê henê di nivîsînê xwe de quta. Bi rastî jî herwekî berî niho jî min gotî: eger ne ji mecbûrî ba min ev nivîsîne nedikir.

Di van çend salan de, mirov pê dihesyêt ku hindê kes û layêt serberdayî di nav kaxa torevaniya Kurdî de peyda bûyîne, ne li joriyê Kurdistanê bi tinê belkî li parçê dî jî, ev karê serberdayî têne kirin û xudanê wan kara bûyîne qehreman û lehengê zemanê xwe, ew di wê hizrê de ne ku karkinyêt wan dê her bimînin veşartî, lê demê hatine ser berkê, wî wextî ew dê çi bêjine dîrokê û çawa bersiva miletê xwe biden!¹³●

13 Ev rexneye di wextê xwe de di kova «Havîbûn» hijmara «25 û 26» sala 2010ê de, hatiye belavkirin.

Çend gotin ji Mesnewiyê

MEWLANA CELALEDDÎNÊ ROMÎ

Wergêr: Dilazad ART

- Mal û zêr ji bo ser, mîna kum in. Ê ku xwe bispêre kum, keçel e.
- Bal bikêşe baranê. Ji ber ku hem kar hem xisar di baranê de heye. Bi vî awayî; barana biharê bexçeyan jîndar dike, hêşin dike: barana payîzi bexçeyan diçilmisîne.
- Piyên koran gopal in. Ji ber vê li ser kevîran nakevin.
- Hişdarî wek rojê ye, hêrs wek qeşayê ye.
- Dema tu li deriyê maneyê bixî ewê dêrî ji te re veke.
- Hedan/sebr, neynika dilfirehiyê ye.
- Razan, ku bi zanîn be şiyarî ye. Heyf ji wî nezanê şiyar re.
- Mîna şêr, neçîra xwe tu bigire. Sergiraniya biyanîyan û nasên xwe berde.
- Ramana te gul be tu bexçeyê gulên î, strî be tu darê birîman î.
- Her ku tu çiqasî hikînetê dubare biki eger tu ne xwedî bi, dê ji te dûr bikeve.
- Ey çav, tu ûm li ser yê dî digirî, kêliyêkê rûne li ser xwe bigirî.
- Tu gûnehkar gûnehê mirovên dî li xwe bar nake, tu kes heta tiştêkî neçîne naçîne.
- Hedan/sebr ji baweriyê taca seran bi dest dixê. Ê ku hedana wî nebe bawerîya wî tune ye.

Lemaya Diyine

BEDÛZZEMAN SEÎD NÛRSÎ

Tirkîra tadayox: Serdar Bedirxan

Redaktekerdox: W.K.Merdimîn

بِسْمِ اللّٰهِ الرَّحْمٰنِ الرَّحِیْمِ

اِذْ نَادٰی رَبِّهٖ اَنِّیْ مَسْنِیَ الضَّرِّ وَاَنْتَ اَرْحَمُ الرَّاحِمِیْنَ

Na Munacata qehremanê sebrî Hezretê Eyyûb 'eleyhîsselamî, hem Erebnaya hem tesîrin a. La gereke ma munacatê xo de na ayet ra îktîbas bikerî û

رَبِّ اَنِّیْ مَسْنِیَ الضَّرِّ وَاَنْتَ اَرْحَمُ الرَّاحِمِیْنَ
3
vajî.

Kilmê meselaya vengdaya ê Hezretê Eyyûb 'eleyhîsselamî na ya ke: Gelek rêş û birînan miyan de epey zeman mendo, mukafato gird ê a nêweşaniye fikiriyayo, kemalê sebr reyra tehammul kerdo, vinder-to. Dima, karmê ke rêşanê ey ra peyda biyî, gama dest pêkerdî têkilê qelb û ziwane ey biyî, semedo ke têkilê qelb û ziwane ey biyî ke cayê zikr û marîfetê îlahî yî, tersê zirardiyayîşê o wazîfeyê ubûdiyetî ra, seba îstîrehatê xo ney, belkî seba ubûdiyetê îlahî vato: "Ya Rebb! Zirar mi resa. Ziwane reyra zikrê mi rê û qelb reyra ubûdiyetê mi rê zirar dano" no vate reyra munacat kerdo, Cenabê Heq o munacato xalîs û safî, bêxerez, seba îllahî, yew şeklo harîqa reyra qebl kerdo.

- 1- Bi nameyê Homay ke rehman û rehîm o.
- 2- A gama o (Eyûb 'eleyhîsselam) Rebbê xo rê wina lebiyabi: "(Homayê mi!) Bêşik êdî no derdî ez bêzar kerda, (ez zana) tewr rehmin ê rehminan Ti yî." (Sûreya Enbiya: 83)
- 3- Ya Reb, zirar mi resa, tewr rehmin ê rehminan Ti yî (Dua ya)

Kemalê afiyetê xo ey rê îhsan kerdo û ey mezharê tewir bi tewir rehmetê xo kerdo. Hayo na Lema de Panc Nukteyî est î.

NUKTEYO YEWIN

Herinda darbanê nêweşiya zahîrî ê Hezretê Eyyûb 'eleyhîsselamî, nêweşiyê ma yê zerî, ruhî û qelbî est î. Eke zere û teberê ma meqlum bibo, ma go Hezretê Eyyûb ra hîna vêşî dirbetin û nêweş biasî. Çünke her yew guneyo ke ma kenî, her yew şiko ke dekeweno sereyê ma, qelb û ruhê ma de birînan akeno. Birîne Hezretê Eyyûb 'eleyhîsselamî tena cuya eyo kilmê dinya tehdît kerdinî. Birîne mayê manewî, cuya maya gelek derge tehdît kenî. O hezretî ra hezar rey hîna vêşî ma muhtacê o munacatê Eyyûbiye yî. Taybetî, senî karmê ke rêşanê o hezretî ra peyda biyî têkilê qelb û ziwane ey biyî. O tewir zî, rêşê ke guneyan ra peyda benî û aswasî /wesweseyî, şikê ke rêşan ra yenî meydan- neûzubîllah- têkilê bâtinê qelb benî ke cayê îmanî yo, zirar danî îmanî û têkilê zewqê ruhaniyê ziwane benî ke tercumanê îmanî yo, ey zikir ra bacnenî û dûrî finenî huş kenî. Heya, gune gama bikewo qelb gam bi gam ey siya keno heta ke nurê îmanî tira vejo ey wişk û wad (bêrehm) keno. Miyanê her yew guneyî de yew rayîr est o ke kê bişono kufr. Eke o gune lezkanî

îstîxfar reyra berteraf nêbo, sey yew karmî ney, belkî sey yew maro qijkeko manewî qelbî gaz keno.

Ma vajî, merdimêko yew guneyo ke pê riyê kê dejeno bi pinanî bikero, gama pêhesiyayîşê kesîna ra zaf xo ver bikewo, estbiyayîşê melean û ruhaniyan ey rê zaf giran yeno. Qayîl o yew delîlo qijkek reyra înan înkâr bikero.

Hem ma vajî, merdimo ke yew guneyo pîl bikero ke cezayê ey cehennem bo, gama tehdîdanê Cehennemî bieşnawo û eke nêdekewo daldeyê îstîxfarî, xo vera ey hemet nêkero, semedo ke can û ruhê xo reyra çinbiyayîşê Cehennemî wazeno, yew delîlo qijkek û yew şik, qewet dano ey ke Cehennemî înkâr bikero.

Hem ma vajî, yew merdimo ke nimajê ferzî nêkeno û wezîfeyê evdîtiya xo ca nêano, o merdim semedê yew qusurê xoyo qijkek ra gama yew sermênê xoyo şenik ra îqazêk bieşnawo, xo pê dejneno. No merdim yew tembeleya ke vera ferzan û emranê pêdimayan ê Sultano Ezel û Ebedî biko, na yew sixintiya pîle dana ci û a sixintî ra wazeno û manen (xo bi xo) vano ke: "Werrekîna o wazîfeyê ubûdiyet çin bibînî." Û no waştîşî ra seke manewî boya dişmeniya îlahî bêro, yew qayîlbiyayîşo înkârî destpêkeno. Eke derheqê wicûdê îlahî de yew şik dekewo qelb, seke qet'i yew delîl bo, mêl bere keno. Yew berê helako pîl ci rê beno a. O bedbext nêzano ke bi wasitayê înkâr herinda yew sixintiya gelek qijkeke – wazîfeyê ubûdiyet – ra înkâr de o sixintî ra mîlyonan ra vêşêr û dahîna muthîş hedefê sixintiyanê manewiyan beno. Pededayîşê meyse ra remeno pededayîşê marî qebul keno. Û sewbîna... Nê heme hîrê mîsalan reyra bêro pêveronayîş ke wa pê sîrrê ⁴ بَلْ رَانَ عَلَى قُلُوبِهِمْ fehm bibo.

NUKTEYO DIYIN

Hawayo ke Vateyo Vîsto Şeşin de derheqê sîrrê qeder de diyayo zanayîş, demê bela û nêweşiye de hîrê cîhetan ra heqê însanan çin o ke gerre bikerî.

Ciheto Yewin: Cenabê Heq, cila wicûdî ke însanan ro daya sero sinetê xo nawneno. Însanî kerdo yew model; a cila wicûdî, o model sero qesneno, fesilneno, bedilneno, vurîneno, tewir bi

tewir nameyanê xo ey sero nawneno. Senî nameyê eyo Şafî nêweşî wazeno, nameyê eyo Rezzaq rê zî weşaniye lazim a. Û sey nînan..

5 مَالِكُ الْمَلِكِ يَتَصَرَّفُ فِي مَلِكِهِ كَيْفَ يَشَاءُ

Ciheto Diyin: Heyat bi tofanan, nêweşiyân zelal beno, reseno kemalê xo, qasidî beno (qewet gêno), aver şono, netîce dano, kamil beno, wezîfeyê cuyî ano ca. Hayato yewrî ke doşegê îstîrehatî de, wicûdo ke safî xeyr o ra ziyade, hîna nizdiyê çinbiyayîşo ke safî şer o yo û verbi ey şono.

Ciheto Hîrêyin: Na dinya, meydanê îmtîhanî ya û cayê xizmetî ya. Cayê lezzet û destmij û mukafatî niya. Madem cayê xizmetî ya û cayê ubûdiyetî ya; vera nêweşiyî û tofanan, eke dîn ro nêrî sebrkerdiş, o hizmet rê û o ubûdiyet rê zaf muwafik keweno û qewet dano ci. Û seba ke her yew saetê xo herinda yew roj îbadetî de bo, gerre ney, şikirkerdiş îcab keno.

Heya, îbadet di bêj o; qîsmo yew musbet, o bîn menfî yo. Qîsmo musbet eşkera yo. Qîsmo menfî zî, nêweşî û beleyan reyra, musîbetzedê zeîfiye û eczê xo fehîm kerdiş reyra, bextwaştîşane vera xo dano Rebbê Rehîmê xo, Ey fikirîno, Ey rê lebîno, yew îbadeto zerrsafî keno. Riya nêdekewena no îbadetî, zerrsafî yo. Eke sebr bikero, geştê musîbetî bifikirîyo, şikr bikero, o wext her yew saetê ey yew roj îbadet hesibîno. 'Emrê eyo kilmek yew 'emro derg beno. Hem zî qorî est î ke, yew deqîqaya înan yew roj îbadet hesibîna. Hem zî yew birarê mino axretî, bi nameyê Muhacîr Hafîz Ehmed yew zat, nêweşiya eya giran mi rê zaf meraq bi. Sek yew mi ra vajo: "Ey barkîn (firaz) biki. Her yew deqîqaya ey herinda yew rojî îbadet hesibîna." Xora o zat miyanê sebr de şikr kerdinî.

NUKTEYO HÎRÊYIN

Seke ma yew-di Qalan de îzah kerd, eke her însan cuyê xoyê viyarte bifikirîyo, zerrîya ey û ziwanê ey ya "ax" yan zî "ox" vano. Yanî, ya pê dejeno yan "Elhemdulîllah" vano. Çiyoy ke zerrîya ey şikneno, elemê manewî yî ke vîndîbiyayîş û tira dîrkewtîşê lezzetê demo viyarteyan o. Çünke qediyayîş û vîndîbiyayîşê lezzetî elem o. Ge-ge yew

4- Qelbê înan sero cengar (o ke guneyan ra peyda biyo) est o. (Sûreya Mutaffifîne: 14)

5- Mulkdar mulkê xo de senî biwazo o tewir tesarruf keno. (Ayet ra girewta yew dua ya.)

lezzeto muwaqet, elemo daîmî dano. Fikiriyayîş zî o elemî wirneno /têdano, xeman tira vejeno. Elemo viyarte (muwaqat) ke heyatê eyê verî de qewîmiyayo, vînîbiyayîşê înan ra, yew lezzeto manewî û daîmî zayîno ke “Elhemdulîllah” dano ey vatiş. No halo fitrî reyra sewab û mukafato uhrewî ke netîceyê belayan o û ‘emrê eyo kilm ke bi wasitayê belayan ra beno yew ‘emro derg, eke nînan bifikiriyoye sebr ra vêşêr şikr keno.

Ganî

الْحَمْدُ لِلَّهِ عَلَى كُلِّ حَالٍ سِوَى الْكُفْرِ وَالضَّلَالِ ۖ

vajo. Yew vateyo namedar est o ke vano, “Wextê musîbetî derg o.” Ya, wextê musîbetê derg o. Labelê hawayo ke şar zano seba ke sixintiyin o (semedê tengani) derg niyo, beno ke sey yew ‘emro derg, tira netîceyê muhîmî yenî meydan coka derg o.

NUKTEYO ÇARIN

Seke Maqamo Yewin ê Vateyo Vîsto Yewin de îzah biyo, sebro ke Cenabê Heqî dayo însanan eke rayîrê wesweseyî (aswasî) de vila nêkero her musîbet rê qîm keno. Labelê bandorê wesweseyî ra û xefletê ra însani û heyato fanî baqî zen kerdiş (hesibnayîş) ra, qewetê sebrî wexto viyarte û ameye rê vila kerdiş reyra musîbeto nikayin rê qîm nêkeno, dest bi gerreyî keno. Seke –haşa- gerreyê Cenabê Heqî însanan de keno. Hem gelek bêheqane û sey xîntan gerre keno û bêsebr têgeyreno. Çunke, her yew rojo viyarte, eke musîbet bo zehmetê xo şiyoye, rehetê xo mendo; elemê xo şiyoye, lezzetê xo yê zewalî mendo; sixintêyê (tenganiya) xo şiyoye, sewabê xo mendo. Ney ra gerre ney, belkî şiklo lezzetgirewtîş reyra (bi lezzet) şikr kerdiş îcab keno. Înan ra cigiriyayîş ney, bîlakîs heskerdiş îcab keno. ‘Emrê eyo viyarteyo fanî, sayeyê musîbetî dekeweno yew bêj ‘emro daîmî û zerrşad. Vehm reyra, elemanê înan fikiriyayîş reyra, yew qism (tay) sebrê xo duştê înan ro vila kerdiş deluyey (gêjî) ya. La rojê ameyey’ madem hama nêameyî, nika ra nêweşey û musîbetê ké go tede bianco bifikiriyoye, bêsebrey biko, gerre biko, ehmaqey a. Vatişê “meşte, bîro ez go veyşan ba, teyšan ba” reyra, ewro bêatîle aw şî-

mitîş, nan werdiş çendehîna ehmeqane yew xîntey a; o tewir zî, rojanê ameyan de, bela û nêweşiyê ke nika çin î, înan fikiriyayîş reyra nika ra xo pê dejnayîş, qe yew mecburiyet çin bo, xo bi xo ezît kerdiş, hende yew ehmaqîya ke, nêerjeno kê ey rê şefqat û merhamet bikerî (bikero).

Welhasil: Senî şikr nîmetî zêdneno; winî zî, gerre musîbetî zêdneno. Hem layîqbiyayîşê merhametî betal keno. Serra yewinê Herbê Dinya ê Yewin de, Erzurum de yew peyayo mubarek yew nêweşiya gelek giran kewtibi. Ez şiya hetê ey. Mi ra va: “Se şewî yo ez nêşna sereyê xo balişna serna bibusa” no tewir pîzweşnî reyra mi rê gerreyê xo kerd. Pîzeyê mi zaf ci veşa. Nişka mi vîr kewt û mi va: “Bîrarê mi, se rojê toyê sixintiyin ê viyarteyî nika dekewtê herinda se rojê zerrweşiyê. Înan fikiriyayîş reyra gerre meki. Înan ra biewni şikr biki. Rojê ke yenî zî, madem hama nêameyî, baweriya xo Rebbê xoyo Rehmanurrehîm biyari, çokanê xo mekuwi, mebermi, hîç ra metersi, rengê estbeye (wicûdî) medi çinbeye (çinbiyayîş). Na saete bifikîri. Qewetê sebro ke to do qîmê na saete keno. Sey yew qumandano sersemî meki ke, qewetê dişmenî ê heto raste pêro daxilê qewetê ey ê heto rast biyayîş reyra ey rê biyî goniya teze, cîhetê rastê dişmenê eyê hetê çepî hama nêameyî o warzeno qewetê merkezî erşaweno kîştê rast û çepî, merkezî zeîf verdano, dişmen yew qeweto qijkek reyra merkezî tarûmar keno.” Mi va: “Bîrarê mi, ti sey no qumandan meki. Heme qewetê xo na saete rê tahsîs biki. Rehmetê îlahiyeyî û mukafatê uhreviyeyî û ‘emrê xoyo kilm û faniyî bifikiri ke ti ey vurînenî kenî derg û ebedî. Herinda no gerreyo dejin yew şikro fereh biki.” Ey zi yew rehetiya tam girewt, va “Elhemdulîllah, nêweşiya mi des ra amey war bî yew.”

NUKTEYO PANCIN

Hîrê Mesele yî

Meseleya Yewine: Musîbeto rastikên û musîbeto mizir, musîbeto ke dîn rê yeno yo. Musîbetê dînî ra ganî her dem kê xo defînî/o dergahê îlahî û biqîriyî/o. Labelê musîbetê ke dîn rê nêameyî, nuqtayê heqîqet de musîbet niyî. Înan ra tay îxtarê rehmanî yî. Senî ke şiwane, kerran verbi mêşneyanê xo dano eyê ke dekewtê hêgayê sewbînan. Mêşneyî ê kerran ra tey vejenî ke, seba yew karo xirab ra xelîsiyayîş yew îxtar o (yanê yew vîrvistiş û şîret o),

6- Bêxeyra kufr û dalalet her hal û weziyet de hemd Homay rê bo. (Hadîsi.Tirmîzî, Daavat, 128. Bkz.İbn-i Mâce, Mukaddîme 23; Ebu Davud, Edeb: 91; Müsned: 3/239)

Hoxanê hexnê

Azad Rêbiwar

Ji bo kek Sabah Kara

Bes reşa xwe girêde
Şin dibare ji rûwê te
Giri qet li te nayê
Wer şewtekê bikene.

Ew nalînên te yî dilşewat
Dil û ceger peritand
Bes bigrî li ser gulê
Îro deng vedaye li her derê
Nav û dengên gulên te.

Birayê min delal bizanibe
Te em gêj û dîn kirin
Bi wan peyvên têrgirî
Ma çima tu nabînî
Reş û spî bi hev re
M'anê didin jiyane.

De wer ji min re bibêje
Ser û dil çima li te
Gasîna ceng û şer e
Ji bilî girî û axîne
Çima tu qet napeyvî

Mizgîna min li te bi
Gulên te wê geş bibin.

1992

bi zerrweşî tadînî. Winî zî, zaf musîbetê zahîrî est î ke, her yew îxtarê îlahî, îqazê îlahî yî. Û înan ra tayî kefarete guneyan î. Û înan ra tayî xefletî vila kenî, ecz û zeîfeya beşerî vîrê merdimî fînenî û yew tewir huzur danî kê. Musîbeto ke şeklê nêweşiyê de yo, seke ma verî zî va, o bêj, musîbet niyo, beno

ke yew îltîfato rebbanî yo, yew pakkerdiş o. Rîvayet de vêreno ke, "Têşanayîşê yew dara deresaya reyra senî meyweyê aye kewenî, têşanayîşê tewraniye reyra guneyî o tewir rişenî."⁷

Hezretê Eyyûb 'eleyhîsselamî, munacatê xo de, seba îstîrehetê nefis dua nêkerdo. Gama ke zikrê ziwani rê û tefekkurê qelbî rê manî bi, seba îbadet û taetî şîfa waşto. O munacat reyra, ganî meqsedê mayo sifteyên, niyetê ma birînanê mayê manewî û ruhî ke guneyan ra peyda benî înan rê şîfa waştîş bo. Seba nêweşiyê maddiyan eke ubûdiyet rê manî biy o wext ma gereke muracatê ey bikerî. Labelê haway duşt vejîyayîş, şîkayet reyra ney, beno ke zelîlane û sey ardim waştîşî muracatê ey bibo. Madem ma rubûbiyetê ey ra razî yî, o nuqtayê rubûbiyet de çiyê ke dayo ganî merdim tira razî bibo. Seke yew terzo ke qeza û qederê xo rê îtiraz bikero "Ax", "Of" reyra gerre kerdene, yew bêj seke qederî rexne kerdiş o, rehma ey sucdarkerdiş o. Keso ke qederî rexne bikero, qoqa xo dano ors ro, şikneno. Keso ke rehme rexne biko, rehm ra meheyr maneno. Desto şikite reyra seba heyf girewtîş o destî şuxulnayîş, senî şikitişê ey zêdneno; winî zî, merdimo ke yew musîbet ey serê ser de ameyo, îtiraz, gerre û mereq reyra têbigeyro, musîbetê xo dila keno.

Meseleya Diyine: Musîbetê maddî eke gird bivîniyî hîna gird benî, qij bivîniyî qij benî. Ma vajî, şandanan (şanan de) xeyalêk çiman merdimê vera keweno. Çiqas ehemmiyet bidiyo ci girs beno, eke ehemmiyet ci nêdiyo vîndî beno. Hawayo ke hingê ke êriş kenî, kê têkilê înan bibî êriş zêdêno, kê peygoş bikerî vila benî, musîbetê madî zî wina yî, merdim çiqas bi ehemmiyet tira biewniyo gird benî. Meraq reyra o musîbet leş ra vêreno qelb de zî ca gêno, beno sebebê musîbetêk manewî, ey ra paşt gêno, dewam keno. Kam gama ke ê meraqî pê qeza rê razî biyayîş û tewekkul reyra biestero, seke reyeyê (ristimê) yew dare bibiriyî, musîbeto maddî, gam bi gam sivik beno, sey dara ke rêçê (ristimê) aye biriyayî wişk bena, şona. Seba tarîfkerdişê no heqîqetî demey mi wina vatibi:

Fek verra di hey bêçare feryadî ra, bela ra biki tewekkul.

Çunke feryad bela miyan de, xeta miyan de bela yo bizan.

Eke to beladayoxî dî, şadiye miyan de, lutf miyan de bela yo, bizan.

7- Hadîsi. Buharî, Merda: 2, 3, 13, 14, 16; Muslim, Birr: 45; İbn Mâce, Edêb: 56; Dârimî, Rikak: 57; Musned, 1/381, 441, 445. Reyna b. Musned: 3/152

Eke to nêdî, heme dinya cefa miyan de, fena miyan de bela ya bizan.

Dinya homay belay to serê ser dî, ti çi qîrenî yew belayo qijkek ra?

Bê, tewekkul biki.

Tewekkul reyra bela ro bihiwi, ta o zî bihiwiyo. O çiqas bihiwiyo qijek beno.

Vuriyeno.

Senî lej de vera yew reqîbo muhtîş hiwiyayîş reyra, xerez beno werfameyîş, dişmeniye bena yarî, kîn şenik beno, xeripêno; tewekkul reyra vera musîbetî vindertîş zî winî yo.

Meseleya Hîrêyîne: Her wext wayîrê yew hukmî yo. No wextê xefletî de musîbet şeklê xo bedilnayo. Tay wextan de û tay şexsan de bela, bela niyo, belkî yew lutfî îlahî yo. Seba ke ez nêweşiyê nê wextan û sewbîna musîbetzedeyan bextiyar vînena – la musîbet ganî dîn ro tesîr nêkero- derheqê duştê nêweşiyê û musîbet de vindertene de yew fikr nêdano mi. Û înan rê hîssê pîzeveşnayîşî nêdano mi. Çünke, kam nêweşo ciwan ke yeno mi het ez vînena, goreyê hemseranê xo yew derece wazîfeyê dînî û axîretî ra pabestiyayo. Ez ey ra fam kena ke, o dis merdiman rê ê bêj nêweşî musîbet niyî, yew tewir nîmetê îlahî yî. Çünke, her çiqas a nêweşî heyatê eyo dinyayî, fanî, kilm rê yew zehmetî dana, labelê heyatê eyo ebedî rê faydeyê xo est a. Yew bêj îbadet hesabêno (dekeweno herinda îbadetî). Eke sihet vîno, serxoşiya ciwanî û sefîlêya no wextî reyra, helbet nêşno halê xoyê nêweşî mehfiye bikero (bipawo), beno ke bikewo sefahet.

Xatîme

Cenabê Heq, seba ke qudrêtê xoyo bêhed û rehmetê xoyo bêpeynî binawno, însanî de yew eczo bêhed, yew feqîreya bêpeynî ronayo. Hem seba kaînat de xeml û xêzê ke nameyanê Homay nawnenî bido zanayîş, însanî hende yew şekil de xelq kerdo ke, seke yew makîneya ke hem şe kena elemanê bêhedan hem lezzetanê bêhedan bigêro. Hem a makîneya însanî de se hebî aletî est î. Her yew elemê xo ciya, lezzetê xo ciya, wezîfeyê xo ciya, mukafatê xo ciya yî. Seke heme cîlveyê esmayê îlahiye ke alemo ke yew însano girs hesabêno de est î, însanî sero, ke yew alemo qij hesabêno, neqşê ê nameyan est o. Nînan de sey sihet û afiyet û lezzetî 'emrê faydeyînî senî şikrî danî vatiş, a makîna zaf

Hewar

Dilêr Zana

Pêlên hewara giyan

Ji hinavên axê

Ji bedena nivistî

Ber bi esmanê erdê ve diherike

Weki birûskekê

Bi bayê bezê berq vedide

Dil dibe dilê kovanên bextê reş

Dikevgire/diparzine di xelaya mirovên çê de

Dike gazi

Ji bo xwe li ber piyên

Tawanê mirovahiyê xwe bide alî,

Nekeve ber diranê çerxa xerabiyên

Ku di rehikê ramana civakê de

Weki lêmiştê dihetike

Nefetise

Roda neçe...

26.01.2010

hetan ra sewqî wazîfeyê xo keno, însan zî seke bibo yew palukaya şikrî. Winî zî, musîbetan, nêweşî, elemî, sewbîna arizayê çiyânê heyacaninan û herketdayoxan reyra, sewbîna çerxanê a makîna dano coş û hereketkerdişî. Madenê ecz û zeîfiye û feqîriya ke miyanê mahiyetê însan de yî dano şuxulnayîş. Yew ziwan reyra ney, belkî ziwanê her yew weslî reyra keweno yew waziyeto bextwaştîşî, yew ardimwaştîşî. Ti vanî qey însan ê arizayan reyra, beno yew qelema hereketin ke ciya-ciya hezar qelemî aye miyan de est î (hezar qeleman xo miyan de hewînena). Rîpelê heyatê xo de yan zî lewhê mîsalî de heyato ke Homay bellî kerdo nuseno, esmayê îlahiye rê yew îlanname virazeno û kewena şeklê yew qasîdeya manzumeya subhaniye, wazîfeyê xoyê fitratî ano ca. ●

Ferîştehan ew di xew re kirin

HATÎCE MOLLAKENDÎ

haticemollakendi@hotmail.com

Li çolê tu tiştêk nîne; ne gotinek, ne kesek...

Eli Şerîati

Li çolistanê satileke spî ji dûr ve dît. Ber bi satilê ve çû. Di her gavavêtinê de satilê tije kir wate. Tije kir avên zelal. Bi xwe bi xwe difikirî: Ew satil teqez tije av e. Lewra li çolistanê av pêwîst e. Ger ku di satilê de av jî tune be hew çima satil, satil e? Qederekê nêzîkê satilê bû. Ji nişka ve di cih de sekinî. Lewra ji tunebûna wateyan ditirsiya. Ji heyîna valatiyan, ji tiştên ku spî dixuyan lê di eslê xwe de reş in, ditirsiya.

Careke din hêza xwe tev top kir. Ji êşên xwe ên mirovatiyê piştrast, ji tijebûna satilê bawer reviya li ba satilê. Binê satilê dixuya jî, lê dîsa jî serê xwe xûz kir. Li nav satilê, li binê satilê nihêrî. Nêrînên xwe giran giran ji satilê zivirand. Rûyê wê tîrş û mehdekirî... Satil vala bû. Wek her caran dîsa jî qirdşikestî, hêvîşikestî bû. Dîsa rastê tunetiyê, bêwateyiyê hat. Bi valatiyê re rû bi rû ma dîsa. Valatiya yarê, gotinên wî ên bêfedî di ber çavan re derbas bûn. Dîsa rastê reşa ku spî dixuya hatibû... û ditirsiya.

Di payîzeke nêzîkê zivistanê de, di saetek nêzîkê duduyan de,

li piştê nîvro... Ew roja ku şev ji nîvro destpê kiribû. Ew şev wisa tarî bû ku nivê rojê jî dabû ber xwe. Nivê rojê jî tarî kiribû. Kesî nizan bû ew şev çend saet bû, çend roj bû. Ew roj pê hesiya, pê agahdar bû: Çar hezar birîndar çêbibûn. Du hezar kes mirîbûn. Di bajarekî de avahî tev hilweşiyabûn. Ên ku sax mabûn jî di konan de bicih bibûn. An jî hatibûn bicihkirin. Di konan de zarokên bê dê û bê bav man di nav wê bobelatê de. Çapemeniyê wisa agahî dida.

Lê haya çapemeniyê jî hêj bi hemşîra ku herdu lingên xwe di binê kavilan de hiştibûn û berî dabû Zanîngeha Erzerûmê, çênebibû. Hêj kesî hemşîreyê ku zarokên xwe hembêz kiribû û bi tevê zarokên xwe di binê kavilan de mabû û bi zarokê xwe ve mirîbû, miribûn nedîtibû. Hêj bûkayekmehî zavayê desthenekirî defin nekiribû. Lewra zava hêj ji binê kavilan derneketibû. Hêj kes bi hemşîreyê sezeryankirî ku kevirên avahiyê bi ser zikê wê de ketibûn û zikê wê teqandibû, nehesityabû. Hêj kesî karmendê

Bi zeraqa tavê re ket bajêrê hilweşiyayî. Bi ketina bajêr re ricif lê ket. Kumê xwe ji ser biriyên xwe yê reş kişand, hevraz kir. Lêvên wê ên ku di navbera xemê û hêviyê de mabûn bi dîtina bajêr re tev xem li xwe werkir


tendurîstiyê ê ku jina xwe û hemû zarokên xwe definkiribû û bêmal mabû, nedîtibû.

Di 'esreke teng de xwe ji serî heta binî reş girêda. Kumê xwe ê reş da serê xwe û heta ser biriyên xwe ên reş û qeytan kişand. Guhên xwe jî xist binê kumê. Guharên wê ji derve man. Çavên wê ên hişyar diçilwilîn. Lêvên wê di navbera hêvî û xemê de nêzikê xemê bûn. Berê xwe da bajarê hilweşiyayî. Çû. Hêj şevêk di ser erdhejê re derbas nebibû. Bi şev kete rê. Ew çiqaş diçû, rê awqas dirêj dibû. Dixwest ku rê kurt bibe, lê nedibû. Bajêrek, du bajêr, sê bajêr, çar bajêr...bajêr, bajêr, bajêr...rêwîtî xilas.

Bi zeraqa tavê re ket bajêrê hilweşiyayî. Bi ketina bajêr re riçif lê ket. Kumê xwe ji ser biriyên xwe yê reş kişand, hevraz kir. Lêvên wê ên ku di navbera xemê û hêviyê de mabûn bi dîtina bajêr re tev xem li xwe werkir. Çavên wê ên ku diçilwilîn, zîq bûn. Lingên wê pêşî lerizîn, erd negirtin. Paşê leziyan, beziyan. Dengê şînen kûr sûkut in, rengên wan reş...

Çû ser kavilan. Li xerca kavilan nihêrî. Bi xîz û şîş û hesinên zirav bûn. Na, şîş nebûn, şîşik bûn. Zengirtî bûn. Girte bi şîşekî û tewand. Û heta çavên wê birrî, virvirand. Bi dengê bilind ramiya: Ger ku hûn avahiyan bi van şîşan çêbikin eva zelzele nîne, komkujî ye. Beriya wê komkujiyê de wijdana we miriye. Di bin kavilan de li wijdana xwe bigerin. Li termê wan na, li wijdana xwe bigerin

Evan kavilan pêşî de jî, gava ku hê bîna bûn jî, dîtibû. Ew çax xîz û şîşik xuya nedikirin. Avahî



xemlandî bûn û aramî didan çavan. Çavan dilan dixapand tabî. Meriv tenê şahnişîna wan xaniyan nedida bi hezar malan.

Evan avahiyan dişiband yar û kesên kêmxelaq, kesên sincxurufî. Yarên heqxwendî, lê heqnenas. Necamêrek di van taybetiyan de jî ser wê de hilweşiya bû. Ew avahî çawa bi ser gel de hilweşiya bûn, yarê wê jî wek wan avahiyan bi ser ruh, dil û çavên wê de hilweşiya bû. Çavên wê, êdî wisa hişyar bibûn ku minafiqî li ku derê dibe bila bibe, di çi mijarê de dibe bila bibe, didît. Ji ber wê bû ku erdhejê, na na ruhhejê herî baş ewê pak fehm dikir. Miçiqandina hejekzedeyan kesî qasê wê nedizaniyabû. Lewra ruh û dil û çavên wê jî piştê minafiqiya yarê miçiqî bûn. Ma tu kesî dizanibû gava ku zelzele dest pê kir û heta sibetirê çend seet, çend dan, çend roj, çend hefte, çend meh derbas bûn? Ma tu kesî dizanibû ji wê pê ve? Ji halê ketiyan ketî fêhm dikin.

Piştê raçavkirina kavilan şûn de serê xwe bilind kir, li çiyayê sîpanê nihêrî. Sîpan li piyan bû. Ew jî li piyan bû. Di vî bajarî de du Sîpan hebûn aniha. Sîpan

di her dewrê de temaşevanê vê erdnigariyê bû. Sîpan di hemû dewran de li vir bû, ji vir bû. Navê xwe danî Sîpan.

Çû nav konan. Me'dekirî ramiya: Ezê vê şevêkê silavek çawa li wan bikim gelo? Ji ber ku destpêka rojê ye bêjim "rojbaş" na, nabe. Eva derew e. Roj nebaş e. Bêjim "demxweş" dem xweş nîn e. Bêjim "qewet be", qewet tê gelo? De hadê ezê bêjim "serê we sax be" Serî sax dibin gelo? Na eva jî derew e. Serî sax nabîn li dû wê şeva ku ji nîvro de dest pê kiribû. Hêza xwe tev berhev kir. Çû, destê xwe li deriyê konekê da û got:

-Rabin... Dizanîm ku hûn ji zû de jî rabûne. Şevê konan zû xilas dibin, xewa wan sivik in. Piştî wê şeva dirêj tav derket. Dê tav niha hewayê, erdê, avê germ bike. Rabin, tav derket.

Li ber konan ku sekinîbû, yekê ji hundir de circira konê vekir. Lewra derê konan circirin. Derî bi pê ve tune ne. Cîrcîr derî nederî circir... Li ku derê kon vebûn li hevdu nihêrîn. Bi xwe him şa bû, him şaş bû. Çimkî eletexmîn, li ba konekî ji rêzê sekinîbû. Çi dizanîbû ger

ku circir vebe dê ewê rastê hevala xwe were?
Circir vebû. Di navbera wan de bédengiyêke
xerîb qêrînî kir. Hemşîrê serê xwe ji konê derxist,
destê xwe dirêjê hevala xwe kir, got:

-Tu hafî? Min dizanibû dê tu werî. Ez filitîm.
Ez sax im.

Ew jî giriya, got:

-Te çima têlefona xwe venedikir?

-Têlefona min di binê kavilan de maye.
Têlefona min û tevê...tevê...

-Tevê çi? Tevê kî? Tevê kê?

Sewtek jê çû, qêriya, got:

-Tevê lawê min, Yusuf. Ferîştehan wî di
himbêza axê de di xew re kirin. Pîsîrên min şîr
tije dibin. Ez ewî şîrê didoşim erdê. Lewra Yusuf
jî di bin axê de ye. Dê ewê şîrê min bigihêjê,
na? Ez lewra didoşim erdê. Dê ewê di bin axê
de jî bi şîrê min têr bibe, na?

Ji nû ve vegeeriyên ciyên ku peyv lê xilas di-
bin. Li wî ciyê sekinîn. Ku dengê wan ji hevdû bi-
girta dê bibûya qêrîn, dê bibûya teqîn. Sûkutbûn,
sarbûn, bêçarefî, bînayên minafiq... minafiqî
mezin dibû, mezin dibûn.

Hevdu hembêz kirin.. ketin konê. Rûniştin.
Sar bû, dicemidîn û xwe qincilandin hev.

Carna bi têlefonek meriv germ dibe. Bi
pîrsîna hal û wextê meriv têr dibe. Hemşîreyê
hevala xwe dîtibû. Germ bibû. Têr bibû.

Li nav konê nihêrî. Penc bihust ji wan wê
de satîlek spî û mezin hebû. Kumê xwe yê reş
ji serê xwe danî. Çû ba satilê. Nihêrî satil vala
bû. Tu tişteke di nav de tune bû. Bi tunetiyê re
rû bi rû ma dîsa. Avahî minafiq, yar minafiq,
wijdan seqet, satil vala, kon sar, Yusuf mirî, bajêr
hilweşiyayî... Mala minê! Çavên wê di navbe-
ra êş û xemê de nêzîkê êşê bûn. Xemê li xwe
werkiribû. Reş bû. Bêberçavk bû. Kûr bûn çavên
wê. Dilê wê di navenda mirovatiyê de. Exlaqê
xwe ji hemû minafiqiyan paqij kiribû. Li bajarê
hilweşiyayî bû xebatkarê dildar. Piştî xwe da
satila vala. Berê xwe da hevala xwe. Rondikên
çavên wê mîna barana biharê berjêr dibûn. Ji
hevala xwe re got:

-Lerza erdê, lerza ruhê, hilweşîna avahiyan,
hilweşîna evîn û dilan û mehşer....tev dişibin
hev...bigrî û bigrî... nabêjim negrî...lê rabe xwe
bide hev...●

Demeke Tarî

Kelhokî

Civiyane pêlên ewran
Tari ye pîrr tari
Rûyê axê berf girtiye
Çiyayên min mîna bûkekê...

Piçûk im
Zarok im
Barê qaçaxiyê li piştî min e
Barekî giran...

Ez ji welatekî biyanî nayê
Nayê ji welatekî xerîb...
Réya min dûr nîne
Ez dûr nînim
Natirsim ji guran, rûviyan
Natirsim ji tu tiştî
Ji xayîntiyê,
Ji xayînan ditirsim ez.
Barê min ne tenê qaçax e
Jiyan e
Fêqir im
Naçar im
Mezlûm im
Barê min ne tenê qaçax e
Zilm e.

Min kuştin.

Prof. Dr. Sibel Arkonaç: Em hemî parêzvanên îdeolojiya cumhûriyetê ne!

HEVPEYVÎN: KOMXEBATA PSÎKOLOJİYÊ*



Mamoste, pêşî em dixwazin hîn bibin ku di lîteratûra psikolojiyê ya cihanê de psikolojiya civakî kengî dest pê kiriye?

Dema ku dîroka psikolojiyê bê zanîn, tarîxa ku em bibêjin destpêka psikolojiya civaknasîyê ye, ew çax dibe tiştêkî polîtîk. Yanê di nav polîtîkaya zanistê de hatiye dayin. Qesta me ya ji polîtîkayê jî îqtîdar e ku gelek kesên hêja yên ku metoda ceribandîne (experîmentalê) bi kar neanîne ji vê sazîyê dûr xistin e.

✓ Yanê sedema destpêka wê, îqtîdar bûye?

Belê. Mesela dibêjin bi pirtûka *destpêka psikolojiya civaknasîyê* ya ewil ve dest pê kiriye. Lêbelê pêşîya wê jî gelek xebat hene. Di salên 1900î de psikolojiya civakî jî, di bin banê tarîxa psikolojiya gelemperî de tê dîtin. Pêşîn, xebata Wundt a bîst salî Völker


Psychology, a ku dixwest tiştê civakî hîn bibe, heye. Lewra, li wir ji bo yekîtiya Almanan dixebitîn. Dixwastin ew yekîti li ser ziman bihata avakirin. Ji ber ku prensîbên wan ji hev cihê bûn, tenê ji hêla ziman ve dibûn yek. Yanê digihîje heta sala 1879an. Pêşîya Wundt jî gelek xebatên ku îro em dibêjin mijarên psikolojiyê ne, hebûn. Her wekî hiş, dîqqet...

✓ Mamoste, ew xebatên ku heta 1910an hatine kirin ên ku îro em dikarin bibêjin bi psikolojiya civakî re eleqedar in, pêşîya 1910an di bin kîjan navî de bi çi awayî hatine nirxandin?

Wundt qala van xebatan dike. Hemî di bin banê psîkofîzyolojiyê de ne. Yanî sînorên xebatên wê ji sînorên felsefê diqetin. Lêbelê ne ku sînorên eşkere û ji aliyê sazîyan ve bûn. Di sala 1879an de wexta ku Wundt dezgeha (laboratûara) xwe vekir û lewheya Dezgeha Psîkofîzyolojiyê jî pê ve daliqand, derdê wî ne ew bû ku dest bi zanistê nû bike. Derdê wî ew bû ku derheqê têgihîştina mirovan de bersiva hin pirsan hîn bibe. Lewra, ji têgihîştinê



Prof. Dr. Sibel A. Arkonaç di sala 1958an de hatiye dinê. Di sala 1980an de ji Li Zanîngeha Stenbolê beşa Psikolojiyê qedandiye. Di sala 1989an de teza xwe ya doktorayê ya bi navê "Têgihîştina Nasnameya Civakî a Stenboli û Komên Kolîkî ya di Derbarê hev de" qedand. Di sala 1993an de di Makebaşê Psikolojiya Civakî-de bû doçent û di sala 2000an de bû profesor. Niha ji li wir dersên lisansê, lisansa bilind û yê doktorayê dide.



Tu kes, ji tu cihan ji felsefê ders nagire, ji sosyolojiyê ders nastîne, ji lîngûistîkê ders nagire; mesela em di vê beşê de hêj niha ji pê îftixar dikin ji ber ku, ji sala yekemîn şûnde tenê dersa psîkolojiyê didin

wêdetir dixwest ka hiş çawa dixebite, wê yekê hîn bibe. Heta hingê jî ev her dem derdê felsefê bû. Di sala 1930yan de gotin, psîkolojî hingê êdî bibû saziyek, jixwe herkes ji bo dîrokekê dinivîsîne, wekî, çawa ku Komara Tirkîyê piştî damezrandina xwe, ji bo xwe dîrokek nivîsandiye. Ji kengî dest pê dike, bi dezgeha ceribandîne a pêşîn ava bûye.

✓ **Psîkolojiya Civakî kengî xwe bi xwe rexne kir? (Wexta ku ji aliyê metodên ku bikartîne ve nêrîna wê ya li ser mirov û civakê em binirxînin)**

Pêşî rexneya navxweyî divê ji aliyê wesifandinê ve bê nirxandin. Çima rexneya navxweyî dike? Yanê tu ji bo xwe jî, ji bo îdeolojiyê jî, xwe rexne dikî da ku tu îdeolojiyê paqij û safî bikî. Yan jî ji bo ku muhekemeya te azad bibe tu xwe rexne dikî, wê çaxê jî, îdeolojî zerar dibîne. Bi vî awayî, ji bo ku kêmasiyên mantiqa ceribandîne, pozîtîvîst û empîrîst di ber çav re derbas bikin û wana sere-rast bikin, di salên 1950î de ev rexne hebûn. Di salên 1960î de bi şiklekî din çêbû. Di salên 1970î de digihîje asta herî bilind, lêbelê gelek ecêb e ku ev rexne li ser psîkolojiya civakî dest pê dikin. Yanê piştî Psîkolojiya Kemilandinê (Developmental Psychology). Klînîk ji ber ku di rêyeke din de diçe xwe naxe nava van rexneyan, jixwe ceribandin niha jî hîç xwe nade ber van rexneyan.

Piştî wê ku ew jî têrê nekirin, guherînan di civakê de divê meriv wan baş fam bike. Di civakê de, civaka Ewrûpayê de, civaka Rojavayê de piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, bi awayekî lezgîn wisa ji hev vediqetin, êdî avahiya ku tê maneya pevrebûnê nikare pê re bigihîne. Postmodernîzm êdî dest pê dike. Modernîzm, pevrebûna kesî/şexsî diparêze; lêbelê Postmodernîzm tiştekî wisa qebûl nake. Di

jiyana rojane de, ew tên dîtin. Ev jî bandorê li ser wan kesên di akademyê de dixebitin jî çêdike û xebat ji nû ve dest pê dikin. Nemaze, disîplînen ku eqrebayên hev in, nêzîkî hev dibin. Lêbelê perwerdehiya psîkolojiyê, piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn, têkiliya di navbera disîplînen eqrebayan de ji holê rakir.

Tu kes, ji tu cihan ji felsefê ders nagire, ji sosyolojiyê dersê nastîne, ji lîngûistîkê ders nagire; mesela em di vê beşê de hêj niha jî pê îftixar dikin ji ber ku, ji sala yekemîn şûnde tenê dersa psîkolojiyê didin. Çi kirin, dest bi xwendina ji felsefê, ji sosyolojiyê kirin, lêbelê; xortaniya van Marksîzm e, li ser Marksîzmê dixwendin. Di salên 70ê û 80yan de xwendina Marksîzmê jî hêdî hêdî dişkê. Yanê ev nîfşa ha, rexneya xwendina ekola mîna Frankfurtê jî dikin. Ji ber vê dest bi xwendin û nivîsandinê dikin. Austîn, Bakhtîn û gelek kesên din dixwînin. Wexta min dest bi xwendina wan kir di sala 94an de, pêşî di sala 89an de kitêbên protestoyê hebûn, *dîkonstrîksiyona psîkolojiya civakî (Deconstructing Social Psychology)*. Kitêb ji serî heta binî protesto ye. Tiştekî dide ser û menzereyekê dide. Lê ez çawa li meselê mêze bikim, nêrîneke ku ez qebûl nakim, dê çawa bi wê, vê alemê temaşe bikim? Ji salên 90î şûnde dikemile, di dawiya salên 90î de di nav wan de, fraksiyonên ji hev curbecur derdikevin. Hevdîtinê qut dikin, referans nadin hev...

✓ **Îcar li Tirkîyê psîkolojiya civakî ya akademîk kengî dest pê kiriye?**

Li Tirkîyê destpêka psîkolojiya civakî ya akademîk bi psîkolojiyê re dest pê dike, dîrokên wan ji hev cihê nînin. Mumtaz Turhan rewşenbîrekî pir girîng e. Psîkolojiya civakî bi saya wî wekî beşeke meşrû berdewam dike. Pêşî bi ceribandîne ve xebatên xwe domandine. Ne ku yek şûnde hatibe û wekî beşeke di bin psîkolojiyê de dest pê nekiriye.

✓ **Belê mamoste. Îcar li Tirkîyê wekî li deverên dinê, aqûbeta psîkolojiya civakî jî eynî bûye? Rexneya navxweyî kengî dest pê kiriye, ji ber ku hûn jî li ser vê beşê dixebitin, tu kesên navdar hene yên ku ev rexne dane destpêkirin?**

Li Tirkîyê rexneya psîkolojî û ya psîkolojiya civakî di sala 2000an de dest pê dike, beriya wê, rexneyên kesên xwedî fikra Marksîzmê, hebûn. Lêbelê rexneya paradîgmâtîk û rexneya zanîne bi

xwe û bi têkildarkirina polîtîkayê ve -yê ku rex-ne dike ev der e- ez tenê me. Melek Goregenî jî heye lêbelê bi rastî ew pêşî paradîgmaya modernîst qebûl dike, dest ji wir nakêşe.

Yên li vir zanistê însa dikan, tebeqeya navendê ye yan jî yê tebeqa jor in. Di salên 50yî de ODTÛ ava dibe, pêşiya wê di sala 1915-1917an de Stenbol Psikoloji heye, piştî wê Ege Psikoloji vedibe û dewama wê tê, Bogazîçî paşê vedibe. Zanîngeha Stenbolê zanîngeheke tîpîk a dewletê ye. Kesên ji Anatoliyayê ji bo xwendinê şandine Ewrûpayê tên. Lêbelê bingehîn ji bajarê Stenbolê ne. Mamoste Mumtaz ne ji Stenbolê ye, ji Pasînlera Erzeromê ye, lêbelê xwendekarên wî tev ji Stenbolê ne. Mesela keçên ji malbatên dewlemend in, bajarî ne. Civak ew zanista ku ew derdixin, xwe tê de nabîne.

Bajarî dixwazin bajariyan bistînin. Li vir hêj jî beşên me yê wisa hene ku ji civakê re girtî ne. Gava ku mirov li rojên paşî dinêre, dibîne ew kesên hewl didin ku bibin laîkî, bajarî, sekûler yan jî ewên ku jixwe wisa bûn; ev kes îro parêzvanên îdeolojiya Cumhûriyetê ne.

✓ *Yanê îqtidar bi xwe!*

Belê belê, îqtidar bi xwe. Ev wê gêr dike yanê lê siwar dibe, Bogazîçî tam mînaka vê ye mesela. Bogazîçî jî, me wekî kevneşopî, parêzvan, paşverû dizane; ji ber ku ew bêhtir Rojavayî ye. Lêbelê em hemî dibin parêzvanên îdeolojiya Cumhûriyetê. Lewra zanîngehên Komara Tirkîyê mecbûr in wisa bibin, ji ber ku hemî karmend in, karmendên dewletê. Bifikire! Felsefe jî, karmendiya dewletê dike.

✓ *Çima li Tirkîyê tenê hûn? Li dinyayê piştî salên 70yan bi şûn de xwendinên rexneyî û yê Marksîst derketine û bi şikleki dewam kirine, lê Tirkîye ji vê pêvajoyê veqetiyaye!*

Min wisa kir. Îtirazên devkî hatin lê nikaribûn zêde tiştêkî bikin. Di nav beşê de min karê xwe yeko yeko meşand, piştî ku bûm doçent jî, ev pêlên nû min nas kirin, ji ber wê min kadroya doçentiye pir rihet girt. Lê cara ewil qebûl nekirin. Sala din dane min. Di sala 97an de li derveyî welat bi xwendekarê xwe yê hosteyî (doktor) re gotara xwe ya ewil wekî danezan da. Li ser *Vegotina Jinê*. Di dawiya 90an de serokê beşê, wexta min teza xwe da, li min hêrs bû, ji bo ku li gorî gotina wê, ya min fikir ne tiştêkî zanistî bû.



Eger hûn dîqçet bikin, di gotarên min de gotina Tirkîyê hiç derbas nabe. Ji ber ku lêkolînan li ser yê Tirkîaxêv re, dikim. Ji bo vê yekê, bi vî awayî sînorê xwe kifş dikim.

Vêga mesela min, di pêşiya min de asoyek heye. Di camîaya psikolojiyê de, nayê hezkerin. Tu gotarên min nehatin weşandin, her dem di dersê de jî dibêjim: Kitêbên min tên xwendin lê gotarên min nayên weşandin. Her dem ji bo civînan gazî min dikan, nemaze di van şeş salên serokatiya min ya beşa psikolojiyê de, bêyî min tu tişt nekirin. Dibêjin: Sîbel girîng e, lê meqalên wê ji ber ku -li gorî wan- ne zanistî ne, nayên weşandin.

✓ *Mamoste ferqa we ji wan çî ye?*

Ji ber ku ez dijî wan diaxivim. Bizane ku her dem ji yekî zane tê tirsîn. Tiştê ku tu û ew girîngiyê didinê ji hev cihê ne. Wexta ku ew li te temaşe dikan, li gorî wan pir tiştê girîng tu qîmetê jî nadiyê; wexta ew wê dibînin, dîtirsîn. Wê çaxê li hemberê te disekine, lêbelê her xayîntiyê jî dike, meqala te naweşîne vê nake, a din nake hwd...

✓ *Di gelek gotar û berhemên xwe de qala "herêmiya zanîne", "çavkaniyên me" û "metnên me" dikan. Qesda we ji van çî ye?*

Eger hûn dîqçet bikin, di gotarên min de gotina Tirkîyê hiç derbas nabe. Ji ber ku lêkolînan li ser yê Tirkîaxêv re, dikim. Ji bo vê yekê, bi vî awayî sînorê xwe kifş dikim. Lêkolînan xwe li ser kesên di vê erdnîgariyê de yan jî milletên zimanên din diaxivin, bi gelemperî nikarim nîşan bidim. Lewra zimanê wan nizanîm.

Wexta dibêjim; herêmiya zanîne, çavkaniyên herêmi, xweseriya me, bi semimî, qesda min, hilberîna jiyîn û nêrînan wan zimanên di vê cografyayê de ne. Lewra tu nikarî wan ji hev veqetîni. Ez wisa dibînim. Yanê jiyîna Ermenan bi Tirkî derbasî heyata min dibe, li ser Tirkî ez diaxi-

Wexta hûn tîn dinyayê diçin psîkologê; dema hûn diçin mektebê, diçin psîkologê; ji bo amadekariya ezmûnan diçin psîkologê, ji bo hîlbijartina pîşeyê careke din diçin psîkologê, dema tu dizewicî zewaceke çawa li gorî te ye psîkolog biryar dide.

vim, lêbelê yên ji Kurdan û Sûryanan tîn jî hene. Ez xaçparêzan li ser mantiqa Ortodoksan nas dikim, lewra li Tirkîyê دنیا min a Katolîkan nîne. Tu caran bi Katolîkan re derdê min çênebû, hemî caran bi Ortodoksan re çêbû.

Di Tirkîyê de nîfşa me jî tê de, di nav xortan de, ji 60ê û şûnde yên Kelîle û Dîmne xwendî, çend kes hene; Efsaneyên Battal Xazî, Efsaneyê Kela Xwînê çend kesan guhdarî kirine, we çiqas çîrokên Kurdan guhdarî kirine û we çiqas ji me re gotine yan jî me çiqas niyet kir ku em wan guhdarî bikin? Metin evna ne. Me Xezalî, Şêx Xalib hîç nexwendin. Peyva "menqîbe"yê piştî salên 90î ez hîn bûm. Qesda min ji metnan ev bûn.

✓ Mamoste tiştên ku hûn qala wan dikin ji ber çi sedemî psîkolojî ji xwe dûr dibîne û dema qala zanistê tê kirin psîkolojî mirovan ji wan rût dike?

Tiştên rast, hin tiştên dinin dibêjin. Lêbelê ev tiştên me wekî civak jî qebûl nekir. Di nav 80 salan de bi meraqa modernîteyê ew tişt hemî me înkâr kirin.

✓ Şoreşa ziman çêbû. Pêwendî û çavkanî tev qetiyên.

Hemî qetiyên, çûn. Yek jî ji ber ku psîkolojî jî milê rastê yê jiyana modern e, wan tiştan didane aliyekî, dibêje ku li wan nenihêre. Jixwe psîkolojî guh nade tiştê tu dibêjî, li bîngeha gotinên te dinhêre.

✓ Dema me ev çavkaniyên herêmî xwendin, feydeya wê çi ye, ji bo psîkolojiyê eger em lê binêrin?

Veqetîna ji çavkaniyên herêmî mîna meriv ji odeyekê derkeve û êdî hîç nezivire wir, neyê famkirin. Di hêrsbûn, enirîn, henek û tuwancên/îma ziman de û mezêlên wê yên veşartî de, hêj şopên wan menqîbeyan, çîrokan hene. Em li ser wan şopan dixwazin modern bibin.

Wê çaxê, wekî lêkolînerekî divê bizanim ka ez di nav kîjan pêwendiyê de xwe binecih dikim. Ji ber vê yekê divê ez dîrokê, dîroka civakê bizanim û haya min ji edebiyatê hebe, herî kême eleqeya min bi du sê disîplinan re hebe. Yanê wekî rewşenbîrekê ne wekî karmendê dewletê.

Mesela nasekî min çûbû Herêmê (Kurdistanê), li gundên Bedlîsê lêkolîn kir. Min jî gotê kanê wergêr ji te re lazim bû, got ji mecbûrî lazim bû. Û hem li gundên Kurdan hem jî yên Tirkan eynî tişt pirsibûn. Wexta min gotê, lê xweyîkirina zarokan li ba Kurdan û Tirkan ji hev cihê ye, ji ber ku pêwendiyên wan nizanîbû, nekarî bersiv bide.

Duh ajokarê Erebê pirsî, gelo Sunnîti û Henîffîti çi ye? Ez jî kenîyam û min gotê, li wir ji ber ku herkes di eynî baweriyê de ye, hêj nizanin. Herin Diyarbekirê, Şaffî hene, Sunnî hene, Henîffî hene. Herkes hevdu dizane.

✓ Ya dawiyê jî, di gotarekê de we gotibû: "Psîkolojî, zimanê muqtedîran hildiberîne û wî zimanê di nav civakê de belav dike." Ji muqtedîran, divê çi bê famkirin?

Ji muqtedîran divê em zordestiyê fam bikin. Di gotara min a bi navê "Zimanê Psîkolojiyê, Zimanê Îqtîdarê" de min gotiye: Wexta hûn tîn dinyayê diçin psîkologê; dema hûn diçin mektebê, diçin psîkologê; ji bo amadekariya ezmûnan diçin psîkologê, ji bo hîlbijartina pîşeyê careke din diçin psîkologê, dema tu dizewicî zewaceke çawa li gorî te ye psîkolog biryar dide. Evana tev hêmanên psîkolojiyê ne yên bo xizmeta îqtîdarê.

Û ez vê jî dibêjim: Ez ji zûde ye ji psîkolojiyê veqetiyam. Ez psîkolog nînim, psîkolojiya civakê jî nakim. Li gorî min wexta ku modernîzm xilas dibe, psîkolojî jî êdî dê xilas bibe. Lewra ji bo sîstemê, mirovan digehîne. Ji bo sîstema kapîtalîst.

✓ Mamoste zor spas.

Spas xweş. ●

***Raşit İlan,
Furkan Erdoğan,
Ümit Eser**

Reva Gulnazê

HESEN POLAT

Amoja Zerîf ber kaniyê re berjor bû, li paş xaniyê apê min re çerixî. Di cihê xwe de hinekî sekinî, li dû xwe maziya. Berjêr û berjor dora xwe temaşe kir û ber bi mala kalikê min gav avêt. Ez li jorî gund li ser sivînga kadîna me rûniştî, matî rêveçûyîna amojaya Zerîf mabûm. Gelo vê danê sibê amoj li çi digere? Min dizanî ku karên jinên gund danê sibê naqedin û ji bo suhbeta jinan wext hîn zû ye. Gurmek ket dilê min û mereqek li laşê min belav bû. Ecêb li gund de tiştêk bi kesekî qewimiye û haya min hîn jê tune?

Ez bi lez rabûm û min berê xwe da mala kalikê xwe. Xwedê dizane, ka amojê dîsa çi hewadîs girtiye û digihîne dapîra min. Înşeleh tiştêk xirab bi kesî neqewimiye! Bi lez ji nêrdîwanê daketim jêr, bi ser sûra hevşo re tûl da û bi aliyê mala kalikê xwe ve berjêr bûm. Bi mereq û heyecanek mezin gihîştim ber derê kalikê xwe. Tu kes li ber derî tune bû. Bi dudilî hinekî li ber derî sekinîm, li der û dora xwe guhdarî kir. Di hundir de dengê axaftinê dihat. Hinekî bîna min

fireh bû. Di wê navbeynê de meta min jî derket der. Biroşên avê li dest de ber bi kaniyê bû. Min bi dengêkî nizm bang li meta xwe kir û jê bi tirs pirsî:

-Metê xêr e, ma çima vê serê sibê amojaya Zerîf derî li we girt? Hêvîdar im ku bi tu kesî tiştêkî xirab neqewimiye?

Meta min bi lez û bez bû, bersiva min neda. Keniya û berjêr bû, berê xwe da kaniyê. Dudi-liyeke din ji min re peyda bû, li ber derî hinekî din sekinîm. Di hundir de pispisa amojê û dapîra min bû. Gelo ez bikevim hundir an na? Wexta axaftina wan li ser tiştêkî dizî be ewê bi ketina min a hundir malê re dengê xwe bidin birrîn. Lê ser de dibe ku dapîra min ji min re hêrs bibe û hinek qeziyana/gotinan jî bibêje. Dibe ku dapîra min mexsûz meta min şand avê ku amojaya Zerîf rehet rehet gotinên xwe jê re rêz bike. Bi vî fikrî re mereqa min zêdetir bû. Min dixwest ku gotinên wan guhdarî bikim. Bi van ramanan re bêdeng ketim hundir, hêdî hêdî di aliyê wan de kişiyam, ber stûnê re derbas bûm, li ber histêra malê de çok da û xwe veşart.

Ez bi lez rabûm û min berê xwe da mala kalikê xwe. Xwedê dizane, ka amojê dîsa çi hewadîs girtiye û digihîne dapîra min. Înşeleh tiştêk xirab bi kesî neqewimiye!

Dapîra min li ber tifikê/argûnê li ser kursiyê rûniştibû. Di argûnê de agir dişewitiya û li ser kuçik tencik dikeliya. Dapîra min bi heska darinî tencik tev dida. Amojê jî li cem wê cilek kişandibû bin xwe û li ser cilê xwe dabû erdê. Destê xwe yê çepê dabû ser juniya dapîra min, bi destê rastê jî tizbî dikişand. Bi ronîya xuriya agir tizbî bi rengekî sor û zer dibiriya. Gulika di serê tizbiyan ve girêdayî bi kişandina tizbiyê re berjêr û berjor dibû. Pisînga gewr lepên xwe dabûn erdê, mîna ku xwe bavê ser nêçîra xwe çavên xwe zûrî gulika serê tizbiyê kiribû. Dibû ku her demê galimî tizbiyê bike. Hajîya dapîrê amojê ji hesab û kitabên pisîngê tunebûn. Bi vî halê wan kenekî ez girtim. Pir nema bi hîqîhîqa xwe wan hajîdarî xwe bikim. Bi gezkirina ziman û qurçîkirina nermika guhên xwe min bi zor kenên xwe da birrîn.

Amojê bi dengekî nizm xeberên/nûçeyên xwe pêşkeşî dapîra min dikir. Dengê wê ewqas kêr bû ku min zor dibihîst. Carna devê xwe dibir ber guhê dapîrê, ew gotinin wê nedihatî bihîstin. Min mesele fam kir, meraqa xwe derbas kir. Lê nediwêriyam ku ji şûna xwe rabim û derkevim der. Dema pê bihesiyana ku min ew bi dizî guhdarî kirîne, dapîrê pir lef û gef li min bike. Tirs û xofek ket dilê min. Hatina meta min ez ji vê astengiyê xelas kirim.

Meta min ava xwe bir li aliyên din danî û hat hundir. Dema ku di ber min re derbas bû, ez jî ji cihê xwe rabûm û min xwe avêt paş meta xwe. Çer ku ez jî dû li metê bikevim hundir. Dapîrê fam nekir. Lê met pê hesiya ku min

bi dizî li gotinên wan guhdarî kiriye. Li çavên min mêze kir û tebessum kir. Min dizanî ku êdî metê, min rehet nahêle. Ewê bixwaze bi şiklekî derheqê gotinên wan de tiştêkî ji devê min bigire. Ez jî wer kêr nebûm. Hesabên min jî hebûn. Min jî dixwest derheqê hinek tiştan de ji meta xwe hinek agahiyên bigirim. Tam firsend ketibû destê min.

Belî bû ku hatina min a vê demê dapîrê şa nekiribû. Dikariya bi sedemekê meta min dîsa bişîne derekê an jî karekî. Lê niha ez jî ji axaftina wan re astengek bûm. Dapîrê tasek av ji metê xwest. Berê xwe guherî, axînek kûr kişand û wisa berdewam kir:

-De çi zanim xuşka Zerîf; ez carna bûyerên li me qewimîne ji ber xwe re tînim û dibêjim: "Me çi dît û me çi nedît". Rast e, pir tişt derî hemla me hatin serê me. Lê pir tişt jî em bi xwe, bi xwe dikin. Hinek tiştên me hene ku bi salan e çi nema anîn serê me. Dîsa jî me jê îbret negirt û ders jê hilneda. Hinek tişt hene ku ger zû û dereng bînin kirin. Herî baş ew e ku mirov bi dilxweşî ji bo bûyîna wan heyên ji destê alîkariyê bike û astengan ji holê rabike. Em çi dikin! Radîbin; cih bihêle alîkariyê, heyên ji destê me astengiyan derdixin. Carna derxistina zehmetan mîna merîfet dibînin û çi namînin tînin serê hev.

Meta min bi van gotinên dapîra min derxist ku tiştêkî nebaş qewimiye. Piçêkî sekinî û bi tirs pirsî:

-Xêr e dayê! Dîsa çi bûye?

Min dizanibû ku dapîra min bersiva wê nade û mîna her caran: "Keça min, ev ne karê te ye.

Tu mêze îşê xwe bike!" bibêje. Bi rastî jî wisa got. Ji ber ku dabîr me ji malê dûr bixe, Xwedê dizane niha çi fikran ji ber xwe re tîne û dibê. Hinekî li dora xwe temaşe kir, serê xwe bilind kir, piçêkî matî kêran û mirdiyaqên pişta xanî ma. Berê xwe da min û got:

-Karekî tu bikî tune ye kurê min? Hela binêre bapîrê te li ku derê ye? Nizanim wî taştî kir, an nekir?

Min dizanibû ku mesele ne bapîrê bi xwe, ne jî taştê kirin û nekirina wî ye. Mesele defkirina min e. Ez û meta xwe li hevdun mêziyan. Me dizanibû ku niha ew ji meta min re jî tiştêkî bibêje û dê wê jî bişîne derekî. Belî bû ku peyîvên amojê Zerîf û dapîra min hîn neqediabûn. Hîn dapîrê tiştêkî negotibû metê pêşî lê girt û got:

-Dayê! Ezê hinek qût bidim mirîşkan û hevşoyê ber derî dimalim. Dû re jî dîçim mala kekê xwe. Bûkê deng li min kiribû, dixwest ku ji min tiştêkî pirs bike. Lê leza min hebû, loma min jê re got ku ezê dû re werim. Tiştêkî ez niha ji bo we bi cih bînim heye? Belkê tu û amojê bixwazin hinekî bi serê xwe bimînin.

Dapîrê jî ez jî bi vê zîrekiya meta min pir kêfxweş bûn. Êdî hewce nedikir ku ez li bapîrê xwe bigerim. Metê jî bi xwe, ji xwe re rêyek derxistibû. Min û metê jî dikarî êdî hember hev rîsên xwe birêsin. Min dixwest ji devê wê hinek tiştan bigrim, wê jî dixwest ji devê min. Em herdu bi hev re derketin der. Wê bi destê min girt û di aliyê hevşo ve kişand. Hîn wê ji min nepirsiyabû min xwest daxwaza xwe bînim ziman. Wê

jî dizanîbû ku firsend zor dest min ketiye û ez dora xwe nadim wê. Dengê xwe nekir. Li çavên min nihêrî û got:

-De bibêje! Daxwaze te ji min çi ye? Tu dizanî ku ez hatina amoja Zerîf a serê vê sibê pir mereq dikim. Ger tu jî di derheqê qisedanên wan de min agahdar bikî.

Heyecanekê ez girtim, devrûyê min mîna bizot sor bû, dilê min mîna girmik lê dixist. Min di pêş de nezanî ku çi bikim û çi bibêjim. Hinek wext di ser min re derbas bû, hêdî hêdî hişê min hat serê min. Metê di serî de ji ber halê min şaş ma, belkê hinekî jî tirsîya. Ez hejandim. Dengê bi tirs:

-Çi li ser te de hat lo! Te zîmanê xwe daqurtand, an hişê xwe wenda kir. Çima deng ji te dernakeve? An jî tiştêkî xirab li te qewimiye ku newêrî bilêv bikî? Metirse lo, ez meta te me. Xwedê mezin e. Derd daye derman jî daye!

Ez nîzanim çima ketim vî halî. Lê nîzm be jî deng ji min derket, hinekî jî fedî kir. Çavên xwe berdan erdê û got:

-Metê, Ez heyrana te! Tiştêkî mirov jê bitirse nîne. Ez hinekî di tê de mam. Behsa ku ez dixwazim ji te re bikim evîn e. Dilê min ketiye keça amoja Zerîf. Ez dixwazim tu ji min re navçîtiyê/navçîniyê bikî.

Meta min bi dengekî bilind kenîya. Ez hemêz kirim, rûyê min maç kir. Pê milên min girt û xwe hinekî şûnve kişand. Çavên xwe xistin çavên min û tebessum kir. Min nedizanîbû ku ewê ji min re çi bibêje. Wê meraqa xwe ji bir kiribû. Piştî xwe da sûra hevşo û got:

Lo zeman!

J. Ahmet Yıldız

Me ji birve kir
Bihna guliyên dayikan
Bejn û simbêlên badayî yên bavan
Tenê ma ji me re
Qerîn û hewara zarokan

Hebû di her biskelî dayikan de
Keçek pêçayî
Her simbêlên bavan de
Lawek

Hey zeman!
Bi Kurdayîna simbêlên badayî yên bavan
Gulî ji ji berve qut kir dayikan

-Biraziyê min mezin bûye, dil berdaye qîzên cîranan; lê hajiya min jê tune. Ma te çima heyana niha ji min re negot. Ji dilan re navçîtkirin tiştêkî xêrê ye. Ma ez ji te re alîkariyê nekim ji kî re bikim. Ger dil hember dilan bin. Wexta dilê wê jî li te hebe, ser seran ser çavan. Min jî got; çi vî biraziyê min qewimiye ku ewqas ket nav vî halî. Ma xorto çima tu ji meta xwe ewqas fedî dikî? Meraq meke. Min derdê te fam kir. Niha jî tu ji min re bibêje: Mijara axaftina di navbera dêya min û amoja Zerîf de çi bû? Bi Xwedê min pir meraq kir.

Bi vê pirsê ez dîsa hişyarî xwe bûm. Gotinên meta min ji aliyekî ve ji birîna dilê min re bibû mer-

hem, ji aliyekî ve jî wesweseyek xistibû dilê min. Rast e! Dilê min jî di wê de heyê, lê dilê wê jî li min heyê? Êdî dora min bû. Min jî ger daxwaziya meta xwe bianîna cih. Lê min nedizanî ku ez wê bûyerê bi çi qeydeyî/torê bilêv bikim. Min jî çavên xwe kutan çavên meta xwe û got:

-Metê, tu dizanî! Gor gotinên amoja Zerîf: "Îşev hevala te ya Gulnaz, keça apê Qado, revandine."

Meta min destên xwe bilind kir, dora xwe meyzand û got:

-Wê Gulê! Naxwe te gotina xwe kir û reviyayî. Xwedê miradê we bike! ●

Stuttgart, 04.01.2012

Mizgînî

ZÎWER ÎLHAN

Li Tilloyê toza li ser dîwanan tê avêtin, hebûna me him bi him xuya dike. Hebûneke jibîrkirî tê dîtin. Nasnameyê ku we toza wê paqij dikir, dibiriqand. Ew nasnameya ku li Meyafarqînê, di hewşa Camiya Mezin de me winda kiribû, ya me bû. Roja ku min ew dît, newroz bû. Agirê dilê min ne yê vê dinyayê bû. Ji dengê salaya îne, pozê min dişewitî. Çongê pantorê min ji çûna sicdê qetiya. Xûşûyê hênîk, tirseke bigiram. Tîrsa windakirina nasnameya nû.

Li Medreseya Sor, wextê xwendinê ye. Dema xwendina kitêban e, dema xwendina derdorê ye, dema xwendina siriştê ye, dema xwendina xwe ye. Dema pevgihandina perçeyê nîşanan e. Batanî, di nav hesabana de ye. Dipîve, difikire. Di nav sînûs û kosûnûsan de li qanûnên Ellah digere. Hindik ma wê bi serve bibe.

Hîn jî Selaheddînê Eyûbî, li ser hespê ye, dide dû Xaçperestan. Wî tu carî Îslam terk nekir, Xwedê jî ew bi ser xist. Negot ma îşê min li Sûrî çî ye, ez çî li xwe digirim li Misrê? Armanca wî ne dewleteke netewî bû.

wî ne dewleteke netewî bû. Ne nijadperest bû. Tegera wî ne ji bo zêr û zîvan bû. Ewî ku zora dijminên xwe dibir jî li wan dihat rehmê, ew nedikuştin. Lê yê we hûn berî şer bi birayên xwe ên Misilman re şer dikin, di dilê we de piçek rehm nîne ji bo birayên we. Dijminên wî hîn jî heyranê wî ne. Lê hûn hê jî li hêviya leşkerên Xaçperestan in. Selaheddîn hê jî li ser soza xwe ye; lê dilê we qulipiye. Lê xêr e îşela. Mizgîniya min li we: He-yama ku Selaheddîn tê de bû, ji ya niha xirabtir bû.

Rojê pênc caran ku dengê gaziya xelasiyê neyê min ezê bifetisim. Di nav vê kesretê de ku pênc caran dengê gaziya serxwebûnê neyê min ezê bixeniqim. Çiqas dûr be jî min nêzikî xwe dike ev bang.

Rabe ser xwe bela qama te bibînin ku tu li ser xwe yî! Guhê xwe bidê, ji camiya El-Rizq dengê ezanê tê. Ji medresa Colemêrgê dengê mewlûda Bateyî tê. Ez li ku bim pêşî zikra Ellah dikim dîv re selewatan li ser Mihemmed tînim. Mulidên me, biratî û yekitiya me ne. Mulidên me, têkilî û

Hîn jî Selaheddînê Eyûbî, li ser hespê ye, dide dû Xaçperestan. Wî tu carî Îslam terk nekir, Xwedê jî ew bi ser xist. Negot ma îşê min li Sûrî çî ye, ez çî li xwe digirim li Misrê? Armanca wî ne dewleteke netewî bû.

alîkariya me ne. Ma ji te re negotin: Li Rihayê yekî merd heye, mêvanê xwe bêxwarin venagerîne. Ez gazî te dikim her sal li Xelîl Îbrahîm mewlûd tê xwarin, tu were.

Weke ku tu li zaroka xwe digerî li Hikmet bigere. Kî zane bê di kîjan deryayê de keştiyan qul dike, kîjan dîwarî dixê, di kîjan karî de belaş kar dike. Bedîuzzeman; di mişextan de kêf kêfa wî ye, biçê balê, wê di guhê te de sirrekê bêje.

Weke ku tu li xwe bigerî li Furqan bigere. Yê ku wî dibîne lal dibe, kal dibe; lê şaş nabe. Yê ku ferq dike bazara axretê zûtir dike. Derbasî dinyayeke din dibe. Li mana digere ku xêrekê bike, li sebebana digere ku li bedêla canê xwe Cinnetê bikire. Şêx Seîd, çiqas şehîd dikeve; ev qasî pir dibe. Şêx Seîd, dixwaze mizginiyê bide we. We gazî heqiyê dike, we gazî Cinnetê dike.

Li medresa Zincîriyê, ilmê biratiyê ava bûye. Wê malbata Îbnul-Esîr ji vir peyda bibe, wê medeniye-teke bêguneh peyde bibe. Rabe ser xwe li medresa Qasimiyê, wextê dersê ye ne wextê tefnîkgirtinê ye. Emê birayên xwe ên Misilman hînî Misilmantiyê bikin. Bila hîn bibin ku ziman, nîşaneke Xwedê ye.

Ji Ûrmiyê dengê Qur'ana pîroz tê. Hin jî rasat-xana Tûsî û kitêbxana Ûrmiyê pev re kar dikin. Lê çav lazim e ku bibîne, dil lazim e ku wêribe wehyê. Ku kitêb vedibin, cejn nêzîk dibe. Ku xwendin derdikeve dervêyî hiş; şiklê evîna min, xuya dike, mala dilê min ava dibe. Hêvî şîn tîn, dengên sersiba eydê tîn. Îro, roja kulîçan e; sibe roja cilên minasib e, du sibe roja eydê ye.

Li medresa Mesudiyê şagirt derketine ber tavê. Helbet wê ji van şagirtan hinek jê bibin Cezerî. Ew; ev çend sedsal bi metqebê qûl dike, bi gonya xwe dipîve, li hêviya çiraxekî weke te ye.

Ebu Henîfe li Dînawerê çêdibe, dibe alimê Îslamê. Ewqas ilm hemû dane ber xwe bi wan diçe. Li ser her tiştî kûr û dûr difikire. Bê komageh dinivîsîne. Mal û milkê wî, destnivîsên wî.

Li Mehabadê Mekteba Qaziyân saz bûye. Hikmê adaletê ava bûye. Yê ku wê kitêbê dixwîne dibe Qazî. Kî xwedî hikmet be, serok ew e.


Amediyê, li serê wî çiyayî, weke Mêrdînê li hêviya dema xwe ye. Li arambûna berfê nenêrin, xwe bi zor digire, bêhna wê dikele. Helbet ev zivistan dê xelas bibe. Li sikakên Amediyê, berf hêdî hêdî dihele. Ku hûn tîn Rewandûzê hespên mîr

û pêşmergên wî ji wan gelî û çiyayan derdikevin û pêşwaziya we dikin. Ji Geliyê Elî Begê kanî dipijiqin. Ava Spî rihê mirov dilebitîne, ev hevokên singa min in ku ji bo dengê gaziya wê avê, bûne cihê dengvedanê.

Zewaca me wilo dewam nake, jiyana wilo nameşe. Birayên me li ser soza xwe neman. Bext nema li cîranan dibe. Te nêrî, bombe bi ser te de barîn, te nêrî textoran tu kuştî. Lê hêvî ji Xwedê qut nabe. Xwe bigir, mifta xezînan di destê me de ye. Hindik ma; Idrîsê Bitlîsî, ji bo peymaneke nû dixebite.

Gazinan ji xwe bike. Bes e hewar hewara te. Ji Xwedê pê ve dengê te diçe kê? Bes e bilbilbûn. Xanî, ji Mem aciz bûye nema wê mesnewiyê dinivîse. Zînê, ji welat derketiye; evîna me bûye mihacir. Edebiyat bûye koçber, avahîsaziya me li hemankê. Koçkê din bike. Vê neqlê ji xwe koç bike. Ji xwe derkeve, biçê deverekê ku tu lê bisitirî. Xwe bike mihacirê dilê xwe. Hemû sûcê wî dilî bû. Biçe dibistana dil. Li wê mizgefta Mazil'evdîn wextê nimêja esir e. Ji dîwarê wê bêhna sersala Hicrî tê.

Tu sêwiyê vî dînî. Tu bêkesê vî welatî. Lê mizgîniya min li te: Mûsa sêwî bû, Îsa sêwî bû, Muhammed sêwî bû... ●



Kalikê min dibêje* ... xal û xwarzî

MURAD POLA

muradpola@gmail.com

Wexta beriya seferê, ûris vedigere vî aliyê me, wê çaxê kalkê me dunya xwe guherîbûye, pîrka me bî dimîne û şeş heb kurên wê hebûne. Bavê min piçûkê şeş birayan bûye. Pîrka me ji eşîra Xelikan bûye. Ew radibe mala xwe bar dike, derbasî aliyê Îranê dibe û dibêje, ezê herim bigihêjime malbavanê xwe. Bila li wê derê zarên min li ber destê xalanên xwe mezin bibin, nekevîne li ber destê xelkê. Piştî ku ew mala xwe bar dikin û diçin cem xalanê xwe, êdî ûris jî ji warê wan vedikişê paşve diçe. Loma ew malên xelkê Taxilka yên ku gundê xwe terikandine jî paşve vedigerine Taxilka.

Di nav Kurmancan de wan çaxan talanbirin gelekî belav bibû. Ji wê hêlê eşîrên Qizbaşolî û Xelikan hev digrin tîn, mal û talanê Taxilka yên Soran dibin. Ew jî radibin li pey wan dikevin, şer dikin û ji wan yekî dikujin û

* Zargotina Kurdî gelekî dewlemend e. Mirov li cem kîjan kal û pîrê rûnê bi seetan salixê çîrok û bûyerên qewimîne didin. Kalikê min Hecî Yaqub gava cimaet digere hemasa bûyerên weha ji me re digot/dibêje. A evna ji wan du heb in.

talanê xwe jî ji wan distînin û paşve vedigerînin. Wanê talanker jî çaxê ku vedigerin diçin welatê xwe, diçin gazî xwarziyên xwe dikin, ji wan re salixê meselê didin û ji wan re dibêjin hûnê bidine pêşiya me, rê nîşanî me bidin û emê jî herin Dirbo yê ku ji me mêrek kuştîye bikujin û heyfa xwe bistînin. Gava ew vedigerin tîn malê, diya wan Xezal ji wan dipirse: Xêr e, xalanê we çima gazî we kirin? Ew jî jê re salix didin û dibêjin me jî gotiye erê! Wê hingê pîrka me ji wan re dibêje: Pî qey hûn qet ji Xwedê natirsin? Ne mirin heye, qiyamet heye! Îca elam! Hûnê cawa/ciwaba Xwedê çi bidin, cawa/ciwaba Însanan çawa bidin. Ê ji kurên xwe re dibêje, de bidine dû min! Ew jî didine dû dêya xwe diçin mala xalanên xwe, li mala şînê fatihê ji mirî re dixwînin û Xezal, xwîşka wan ji wan re li ser meselê xeber dide û ji wan re dibêje: A ev şeş heb kurê Soran in, min ew anîne cem we, bala xwe bidinê, di bedela kurapê me de kîjan heye, ewî bikujin, êdî hûn digihêjine hesabê xwe. Lê ew vê qebûl nakin û jê re dibêjin: Xezalê! Em xwarziyên xwe nakujin. Lê hûnê çi bikin? Dibêjin: Em ê te talan bikin. Ew jî dibêje: Erê,

Di nav Kurmancan de wan çaxan talanbirin gelekî belav bibû. Ji wê hêlê eşîrên Qizbaşolî û Xelikan hev digrin tîn, mal û talanê Taxilka yên Soran dibin. Ew jî radibin li pey wan dikevin, şer dikin û ji wan yekî dikujin û talanê xwe jî ji wan distînin û paşve vedigerînin

min talan bikin. Lê bi wî şertî ku tu berxa bernadî pêz. Emê bân berxan berdine pêz. Ew jî dibêje, erê bila bi gotîna we be. Bavê min got: Em vegeriyên hatin, diranê me çîrçeçîrçe, li hev dixwin lê em ji dêya xwe newêrin. Got, qet mineta wê nîne. Got: Hatin berxê me berdanê, xwîna wî mirî jê veqetandin û yê din jî li hev parve kirin. Paşê gotin: Xezalê! Tu zanî çî heye? Êdî emê sibê bân mala te jî bar bikin bibin sînora wergerîne aliyê din. Û jê re dibêjin: Kîngê Gilîdax û Kosedax hat hevdu re xeber da êdî emê wê çaxê bi hevdu re xeber din. Ew jî ji wan re dibêje: Xwedê Xwedayekî wisa ye ku wana hankêva tîne cem hevdu. Paşê mala wan bar dikin tînin di hudûd re derbas dikin

Lê wana hê paşî bi Donoyan re li hev kirine û gotine emê xwarziyên xwe di hudûd re derbas bikin, hûn jî werin koça wan bibin. Gava xal terka xwarziyên xwe dikin diçin elamî Donoyan dikin. Ew jî derdikevin pêşiya rêya wan digirin û koçê bi malê wan ve hildidin dibin. Wê hingê du zarên piçûkê Apê Evdîle hebûne, herdu jî di xurca hespê de bûne. Ji wan re dibêjin wan herdu zaran derxin emê hespê jî bibin. Wê çaxê ji wan yek xîreta wî vê yekê qebûl nake, dibêje wellahî gava tu dest bidî hespê ezê te bikujim. A vî qaydî koça wan hildidin dibin. Êdî ew dimînin, mihîna kumêt dimîne, tiştêkî wan a din namîne.

Radibin destevala vedigerin tîna Taxilka. Pîrka me qet talaşa wê nîne. Bavê min digot: Lê em hevdu dixwin. Dibêje qey hûn nexweş in, ka hûnê roja qiyametê çawa Xwedê bidin û hûnê he-

rin bidine pêşiya wan, merivan bidine kuştinê! Qet tiştêkî wisa dibê! Xwedayê rizqê me bigihîne. Got û em hatin. Çend sal ketine navê, êla Xelika, xalanê wan yê werin derbasî vî alî bin û hatine hinda Kalûs; Kalûs çiyayekî hinda Bayîzde/Bazîde ye. Têne wira, ji wir tene mala Îsa Begê. Bavê min ew jî diçine mala Îsa Begê. Dibêjine xalanê xwe. Gelfî xalana! Gilîdax û Kosedax, hove teze hatine hevdu re xeber didin. Xwedê Xwedayekî wisa ye, te dît çî zûtirkê wan tîne digihîne hevdu. Ji wan re dibêjin hûnê heqê me bidin. Di axiriyê de li wê derê hesab dikin û bi eşîrtayî heqê xwe ji wan distînin tînin.

Kalikê min dibêje: A ew pezê me hinekî qerqaşê devreş bû. Kesî nikaribû hirya wan bibire. Tenê Apê Sadiq û Apê Şukrî dikaribû wan bibirre, wisa bi hirî bûn bê hesab. Gava dest davêtine wana radibûne çik, rêşiyên hiraya wan dihat digihîste erdê. Heta vê axiriyê jî ew pezîna di nav heywanê me de hebûn. Çaxê qaçaxan pezê me bir êdî wê çaxê koka wan biliya. Eşîra Xelikan jî dane Trakya, ew sewqî Trakya kirin. A ji wan hinek hê li Trakya mane û hinek jî paşê hatin, nika Îdirê li Golê ne. Nika hê li Trakyê Xelikî hene. Gava em çûne eskeriyê ji wir hinek hatine cem me.

Mikemik

Di sala 1941ê de ji Îranê, qaçaxê Îranê hatin Taxilka çarhezâr û heftsed pezê me talan kirin, birin. Kavireka me ya qer û yeka sor mabû. Bavê me ew firotin da sî û şeş panotan. Nan qulixayê bû, xela hebû ew pere da sê kod genimê binê çalan, ew

jî nedihate xwarin. Qulixayiyeka wisa çêbû, her Xwedê dizane. Em diçûn, me li Gilîdaxê benîşt digirt. Me du cûm benîşt dida nanekî. Me benîşt dibir Îdirê difrote Ecemên Îdirê. Wana nan diavêt. Em rojekê, ez (Hecî Yaqub), Hecî Mişîr û Mahir. Em çûn, emê benîştê qanokê bigrin. Me li Qewex nihêrî tune, me li Evdalokê nihêrî tune, em çûne gundê Mîrzo li jorê, me wê derê dît. Wextê em çûn me nihêrî mikemikê tê. Seyekî belek jî bi me re bû, se jî seyê Mahir bû. Me got: Pî ev bizinek e. Bi vê gotinê re, got şîlp şîlp û pê re bû kuztîniya sê. Me got pî ev mar e, em reviyên. Sancî ketiye zikê min. Ez nikarim birevim, para mame. Ew jî diçin. Ez cûm min lê nihêrî ew hilkişiyane ser zindarekî, ez jî çalepiya çûm, çûme serê zindêr. Hema ba li qirşekî dixist min digot, a ev mar e. Neksî min danî, wana pê ketin benîşt girtin. Ez jî peya bûm min jî benîşt girt. Ewan kasika xwe tijî kirin, ya min nêvî ye. Gotin: Êdî em herin, min got wellah ez nayem. Gotin: Çima? Min got: Lê bavê min dê bêje, ka te tu benîşt aniyê? Ew mezin bûn, ez piçûk bûm. Ew mecbûr man kasika min jî tijî benîşt kirin. Me lêxist em hatin. Yekî gundiyê me hebû, wî ji Îdirê nan dianî, me jî sê cûm dida nanekî. Me çaxê benîşt dibir Îdirê du cûm nanekî dikir û gava wî dianî sê cûm nanekî bû. Bû bihar me li Qeregûn danî. Qeregûn me sê mehan danî, lê me navê nan nebihîst. Ew sala me wisa bi qulixayî derbas bû. ●

Li gor Îslamê jin û bazirganî

ROJBÎN OZKAN

rojbinozkan@gmail.com

Herçendî gelê Rojhilata Navîn bi gelemperî misilman bin jî, mixabin kevneşopiyên wan li gor qaîdeyên Îslamê teşe negirtiye.

Û mixabin ramanên wan ên paşverû her tim di jiyana rojane de li wan hukim kiriye.

Kevneşopî her dem di nav jiyana gelê Rojhilata Navîn de serdestê zagonên Îslamê bûye.

Û mixabin gelê Kurd jî, gelek caran kevneşopiyên xwe ên li dijî mafê jinan wekî ku zagonên Îslamê bin pênase kirine û wiha jî bi kar anîne.

Gelê Kurd, her dem xwestiye ku kirasê kevneperestiyê bi navê zagonên Îslamê li jinan bikin.

Kesên hişmend, gelek baş dizanin ku mafê tu dînan nedaye jinan, dîne Îslamê daye û ew rûmetdar kirine. Vêca gelo çima mîrên Kurd li dijî vê rastiyê tevdigerin û kesên ku hay ji zagonên Îslamê nînin jî, ji vê ola pîroz sar dikin?

Wekî tê zanîn, gelên ku bindest bin psîkolojiya bindestiyê bi her awayê bandor li ser derûniya wan dike...

Bi ya min ji ber ku mîrên Kurd, di nav civakê de, sedîsed

bi azadiya xwe nahese, ji ber vê yekê azadiya jinan jî bi wan giran tê.

Lewra zagonên Îslamê li gor berjewendiyên xwe şîrove dikin...

Di nezera hinek mîrên Kurd de, jin herdem wekî mirovên bê hêz û belengaz in...

Mixabin ew ramanên paşverû di berhemên hîn nivîskaran de jî xwe nîşan dide.

Nivîskarê hêja, birêz Murad Celalî bi navê; "Jiyana Pêxemberê me Hz. Muhemmed" pirtûkek gelek hêja û serkeftî nivîsandiyê. Rastî dema min ew pirtûk dît, ez pê şanaz û serbilind bûm. Pirtûk ji 640 rûpelan pêk tê û ji weşanên Nûbiharê derketiye.

Kek Murad, jiyana qasidê Xwedê û dîroka Îslamê bi zimanekî rewan û berfireh aniye ziman... Bêyî ku mebesta xwe bînim ziman, min hez kir bêjim; hemû xwendevanên Kurd vê berhema hêja, beriya her tiştî ji bo ku jiyana qasidê Xwedê baş bizanibin bila bixwînin.

Ez, birêz Celalî ji ber vê berhema hêja bi dil û can pîroz dikim...

Kesên hişmend, gelek baş dizanin ku mafê tu dînan nedaye jinan, dîne Îslamê daye û ew rûmetdar kirine. Vêca gelo çima mîrên Kurd li dijî vê rastiyê tevdigerin

Pirtûkek wiha birûmet, bi zimanê me yê şêrîn helbet emê pê serfiraz bin. Lê?...

"Lê" bi baweriya min dema kîjan xanim çavê xwe li rûpela 71ê bigerîne wekî min dê şûrek di dilê wê de biçike û dê rûmeta wê bişkê...

Ji ber ku kekê hêja, nizamim bi çi mebestê, lê di bendekê de weha dibêje: *"Li Mekkeyê Xeticeya qîza Huweylîd jineka ticar bû. Piştî mirina mêrê wê ev karê bazirganiyê hildabû ser milê xwe. Lê ji ber ku jin ango sîwetek bû, nikaribû bi xwe karwanê xwe yê bazirganiyê bi rê ve bibe"*.¹

Ev bend di wê pirtûkê de wekî lekeyek reş a ku li ser qumaşeke spî be, xwe nîşan dide.

Bi ya min, tu nivîskar û tu berhem bêqisur nîne. Bes dema berhemek weha payebilind de, gotinek weha ji rastî dîr, kirêt û rûmeta mirovan ya (jinan) bişkêne hebe, hingê bêdengmayin li min giran tê... Lewre ezê çend rexneyên xwe ji kek Murad û kesên ku wekî cenabê wî, hêz û kesayetiya jinan piçûk dibînin re pêşkêşî raya giştî bikim...

Dema min ev bend xwend, beyî ku ez bi pêşdarazî tevbigirim û kek Murad tawanbar bikim, min jê re telefon vekir û dilgiranîya xwe ya di vê mijarê de anî ziman.

A rastî dema min telefon vekir, min wisa hizr fikir, an jî hêvî fikir ku birayê hêja, wê ji min re bêje; te ez xelet fêmkirime. Mebesta min ew nebû, hwd. Bes, dema kek Murad ji min re got; tu eleqa wan gotinan û pûçikxistinê

tuneye û ev gotinên min rastiyeke siriştiye hwd... Wekî sîfîlekê ava sar li ser serê min rijiyabe, ez hema cihê xwe de sar bûm. Gelo ev çawa dibe rastiyeke siriştî? Ma kekê hêja, di valahiye de dijî? Gelo dibe ku kesê ku Metropoleke wekî Stenbolê de bijî û haya wî qet ji jinên ku bazirganiyên dike nebe? Ha heke hejmara wan xaniman gelek kêmbûya erê, lê heyran ma ev camêr qet navên jinên bazirgan, ên ku hejmara wan nediyar e, ên navdar jî, ne pêwîst e ku ez yek bi yek bêjim nebihîstibe... Dema min ji kekê hêja re çend mînak ji dîroka Îslamê û ji roja me ya îro da, wî ji min re got; ew mînakên tu dibêjî îstisna ne. Ya rastî ê herî zêde ez mecbûrê vê nivîsê kirim, ew gotinên birêz Celalî bûn. Helbet kesên xwedî wijdan dê li ser van gotinan bikene. Ma heke ez listeya jinên karsaz bidim, bawerim wê kekê min jî, ji wan gotinên xwe şerm bike...

Bazirganî ne tenê karê kesên ku li bajêr de dijîn e. Di piçûkahiya min de, mala me li gund bû. Gelek baş tê bîra min, jinên gundî ên ku qet xwendin û nivîsandina wan nebû jî dîsa dikaribûn bi awayekî karê bazirganiyê bikin. Wekî mînak, hin caran mala bavê wan hin caran jî dema mêrên wan hinek pez an jî berx, golik û hwd bida wan jinan ew çend sal xwedî dikirin ku hejmara wan zêde dibû, hingê dema merivên ticar dihatine gund, an jî yek caran bi xwe diçûn bajêr û wan bi xwe ev heywanên xwe difirotin. Yek caran jî, jin bi xwe li mal de cil mexfûr dihûnandin û ew dişandin bajêr difirotin.

Vêca ez ji kek Murad re di-

bêjim; qey ev bazirganî nebû?

Ustad Bedîuzzaman jî di berhema xwe ya payebilind "Rêberiya Xaniman" de weha dibêje: *"Jin ji bo debariya xwe pêwîstî bi arîkariya yekî dibînin."*

Jin heta dikevin bin hukmê mêrên serserî ên ku terbiya Îslamê napejirînin de, ji bo riza wan mêran dinya xwe û axretê xerab dîkin, bila wekî jinên gundan debara xwe bi keda xwe bikin, deh qat ji ya din çêtir e".²

Bi ya min ustad di vê hinareya xwe de bi me daye zanînê ku jin bi kesayeta xwe ya serbixwe dikare debara xwe bike. Ango ew jî baweriyê bi jinan û bi hêza wan tîne...

Îcar ne tenê di roja me de, em di pirtûkên dîrokê de jî dibînin ku ji dema Hz. Muhemmed (s.) heta îro her sedsalê jî bazirganên jin hebûne û Xwedê bê erê heta dinya hebe jî dê hebin... Herçiqas kesên wekî cenabê kek Murad, nexwazin vê rastiyeke bibînin jî di halê hazir de rastî ev e...

Di nezera ola Îslamê de jin sedîsed xwedî kesayetiyeke serbixwe ye. Û mafê tu kesî tuneye wan wekî kesên bêhêz û bêkêr nîşan bide.

Wekî ustad Hesên El-Benna dibêje: *"Jin nivê umetê ne. Her weha di jiyana ummetê de xwedî bandora herî zêde ne"*.³

Her çendî hewcedariya min bi îsbatkirina ramanên min nebe jî, ji bo ku ez baştir bêmkirin, min hez e hinek mînakên ji çaxa Qasidê Xwedê û çaxê piştî wî yê dîroka Îslamê de bînim ziman.

1 Celalî, Murad, *Jiyana Pêxemberê me Hz. Muhemmed*, Nûbihar, r. 71

2 Nursî, Bedîuzzaman Said, *Hanîmlar Rehberî*, Zehra Yayıncılık.

3 el-Benna, Hasan, *Müslüman Kadın ve Görevleri*. Ravza Yay., 1995 r. 11

Xanima Pexemberê me (s.) Hafsa keça Omer ji Hz. Ebebekir xaniyekî dikire û wî xanî di çaxê Hz. Osman de difiroşe. Dema ku Hz. Osman dixwaze mescîdê hinekî dî fireh bike daxwaziya firotina xanî ji Hz. Hafsayê dike. Lê Hz. Hafsa ji ber ku mescîd fireh bibe dê rêya ku diçe mescîdê bê girtin naxwaze bifiroşe.

Lê çaxa ku soza xaniyek fi-rehtir û vekirina rê jê re tê dayîn hingê dayika ummetê bi firotina xanî qayil dibe.⁴

Li gor ragihandina Îbnî Sad ku ew dibêje; di çaxê Hz. Omer (r.) de jin di karê bazirganiyê de gelek çalak bûne. Jinek bi navê Ema bintî Muharîbe, hingê ku kurê wê Abdullah b. Ebî Reba ji Yêmenê danî li Medîne difirote.⁵

Her weha jinên Mekkê, ne tenê li Medîne wekî bayî dixebitîn hin caran jî, ji bo bazirganiyê diçûne seyyehatê. Hêjayê gotinê ye ku di çaxê xelîfeyên raşîd de dewletê jî handaniya jinan kiriyê û hin caran jî kredî daye wan xaniman. Li gor ragihandina et-Taberî, xanima Ebu Sufyan Hind, ji Hz Omer (r.) kredî dixwaze. Hz Omer (r.) daxwaziya wê qebûl dike û ji malê xezîne çar hezar

dirhem deyn didê. Hind bi vî pereyî, diçe bal qebûla Kelb li wir danûstandinan dike. Xêncî Hind gelek xanimên Medîne jî karê bazirganiyê dikirin.⁶ Ango Hz. Omer (r.) destûra bazirganiyê dide jinan û baweriyê xwe bi serkeftina jinan tîne.

Jinikek misilman a bi navê Kayle el-Enmariyye bi karê bazirganiyê ve mijûl dibû.

Weha dibêje: "Qasidê Xwedê di yek ji seyyahetên xwe yê umrê de, ji bo ku ji îhramê derkeve hate el-Mesveyê, ez hatime bal wî rûniştim û min jê re weha got; 'Ya Resulellah ez, danûstandinê dikim. Dema ku dixwazim tiştê bikirim bêyî ku ez wî tiştî bikirim, hêdî hêdî bihayê wê ber bi bihayê ku ez dixwazim bidim, zêde dikim. Her weha dema dixwazim tiştê bifiroşim jî ew bihayê ku ez dixwazim bi wî bihayî bifiroşim serdestê wê bihayê de nîşan didim û paşê jî hêdî hêdî wî bihayî dadixînim.' Li ser vê gotinê, Qasidê Xwedê ji min re weha got:

Ey Kayle, weha neke, dema ku tu tiştê dikirî, firoşger bide jî nede jî, ew bihayê ku tu dixwazî bidî wisa bibe kiryar. Dema ku tiştê bifiroşî jî, kiryarên te bikire an nekire ew bihayê ku tu

dixwazî wê bixwaze".⁷ Ji vê bûyerê jî tê zanîn Qasidê Xwedê li dijî bazirganiya jinan nebûye. Heke ev jin xwedî vê şiyanê/qabîliyetê nebûya helbet wê bigota; Ey Kayle ev ne karê jinan e, here mala xwe rûnê... Heyf e ku îro hê di nav ûmmeta Wî de kesên ku li dijî tevger û şîretên wî li jinan dinihêrin hene.

Heyf ku çi heyf!.... Wekî gotineke dawî:

Mebesta min ji vê nivîsê bi tu awayê rexnekirina pirtûka kek Murad nebû.

Wekî min li jorî jî anî ziman, ev pirtûkxaneya Kurdî de, xasma di zaravayê Kurmancî de, pirtûkek di mijara xwe de bêmînak e. Û ne tenê ev pirtûka hêjayê gotinê ye ku, wekî xwendevanên Nûbiharê jî baş dizanin xebat û keda kek Murad ya ji bo zimanê Kurdî û ola Îslamê nayê înkarkirin. Rastî jî kekê hêja, li cem min pir bi qedr û bi qîmet e...

Ez tenê hinek nêrînên kekê hêja û kesên ku wekî wî difikirin rexne dikim.

Hêvîdar im ku xwendevanên hêja min şaş fêm nekin. ●

4 Savaş, Dr. Rıza, *Raşid Halifeler Devri - de Kadın*, Ravza Yay. r. 73

5 Savaş, Dr. Rıza, *Raşid Halifeler Devri - de Kadın*, Ravza Yay. r. 73

6 Savaş, Dr. Rıza, *Raşid Halifeler Devri - de Kadın*, Ravza Yay. 1996, r. 74

7 Savaş, Dr. Rıza, Hz. Muhammed (s.a.v) *Devrinde Kadın*, 1991, r. 234

SERSAXÎ

*Dayika hevala me Rojbîn Ozkanê, Fîrdews xanim wefat kiriyê.
Xwedê rehmeta xwe lê bike û serê malbata wê û zarokên wê sax be.*

Nûbihar

Helbesteke birîndar û şikestî

BRO OMERÎ

Dîwana Seydayê Cegerxwîn a yekem ku ji aliyê Weşanxaneyê Dengê ve hatiye çapkirin, di rûpelê 152yan de bi sernavê "JI QEDRÎCAN RE" helbestek heye. Ew helbest ne tamam e, şikestî ye, nîvco ye. Helbest dualî bû. Aliyek jê pesindan bû, ango Seyda pesnê Qedrîcan dida, li aliyê dinê bi êrîşek dijwar çûbû ser. Ez dinêrim ku beşa pesindanê tenê hatiye nivîsandin lê beşa êrîşê tê de nîn e... Min gotibû "birîndar e," ji ber ku pêncrêz hatiye ristîn lê beşên 1, 5, 6 û a 7an çarêz in. Di dîwanê de helbest weha dest pê dîke:

Ey hevalo, delalo, tu her tiştî dizanî/Di zimanê me Kurdan, tu wek Melayê Xanî/.../.../.../.../

Sondê dixwim bi atêş, bi wî xirqê kirîva/Li ber tava te mane, Zaz û Tor û Birîva...

Helbest kuta dibe. Lê ez dizanim ku beşeke wê ya din hebû; gelek tişt jê di bîra min de bûn...

Sal, 1946 bû; hunermendê nemir Seydayê Cegerxwîn, li Kurdistana biçûk, li gundê Helemê-Şêxo, cîranê me bû. Ez sê-çar salî

bûm; mîna xewnekê tê bîra min. Li gund, du şagirtên wî hebûn; yek jê şehîd Zibêrê Omerî, ê dinê jî Ehmed Kurdî bû. Wî helbest diristin, wan jî jiber dikirin û dixwendin. Gişt helbestên dîwana yekem bûn. Gelek ji wan di kovara ku Mîr Celadet Alî Bedir -Xan bi sernavê *HAWARÊ* derdixist de dihatin weşandin. Wê demê Mîr Celadet li Şamê bû. Qedrî Begê Cemîl Paşa, Elî Axayê Zilfo, Umer Axayê Şemdîn, Osman Sebrî û Qedrîcan jî li Şamê bûn... Qedrîcan, bi eslê xwe ji Dêrika Çiyayê Mazî; xortekî xwenda, rewşenbîr û di heman demê de, berrisîyarê nivîskaran ê kovarê bû...

Rojekê Qedrîcan, nameyekê ji Seydayê Cegerxwîn re dişîne û wî rexne dîke (xwedêgiravî, rexneyên wî ne ji dil bûn...) . Name di vê çarçoveyê de bû: "... Seydayê min!.. Roniya her du çavên min... Helbestên te pir tûj in... Cihê ku em lê ne, ne dost e. Dagirkerê welatê me û dijminê me û gelê me ye... Bîzor û heft bela, em li vî welatî sitirîne... Her çî tu yî, ne xema te ye; te temenê xwe qedandîye... Em hîna ciwan

Sal, 1946 bû;
hunermendê nemir
Seydayê Cegerxwîn,
li Kurdistana biçûk, li
gundê Helemê-Şêxo,
cîranê me bû. Ez sê-çar
salî bûm; mîna xewnekê
tê bîra min. Li gund, du
şagirtên wî hebûn; yek
jê şehîd Zibêrê Omerî, ê
dinê jî Ehmed Kurdî bû.

in... Qey tu bi van helbestan serê me naxe belayê?..” Hunermendê nemir, kengê di bin van gotinan de dimîne û vê helbestê dirêse...

Ji bo temamê helbestê, min serî li Ehmed Kurdî da; got: “Tu mafdar î; helbest nîvco ye lê xweş ne di bîra min de ye ... Li ba te, li Qoserê Seydayê Evdilqîdûs heye, jê bipirse...” Min ji Seydayê Evdilqîdûs pirsî; got: “ Rast e lê min jibîr kiriye; ji

JI QEDRÎCAN RE

Ey hevalo, delalo! Tu her tiştî dizanî...
Di zimanê me Kurdan, tu wek Melayê Xanî
Tu xortekî çeleng î; ez kalekî zamanî;
Dil û gerden şikestî, bendewarê xizanî
Xwedê te xweş bihêlî, tu xortekî ciwanî...

Erê rûwê te roj e, tava wê da diyara
Devê te wek bişkoj e, nû derkeve ji xara
Porê serê te sor e, mîna gula zinara;
Serê te kehruba ye, mû distîne ji mara;
Ayîneya Sikender, çavên te bûn li Dara...

Birhên te pir zirav in, herdu mîna du hîva¹
Pozê te î çilaqî, sade ji zêr û zîva,
Bejna te a Siyamend, li Zozanê Silîva...
Sondê dixwim bi atêş, bi wî Xîrîqê Kirîva;
Li ber siya te mane, Zaz û Tor û Birîva...



Mele Xidirê Xursî bipirse; dibe ku hîna di bîra wî de be...” Min serî li Mele Xidir da; mala wî ava; dema şagirt bû, jiber kiribû... Dest pê kir û mîna Bilbilê lata Warê Boşo xwend... Ji kêfan re hêsiran di çavên min re dan der... Min ew hembêz û maçî kir... Sê rêz jê kêmin in. Ev serê şeş sala ye, ez li wan rêzan digirim lê min pêde nekirin. Ê zane bila derxîne holê... Xwendevanên hêja, helbest weha ye:

Di dîwanê de, helbest diqede. Lê helbest weha berdewam dike:

Ey Qedrîcan efendî! xortê delal û cindî...
Reşbeleka te î xweş, min ew xwendî bi rindî,
Ew gotinên te ên tûj; wek tîran tu li min dî...
Ew ji fidê çavên te, tu Kurdekî lewend î;
Îro şerm e ji bo me, ku em bibin dubendî...

Benda te pir şîrîn e, hemî dur û mirarî,
Te rim daye milê xwe, li meydanê siwar î...
Şervanekî çalakî, pêtî ji te dibarî²
Tu bi êrîş tê ser min; tu dost î, an neyar î...
Ev e bextê me Kurdan, em tînen hevdu bixwarî...

Ez Kurdekî wisa me; nav û dil bêqirêj im.
Ez im her wekî Zerdeşt, tim rastiye dibêjim...
Te hiş ji serê min bir, bê rojî û nimêj im³
Li Ewrûpa nemame, lê ne dîn û ne gêj im...
Pir şerm e ku wekî te, çend gotinan bibêjim...

Ji ber derdê me Kurdan, bi şev û roj dinalim...
Şaşa xwe ku ez deynim; ciwan im; ez ne kal im,
Millet îro ranabe, bi tenê bêmecal im.⁴
Tu li emrê'm dipirsî; umre'm sih û du sal in...
Şûr û gurzan hildidim; ez Restem kurê Zal im...

Belê min te efû kir, yekî dirist, yekî dîn...
Ez ramûsim çavên te; çavên reş î dûrebîn...
Ez li te dikim silav, li Mîrê xwe î bengîn,
Elî Axayê Zilfo, Umer Axayê Şemdîn...
Bi qurbana serê we, ji dil û can CEGERXWÎN...

1- Di helbestê de kevana hatiye nivîsandin, çewt e.

2.3.4- Disa bi ked û lêgerîna xwe ez bi ser her sê rêzên windayî ve bûm. Xwedê jê razi be, Mele Evdilxefûrê Çalî ez bêjim deh hûn bêjin bîst caran min jê re xwend, wî lê guhdarî kir; hêdî hêdî ew rêzik di mejiyê xwe de derbas kirin û teşe dayê. Ango her sê rêzik ji binê zindaneke kûr derxistin dan destê min.

Qelem ey!

M. ZAHİR ERTEKİN

“nûn, wel-qelemî wema yesturûn...” 68:1

Qelem çi ye lo?

Nivîs çi ye hevalo?

Im bi nivîsê dikeve nava rûpelên dîrokê û dijî. Lewra hatiye gotin ku: “Gotin difire tenê nivîs dimîne”. Şaristanî bi qelemê têne avakirin. Çiqas tecrûbe, serborî û tiştên bi feyde hene, hemû bi saya qelemê ji pêşerojê re hatine şandin. Ji ber vê yekê serpêhatiya qelemê dûr û dirêj e û ev serpêhatiya wê bi niqutandina ser rûpelan naqede. Bi saya qelemê nivîs, bi saya nivîsê nivîskar û bi saya nivîskar xwendevan dikemile. Di rêya heyatê de qelem! Tu dev ji min bernedî ger ku ez dev ji te berdim jî...

Şev... Îşev... Ji şevên demê, lê ji şevên li dûhevsiwarbûyî cuda...

Îşev di nava dilê min de xije xija moxilê ye. Moxileke xwêdandayî. Ev moxila çavnebar, qulikê xwe bi min diguvêşe û bi awayekî têrxezeb min di nava têlên xwe de dibe û tîne. Geh berjêr dibim geh berjor. Di binê vê serobinoyê de wekî masiyên bêplan avjeniyê dikin, çelq dibim. Ez û ew erdhejên di hundirê min de, em li ber deriyê moxileke bi hêrs in, geh dikelin û geh jî dixwazin bikenîn, lê mixabin... Li derve tenê dengê kûçikên

zikbirçî û dengê tirêmbêlan, ji çend deqîqeyan carekê...

Şev e. Ji dendikên şevê destê xwe hine dikim. Lê hina destê min zû jê diçe. Ji dengê şevê helbestê vedixwim. Devê xwe dixim paxila şevê û bilûra şivên dinehwirînim. Weke tewanbarekî û weke sûcdarekî di binê lihêfa şevê tîrên rexneyan li kezaba xwe dixim. Bi xwe dixeyîdim û de'wa xwe ji xwe dûr kirinê dikim. Bi carekê bîna Şikefta Hîrayê hate pozê min. Bêhna vê ayeta pîroz di ber pozê min re derbas bû: “Ey Resûlê min ê ku ketiye binê lihêfa xwe, rabe û şiyar be.” (Muddesîr 1-2) weke şûrekî nûranî li dilê min dikeve. Ez bi xwe dihesim.

Dengê bêjînga şevê riya li ber westiyayîyan vedike. Riya kakişanî (kadiz) dibe derî ji dinyaya dilan re. Baskê hevpeyvînan xwe vedikin û şaxên xwe dirêjî dilên xemgîn dikin. Dinya ji derewan xwe vala dike. Kewara nefsê fistanê edebê bi ser bejna xwe dadike. Kenên qermîçokî xwe li pênuşan dipêçin û qelem wan dibe deryaya bişîrîne. Kela girî bi ser canê xemxwar de diqulibe lê qelem dibe şûr û

Şev e. Ji dendikên şevê destê xwe hine dikim. Lê hina destê min zû jê diçe. Ji dengê şevê helbestê vedixwim. Devê xwe dixim paxila şevê û bilûra şivên dinehwirînim.

destê xwe davêje kaniya baranê ji bo giriyên bêderman. Evna tev spartekên şevê ne. Ez jî xwediyê van gunehan... li xwe difetilim, da ku ez jî sûdeke bixêr ji vê şevê bigirim.

Şev bi ser min de tê. Weke ku hesabekî wê hebe bi min re. Dengê heywan û tirêmbêlên derve jî, alîkariyê bi şevê re dikan. Dernakeve neynika ku xew ji çavê min bi dûr xistiye. Dem dibore. Şev tarîtiya xwe xurttir û tûjtir dike. Tu dibêjî qey fereca derewîn jî ketiye binê 'erdê. Lê ez dizanim ku pirkûriya şevê nêzîkahiya tavê ye. Dibe ku şewqa rojê nêzîk be, lê dema têdeyî bi agirê xwe, ji agirê Nemrûdê bêmirad jî xerabtir e.

Şev jî dihele û ber bi diyariyekê ve diçe. Ez û esmanê dilê xwe jî diborin, didomin û diborin... Kela girî pir nêzîkî dilê min e. Dilê min kêman weke niha hatiye guvaştin. Her wekî 'ewrên li ber baranê me. Lê berfa ku xwe li qontarên çiyayên dilê min rapêçaye, nahêle ku germahî ji dilê min bifûre. Û her wiha çav jî bêpar in ji baranê... Keskesora dilan jî -mixabin- bi barana çavan ve girêdayî ye...

Di newaleke bêdeng... di dengekî bêşev... di şeveke bêxew de ... digel hevaltiya hêsiyan...

Berf... Çawa ku navekî xweş e jî, lê ji dilan re weke xewrevîneke bêbinî ye. Dibe ku li derve, welat û daristan di nava havîneke herikbar de bigevizin. Lê di dilan de her dem ne wisa ye. Dibe ku di nava havînan de jî, dil ji peşkên berfê nikaribe xwe biparêze. Îşev jî tiştêkî wisa hatiye serê min... Seqem tevdi-gere di nava hinavê min de. Ma

wê haya kê ji kê hebe di vê şeva tarî de. Tew ku xewa şêrîn xwe xemilandibe û xwe bi ser çavan de ajotibe tu yê çî bikî ji lingên tevizandî di bin kulîmekan de, çavên soromor yên bêxew, lênûs, pênuş û dûrbûna ji nav nivînên mexmûr...

Xew û şevê ku li hev kirin, ji vê pê ve ji berfê bêtir dê çî xwe li min bigire. Ma ne wisa ye, çawa îşev jî ez ji nav nivînan qiloz kirim û bayê berfê, ji nav kezeba felekê derxist û bi ser ronikên min de dakir. Ez tewş û mewş kirim.

Ez nabêjim xem nake. Gelekî bi xem e. Ma ku ne xema min bûya minê çima di nîvê vê şevê de ev xetên reş, bi ser reşayiya şevê de biweşandana? Ma ne xem bûya min û şevê me xencerên xwe tûj dikirin? Ma ezê çima hol bibama di vê tariyê de? Xem dike ji bo min û loma ez deyndarê rihê xwe me jî...

Helbestvanekî gotiye ku dema te serma girt, berî ku tu bibî cemed, binuxumîne gunehên xwe. Li xwe mikur were û alîkariyê ji çavê xwe re jî bixwaze. Ez dibêjim rind gotiye lê kêman e. Ma ne va ye ez jî, ji bo heman êşê xwe dispêrim pênuşarisasî. Ma ku ev awaz li xwe mikurhatin nebe, çî ye? Kî dê karibe xewê li min biherimîne, ku ne kul be...

Ku kewara dil vala nebe û bêxwedî li rastê nemîne dê çawa firtûneya poşmaniyê xwe bigihîne. Ku ne ji hêviya gaziyan bûya, ez û dengê lawirên şevê, kengî dihatin rex hev. Dûxan ji qelema min nedifûriya ku tirsqa qeşagirtina dil nebûya. Pênuşamin ji dêlva dilê min xwe nedite-

wand û ji bedêla çavên min hêsir nedibarand, li ser kaxeza spî. Îcar ez dibêjim ev jî baş e... Yanî ji tunebûnê çêtir e. Tew ku meriv bi valakirina hewzên xwe nehesese... Tew ku meriv bi ziwabûna kewarên xwe nehese... Tew ku di dema çewtî û xeletiyên de meriv nikaribe li paş xwe vege-re û xwe berhev bike... Aha wê çaxê agirê dojhê rasterast xwe li meriv dipêçe... Pênuş serî li ber meriv radike; xew, xwe seranser bêbinî dike û xewarên xwe dixwe. Weke ku tiştê neqewimîbe tew... Wê çaxê meriv dikare bibêje ku mirinê wezîfeya xwe bi cî aniyê û Fatîheyê Şerîf pêwîst e...

Belê, ez dizanim ku çî dinivîsim. Ez agirê hundirê xwe bi rêya avnûskê derdixim der. Dawa xwe dadiweşînim û derî li keserên nav canê xwe vedikim. Dixwazim wan berdim û bi vî awayî xwe nêzîkî azadiyêke siriştî bikim. Xwe dicebirînim, dikewînim; ji bo ku karibim şeveke din bi azadî xwe bihewînim, xwe berhev kim. Prova jiyaneke birûmet e belkî... Kelecânê beradayî dişom, bi vî awayî. Ez dizanim ku qelem perwerdekarekî qewî û qedîm e. Naêşîne û hêdî hêdî dikişîne nême ji can... Ku ew nebe ezê ji bêhtengiyê bifetisim. Beriya fetisandinê ceribandina poşmaniyê tije hêvî ye. Ez di vî baweriyê de me. Aram, sebr û tebatî ji aliyê pênuşê difûre. Ruh bi pênuşê xwe diçêrîne gelekê caran. Hubra pênuşê car caran bêhneke rehmanî jî bi xwe re tîne û kirasekî ewliyayî li xwediyê xwe dike. Lê ne her car...

Îcar ha niha qelem hatiye meydana herbê û li ser movikê tiliyê min siwar hatiye. Ez derdê

di şevê de ku li min civiyane jê re dixwînim ew jî dirêje... Çeman li ber vedike, dike kanî û bi çolan ve diteqîne. Diherike û tew derdên ku di binhişê min de niştasih bûne jî derdixê û datîne ser sifra jiyana min. *Şûnê şîşên ji agir dikewîne û ji feleka neyar re nameyên bêbersîv dişîne. Şa'irê hêja (hezar rehmet li wî) M. 'Elî Baqustanî bi pênuşa xwe wiha diaxive:*

Qelem ey qelem ey qelem ey qelem

Kerem ke qiyam ke ey ya muhterem

Belê. Mele 'Elî, ji dilekî kûr sê caran li ser hev, bangî qelemê dike û wê da'wetî qada şerê nivîsê dike. Lewra bi carekê, dilê wî rehet nabe û weke ku ditirse û dibêje ku ez carekê tenê ban dikimê, dibe ku neyê.

Ez jî bi pîrozbahîya qelemê dengê şevê û dengê dilê M. 'Elî, dîsa bi hêza qelemê bilind dikim.

Xwedayê min! Tu min bi min bide hesandin û nasandin. Tu min bi min nede xapandin û xeniqandin.

Xwedayê min, tu bi destê min, min nedî destê dijminê min...



Gava ku kelemeke çiyayî dev li te kir, xwe bispêre tahtan; ku teht qelişîn xwe bavêje ava nava wan, ku av ziwa bû, bêje "La uhibbul afilîn" û berê xwe bide rêya dil û wîjdan, bê xeberdan û bi bazdan... ●

Neçe...

Bamed Serdar

Çirokên saxsikestî xwe diguhêzin çirrayîya şevê
Li paşîya dilê min xwelîya qesîdeyên vê gavê
Û ez
Kevir geriyayê girêkên çavên te
Xêzikên raxistî nivîstên milên te
Hêsrên kefenkirî me ji bo te
Peravên jiyaneke li keserên ciwanîyê hefidandi
Rû bi rû li cotek gulleyên çavên te neteqandî
û li du te
Her evîndar xwe vedikşîne teniya çiroka xwe
Neçe û vê oxirê ji min nexwaze
Wê devê rêyan di çavên min de şikestî bimînin
Wê dûrbûn xwe bidin hev
Ezê mîna kefareta gunehekî te bimînin
û wek kulmek nokê li tehtê ketî
Şuşeya dilê xwe biderizînim
û ezê xwe vekîşînim heft xwelîya
Wê gumînen iske iske dilê te biteqin
Roj xwe li çûna te lavlavk bike
Neçe û vê oxirê ji min nexwaze
Ma ezê bi çend dengê bangî kim te û
ezê bi çend hawaran xwe veçêrim?
Neçe û vê oxirê ji min nexwaze.

GULDAN
MELA HUSNÊ HEZÎN



Weşanên Nûbiharê

Kitêbên Kurdî	
Adat û Rusumatnameê Ekradiye / M. M. Beyazidî	17.50
Antolojiya Çirokên Nûbiharê/Ayhan Geverî	12.50
Aqilê Hevpar yê Mirovahiyê/M.Xalid Sadinî	20.00
Cildên Kovara Nûbiharê (10 Cild, cildi)	30.00
Çarîn/ Sabah Kara	6.00
Çil Hedîs / Îmamê Newewî	5.50
Çirokên Mesnewiya Şerîf.... /Sadîk Yalsîzuçanlar	11.50
Çirokên Gelêrî/M.Xalid Sadinî	8.00
Derwêşê Evdî/Eyûp Kiran	13.00
Destana Şerrê Kundan û Qijikan/Gernas Koçer	11.50
Di ronîya Quranê de Dîroka Pêxemberan/Murad Celalî	9.00
Dîwan/Perto Begê Hekarî	15.00
Dîwan/Şêx Muhammed Hediye Qewmanî	12.50
Dîwan/ Seyid Eliyê Findikî (Çapa Nû)	15.00
Dîwan/Mela Zahirê Tendûrekî	15.00
Dubeytî/ Baba Tahirê Uryan (Çapa Nû)	12.50
Ebdullahê Minyeyî / Hekimoğlu İsmail	10.00
Elîfba û Tecwîd/Mela Ehmedê 'Eynberanî (Digel DVD)	10.00
Eqîde û Fiqha Zelal/Mela Burhanê Hedbî	14.00
Evîna Pinhan/ Sabri Akbel	6.50
Feqîyê Teyran (Çapa Nû ya Berfireh) / M. Xalid Sadinî	20.00
Ferhenga Çapemeniya Kurdî	14.00
Ferhenga Kurdistanî/Elî Ekber Kurdistanî	12.50
Ferhenga Pirzimanî	15.00
Guldan/Seydayê Mela Husnî	10.00
Gulistan/Şêx Sadiyê Şirazi/M. M. Garsî	11.50
Gulşenê Raz/Şêx Mahmud Şebuşterî /M. M. Garsî	8.00
Hebana Berxvan/Raufê Bêçare	10.00
Heyranokên Kurmancî/M.Xalid Sadinî	12.50
Jiyana Pêxemberê Me Hz. Mûhemmed/Mûrad Celalî	20.00
Kela Dimdimê û Xanê Lepzêrî/Casimê Celîl & Emerê Celalî	7.00
Kellê û Dimne/Beydaba	12.50
Leyla û Mecnûn/Siwadî	7.50
Leyl-name/ Ayhan Geverî	6.50
Li Muksê Folklor û Jiyana Rojane/Prof. Î. A. Orbelî	8.00
Mamîkên Kurmancî/M.Xalid Sadinî	12.50
Meqamat / Herîrî (Werger M. Ehmed Meylanî)	6.00
Mewlûd / Melayê Bateyî (Latînî-Erebî, şamûa)	8.00
Meala Fîrûz û Şerha Qur'ana Pîroz /M.M.Garsî Farqînî	25.00
Mela Huseynê Bateyî / M. Xalid Sadinî	15.00
Mem û Zîn/Bî rave û şîroveyeke nû	35.00
Mem û Zîn/Amadekar: Huseyn Şemrexî	17.50
Melayê Cizîrî/Amadekar: Selman Dilovan	17.50
Neynika Nimêjê/Mele Mûhemmedê Neynikî	10.00
Neynika Xeman Mele Mûhemmedê Neynikî	8.00
Nimêj Dikim/ Komisyon	7.00
Nûra Qelban-Tefsîra Qur'anê (Cildek)	30.00
Peyîva Bîst û Sêyemîn/ Seidê Norsî	4.00
Peyîvên Piçûk/ Seidê Norsî	6.00
Pêxemberê Ummetê Hz. Mûhemmed/ Ebdilhadî Botî	8.50
Pêkenokên Kurmancî/M.Xalid Sadinî	??.00
Pênc Rîsaleyên Îmamê Xezalî/M. M. Garsî	8.00
Rîsala Biratîyê/ Seidê Norsî	4.00
Riyadû's Salihîn/ Werger: M.Salihê Dihê	35.00
Ronahiya Qurana Pîroz/ M. Muhammed Hekkarî	25.00
Rubaiyat/ Omer Xeyyam	6.00
Seyf-ul Milûk û Bedî-ul Cemal/ Siyahpoş	15.50
Şiyerê Nebî / Milla Cimayo Babij	6.00
Şiyera Nebî/Ebû'l Hesen En Nedwî	9.00
Sorgul/Ibrahîm Sunkur	13.00
Şev û Rojên Mubarek/Ayhan Meretowar	10.00
Tûrikê Pîrê Kal / Pîrê Kal	7.00
Vateyê Qijekî / Seidê Nursî	4.00
Yezdan Dizane / Mezher Bozan	6.00
Zêna/Mezher Bozan	10.00
Bi herfên Erebî	
Baxçeyê Jiyana Piştî Mirinê/ Seyda Mele Yasînê Yusrî Amedî	12.50
Defteroka Şîrîn/(Berhevkar) Mûhemmed Mehsûm	6.00
Diyariya Kurdî Fiqha Şafî	6.00
Dîwana Hezîn/ Seydayê Mela Huznî	15.00

Eqîde û Tecwîd/Xelîfe Yusuf	5.00
Fiqha Şafî / S.M. Husnî Hezîn	15.00
Mecmeul Mesail/ Xelîfe Yusuf	30.00
Mewlûda Gundî/Seyyid Bedreddin	3.00
Mem û Zîn/Ehmedê Xanî (Şerh: Huseyn Şemrexî)	17.50
Mewlûd/Ertûşî (Bi cild-du reng şamûa)	15.00
Nûbihar/Ehmedê Xanî (Şerh: Huseyn Şemrexî)	8.50
Kulxaniya Veşartî/S. M. Husnî Hezîn	6.00
Reng û Rûyê Pêxember M. Husnî Hezîn	12.50
Rîsaleyên Eqîde û Exlaq û Edeb	15.00
Serkanî/Mele Mûhemmedê Mehsûm	8.50
Tuhfetul Sîbyan/Xelîfe Yusuf	7.00

Kitêbên Kurdî-Tirkî

Diwan/ Melayê Cizîrî (Şamua-Kurdî-Tirkî)	30.00
Ez Kurdî Hîn dibim-Pratik Kürtçe Dersleri	20.00
Gotinên Pêşyan û Botan/Abdulkadir Bingöl	15.00
Melayî Cizîrî Divan'ın Şerhi/A. Septioğlu	9.00
Mersiyeyên Rojhilat-Doğu Ağitları/ Sabah Kara	6.50
Nameyên Bêcewab-Karşılıksız Mektuplar/ Sabah Kara	6.50
Sempozyûma Bedîuzemman Seidê Nûrsî (Sempozyumu)	25.00











Kitêbên Tirkî

Asilerin Dönüşü / Gülîstan Çoban	6.50
Bedîuzzaman'ın Volkan Yazıları/ Osman Resulan	4.00
Çağdaş İnan Şiiri Antolojisi/ Sabah Kara	6.50
İslam Tarihinde Kürt Kadını / Muhammed Hayr Yûsuf	6.50
Kürtler ve Kürdistan Tarihi	35.00
Melayê Cizîrî Divanî ve Şerhi/ Prof. Abdülbaki Turan	35.00
Şerefname (2.Cild Osmanlı İnan Tarihi)	15.00
Turabidin'den Beriye'ye / Altan Tan	25.00

LİSTEYA PIRTÛKÊN KENTÊ

Aşk ve Savaş / Necdet Karasevda	11.50
Babam /M. Saîd Ramazan el-Bûtî	12.00
Bedîuzzaman'ın Hayatı/ Abdurrahman Nursi	6.00
Bütün Yönleriyle Arabkendi / M. Şerif Eroğlu	12.50
Tarih,Kültür ve Cizre/Abdullah Yaşın	20.00
Cumhuriyet Öncesi Diyarbakir'de Maârif	12.00
Çığır Açan Şark Alimleri/Abdulhadi Timurtaş	8.00
Çiğlîga Duran Sözler/ Misbah Hicri	6.00
Diwan/Molla Ahmed-i Ceziri	16.50
Diwan/Kiğilî Şeyh Selim	10.00
Diyarbakir Eğitim Tarihi/ Mehmet Şimşek	8.50
Duru Su Rüyası/ Mehmet Özer	12.00
Elma Kokusu (Yola Adanan Şiirler) Gülîstan Çoban	7.00
Eski Diyarbakir'de Gündelik Hayat/ M.Şefik Korkusuz	9.50
Eski Saîd'in Ehemiyetli Talebesi Hamza / Veysel Aydeniz	9.00
İlk Vatandan Gelen Sürgün/ Hasan Hüseyin Çevik	10.00
İnsanlığın Ortak Aklı/ M. Halit Yalçın	30.00
İslâm'ın Anadolu'ya Gelişi/ Ahmet Demir	12.00
İslam Aleminde Vakıf Kütüphaneciliği	10.00
İtirafçı/ Gülîstan Çoban	6.00
Kolay Farsça/ Osman Aslanoğlu	25.00
Kuruluş Döneminde Eyyûbiler / Ali Beyyûmi	12.00
Mazideki Suroç / A. Kadir İkbâl	9.00
Mazlum Halepçe / Müştehir Karakaya	7.00
Medreseden Meclis'e Meclis'ten Medreseye/ G. Emre	15.00
Mem û Zîn /M. Saîd Ramazan el-Bûtî	8.50
Muhafazakar Kürt Yoksullar, Mehmet Bozgan	6.00
Molla Muhammed Zevingî/ Abdulhadi Timurtaş	7.00
Seyahatnamelerde Diyarbakir/ M. Şefik Korkusuz	30.00
Sırr-ı Hanımın Divanı/ M.Şefik Korkusuz	10.00
Siya Mend / M. Saîd Ramazan el-Bûtî	8.50
Sonsuzluk Histerisi / Mehmet Bozgan	5.00
Kon Kapı / M. Zahir Ertekin	8.00
Süryaniler ve Diyarbakir/Mehmet Şimşek	14.00
Tarihin Adı Urfa/Misbah Hicri	8.50
Tezkire-i Meşayih-i Amid/M. Ş.Korkusuz	30.00
Urfa ve Çevresi Eyyubiler Tarihi/ Ahmet Demir	11.00
Urfa Efsaneleri/ Mehmet Kurtoğlu	12.00
Vadedilen Günler / Taha Hüseyin	9.00
Zamana İthaf/Mehmet Bozgan	6.00
Zembîlfiros/Gulistan Çoban	8.00

Ji refên Nûbiharê!





Zivistana **Diyarbakirê**
Foto: A. Şahin